# SERDEMA NÛ YA ŞOREŞAN
# ŞOREŞA AZADİYA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

**PIRTÛKA YEKEMİN**

# BINGEHA ŞOREŞÊ

**MEHMET EMÎN MUTLU - ERSÎN ÇELÎK**

# NAVEROK

**PÊŞEK**
**DESTPÊK**
**KRONOLOJÎ**
**BEŞA YEKEMİN; JI MILÊ DÎROKÎ VE SÛRIYE Û ROJAVAYÊ KURDISTANÊ**
1-Hevsengî, Nakokî û Pevçûnên Li Rojhilata Navîn, Sûriye û Rojavayê Kurdistanê
2-Di Nava Aloziya Rojhilata Navîn De Şoreşa Rojava
3-Şoreşa 19'ê Tirmehê
**BEŞA DUYEMİN; DI ŞOREŞA ROJAVA DE XEBATÊN XWESERIYÊ**
1-Di Nava Şoreşê de Pêşengtiya Jinê
2-Li Ser Şopa Şehîdan Xebatên Ciwanên Şoreşger
3-Li Rojava Xebatên Ziman û Perwerdehiyê
4-Di Nava Şoreşê de Xebatên Aboriya Komînal û Ekolojîk
5-Li Rojava Çapemeniya Azad
6-Şoreşa Rojava, Bingeha Xwe ji Çand û Hûnera Şoreşgerî Digre
**BEŞA SEYEMÎN; DI ŞOREŞA ROJAVA DE PÊŞKETINA HÊZÊN PARASTINÊ**
1-Li Rojava Avabûna Hêzên Parastinê: YPG
2-Rêxistinbûna YPJ'ê
3-Di Şerê Deşt û Bajaran De Taktîk

**PÊŞEK**

Li parçeyekî welatê me, li Rojavayê Kurdistanê Şoreş pêk tê. Weke komeke rojnameger, da ku em vê Şoreşê nêz ve bişopînin, fêm bikin û bidin fêmkirin nîqaşeke dimeşînin. Mirov dikare çi bike? Ji ber ku rojane pêşketin çêdibin, em nikarin bigihêjin leza Şoreşê. Plansaziyeke me ya dîtir nagire, kêm dimîne. Ji ber vê karê ku divê ewilî pêk were, çûyina qada Şoreşê ye. Divê em Şoreşê bibînin, bêhna wê bikşînin hundirê xwe; divê em li gel şoreşgerên vê Şoreşê nîqaş bikin, notên xwe bigirin, wêne û dîmenên xwe bikşînin… Ya herî girîng jî divê em fêm bikin… Piştî gelek nîqaşên bi vî rengî em amadekariyên xwe dikin û dikevin rê. Armanca me qeyidkirin, fêmkirin û dayina fêmkirin e. Em armanc dikin ku belgefîlm û rêzenivîsên ku bikaribin Şoreşê vebibêjin amade bikin.

Xebata ku pirtûkên di destê we de derxistine holê jî li ser esasê lêgerîneke wisa derket holê. Me di zivistana 2013'an de dest bi vê xebatê kir. Lê di 2014-15'an de zêdetir em lez bûn û xebata me têgihîştî bû. Li Kurdistanê meşandina xebatên rojnamegeriyê, weke her karek û qadeke din a xebatê, divê tu gelek karan di nava hev û din de bimeşînê. Carna tiştên ku divê tu ewilî pêk bînê diguherin, carna jî şert û merc nahêlin ku plansaziyên te pêk werin. Bêyî ku em binepixînin, em dikarin bibêjin ku her serdemeke me ya vê xebatê bi serê xwe dibe pirtûkek. Lê me nexwest ku çavdariyên xwe di van pirtûkan de pir zêde derxînin pêş. Lewma divê ne em, yên ku di ber vê şoreşê de canê xwe danîne holê biaxifîbana. Ji ber ku baweriyeke me ya bi vî rengî hebû, em gihêştin biryareke wisa. Ango ne em, dê çalakiya şoreşê û şehîdên şoreşê, Şoreşê vebibêjin. Em ê neaxifin, dê lehengtî û fedakariyên şehîdên şoreşê biaxifin.

Di vê derê de divê mijareke din ku em li ser bisekinin jî; cihê ku gelek hilbijêrên me hebûn, çima me di vê mijarê de xebata pirtûkê meşand? Ji ber derfetên teknolojiyê ku roj bi roj pêş dikevin û erzanbûyina amûrên dîtbariyê, li her qadeke dîmen tên kişandin û parvekirin. Bi taybetî înternet û medyaya civakî derfetên ku her kesek tiştên li derdora xwe diqewimin parve bike dide. Vê rewşe, li cihên ku çapemenî û ragihandin di destê deshilatdaran de ye, bi taybetî jî li Rojhilata Navîn ji bo gelan gelek derfetên xwe îfadekirinê derxistin holê.

Di 2010'an de li Tûnis'ê ciwanekî Ereb yê bi navê Muhamed Ebû Ezîzî, da ku kiryarên deshilatdariyê şermezar bike, xwe şewitand. Vê bûyerê, di destpêkê de li Tûnis û Misirê gelek cihên Rojhilata Navîn serhildanên mezin yên gel derxistin holê. Ev tevgera gel gihêşt asteke wisa ku êdî weke "*Bihara Ereban*" hate pênasekirin. Gelê Ereb li her cihekî ku lê jiyan dike, li hemberî zilma rejîmên faşîst serî rakir. Diyardeyeke ku ev pêşketin diyar dikirin jî, amûra sereke ya civakê medyaya civakî bû. Ev qada ragihandinê, pir zêde çavê deshilatdaran tirsand. Saziyên deshilatdariyê ku têkoşîn û xwestekên azadiyê yên gelan ji xwe re weke xeterî dibînin, hema dest avêtin ev qada ragihandinê jî û di asteke de xistin bin venerîna xwe.

Ragihandina ferazî-sanal ku hemû beşên medyaya civakî jî digire nava xwe, fersendeke ku yek bi yek her kesek bikaribe li gel civaka xwe fikir û tevgerên hevpar nîşan bide ye. Her wiha ragihandina ferazî jî, qadeke propaganda û rêxistinbûnê ye. Lê dijberî wê, hemû deshilatdarî û rejîmên herêmî û navnetewî jî da ku kesan bixin qontrola xwe û wan arasteyê konevaniyên xwe bikin, ev qada ragihandinê kar tînin. Wê demê di ragihandinê de, bi taybetî jî di tora civakî ya ragihandinê de, di navbera kes-civak û dewlet-deshilatdariyê de xeteke pir zirav heye. Ew xet, xeteke şikestinê re amade û şîlo ye!

Di vê qadê de em bi kurtasî û bi rehetî nêrînên xwe tînin ziman; ev yek jî gav bi gav me ji civak, kolan û çalakiyan dûr dixe. Qada ferazî ya ragihandinê ku bi teknolojiya ragihandinê ji bo me hatiye pêşkeşkirin, di mirov de hîseke azadiyê ya demkî ava dike. Di van tor û xetên ragihandinê de, bêyî ku bêhna me teng bibe, em her tiştekî re mijûl dibin. Ji ber ku tiştê em dikin jî, em weke çalakî dibînin, ew yek me hêdî bi hêdî ber bi bêçalakîtiyê ve dibe.

Weke gelên Rojhilata Navîn em xwediyê çandeke zanyariyê ne. Ji wan zanyaran yek jî Ebûzer Gifarî ye. Dibêje, "*yên ku êvaran bi zikê birçî radizin, ger hê jî destê xwe navêjin şûrê xwe, ne li ser hemdê xwe ne.*"

Niha dev jî ketina zanebûna birçîbûna xwe berde, em dizanin ku aliyê din yê dûnê çi diqewime. Em hemû tevgerên li derdora xwe bi çend kurtegotinan spot dikin û belav dikin. Em çi nizanin? Bi awayekî şênber her roj li hemberî gelê Kurd qirkirin çêdibin. Ji ber ku li hemberî van qirkirinan berxwedan heye, komkûjî pêk tên. Bajarên Kurdan bi erdê ve dikin yek û talan dikin. Da ku em serî

rakin, di her kêliyeke de hinceteke me heye. Lê di encamê de çi dibe? Van bûyerên kêlî bi kêlî pêş dikevin, her çiqasî ji bo serhildanê bangawaziyek bin jî, em didaqûrtînin. Her tişt êdî xwezayî tê dîtin. Redkirin, dijberbûyin, mûxalîftî, xwestin û înşakirin… Di nava ew qûlika reş a qada ferazî de winda dibin. Kapîtalîzm, bi rêka ragihandina ferazî-sanal; alternatîfa xwe ya herî rasteqîn, ango sosyalîzmê difetisîne. Nahêle ku li gel demokrasiyeke mîsoger ji nû ve xwe ava bike. Demokrasiya sexte ya kapîtalîzmê, bi rêka ev tora ferazî dikare xwe bidomîne. Civakxwaz û azadîxwazên nûjen jî, nikarin vê yekê vala derxînin.

Di dema ku me ev xebat dimeşand de, me jî her ev pirs li xwe kirin; pêvajoyê ku weke "*Bihara Ereban*" hate pênasekirin û li qadên weke Tahrîrê bi milyonan kes komkirin, çima ji bo gelên Rojhilata Navîn venegeriya şoreşeke mayinde? Bi sedan mirovan, di vê têkoşînê de jiyana xwe dest dan, mirovên ku hejmara wan bi milyonan tên diyarkirin, bi awayekî ji vê rewşê tesîr bûn. Di vê pêvajoyê de gelek dîktatorî hatin rûxandin, lê cihê wan rêveberiyên demokratîk ku di roja me de weke av û nan pêwîstiyên jiyanî ne nehatin avakirin; hê jî rêveberiyên faşîst û deshilat li ser kar in.

Li dijberî vê, xaka Rojavayê Kurdistanê ku parçeyê herî biçûk yê Kurdistanê ye, şoreşek pêk hat. Tiştê ku ev şoreş pêkanî çi bû?

Di qadeke ku ne xwediyê pir derfetan bû û hemû dane li dijî wê bûn de, çawa ŞOREŞ pêk hat? Cudatiya vê xakê û şoreşê çibû?

Dibe ku pir balkeş jî were dîtin, lê cudatiya ku me dît; SEROKATIYEK û PIRTÛKEK bû.

*"Berxwedan Jiyan e."* Ev pirtûkeke ku di sala 1991'an de bi Erebî li Rojavayê Kurdistanê hatiye çapkirin e. Berxwedana komek şoreşgerên Kurdistanî û Tirkiyeyî ku piştî cuntaya leşkerî ya 12'ê Îlonê, di zindana Amedê de hatine komkirin vedibêje. Ango li dijî şikenceyên herî giran yên mirovahiyê, berxwedana mezin a vînî ku Apoger bi bedena xwe dimeşînin vedibêje. Mazlum Doxan, Kemal Pîr, Sakîne Cansiz û Xeyrî Durmuşan vedibêje…

Her kesê/a ku me li Rojava dît û em pê re axifîn, gotin *"min pirtûka Berxwedan Jiyan e xwend û ez bi tesîra wê tevlî têkoşînê bûm."* Her wiha van kesên ku em qala wan dikin, piranî pêşengtiya vê şoreşê dikin. Jixwe ji ber tûndiyên rejîma Beas, ev pirtûk bi awayekî veşartî tê belavkirin û xwendin. Her kesê/a ku dixwîne, bi hestên têkoşînê tijî dibe û ji bo azadiyê dikeve tevgerê. Tevlî tevgera bi rêxistin, xebata kolektîf û jiyana komînal dibe.

Dema ku ev jiyan û fikirên hevpar kom dibin û fersenda wê dibînin, li ser vê esasê tevger û çalakî çêdibe, şoreş pêş dikeve. Şoreşa Rojava jî, vê yekê îspat dike.

Hûn dikarin bibêjin, çima vegotina van tiştan tê kirin? Lewma pirtûkên di destê we de, di encama nîqaşeke ew qesî kûr û berfireh de derketin holê. Me dît ku li ser Şoreşa Rojava, bi hezaran klîp û bernameyên tv'yê hene; bi deh-hezaran dîmenên ku li ser înternetê belav bûne hene. Kêm be jî, hin belgefîlm hatine kişandin. Bi milyonan peyamên tiwîtirê û wêneyên ku hatine parvekirin hene. Lê di derheqê ev şoreşa ku hemû cîhan xistiye bin terîsa xwe de, pirtûkên hene têliyên destekî derbas nakin. Yên heyî jî pir parçe ne û bi awayekî giştî teyisandina şoreşê dûr in.

Ger pirtûk tune be, nivîs jî tune ye. Ger nivîs jî tunebin, tiştên ku tên jiyîn, tenê weke geşedan dimînin. Jixwe weke me li jor jî got, ji ber nexweşiya teknîkê ya roja me, ev tiştên ku rojane tên weşandin jî, pir zû tên xerçkirin. Di teyisandina şoreşê de, ev yek jî dibe sereseriyeke mezin.

Ji ber van sedeman, me biryar da ku van hevpeyvînên ku me bi gel û şoreşgerên Rojava re kirine, em weke pirtûk amade bikin. Bêguman piştî ku me ev biryar da, ji bo ku ji her alî ve şoreş were teyisandin û aliyên kêm mayî timam bibin, me hin hevpeyvînên din çêkirin. Pêwîstî pê hebû ku pêşketina ev têkoşîna mezin, rawestgehên wê yên girîng; şer, lehengtî û serkeftinên wê bibin belge. Ev pêwîstiyeke pir girîng bû û vê pêwîstiyê di meşandina me ya vê xebatê de her em motîve kirin.

Me navê hevpar yê van pirtûkan weke "*Serdema Nû ya Şoreşan-Şoreşa Rojavayê Kurdistanê*" diyar kir. Dema ku ev pirtûk werin xwendin, dê baştir were fêmkirin ku me çima ew nav lê kiriye. Lê em bi xwe ve têkîldar dixwazin balê bikşînin ser vê xalê. Heya ku me Şoreşa Rojava dîtiye û toza wê kişandiye hundirê xwe, rastiya şoreşê û şoreşgeriyê pir razber bû. Lewma ji zarokiya me ve, nêrîneke weke "*serdema şoreşan xilas bû*" di mejiyê me de hatibû bi cih kirin. Em çûn, me dît û jiyan kir; di encamê de em jî gihêştin wê qaneatê ku serdema şoreşan xilas nebûye, dijberî wê em têgihêştin ku serdema nû a şoreşê jî li Rojava destpê kiriye.

Me ji bo van pirtûkên ku ji sê cîldanan pêk tên, di nava civakê de bi dehan mirovan re, sedan seatan hevpeyvîn çêkirin. Hevpeyvînên me, bi Kurdî, Tirkî û Erebî bûn. Heya ku me ev hevpeyvîn guhdarkirin, dahûrandin û ji bo pirtûkan hilbijartin, ji ser re salek derbas bû. Me hewil da ku em li gorî Kantonan û diyalektîka pêşketina şoreşê, cîld û mijarên pirtûkê diyar bikin.

Pirtûka yekemîn; pêvajoyê şoreş pêk hatiye digre dest û analîz dike. Li Rojhilata Navîn dîktatorî, gel û bawerî; nakokî, pevçûn û tifaq… Li gel vê, li Rojavayê Kurdistanê rêxistinbûna civakî, têkiliyên aborî û berhemdarî, perwerdehî, dadgerî û parastin di vê cîldê de hatin destgirtin. Şoreşa ku di pêşengtiya jin û ciwanan de gav bi gav pêş dikeve, çawa sazî dibe? Hewil hate dayin ku li gorî diyalektîkeke ev pêvajo werin vekirin. Her wiha înşakirina gel a rêveberiyên xweser, pergala meclîs û komînan ku bingeha teqûz a şoreşê çêdike, di vê cîldê de hate destgirtin.

Pirtûka duyemîn; dema li herêma Cizîrê gel rêveberiyên bajarên xwe bi dest xistin û pê ve girêdayî êrîşên rejîmê û komikên çete digire dest. Di vê cîldê de Şerê Serêkaniyê, beriya şer û encamên şer cihekî pir girîng girt. Lewma ev berxwedan bi derfetên di asta tinebûnê de ne hate meşandin û şoreşa mijara gotinê ye teqûz û mayinde kir.

Pirtûka seyemîn; pêşketinên şoreşgerî yên li Heleb, Efrîn û Kobanê û hewildanên înşakiran pergaleke demokratîk a gel digire dest. Di vê cîldê de êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Şoreşa Rojava derketin pêş. Her wiha berxwedana dîrokî ya YPG û YPJ ku li dijî van çetayan nîşan daye, damgaya xwe vê pirtûkê xist. Hevparên DAIŞ'ê jî, bi awayekî şênber bi vê berxwedanê teşîr dibin. Gel, mirov û bajar… berdelên pir giran didin û êşên pir mezin dikşînin. Lê ti caran radestî dagirkeran nabin…

Bêgûman ev pirtûkên ku di encama vê xebatê de derketine holê, kurteyeke di pêvajoyê şoreşê de hatiye jiyîn e. Lê berxwedanvanekî Sur'ê Xemgîn Roj, ji bo berxwedana Sura Amedê ji rojnivîska berxwedanê ku bixwe nivîsandiye dibêje, "*her çiqasî ev nivîsandin, ji sedî yekê berxwedana hatiye jiyîn be, di wateya dilopeke ku dikeve nava pelên dîrokê de bi nirx e.*" Em jî vê nêzikbûnê û felsefeyê esas digirin.

Li gel vê yekê weke me li jorê jî got, ji ber leza şoreşê me nikarî em pêşketinên di nava ev sala dawî de çêbûne, bixin nava vê xebatê. Piştî ku hevpevyîn xilas bûn û di pêvajoyê amadekariya pirtûkê de, pêşketinên girîng yên weke rizgarkirina Minbic'ê û Operasyona Xezaba Firatê pêş ketin û hê jî di vê çarçoveyê de Bakur Helebê û derdora Reqayê şerê dijî DAIŞ'ê û rizgarkirina van herêman berdewam dike. Em bawerin heya ku ev pirtûk bigihêjin ber destê we dê di çarçoveya Şoreşa Rojava de hê gelek pêşketinên din çêbibin. Lê em bawerin tiştên ku di van pirtûkan de tên vegotin, xet û diyalektîka van pêşketinan jî rewa dike. Pêşketinên çêbibin jî, dê li ser heman rihî û felsefeyê bin. Jixwe em angaşt nakin ku em di derheqê Şoreşa Rojava de her tiştekî vediguhezînin, em çi bikin jî wê kêm bimîne. Lê mirov van pirtûkan weke çavkaniyên bingehîn yên şoreşê dikare pênase bike. Divê aliyên kêm mayî, yekser ji aliyê kesên ku jiyan kirine ve werin nivîsandin. Ji vî alî ve mirov dikare vê xebatê sûd werbigre û ev xebat ji bo xebatên ku pêş bikevin di heman demê de teşfîqkirinek e.

Herî dawî, em ji hevalên ku ji destpêkê heya dawî alîkariya vê xebatê kirine re spas dikin. Di nivîsandina qeydên deng û redekteyê de kedeke mezin a Firat û Şoreş çêbû, Veysî wêneyên ku kişandine bi me re parve kirin, ANHA û Ronahî TV arşîvên xwe ji me re vekirin; em hemûyan re spas dikin. Dîsa ji ber ku dilê me nehiştin û nivîsên destpêkê nivîsandin, em ji Diyar Hebûn, Faraşîn Adar û Zinar Suruç re spas dikin. Her wiha ji bo gel û şoreşgerên Rojava, ji bo ku şoreşeke wisa diyarî me kirin û di vê xebatê de alîkariya me kirin em spas dikin.

**Ersîn Çelîk - Mehmet Emîn Mutlu**
**1'ê Adarê 2017**

## DESTPÊK

### Ji Şoreşa Azadiya Rojava ku serdema nû ya şoreşan dide destpêkirin re…

Beriya her tiştî ez Şoreşa Azadiya Rojava ku bûye ronahiya sedsala 21'emîn silav dikim, şehîdên leheng yên vê şoreşê bi rêz û mînet bi bîr tînim. Şoreşa Azadiya Rojava, hem xwe dispêre bingeheke civakî, hem jî li ser esasê konjektoreke siyasî-leşkerî pêk hatiye. Her du alî jî girîng in. Yek ji wan derxistina pêş û milê din paş hiştin ne rast e. Çawa ku ne heman tişt in, ne dijberî hev in jî. Divê em bizanibin ku ya ku pêk hatiye hev û din timamkirin e. Ango asta potansiyela civakî ku ji bo şoreşekê pêwîst dike û di dema şoreşê de pêvajoya heyî, hev û din timam dike.

Divê em kûrahiya dîrokî û hîmê civakî ku bûye bingeha şoreşê, li ser esasê xebatên welatparêziyê ku dehan salan berdewam kirine bi awayekî berfireh bigrin dest û binirxînin. Tê zanîn ku civaka Kurd, ji wan civakên kadîm ku li Mezepotamya di navenda şoreşa Neolîtîk û şaristaniyê de cih digrin e. Di seranserê dîrokê de jî li dijî êrîş û dagirkirinên hêzên deshilatdar û dewletperest her ber xwe daye, jiyan û civakbûna xwe li ser vê esasê ava kiriye. Ango bingeheke xurt a dîrokî û civakî di civaka Kurd de heye. Di dîroka nêzik de jî civaka Rojavayê Kurdistanê, ji serhildan û berxwedanên ku di çayreka yekemîn a sedsala 20'emîn de li parçeyên din yên Kurdistanê pêş ketine tesir bûye û ji dil hîs kiriye. Hemû encamên van serhildanan -ku hemû jî hatine tepisandin- bi awayekî bermahî be jî li Rojavayê Kurdistanê kom bûne. Bi awayekî rojane jî xebatên şoreşgerî ku di pêşengtiya Rêber Apo de ew 20 salin berdewam dikin hene. Ev xebat bi piranî li ser esasê rêxistinkirin û perwerdekirina civakê û amadekariya şoreşê pêk hatine. Divê em van hemû diyardeyan ji bo Şoreşa Azadiyê ya 19'ê Tirmehê, ji milê cîvakî û dîrokî ve weke hîmekî bigrin dest. Bêyî ku xwe bispêre bingheke wisa ne gengaz bû ku Şoreşa Azadiyê ya 19'ê Tirmehê pêk were.

Ji milê konjektorê leşkerî û siyasî ve jî em dikarin balê bikşînin ser hin tiştan; tê zanîn ku Tevgera Azadiya Kurdistanê, ji 1'ê Hazîranê 2010'an û vir ve derbasî Serdema Stratejîk a 4'emîn bûye. Ango li ser esasê stratejiyeke nû ya Şerê Gelê Şoreşgerî, pêvajoyekî dijwar yê têkoşîn û pengavan pêş xist. Bi taybetî di 2011-12'an de li Bakurê Kurdistanê ev pengava Şerê Gelê Şoreşgerî, bi awayekî berfireh û kûr hate jiyîn. Ev pêvajo, pêngaveke herî girîng a têkoşîna gerîla ku ev 30 sale li Bakurê Kurdistanê berdewam dike bû. Her wiha rewşa ku li Başûrê Kurdistanê pêş diket û Şerê Qendîlê ku di Tebax û Îlona 2011'an de li Rojhilatê Kurdistanê pêş ket û tevgera gerîla ku li Rojhilatê Kurdistanê pêş diket, bi kûraniya Şerê Gelê Şoreşgerî ve bû yek. Vê yekê ji xwe re hin encamên pratîkî jî derxistin holê û pêwîstî bi pengavên nû çêbû. Divê em Şoreşa Azadiya Rojava ku di 19'ê Tirmehê 2012'an de pêş ket jî weke encameke girîng a ev serdema Şerê Gelê Şoreşgerî bigrin dest û binîrxînin. Şoreşa Azadiya Kurdistanê, raste rast weke encameke Şerê Gelê Şoreşgerî yê Bakurê Kurdistanê û berxwedana azadiya Kurdistanê ku di pêşengtiya Rêber Apo de ew 40 salî zêdetire berdewam dike derketiye holê. Vegeriye parçe û çirûskeke Şoreşa Azadiya Kurdistanê.

Konjektorê siyasî û leşkeri yê Rojhilata Navîn jî, îro hemû hêzên siyasî yên Cîhanê hewl didin ku ji nêz ve bibinin, binirxînin û fêm bikin. Şerê 3'emîn yê Cîhanê ku li Rojhilata Navîn pêş dikeve, da ku were fêm kirin ji milê her kesî/ê ve tê nirxandin. Ev şerê ku di navbera hêzên sermayedar yên hegemon û dewlet neteweyên herêmê ku di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de derketine holê de berdewam dike, ji destpêka 2011'an ve li cihên cuda yên erdnigariya Erebîstanê pêş dikeve û bi serhildanên gel ve ketiye nava hev û din. Nexasim gelek derdoran ev tevgerîna gel weke "*Bihara Ereban*" bi nav kirin. Di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de gelê Ereb weke civakeke rêza duyemîn hate dîtin. Her çiqasa têkiliya van xwepeşandanên gel ku ji Tûnis û Misirê destpê kirin û li hemû erdnigariya Erebîstanê belav bûn, bi tesîra Şerê 3'emîn yê Cîhanê ku li ser Erebîstanê çêbûye ve têkîldar be jî; divê em balê bikşînin ser ku ev xwepeşandan bi rewşa gelê Ereb ku di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de xistinê û berteka gel a li hemberî ew statûya civaka rêza duyemîn ve jî girêdayîye. Weke encameke bertekên gel yên li hemberî wê statûyê derket holê. Tê zanîn ku ew rewşa serîrakirin û xwepeşandanan ji 2011'an ve li Sûriye jî belav bû.

Ji milê din ve Sûriye ji 2011-12'an ve vegerandine navendeke sereke ya Şerê Cîhanê yê 3'emîn. Ev şerê ku weke nakokî û pevçûnên di navbera hêzên hegemon yên kûrevî û statûkoperestên herêmê de li erdnigariya Ereban pêk tê, kişandin ser erdnigariya Sûriye û ew şer bi dijwarî li Sûriye hate jiyîn. Ev

şer di havîna 2012'an de kûrtir û dijwartir bûye û bûye xeleka herî lewaz a pergala modernîteya kapîtalîst a Sûriye û dewlet neteweya Sûriyeyê. Van êrîşên ku hêzên sermeyedar yên kûrevî di hundirê Sûriye de pêş dixistin, di 19'ê Tirmehê 2012'an de bi çalakiya leşkerî ku li Şamê hatiye darxistin gihêşt lûtkeyê û rêveberiya Beşar Esad hejand. Vê rewşê li gelek cihên Sûriyeyê û Rojavayê Kurdistanê pêşî li lewazbûn, sistbûn û belavbûna serweriya dewletê vekir. Piranî cihên ku li ser sînor cih digrin û ji navenda rejîmê dûr in ji bin serweriya dewletê derketin. Şoreşa Azadiya Rojava ku ji Kobanê destpê kir û li hemû bajarên din yên Rojavayê Kurdistanê belav bû jî di konjektoreke wisa de di asta leşkerî û siyasî de pêş ket. Vê yekê xwe bi xwe rêvebirina gelên Rojava îfade dikir. Di demeke kurt de Kurdistana Rojava bû parçeyê herî azad yê Cîhanê. Li parçeyê Rojava yê Kurdistanê zayina rêveberî, pergal û jiyaneke nû çêbû.

Di navbera Şoreşa Azadiya Rojava û Şerê Cîhanê yê 3'emîn ku li Rojhilata Navîn tê jiyîn de jî têkiliyeke wisa heye. Nexasim li ser hîmê pêşketina Şoreşa Rojava, şerê azadiya Kurdistanê û Şerê Cîhanê yê 3'emîn ketine nava hev û din. Di nava rewşeke wisa de, diyardeya ku herî zelal û ronahiyê diteyîsîne derdora xwe ew e; ya ku riya aştiyê nîşan dide, hêza çareseriyê derdixe holê, ji hemû gelên Kurdistan û Rojhilata Navîn û mirovahiyê re dibe hêviya azadiyê Şoreşa Azadiya Rojava ye. Ev nêzikî 5 salan e, ev rista xwe bi awayekî tesîr dîlîze. Roj bi roj ew rist mezintir jî dibe. Em bawer dikin ku ev ronahiya hêviyê dê her hebe û wê rista xwe jî her bîlîze.

Ne gengaz e ku mirov Şoreşa Azadiya Rojava, ji têkoşînên azadiyê yên li parçeyên din ên Kurdistanê hatine meşandin û xebatên şoreşgerî yên Rêber Apo ku li Rojavayê Kurdistanê 20 salan berdewam kirine qut bigre dest. Tê zanîn ku her çiqasî bi Peymana Lozanê Kurdistan hatibe parçekirin û civaka Kurd hatibe înkarkirin û tûnehesibandin jî, civaka Kurd ev pêvajo û statû ti caran qebûl nekiriye û li Bakur, Başûr û Rojhilat berxwedanên demdirêj û piralî meşandine. Nexwasim ev berxwedan tenê li hemberî statûya ku di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de derketiye holê jî nehatine meşandin. Beriya wê, di sedsala 19'emîn de jî, bi mabesta zêdetir pere û leşkeran ji van herêman bigrin êrîşên hûkimraniya Osmanî li ser mîrtî û herêmên Kurdan hene. Li hemberî van êrîşan jî, Kurdên çar parçeyan bi piştgiriya eşîran ber xwe dane. Bûyerên ku weke *"serhildanên Kurdan"* tên bi navkirin, li ser vî hîmî pêş ketine. An na xweberê çênebûne, an jî ji bo ku otonomiyên di nava hûkimraniya Osmanî de hene bizivirînin statûyên serxwebûnê ti serhildan çênebûne.

Êrîşên di sedsala 20'emîn de jî, êrîşên nijadkûj ku li ser esasê parçekirin û tûnekirina civaka Kurd çêbûyî ne. Ango serhildan û berxwedanên ku di sedsala 19'emîn û 20'emîn de çêbûne û bi komkûjiyan encam bûne, li dijberî van hewildan û êrîşên dagirkirin û nijadkûjiyê pêş ketine. Van berxwedanên ku di demên cuda de li herêmên cuda pêş ketine, her çiqasa pêşketinên girîng derxistibin holê jî, hemû bi komkûjiyên mezin encam bûne û hatine pelçiqandin. Ev êrîşên ku di sedsala 19'emîn û 20'emîn de hatine ser Kurdistanê, tevgerên komkûjiya fîzîkî ne. Her çiqasî herêm herêm û di demên cuda de hatibin çêkirin jî, di encamê de bi komkûjiyan encam bûne û bûne sedem ku bi sedhezaran Kurd jiyana xwe dest bidin. Di 50'î salê dawî yê sedsala 20'emîn de jî, dagirkeran li ser hîmê van komkûjiyên fîzîkî û encamên siyasî û leşkerî ku van komkûjiyan derxistiye holê, Kurd xistin nava pêvajoyekî piralî yê bişavtin û qirkirina çandî.

Ji ber vê yekê tesîra van berxwedan û serhildanên ku li Bakur, Başûr û Rojhilat çêbûne, li ser Rojavayê Kurdistanê jî tesîr kirine. Her çiqasî li parçeyên din yên Kurdistanê berxwedan bi komkûjiyan encam bibin jî, zanebûna welatparêziyê û vîna berxwedanê ku van serhildanan afirandiye li Rojavayê Kurdistanê her xwe zindî û ser piyan hiştiye. Her wiha berxwedana gerîla ku ji 15'ê Tebaxa 1984'an û vir ve bê navber li Bakurê Kurdistanê didome, li ser Rojavayê Kurdistanê tesîreke pir mezin kiriye. Li gel vê yekê ji 1991'an ve li Başûrê Kurdistanê statûya Kurdan ku derketiye holê û pêşketinên çêbûne jî li ser Rojavayê Kurdistanê tesîr kirine. Her wiha berxwedana ku li Başûrê Kurdistanê di pêşengtiya PDK'ê û YNK'ê de çebûye jî, di astekê de her Rojava tesîr kiriye. Bi taybetî berxwedana gerîla ku di sala 84'an de li Bakur destpê kiriye ne tenê tesîr kiriye, raste rast Rojavayê Kurdistanê kişandiye nava vê berxwedanê. Bi kurtasî têkiliyeke mirov nikare ji hev û din qut bike ya Şoreşa Azadiya Rojava û serhildanên Kurdan ku di sedsala 19'emîn û 20'emîn de çêbûne heye.

Di nava vê têkiliyê de bêguman diyardeya herî kûr jî xebatên şoreşgerî yên Rêber Apo ku ji 1979'an heya komployê zêdetirî 20 salan li Rojavayê Kurdistanê meşandin e. Ji 2'yê Tebaxa 1979'an û vir ve, ango bi çûyina Serokatî ya Rojavayê Kurdistanê, di jiyan û sekna siyasî, çandî û civakî ya gel de

guhertineke bingehîn çêbûye. Bi vê yekê ji bo Rojavayê Kurdistanê pêvajoyekî nû destpê kiriye. Piştî darbeya leşkerî a 12'ê Îlonê, Tevgera Azadiyê bi demkî paşvekişandinek çêkir û li xeta Fîlîstîn-Lûbnanê amadekariyên berxwedanê kirin. Vê yekê jî di nava Şoreşa Bakur de, tesîr û rista Rojavayê Kurdistanê zêdetir kir. Paşvekişîn û vegera welat de, Rojavayê Kurdistanê bû rawestegeh û biryargeheke bingehîn.

Tesîra pengava gerîla li Bakurê Kurdistanê pêş ket, qesî ku li ser gelê Bakur tesîr kir, gelê Rojavayê Kurdistanê jî bandor kiriye. Li gel ku Kurdên Rojava ji aliyê madî, manevî û çandî ve piştgiriya Pengava 15'ê Tebaxê kirin; keç û xurtên xwe yên herî bi qîmet tevlî şer kirin û ji bo ku berxwedana azadiya Bakur bê navber bidome, tevlêbûneke mezin çêkirin.

Ev pêşketin hemû bi xebatên rêxistinkirin û perwerdehiyê yên Rêber Apo ku li Rojava meşandine çêbûn. Van xebatan, gel û ciwanên Rojava zane û rêxistin kirin û berê wan daye berxwedena Bakur. Pêşketinên berxwedana Bakur jî, di Kurdên Rojava de rê li pêşiya pêşketina zanebûn û rêxistinbûna welatparêzî û şoreşgertiyê vekir. Bi vî awayî Rojava tesîr kir. Parçeyekî bingehîn yê Şoreşa Vejîna Netewî ya demokratîk û zanebûna welatparêzî û şoreşgeriyê ya Kurdan ku di salên 90'î de li Bakurê Kurdistanê ava bûye, li Rojavayê Kurdistanê pêş ketiye. Lewma rastiya ku ji bo Şoreşa 19'ê Tirmehê ya 2012'an bûye bingeh, ev zanebûn û rêxistinbûyin e. Rê li pêşiya vê Şoreşê vekiriye.

Ger di sala 2012'an de Kurdên Rojava karîbe konjektorê derketiye holê binirxînin û bizivirînin şoreşê, risteke mezin a xebatên rêxistinbûn û perwerdehiyê yên Rêber Apo di vê derê de heye. Ango berxwedana Bakur, ne tenê gelê Bakur, gelê Rojava jî perwerde û rêxistin kiriye û kişandiye nava şoreşê. Jixwe li Rojava jin û mêrekî ku Serokatî nas neke tune ye. Divê mirov xebatên Rêber Apo wisa ji rêzê û gelemperî negre dest; dijberî wê xwe gihandiye hemû derdoran; xebateke piralî ku hemû jin, mêr, ciwan, zarok û extiyaran mûxatab digre meşandiye. Şoreşa 19'ê Tirmehê û berxwedana ku ji çar salan zêdetir e li dijî hemû êrîşan li Rojava berdewam dike, mirov nikare ji xebatên rêxistinkirin û perwerdehiyê yên Rêber Apo qut bigre dest. Bi vî rengî girtina dest, ne rast û watedar e. An na xweberê şoreşeke bi vî rengî ku olan dide çênabe. Ango Berxwedan û Şoreşa Rojava xwe dispêre danehev û bingeheke wisa.  Vê bingehê hîmê Şoreşa 19'ê Tirmehê avêt, vîna azadiyê ya 19'ê Tirmehê jî pengava şoreşgerî ku van danehevan zindî û jiyanî dike avêt û rastiya berxwedana dij-faşîzmê derxist holê.

Taybetmendiyeke din a Şoreşa Rojava jî; bersiveke mîsoger da gotin û propagandaya ku weke "*serdema şoreşan xilas bû"* tê diyarkirin. Hemû derdorên dij-şoreşê, bi awayekî hevpar vê propagandayê dikin. Hêzên faşîst, paşverû, hêzên deshilatdar-dewletperest û hêzên Modernîteya Kapîtalîst vê propagandeyê pêş dixin. Derdorên ku ji têkoşînên azadî û demokrasiyê zirar dibînin, ji bo ku pengavên şoreşgerî lewaz bikin, vê angaştê derdixin pêş. Ev jî rêbazeke şerê taybet e. Ango tiştekî wisa tune ye û ne gengaze ku hebe jî. Gelo pergalên deshilatdariyê û devletê ji holê rabûne ku serdema şoreşan jî xilas bibe? Ango ev yek berovajîkirineke ji rêzê ye. Ji bo ku kesên ne xwediyê zanebûneke civakî ne tevlî nava têkoşîna şoreşgerî nebin û di bin tesîra dij-şoreşê de bimînin, ev gotin tên karanîn.

Ji vî milî ve ti rastî û wateya van gotinan tune. Lê dema ku em asta teknîk gihêştiyê û karanîna Modernîteya Kapîtalîst a vê teknîkê û ji bo mêjî şûştin û li ser rihê mirovan tesîrkirina faşîzma Netewa Dewletan, hewildanên van derdoran li ber çavan bigrin, gotin û propagandayên ku li ser vê esasê pêş dikevin divê biçûk nayen dîtin. Divê bi vala derxistina van propagandayên tarî; propaganda û perwerdehiyeke pêş bixin û li ser wê esasê ciwan, jin, kedkar û gelan bigihînin zanebûn û feraseteke rast.

Li gorî rastiya xwe, feraseteke şoreşê ya sedsala 20'emîn hebû. Ev pêvoja bi Şoreşa Cotmehê ya 1917'an destpê kir û pengaveke şoreşgerî ku xwe dispart nakokiya çînî bû. Tevger, şoreş û şerên rizgariya netewî jî pêş xistin. Armanç kir ku li dijberî pergala sermayeyê, deshilatî û devletên karker û kedkaran biafrîne. Xwediyê qarektereke teqez, hişk û fetihkar bû. Bi van têkoşînan, sedsala 20'emîn bû sedsala têkoşînên civakî û şoreşan. Ji destpêka sedsala 21'emîn ve, di van qarekterên şoreşgerî de guhertinên girîng çêbûn. Nexwasim şoreş, tenê di sedsala 20'emîn de pêş neketin. Beriya pergalên deshilatdar û dewletperest jî hebûn. Mirovahiyê, hemû pêşketin û nûbûnên ku di jiyana civakî de pêş dikevin weke "**şoreş**" pênase kir. Mînak, di pêşengtiya jinê de Şoreşa Neolîtîkê, Şoreşa gundewarî û cotkariyê çêbû. Ango ji ber ku hin taybetmendî û qarekterên sedsala 20'emîn ji holê rabûn, şoreş jî xilas nebûn û ji holê ranebûn. Heya ku jiyana civakî hebe wê her hebin û zindî bin. Şoreş, îro ji ew

pênaseya teng a siyasî û leşkerî derdikevin û li ser hîmê aborî, civakî û çandî pêş dikevin. Ango ev aliyên şoreşê zêdetir derdikevin pêş.

Di sedsala 20'emîn de pêşketinên ku bi Şoreşa Rusya çêbûne, bi belavbûna Yekîtiya Sovyetan ku di destpêka salên 1990'î de çêbû ve hatin derbaskirin. Li gel vê yekê di felsefe û teoriya şoreşgeriyê de, di xeta bîrdozî-siyasî de, di textîk û stratejiyan de, nûbûyina şoreşgeriya sosyalîzîmê û ji nû ve avabûn pêş ket. Ev jî rastiyeke bingehîn e. Ji belavbûna Sosyalîzma Reel û vir ve serokatî û hêzên demokratîk û şoreşger, ketin nava lêgerînên nû. Bi nîqaş, lêkolîn û lêhûrbûneke mezin, hewil dan ku waneyên şoreşên berê der bixin û teoriya şoreşgeriyê ya sedsala 21'emîn pêş bixin. Di vê mijarê de ji kesên ku herî zêde hewildan nîşan didin û encamên serkeftî derdixin holê yek jî Rêber Apo ye. Nêrîn û fikrên Rêber Apo civaka Kurd dorpêç dikin, civaka Kurdistanê jî derbas dikin; xwe digihînin Rojhilata Navîn û hemû mirovahiyê. Felsefeya xeta Netewa Demokratîk ku li ser esasê teoriya Modernîteya Demokratîk a Rêber Apo pêş dikeve, di hemû civakan de tesîra xwe dike û rê li pêşiya zanebûn û rêxistinbûneke nû vedike. Şoreşa Azadiya Rojava jî, mînaka ewil a pêkanîn û jiyanîkirina ev nûbûyina fikrî ye. Li gel vê yekê Şoreşa Azadiya Rojava, encama şênber û mayinde ya hewildanên rêxistinbûyin û perwerdehiya 40 salan a Rêber Apo ye; mînaka ewil a ev serkeftina mezin e.

Li ser vê esasê Şoreşa Azadiya Rojava, propagandaya *"serdema şoreşan xilas bû"* bi awayekî giştî ji holê rakir û îspat kir ku ev gotin, dereweke mezin e. Ji milê rêgez û armancan ve şoreş diguherin û berdewam dikin. Rêgeza diyalektîkê di ev rastiya şoreşan de jî pêk tê. Ji vî milî ve Şoreşa Azadiya Rojava, çirûsk û pengava ewil a şoreşên azadî û demokrasiyê yên sedasala 21'emîn e. Ango şerê Bedîrê yê Şoreşa Îslamê ye. Her wiha ger mirov ji milê pêşengtiyê ve bigre dest, Şoreşa Rojava dişibe Şoreşa Rusan a 1915'an. Çawa ku piştî wê, Şoreşa 1917'an a Rusan çêbû û li Asya, Avrupa û Amerîqayê belav bû; pêşketinên ku Şoreşa Azadiya Rojava derxistina holê jî wê bi serkeftina Şoreşa Azadiyê ya Kurdistanê encam bibe û wê rê li pêşiya Şoreşa Azadiyê ya Rojhilata Navîn veke.

Li gel ku şoreş, di nava civakeke biçûk de pêk hat, li hemû cîhanê olan da. Ev jî bingeha xwe ji van taybetmendiyên şoreşê digre. Ger îro Şoreşa Rojava ev qesa çêker, bandorker û berxwedêr e; bi lezgînî li hemû mirovahiyê belav dibe, weke ku di mînaka 1 Mijdarê Roja Cîhanê ya Kobanê de jî hate dîtin hemû mirovahiyê li derdora xwe kom dike, ji ber van taybetmendiyan e. Ger mirov bi nêrîneke wisa bigre dest, mirov dibîne ku Şoreşa Rojava ne şoreşeke herêmî û xwecihî ye. Rast e, bi çend kantonan û hin bajaran ve sînordar e û li cihekî ku ti kesî/ê texmîn û hesap nedikir pêk hat. Lê ev tişt nabin sedem ku Şoreşa Rojava, herêmî û xwecihî bimîne, an jî tenê bi Kurdistanê ve sînordar bimîne.

Dijberî wê, taybetmendiyên vê şoreşê ku wê, cîhanî û gerdûnî dikin hene. Di saya van taybetmendiyên xwe de karî li dijî DAIŞ'a ku li serê hemû mirovahiyê bûye bela ber xwe bide û ev hêza hovane bişkîne. Her wiha xwediyê felsefe û teoriyeke ku riya azadî û rizgariyê nîşanî hemû bindestan dide û vîn û biryarbûna têkoşînê di her kesî/ê de pêş dixe ye. Şoreşa Rojava ne tenê tevgerîneke siyasî û leşkerî û tevgereke teng a civakî ye.

Şoreşa Azadiya Kurdistanê, şoreşeke mezin a fikrî ava kir. Şoreşa Rojava jî xwe dispêre ev pergala felsefî, hişmendî û fikrî ya gerdûnî. Armanc û rêbazên wê jî, bi vê yekê ve girêdayî ne. Ji vî milî ve dibe ku şoreş li cihekî teng bi çalakîbûneke sînordar pêk hatibe; lê rih û hişmendiya ku bereya wê diyar dike gerdûnî ye. Ev gerdûnîbûn, ji ev Paradîgmaya Demokratîk-Ekolojîk-Azadîxwaziya Jinê ve girêdayî ye. Bi taybetî azadîxwaziya jinê, aliyekî girîng yê gerdûnî ye. Di nava vê de jî li dijberî her cureyî deshilatdariya mêr û dewletperestiyê, afirandina demokrasî û azadiya civakî heye. Ti azadî û wekhevî, bêyî ku xwe bispêrin azadiya jinê, ne rast û bes in. Bi awayekî giştî civakê azad û demokratîk nakin.

Her wiha aliyê wê yê aborî, li dijî tûnekirina xweza û civakê ya endûstriyalîzmê ye. Hevsengiya mirov û xwezayê pêş dixe. Ev jî li dijî xeteriya mezin ku endûstriyalîzm pêş dixe, jiyandina mirovahî û gerdûnê îfade dike. Milê wê yê civakî jî li ser heman hîmî pêş dikeve. Tê zanîn ku şoreşên sedsala 20'emîn her çiqasa li ser esasê azadî, wekhevî û hevpariyê pêş ketibin jî; di encamê de xwe dispartin xeta çort a deshilatdariyê û milê siyasî û leşkerî zêdetir pêş bû. Şoreşa Rojava pirsgirekên ku di vê derê de tên jiyîn jî derbas dike. Di Şoreşa Rojava de milê leşkerî û siyasî ne pêş e; milê bîrdozî, çandî, fikrî û civakî li pêş e, li gel vê yekê milê wê yê leşkerî û siyasî jî heye. Ji ber vê yekê feraseteke nû ya demokrasiyê temsîl dike; ne dewletperest û deshilatperest, civakperest e. Bi her tiştî xwe, bi rastî û pîvanên civakî ve girêdayî ye. Ji ber vê qesî ku berxwedan û serkeftina wê ya li dijî DAIŞ'ê, li ser mirovahiyê tesîr dike; xwe sipartina xet û bîrdoziyake bi vî rengî wê zêdetir çêker û bandorker dike. Ji ber

vê ew qesa zindî ye, kelecanî û hêviyê dide mirovahiyê. Di têkoşîna dijî DAIŞ'ê de jî me dît ku ji Tirkiye heya Îngîltere, ji çar aliyên cîhanê ciwanan li derdora xwe kom dike. Berxwedaneke şoreşgerî û enternasyonalîst derxist holê. Ev rastiya ku ev qesî ciwan dikşîne Rojava û wan ciwanan ew qesî wêrek û fedakar dike, divê mirov rast fêm bike. Di vê derê de nêzikatiyên teng yên leşkerî û siyasî têrê nakin ku vê rewşê diyar bikin. Dijberî wê rastiya ku ji ev pêşketin çêkirin; felsefe, teorî û xeta bîrdozî-polîtîk ya Şoreşa Azadiya Rojava bû. Şoreşa Rojava îspat kir ku civaka azad û demokratîk dikare pêk were. Ev yek nîşanî her kesî/ê da.

Şoreşa Rojava ku bûye çavkaniya hêviya mirovahiyê, mirov dikare waneyên pir mezin jê derxîne. Ji bo vê yekê divê civaknas, siyasetmedar û stratejîstên leşkerî hewildanên mezin nîşan bidin; divê lêkolîn û lêhûrbûyinên mezin çêbikin. Lewma ev şoreş xwediyê taybetmendiyên ku rê nîşanî hemû bindestên cîhanê bide û ji bo azadiyê berê wan bide têkoşînê ye. Lê em dikarin bi kurtasî li ser du waneyên sereke bisekinin.

Waneya esasî ku em ji Şoreşa Rojava derxînin ev e ku şoreş li her cihî pêk tê û her civakeke ji xwe bawer, dikare şoreşê pêk bîne. Dev ji *"xilasbûyina serdema şoreşan"* berde, serdema şoreşan ya nû destpê kiriye. Di vê serdemê de şoreş wê rastir û berfirehtir pêk werin. Ya ku ev serdem daye destpêkirin jî Şoreşa Azadiya Rojava ye. Lewma di vê şoreşê de, civakeke ku heya niha navê wê jî tunebû û hesap nedikir ku wê bi serê xwe şoreşekê dar bixe û bigihêje serkeftinê pêş xistiye. Hejmara vê civakê jî ji çend milyon kes derbas nake û erdnigariyeke wan ya giştî jî li holê tune ye. Civakeke bi vî rengî, tevî hemû êrîşan wêrekiya pêkanîna şoreşeke di vê astê de nîşan dide. Ji ber vê yekê ger zanebûn û rêxistinbûna pêwîst hebe, her civakeke dikare şoreşê dar bixe û li her cihekî şoreş pêk tê.

Pê ve girêdayî waneya duyemîn jî ev e; divê mirov di vê derê de ji pirsa *"şoreşeke çawa"* re bibe bersiv. Di vê mijarê de rastiyeke din ku Şoreşa Rojava nîşan daye jî, îspat bû ku şoreş bi zor û rêbazên çort pêk nayen. Ji bo ku şoreş pêk werin û bi awayekî serkeftî berdewam bikin divê xwe bispêre du şertên esasî; ya yekemîn divê têra xwe amadekariyên rêxistinbûyinê û perwerdehiyê hebin. Ya duyemîn, divê xwe bigihîne konjektoreke guncav. Ger van herdu mijar, di kêliyeke de bibin yek û di kêliyeke wisa de şoreşgerên wê qadê vîna pêkanîna şoreşê nîşan bidin û berpirsyariyên wê bigrin ser xwe, ango weke şoreşgerên ku dîrokê dinivisînin tevbigerin, li wê derê mirov dikare gavên şoreşê biavêje û mirov dikare şoreşê bi serkeftinê tacîdar bike. Peywira şoreşgeran, da ku di konjektora guncav de bikaribe gavan biavêje, ji bo hêza pêwîst kom bike, meşandina xebateke dijwar a rêxistinbûyin û perwerdehiyê ye. Berê ji vê yekê re digotin, "*pêvajoya xebatên şoreşgerî."* Ji bo pengava şoreşgerî, teqez amadekarî pêwîst dike. Di nava amadekariyeke wisa de mirov dikare her tiştî bike. Di her welat û civakê de mirov dikare xebatên amedekariyê yên şoreşgerî bimeşîne. Di zemîna herî faşîzan de jî mirov dikare van xebatên amadekariyê bimeşîne. Ti hêz nikarin vê yekê asteng bikin. Li ser vê esasê şoreşger jî, ew kesê/a ku ji berê ve amadekariya rêxistinî û perwerdehiyê dike, di kêliya pengavê de van amadekariyan dikare rast binirxîne û di dema pêwîst de wêrekî û hêza avêtina wê gavê nîşan dide ye. Mîlîtanên şoreşger û serokatiyên şoreşger, tenê li ser vê esasê dikarin hebûna xwe bidomînin.

Pê ve girêdayî em dikarin li ser du waneyên din ku di şoreşên pêkhatî de derketine holê bisekinin. Ya yekemîn; rast e divê şoreş xwe bispêrin hêza xwe ya cewherî, lê divê em bîr nekin ku şoreş karên îtîfaqan e. Ti şoreşên ku xwe naspêrin hêza xwe ya cewherî nikarin serkeftinê bi dest bixin. Lê tenê bi hêza xwe ya cewherî jî nikare ser bikeve. Divê hevkarên xwe rast hilbijêre û di dema wê de têra xwe îtîfaqan pêş bixe. Divê yekîtiya hemû derdorên ku ji şoreşê sûd werdigrin pêş bixe û polîtîkayeke ku nêzikatiyên dij-şoreşê tengav bike bişopîne. Ev rastî, ji aliyê Şoreşa Azadiya Rojava ve jî careke din hate îspatkirin.

Li gel vê yekê girîng û pêwîst e ku pengavên şoreşgerî bi awayekî serkeftî werin avêtin. Lê ev jî tena serê xwe têrê nake. Li gel hemû şoreşên dîrokî, Şoreşa Rojava jî nîşanî me dide ku her pengaveke şoreşgerî, bi xwe re dij-şoreşê jî dixe nava tevgerê. Ango her şoreşek, bi pengavên dij-şoreşê ve rû bi rû dimîne. Di rewşên wisa de herî kêm qesî ku pengavên şoreşgerî bi awayekî serkeftî pêş dikevin, li hemberî pengavên dij-şoreşê divê mirov di nava parastin û berxwedaneke ku şoreşê diparêzê de be jî. Ango li hemberî her cureyên êrîşan, divê mirov her ji parastina şoreşê re amade be. Ger parastineke bi vî rengî tunebe; şoreş nikare xwe li ser piyan bigre, bijî û hebûna xwe bidomîne.

Waneya seyemîn, xwe sipartina civakê ya şoreşê ye. Divê şoreş, bi awayê Netewa Demokratîk perwerdekirin û rêxistinkirina civakê weke karê xwe yê ewilî bibîne. Ji vê yekê re înşaya Netewa De-

mokratîk jî tê gotin. Divê mirov şoreşê, tenê weke mijareke serwerî û deshilatdariyê, an jî çareserkirina pirsgireka rêveberiyê negire dest. Dijberî wê divê mirov şoreşê weke di mijarên aborî, siyasî, parastin û civakî de li ser esasê armancên şoreşgerî rêxistinkirin û perwerdekirina civakê bigre dest. Ger ev yek pêk naye, mayindebûyina şoreşê ne gengaz e.

Çawa ku di nava şoreşê de divê mirov civakê li gorî jiyaneke nû perwerde û rêxistin bike, dijî êrîşan divê mirov parastinê jî bispêre civaka ku hatiye perweredikirin û rêxistinkirin. Civaka şoreşger, gihandina asteke ku li ser esasê rastiya şerê gelê şoreşgerî hatiye perweredikirin û rêxistinkirin pir girîng e. Ne gengaz e ku şoreş bi tenê pêşengan were parastin. Jixwe havalekirin û ji hin hêzên din re hiştina parastina civakê ne mijara gotinê ye jî. Di rewşeke wisa de wê şoreş serxwebûn û azadiya xwe winda bike. Rewşeke bê parastin jî wê bihêle ku li hemberî êrîşan şoreş bipelçiqe. Ango riya yekane, civaka azad li ser hîmê parastina cewherî perwerdekirin û rêxistinkirin e. Çawa ku civak ji bo înşaya şoreşê tê seferberkirin, divê ji bo parastinê jî were seferberkirin. Divê înşaya civaka demokratîk, bi parastina şoreşê ve di nava hev de were destgirtin û meşandin.

Bi awayekî giştî diyarde û nêzikatiyên ku Şoreşa Rojava mayinde bikin jî, em dikarin wisa bi rêz bikin;

Yek, di xeta Konfedaralîzma Demokratîk de civakeke demokratîk a rêxistinkirî…

Du, civakeke parastina rewa ku hêza xwe ya cewherî derdixe holê û hêza gel dixe tevgerê…

Sê, Şoreşa Rojava bi şoreşa giştî Kurdistanê ve kirina yek…

Çar, Şoreşa Rojava xistina parçe û pêşengekî Şoreşa Demokratîk a Sûriyeyê…

Tenê pênasekirin û diyarkirina van mijaran jî têrê nake; divê bi rêbazên afirîner werin plankirin, rêxistinkirin û bi awayekî serkeftî di dema wê de werin jiyanîkirin. Ger şoreşgeriya Rojava ku bi zayina xwe derdora xwe ronî kiriye û hêviyeke mezin daye mirovahiyê, van peywirên xwe pêk bîne; dê hêza ronîkirina şoreşên sedsala 21'emîn û li ser ev xeta nû ya şoreşê ji meşa civakan re pêşengtîkirinê jî nîşan bide.

Weke me li jorê jî got, qareketereke girîng a vê şoreşê jî têkiliyên di navbera gelan de ne. Têkiliyên Kurd û Ereban heya Sûmer û Serdema Neolîtîkî diçin û xwe dispêrin rastiyeke dîrokî. Di tevahiya dîrokê de jî deshilatdaran xwestiye di navbera Kurd û Ereban de nakokî û pevçûnan pêş bixin. Lê civaka Kurd û Ereb her li hemberî vê derketine û têkiliyeke birane û hevpariyê jiyîne.

Ji milê dîroka nêzik ve jî; pergala Netewa Dewletê ku di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de ava bûye, li ser esasê serweriya Tirk û Farisan pêş ket. Vê pergalê Kurd û Erebên ku ji gelên qedîm yên herêmê ne parçe kirine û xistine asta civaka duyemîn û seyemîn. Li gel vê yekê gelê Kurd, xistine nava dorpêçeke pergala qirkirinê û xwestine ji holê rakin. Ev rewş Ereb û Kurdan dixe nava qedereke hevpar û nêzikî hev û din dike.

Ji ber vê yekê gelên Ereb û Kurd, di sedsala dawî de statokaperestiya netewe dewletan nas nekirine û bûne du civakên ku bi rê û rêbazên cuda li hemberî vê pergalê derdikevin. Rewşa ku ew herdu gel di nav de ne hev û din tesîr dike û qedera wan nêzikî hev e. Di nava berxwedaneke hevpar de ne. Di nava van berxwedanan de têkilî û îtîfaqên xwezayî pêş dikevin. Ji ber vê sedemê di têkoşîna guhertina stûkoperestiya ku di encama Şerê Cîhanê yê 1'emîn de derketiye holê de gelên ku rista şoreşgeriyê dîlizin Kurd û Ereb in.

Ji ber vê yekê xebatên ku di pêşengtiya Rêber Apo de li Rojavayê Kurdistanê û Sûriye pêş ketine, zanebûn û rêxistinbûna ku hatiye pêşxistin; da ku li ser esasê yekîtiya demokratîk ya Ereb û Kurdan Rojhilata Navîn a nû pêş bikeve bûye destpêkek. Li ser vê esasê dîyalektîkeke nû a têkiliyan pêş ketiye. Lê piştî ku Rêber Apo ji Sûriye derket, ev dîyalektîka têkiliyan di heman astê de nehatiye domandin.

Bi taybetî komploya navnetewî ku li ser Rêber Apo hatiye darxistin, di vê rewşê de diyarker e. Ji ber ku di dema komploya navnetewî ku li ser Kurdan hatiye meşandin de, pergala modernîteya kapîtalîst bi awayekî *"devletên Ereban"* jî kar anîne, vê yekê tesîra xwe li ser têkiliyên gelê Ereb û Kurd jî kiriye. Di van têkiliyan de hin lewazî û lêpirsîn çêbûne. Her wiha ji ber ku van salên dawî li cihên weke Şengal û Kobanê têkoşîna li hemberî DAIŞ'ê tê meşandin, bi awayekî têr û tijî ji gelê Ereb re nehatiye veguhestin, hin şaş fêmkirin çêdibin û di têkiliyên gelê Ereb û Kurd de hin lewazî çêdibin. Ev yek jî di lewazbûna têkiliyan de dibe diyardeyeke duyemîn. Êrîşên DAIŞ'ê li ser Rojava, Başûr û Şengalê çêbûn û gelê Kurd jî li hemberî van êrîşan berxwedaneke xurt nîşan da. Ji ber vê yekê cihê ku li

ser esasê şoreşgeriyê têkiliyên Kurd û Ereban pêş bikevin û bi hev re hîmê herêmeke nû biavêjin; têkilî lewaztir bûne. Dema mirov ji vî alî ve mezî dike, divê tiştên ku tên jiyankirin, weke komplo û provaqasyonekê werin nirxandin. Armanceke derdorên ku DAIŞ derxistine holê û wê xwedî dikin jî ev e; dixwezin ew têkiliya şoreşgerane ku divê bibe bingeha Rojhilata Navîn a nû asteng bikin. Gelê Kurd û Ereb bînin hemberî hev û hevpariya wan a dîrokî xirab bikin. Ji vî alî ve provaqasyoneke dij-şoreşê ye.

Berxwedana Kurdan ku li Şengal û Kobanê, li Rojava û Başûrê Kurdistanê darbeyên mezin ji faşîzma DAIŞ'ê dane, bi awayekî têrê bike ji gelê Ereb re nehatiye vegotin û armancên demokratîk û azadîxwez yên Tevgera Azadiya Kurdistanê ji gelê Ereb nehatiye nasandin. Ji ber vê yekê di nava civaka Ereb de ji milê hin nivîskar û rewşenbîrên Ereb ve jî berxwedan û Şoreşa Rojava bi awayekî rast nehatiye fêmkirin. Di têkilî, hewldan û xebatên Tevgera Azadiya Kurdistanê ku di van demên dawî pêş dikevin de jî, hin diyardeyên vê şaş fêmkirinê ku mirov pê diêşe tên dîtin. Ango ger ev xebat bi rehetî ser nakevin, rista vê şaş fêmkirinê heye. Divê her şoreşgerekî/ê Kurdistanê ku xwe berpirsyar dibîne, ji bo ku ev şaş fêmkirin ji holê rabe û li ser esasê têkoşîna hevpar a gelan têkilî pêş bikevin di nava hewldanan de be. Di serdemeke wisa de, ji xebatên herî şoreşgerane yek jî ev e.

Di vê serdemê de divê mirov têkiliyên gelê Ereb û Kurd bi awayekî sere sere û ji rêzê negire dest. Li dijberî pergala modernîteya kapîtalîst, diyardeya ku Şoreşa Rojhilata Navîn ku ji mirovahiyê re pêşengtiyê bike dar bixe ew têkilî ye. Bêguman di ev pêşketina demokratîk û şoreşgerane ya herêmê de wê rista gelên dîtir jî hebe. Mînak, tesîreke girîng a civaka Tirkiye û Îranê û civaka Îsraîlê wê çêbibe. Divê mirov rista van civakan bîr neke, yekalî û teng nêzik nebe. Lê rastiyeke bê nîqaş heye; têkiliyên gelê Ereb û Kurd, wê di asta pêşengtiyê de rista xwe bîlîzin û wê bibin hêza dînamîk a Şoreşa Rojhilata Navîn.

Divê hem siyasetmedar û rewşenbîrên Kurd, hem jî yên Ereb vê yekê bi awayekî teqez û zelal fêm bikin. Divê li gorî vê nêzikbûnê fikir û teoriyek pêş bikeve û civak li gorî vê werin perwerdekirin. Divê li ser vî hîmî siyaset şêwe bigre. Divê hem helwesta stratejîk a Şoreşa Azadiya Kurdistanê, hem jî helwesta demokratîk a civaka Ereb, li ser esasê hîmê azadî, wekhevî û biratiyê pêşxistina têkiliyên gelên Ereb û Kurd bin. Divê van têkiliyan bigihînin asta pêşengtiya Şoreşa Rojhilata Navîn. Ji milê civakê ve jî, divê stratejiyên şoreşgerî bi vî rengî bin.

Qûrama Modernîteya Demokratîk; li Rojhilata Navîn pêş xistina şaristaniyeke nû, projeya Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn pêş dibîne. Ev yek ji milê Tevgera Azadiya Kurdistanê ve di demên pêş de pêşketinên ku divê çêbibin jî diyar dike, bereya wê diyar dike. Serokatiya Konfederalîzma Demokratîk, ji gelek aliyan ve dîtina vê daniye holê, dahûrandina wê kiriye û têra xwe îzah kiriye. Divê siyaset û rewşenbiriya Kurd vê xetê bi awayekî rast pêk bîne. Di heman demê de ji bo ku vê zanebûn û nêzikbûnê ji bo rewşenbîrên Ereb veguhezin, divê di nava hewldanên mezin de bin. Lewma herî kêm qesî Kurdan, divê di nava civaka Ereb de jî, ev teorî û polîtîka pêş bikeve.

Di pêkanîna van peywir û karên stratejîk de risteke mezin a Şoreşa Rojava heye. Ji bo ku stratejiyeke rast, têkilî, îtîfaq û ronakbîriya ku tê xwestin pêş bikeve qada bingehîn erndîgariya Sûriyê ye, erdnîgariya Lûbnanê ye. Li gel ku bingehên vê yên bi erdnigariyê, dîrok û siyasetê ve girêdayî hene, di ev têkoşînên ku di dema nêzik de pêşketine de jî hîmekî teqûz yê vê rewşê hatiye ava kirin. Ji ber vê yekê, tiştên ku em qala wan dikin, ne tiştên nû ne jî. Bingeheke wê heye û di astekê de hatine pêşxistin. Tiştê ku divê niha were kirin; bi awayekî rast fêmkirin û ji dil pêjirandina vê rastiyê ye. Di nava pêşketinên rojanê de, ji bo ku ev xet ser bikeve pêşxistina xebatên polîtîk û şoreşgerane ye. Divê Şoreşa Rojava jî, demokrasiya civaka Ereb jî berê xwe bide vê yekê. Divê her du civak û tevgerên şoreşgerî yên van civakan, çareseriyê di vê derê de bigerin. Ne ku divê xwe bispêrin hêzên herêmî û gerdûnî û çareseriyê di piştgiriya wan de bibînin; divê bi hev re têkiliyan pêş bixin, li ser esasê îtîfaqa Şoreşa Ereb û Kurdan, Rojhilata Navîn a nû û demokratîk pêş bixin. Di vê pêvajoyê de tiştê ku divê esas were girtin ev e. Xeta rast û serkeftinê bîne ew e. Feraset û pratîka ku herdu civakan azad û demokratîk bike jî ev e. Dervayî vê kîjan nêzikatî pêş bikeve, dê koletî, tûndî û dijberbûnan ava bike. Sedsala ku me pişt xwe hiştiye, daneya herî berbiçav a vê yekê ye. Cihê ku em heman şaştiyan dubare bikin, divê em ji wan pratîkan waneyan derbixin û divê em pergalên ku gel yekîtiya xwe ya demokratîk çêbikin û azad bijîn pêş bixin.

Herî dawî divê em balê bikşînin ser ku divê têkiliyên gelê Ereb û Kurd, li ser esasê şoreşgerî û demokrasiyê pêş bikevin. Ti caran têkiliya di navbera van her du gelan de, divê ne li ser esasê deshilatdarî û dewletperestiyê be. Çawa ku ew têkilî wê ne li ser esasê berjewendiyan be, divê ne dijberî gelên dîtir be jî. Divê hebûna azad û demokratîk a ti gelan dijmin nebîne. Dijberî wê yekbûna demokratîk a Kurd û Ereban, divê hemû gelên Rojhilata Navîn weke malbatekê hembêz bike û wan jî tevlî vê yekîtiyê bike. Teqez divê nijadperestî û berjewendîperestiyê red bike û biratî û yekîtiya demokratîk esas bigre. Em bawer dikin ku ger têkiliyên Kurd û Ereban ku Rojhilata Navîn a nû ava bikin, li ser vê esasê pêş bikevin dê rast û serkeftî bibin.

Bi taybetî di Şoreşa Rojava de divê mirov li ser pêşengtiya jinê bisekine. Jinê tenê şoreş û berxwedana li dijî DAIŞ'ê pir-rengî nekiriye, di heman demê de ji her alî ve pêşengtî kiriye. Şoreşa Rojava, şoreşeke demokrasî û azadiya civakî ku li ser esasê azadiya jinê pêş dikeve ye. Bi pênaseyeke şênbertir mirov dikare bibêje weke şoreşeke azadiya jinê pêş ketiye. Hem ji milê felsefî ve, hem jî ji milê pratîkê ve wisa ye. Ji milê felsefî ve xwe dispêre paradîgmaya civaka demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê ya Serokatî. Ji ber ku qûrama Modernîteya Demokratîk ku Serokatî pêş xistiye esas tê girtin, çareseriya hemû pirsgirekan û bingeha hemû azadiyan, di azadiya jinê de tê dîtin. Ji ber ku ev şoreş xwe dispêre felsefe, teorî, bîrdozî û polîtîkayeke bi vî rengî, çareseriya hemû pirsgirekan di azadiya jinê de tê dîtin û azadiya jinê dibe bingeha hemû azadiyan. Lewma rengê jinê di nava vê şoreşê de pir diyarker e û pêşengtiya jinê di asteke pir mezin de ye.

Her wiha civaka Kurd, civakeke ku Şoreşa Neolîtîkê pêş xistiye û jiyan kiriye. Şoreşa Neolîtîkê, şoreşeke jinê ye. Nexwasim di civaka Kurd de jî, rist û asta jinê pir cuda ye. Tevlêbûna wê ya jiyana civakî pir bi hêz e. Rûxmî ku pergala malbatê ku hêzên dagirker û fetihkar, hêzên deshilatdar-dewletperest pêş xistine, xwestibe ev statûya jina Kurd ji holê rake û jinê bixe bin koletiyeke çort jî; ji ber taybetmendiyên kûr yên civaka Kurd, jin ji destpêkê ve di asta pêşengtiyê de tevlî têkoşîna Tevgera Azadiyê bûye.

Tevî ku li Rojhilata Navîn mînakên wê tune ne û li cîhanê jî pir kêm mînakên wê hene; jin tevlî berxwedana Tevgera Azadiyê ku di pêşengtiya Rêber Apo de pêş dikeve bûye, bi demê re fermandarî û arteşbûna jinê pêş xistiye. YPJ jî, encameke ku ev gerîlatiya jinê derxistiye holê ye. Vê yekê jî hiştiye ku di Şoreşa Rojava de jin, bi awayekî şênber pergala xwe ava bike, xwe vegerîne çalakî û rêxistinê û bi rista pêşengtiyê bibe hêzeke mezin û encamgir. Her wiha ne tenê YPJ, Yekîtiya Star û rêxistinbûyinên din yên jinê jî di heman astê de tevlî şoreşê dibin. Hemû jinên Kurd, ji aliyê xwe ve di astekê de tevlî Şoreşa Rojava bûne. Ji milê zanebûn û çandî ve guhertin û veguhertineke girîng, şoreşgerbûyin û azadbûyinek jiyîne. YPJ pêşengtiya mîlîtan û fedaî ya van pêşketinan e. Hem li dijî pergala dagirker û qirker di parastina civaka Kurd de, hem li dijî faşîzma DAIŞ'ê di parastina şoreş, gelên Rojhilata Navîn û mirovahiyê de; hem jî li dijî serweriya mêr di parastina azadiya jinê de bi felsefe, teorî, rêxistin, çalakî û pratîka xwe, xwe îspat kirine.

Ji ber vê yekê YPJ bûye remzeke sereke. Civakên Ewropa jî, li dijî gef û zextên DAIŞ'ê, ji hebûna YPJ'ê hêz û moral digirin. Şervanên YPJ'ê vexwandin gelek cihên Ewropayê û weke çavkaniyeke hêviyê nîşanî gelên Ewropa dan. Şerkeriya YPJ'ê heya Qesra Elize çû. Civaka Fransî ku ji şoreşa Ewropa re pêşengtî kiriye, li hemberî faşîzma DAIŞ'ê moral û baweriyê ji YPJ'ê digre. Bi kurtasî azadî û berxwedana jinê, di Şoreşa Rojava û Şoreşa Azadiya Kurdistanê de teqeziya serkeftinê ye. Her wiha Tevgera Azadiya Jinê, di demên pêş de dê ev rista xwe zêdetir bîlîze.

Heya niha li Kurdistanê berxwedana li dijî qirkirinê, li ser esasê şehadeta deh-hezaran mîlîtanên şoreşger û fedaiyan pêş ket. Bênîqaş e ku weke parçeyekî vê berxwedanê Şoreşa Azadiya Rojava jî, li ser esasê lehengtiyên mezin, berdelên giran; bi rih, zanebûn, wêrekî û fedakariya şehîdên leheng heya vê astê hatiye. Di dîroka wê de Îsmaîl, Dîjle, Ehmedê Ereb heye; Şîlan Kobanê û hevalên wê hene; fermandarê mezin ê gelê Rojava Xebat Derîk heye. Bi hezaran egîdên gelê Kurd, keç û xortên wan, di pêşxistin û parastina Şoreşa Azadiyê de bi lehengtî ber xwe dan û şehît ketin. Li gel zarokên Rojava, ji parçeyên din yên Kurdistanê û ji dervayî welat jî gelek ciwan di nava vê lehengtiyê de cih digrin. Li gel vê yekê rastiyeke berxwedana şoreşê ku ji çar aliyên Cîhanê û di destpêkê de Tirkiye, li gelek welatên Rojhilata Navîn ji gelên Ereb, Faris û Tirkmen ciwan tevlê bûne û bi lehengî şehîd ketine heye.

Şehîdên Şoreşa Rojava, qesî ku zarokên gelê Rojava ne di heman demê de zarokên hemû Kurdistan, Rojhilata Navîn û gelên Cîhanê ne. Mirovahî di rastiya şehîdên berxwedana Şoreşa Rojava de derketiye holê. Di pratîkê de jî 1'ê Mijdarê Roja Cîhanî ya Kobanê ev yek îspat kir. Li dijî faşîzma DAIŞ'ê berxwedana Kobanê, li penc parzemînan hemû mirovahiya azad rakir ser piyan û ev li dijî faşîzmê xistin nava berxwedana hevpar. Tiştê ku nunertiya vê dike, jê re pêşengtiyê dike û hebûna vê rastiyê derdixe holê jî bêguman û nîqaş rastiya şehîdan e. Şehîdên Berxwedana Rojava, îspat kir ku êrîşkariya faşîzan çiqasa hov dibe bila bibe, mirov dikare li hemberî wê ber xwe bide û serkeftinê bi dest bixe. Di vê mijarê de Berxwedaniya Kobanê, bi tîpên zerîn navê xwe li dîroka berxwedan û serkeftinê ya gelan nivîsand. Heya ku ev dûne bizivire û mirovahî hebe, dê Berxwedana Azadiya Kobanê li ser vî hîmî her were bîranîn.

Ji vî alî ve Şehîdên Berxwedan û Şoreşa Rojava, stêrkên serkeftinê ne. Şehîdên Berxwedana Rojava, bi awayekî şênber nîşan da ku pêşeroj û berjewendiyên gelan yek û hevpar in. Nîşan dan ku ziman, ol, renk û zayenda wan çi dibe bila bibe mirovî yek e; mirovahî li ser esasê feraset û armancên hevpar dikare jiyan û şer bike. Di sirûdên şoreşgerî de jî dibêjin, "*em cudahiya ziman û ol nas nakin, weke ku em ji heman dayikê velidîne ye."* Ya ku di pratîkê de bi awayekî vekirî ev dirûşme îspat kir, berxwedêrên Kobanê bûn; berxwedêrên Hol û Hesekê bûn; berxwedêrên Minbiçê bûn. Îro berxwedêrên Raqa û Bab'ê li ser esasê vê rastiyê şer dikin. Weke ku zarokên heman dayikê bin, tevî ku zimanê hev û din fêm nakin, ol û rengê wan cuda ye; li ser esasê armanceke hevpar; li ser esasê rêgeza hevparî, azadî û wekheviya ku xwe dispêre pir-rengiyan tên gel hev, mil bi mil şer dikin û bi hev re şehîd dikevin. Xwîna wan tevlî hev dibe. Çawa ku li dijî faşîzma Hîtler, mirovahî bû yek û yên ku di wê derê de şehîd ketin, ji têkoşîna mirovahî û azadiyê re mîrasek hiştin; Şehîdên Şoreşa Rojava jî, ji dîroka bi hev re jiyîn û berxwedanê ya mirovahiyê re mîraseke wisa mezin hiştin. Ev, deskeftiya herî mezin ya mirovahiyê ku di roja me de derketiye holê ye. Bi vî rengî yekîtiya gelan jî bi awayekî xurt pêş ket. Pira Şoreşa Rojava ava kiriye, ev qesa teqûz e ku hemû gel, bindest, jin, ciwan, kedkarên cîhanê bi baweriyeke mezin dikarin ji vê pirê re derbas bibin. Bangawaziya Şoreşa Rojava ji bo gel û bindestên cîhanê jî ev e; em bawer dikin ku dê ji vê bangawaziyê re bersiveke xurt were dayin û biratiya ku li ser esasê azadiyê li Rojava pêş ketiye, wê li hemû cîhanê belav bibe.

Ji ber van sedeman, dema ku ji bo pirtûkên di destê we de ji min nivîseke destpêkê hate xwestin, min jî ev yek weke peywireke şoreşgertiyê girt dest û qebûl kir. Ev pirtûk xwediyê wate û girîngiyeke mezin in; armanç dike ku kêm be jî hin serdemên Şoreşê û lehengtiyên berxwedanê, rihê Şoreş û berxwedanê ragihîne xwendevanan. Bêguman divê li ser rastiya berxwedan û şoreşeke ev qesa mezin, gelek tişt werin nivîsandin, gotin û pêkanîn. Bi taybetî divê wêje û çand, di hemû beş û rehendên wê de, ev berzbûyina mirov ragihîne û ji bo ku nifşên nû vê rastiyê ji dil bipêjirînin berheman biafrîne. Ger dê wêje û çandek hebe û ji bo gel û civakan xwediyê girîngiyeke be; divê rastiya berxwedanên weke Kobanê û Şengalê ku li dijî faşîzma DAIŞ'ê, êniya faşîst a AKP-MHP'ê ku berdewamên faşîzma Hîtler, Musolînî û Sadam in, pêş ketine vêbibêjin. Cihê ku rastiya mirovahiya azad, rastiya jin û mêrê azad derketiye holê, ev berxwedan in. Leheng û şehîdên ev berxwedana mezin, bûn mînak û pêşengên mirovahiyeke bi vî rengî. Hûner, jiyana wan e. Wêje; rastî, hest, psîkolojî û rihê mirovahiyê ku di vir de derdikeve holê ye. Lewma divê hemû civak, bi ev rih, zanebûn û baweriya mezin werin perwerdekirin; divê şêwegirtina civakê li ser esasê van nirxên mezin çêbibe. Ji ber vê yekê ev lehengiyên mezin ku kêlî bi kêlî hatine jiyîn, divê em bi riya hûner, wêje û civaknasiyê vegotin bikin û ragihînin gelên ku çar aliyên cîhanê dijîn. Dev ji peywira şoreşgertiyê jî berde, ev peywira sereke ya mirovbûyinê ye. Peywira sereke ya kesên ku îro ji xwe re dibêjin, "*ez mirov im, ez şoreşger im, ez azadîxwez im"* ev e; ev berzbûyin fêmkirin, ji dil pêjirandin, bi awayekî piralî anîna ziman û îfadekirin û ragihandina gelên dîtir, rastiya civak û mirovê nû li ser esasê van nirxan ava kirin e.

Divê ji bo berxwedana Şengal û Kobanê pir tişt werin nivîsandin. Ji bo qewimînên li Cizîrê, Heleb, Efrîn, Mexmûr û Kerkûkê pir tişt werin nivîsandin. Lehengtiyên li van cihan çêbûne, rastiya berzbûyina mirovahiyê divê ji her milî ve werin ziman û bibin mijara wêje û hûnerê. Divê em van ragihînin hemû civaka Kurdistan, Rojhilata Navîn û mirovahiyê. Weke ku kesên di naveroka pirtûkê de vegotin kirine jî anîye ziman, ji bo vê yekê çiqasa hewldan were dayin jî têrê nake, çiqasa xebat werin meşandin jî dê kêm bimînin. Divê zêdetir helbest û roman werin nivîsandin, divê zêdetir stran werin ziman. Da ku ev

nirxên mezin yên mirovahiyê werin vegotin û ev berxwedana mezin bibe malê mirovahiyê. Da ku lehengtî nayen bîrkirin, dijberî wê bibin cewhereke mirovahiyê ku her jiyan dikin.

Pirtûkên di destê we de bi zanebûna van peywir û berpirsyariyan hatine amadekirin. Kêm be jî di astekê de pêkanîna van peywiran e. Armanc dike ku hin rastiyên Berxwedana Rojava vegotin bike û ragihîne civaka Kurd û mirovahiyê. Armanç dike ku van nirxên mezin bide jiyîn; li ser esasê vê rastiyê jin, ciwan û civakan perwerde bike. Ji hevpeyvînên ku ji kesên ev rastî jiyîne re hatine kirin, pêk tê. Ango ji rastiyên ku hatine jiyîn pêk tê. Lê her çiqasa kesên ku di nava vê berxwedanê de mane ev vegotin kiribin jî; bi awayekî rast û giştî vegotin kirina rastiya şoreşê, ev lehengtî bi layiqî anîna ziman, rihê fedaî yê Arînan û rihê Diyaran ku dibêje "*bisekine! Kobanê radest nabe, faşîzm nikare bikeve kolanên Kobanê"* diyarkirin, ne tiştekî hêsan e. Divê mirov van pirtûkan li ser vê esasê bixwîne. Weke pirtûkên ku berxwedaneke pir mezin dinivisînin, bêguman kêmasiyên wan hene; lê tiştê ku dixwazin bikin rast e, armanca wan mezin e.

Tiştên ku ev pirtûk dinivisînin, nirxên sereke yên mirovahiyê ne. Ji vî alî ve jî diyare ku bi ked û hewildaneke mezin hatine amadekirin. Em bawer dikin ku dê hemû xwendevan li ser esasê van rastiyan nêzik bibin; bi xwendina van pirtûkan hewl bidin ku rastiya Berxwedan û Şoreşa Rojava hinekî din ji nêz ve fêr bibin, fêm bikin û ji dil bipêjirînin. Ger ev pirtûk li ser xwendevanan tesîreke bi vî rengî çêbikin; berzbûyina mirovahiyê ku di Berxwedan û Şoreşa Rojava de derketiye holê; ev rih, hest, fikir û nêzikbûnên lehengtiyê kêm be jî ji xwendevan re werin vegotin dê rista xwe bilîze.

Li ser vê esasê ji xwendevanan re serkeftinê dixwazim. Ez ji wan dixwazim ku ji van pirtûkên ku Şoreşa Rojava vegotin dikin, bi bawerî bixwînin, li ser vê esasê xwendin û lêkolînên xwe berdewam bikin. Ger wisa bibe em bawer dikin ku dê gelek tiştan jê fêr bibin û dê li ser riya heqîqetê gaveke din pêş ve biavêjin.

**Diyar HEBÛN**

## KRONOLOJÎ

- 15 Adar 2011: Destpêka bûyerên Sûriye
- 21 Mijdar 2011 Televîzyona Ronahî dest bi weşanê kir
- 12 Tîrmeh 2012: Avakirina Desteya Bilind a Kurd
- 19 Tirmeh 2012: Rizgarkirina Kobanê ji rejîma Sûriye, destpêka şoreşê, îlana YPG
- 21 Tîrmeh 2012: Rizgarkirina Efrîn, Dêrik
- 23 Tîrmeh 2012: Rizgarkirina Dirbêsiyê
- 24 Tirmeh 2012: Rizgarkirina Amûdê
- 8 Mijdar – 17 Kanûn 2012: Qonaxa yekemîn a şerê Serêkaniyê
- 9 Kanûn 2012: Til Temir ji rejîmê hate paqij kirin
- 1 Çile 2013: I. Konferansa YPG
- 16 Çile – 19 Sibat 2013: Êrîşa çeteyan û qonaxa duyemîn a şerê Serêkaniyê
- 17 Çile 2013: Rizgarkirina Girzîro
- 7 Sibat 2013: Êrîşa rejima Suriyê li ser hêzên YPG li Eşrefiyê – Heleb
- 14 Sibat 2013: Li Tiltemir êrîşa Cebhet el Nusra
- 1 Adar 2013: Ajansa Nûçeyan a Hawar (ANHA) dest bi weşanê kir.
- 2 Adar 2013: Rizgarkirina Çilaxa
- 3 Adar 2013: Rizgarkirina Tirbespiyê
- 26 Adar 2013: Li Rimêlan konferansa Netewî a Ciwanên Kurd hate lidarxistin
- 29 Adar 2013: Êrîşa mezin a rejîma Sûriye li taxa Şêx Meqsûd li Heleb
- 4 Nîsan 2013: I. Konferansa YPJ
- 9 Nîsan 2013: Li Hesekê provaqasyonên dewleta Sûriye
- Gulan 2013: Li Til temir êrîşên Cebhet el Nusra
- 23 Gulan 2013: Êrîşa Cebhet el Nusra li ser gundewarên Efrînê
- 27 Heziran 2013: Li Amûdê di provaqasyon û êrîşa çeteyan de, şervanê YPG Sebrî Gulo şehîd ket û gelek welatî birîndar bûn. Hejmarek çete hate kuştin.
- 16 Tîrmeh 2013: Êrîşa Cebhet el Nusra li Serêkaniyê, qonaxa sêyemîn
- 19 Tîrmeh 2013: Êrîşên Cebhet el Nusra li ser Kobanê
- 14 Îlon 2013: Êrîşa giran a çeteyan li ser gundên Alok û Cafa (Serêkaniyê).
- 15 İlon 2013: Li Qamişlo di dibistanan de yekemîn car perwerdeya Kurdî destpê kir.
- 26 Cotmeh 2013: Rizgarkirina Tilkoçer ji çeteyên Cebhet El Nusra
- 5 Mijdar 2013: Serêkaniyê, Til Xelef û Menacîr ji çeteyan hatin rizgar kirin
- 14 Mijdar 2013: Operasyonên YPG li ser gundewarên Tirbespiyê
- 25-30 Mijdar 2013: YPG-YPJ navbera Hesekê û Til Temir ji çeteyan paqij kir
- 31 Kanûn 2013: Yekemîn pêngava Til Hemîs
- 4 Çile 2014: Li Cerablus şerê Artêşa Azad û DAIŞ
- 21 Çile 2014: Avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Kantona Cizîrê
- 27 Çile 2014: Avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Kantona Kobanê
- 29 Çile 2014: Avakirina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Kantona Efrînê
- 25 Gulana 2014: Pêngava gundên Rawya û Dehma (Ji bo vekirina xeta Serêkaniyê û Kobanê)
- 13 Tîrmeh 2014: Êrîşa çeteyên DAIŞ li ser Cezaa
- 15 Îlon 2014: Êrîşa çeteyên DAIŞ li ser Kobanê
- 1 Çile 2015: Rizgarkirina Girê Miştenûr
- 26 Çile 2015: Rizgarkirina navenda bajarê Kobanê ji çeteyên DAIŞ
- 2 Sibat 2015: Duyemîn Pêngav û Rizgarkirina Til Hemîs û Til Berak
- Gulan 2015: Rizgarkirina Çiyayê Kizwana
- 15 Hezîran 2015: Rizgarkirina Girêspî
- 27 Tîrmeh 2015: Rizgarkirina Sirînê
- 1 Tebax 2015: Rizgarkirina Hesekê û derdora wê ji DAIŞ

- 13 Mijdar 2015 Rizgarkirina Holê

**BEŞA YEKEMÎN**
**JI MILÊ DÎROKÎ VE SÛRÎYE Û ROJAVAYÊ KURDISTANÊ**

*Demokrasî û înşaya Netewa Demokratîk…*

*Çûyina ewil a Rojavayê Kurdistanê, piştî ketina rekeke dijwar û derbaskirina hin astengiyan pêk hat. Qesî ku me ji derva, ji ragihandinê bihîstiye di derheqê Şoreşê de agahiyên me hene. Li Kurdistanê kesekî-ê ku biyaniyê şer e tune ye. Ji ber vê tiştên ku şer derxistine holê, em texmîn dikin, lê tiştê ku herî zêde em meraq dikin; pergala ku li wê derê pêş dikeve ye.*

*Di destê me de cîhazên deng qeyd dikin, qamera û wênekêşên me hene. Hinekên me dixwazin belgefîlma Şoreşê çêbikin, hinek dixwazin bi wêneyan nîşeyeke ji dîrokê re bihêlin, hinekên me jî li pêy çîrokên şoreşê ketine.*

*Piştî hemû çîrokên rê, em di dawiya dawî de digihêjin Rojava. Di rêkê de serê 10 km careke em tên sekinandin, tiştê ewil ku li ber çavê me dikeve ji aliyê ewlehiyê ve tevdîrên cîdî hatine stendin. Li her cihekî ku em tên sekinandin, "bi lêborîn" xwestinê, pirs li me tê kirin ka em çima li wê derê ne. Dema dibîhîzin ku em rojnameger in, gazincên xwe li me dikin û ji 7 salî, heya 70 salî her kesek şîreta "tiştên rast ku hûn dibînin binivîsînin" li me dike.*

*Binxetê, Serxetê…*

*Ji bo me Serxetê tê zanîn, lê Binxetê heya ev dema ku em derbas bûn parçayê welatekî bû. Her çiqasî heya wê demê jî, me gelek hewildanên şopandin û fêmkirina geşedanên li wê derê nîşan dabin jî, piştî ku em çûn wir, me dît ku di fêmkirinê de ka em çiqasî kêm mane. Li her cihekî Rojava ku em çûnê, weke cejnê lê hatiye û lezgîniya roja arîfeyan heye, her kesek dixwaze bi lezgînî xwe bigihîne cihekî dîtir. Kurdên Sûriye weke Apê Mûsa jî dibêje, "ji sifirê destpê nekirin, di rewşeke bin sifirê de bûn." Ji rewşeke wisa xwe gihandin asta Şoreşa îro. Bi taybetî di çend salên dawî de potansiyeleke mezin a demokrasî û azadiyê derketibû holê ku ne gengaz e mirov li hemberî wê şaşwaz nebe.*

*Mijareke sereke ku divê mirov di destpêkê de balê bikşîne ser jî, deriyên sînor yên Rojava ne. Ev deriyên ku li welatên din gelek wateyên wan hene, li Rojava tenê Ambargoyê îfade dikin! Weke dewletên dagirker rêveberiya PDK'ê jî demeke dirêj bi hinceta "ewlehiyê" deriyên li gel Rojava venekirin. Ji ber bertekên gel û raya giştî demeke kurt hatibin vekirin jî, dubare hatin girtin. Jixwe li sînorê Bakurê Kurdistanê, dev ji cihên bi mayin, têlên heyî û xendekan berde niha jî weke ya Gazze blokên betonê ku di dirêjiya 6 metroyan de ne hatine danîn.*

*Ji ber konevaniyên dijî Şoreşa Rojava yên PDK'ê, bi dehan rojnamegerên bi nav û deng yên cîhanê ku dixwestin biçin û hawayê şoreşê bikşînin hûndirê xwe jî hatin astengkirin. Gelek rojnameger û şandeyên navnetewî ku dixwestin derbasî Rojava bibin, cardin bi hinceta "ewlehiyê" hatin astengkirin. Ji ber vê yekê çend caran wan jî, weke me rêkên "ne fermî" ceribandin.*

*Ji belavbûyin û rêxistinbûna ev pergala azadîxwaz tê tirsîn!*

*Dema ku em armanca vê dorpêçê dipirsin, gelek kes "modela azadîxwaz û rêka seyemîn ku Kurdên li Sûriyê û gelên Rojavayê Kurdistanê hilbijartine" destnîşan dikin. Ev konevanî, li dervayî komikên ku di bin venerîna hêzên navnetewî de tevdigerin û xeta nijadperest-deshilatpereset a rejîma Esad, rêkeke din dişopîne. Li dijî herdu nêzikbûnan, ji bo gelan alternetîfeke din pêş dibîne. Ev alternatîfa ku xwe dispêre Paradîgmaya Civaka Demokratîk a birêz Ocalan, bi Şoreşa Rojava îspat dike ku*

*mirov bi aşitî û azadiyê dikare ji nava Şerê Cîhanê yê Seyemîn ku li Rojhilata Navîn berdewam dike derkeve.*

*Ev çareseriya ku pêşniyar dike jî, ji bo parçeyên din yên Kurdistanê û Rojhilata Navîn, hêvî û dibêtiyeke rêxistinbûnê di nava xwe de dihewîne. Bi awayekî xwezayî ev "xeterî" jî hem dewletên statûkoperest yên herêmê, hem jî deshilatdarên kûrevî ditirsîne. Mirov dikare bibêjê ku sedemeke bingehîn a ambargoyê û girtina sînoran jî ji ber vê tirsê ye.*

*Biryaran meclîsa gel dide!*

*Ji Cizîrê heya Heseke, Heleb, Kobanê, Şehba û Efrînê… li her cihekî xebata yekser, xebatên meclîsên gel in. Li her cihekî malên gel, saziyên ciwan, jin, ziman, çand û hûnerê; meclîsên gel, rêxistinbûnên perwerdehiyê û pîşeyî, dadgeh û asayîş tên avakirin. Ewlehiya dervayî YPG-YPJ, ewlehiya bajaran jî hêzên asayîşê ku di bin navê polîs, zabita û trafîqê de xwe beş bi beş rêxistin kirine digrin.*

*Ji bo ku şênber bibe, em dixwazin bûyereke ku me jiyan kiriye bi we re parve bikin; em rojeke ji Dêrîkê diçin Qamişlo. Em li ser rêka gundekî dibînin ku hin gundî li derdora kepçyeke dixebite kom bûne. Em jî dixwazin biçin gel wan. Lê beriya ku em bikevin rêka gund, em dibînin ku cihê kontrolê yê YPG'ê heye. Em dixwazin destûrê wan bigirin û wisa bikevin rêka gund. Em ji fermandarê YPG'ê ku li wê derêyê re dibêjin, "em dixwazin li vî gundî hin hevpeyvînan çêbikin û dîmenan bikşînin." Fermandar ji me re dibêje, "me alaqadar nake, biçin û ji meclîsa gel a gund destûr bistînin!" Ev bersiv bêyî ku em pir gûftogo bikin, ji bo asta demokratîkbûyinê ya şoreşê jî hin daneyan destnîşan dike. Weke ku em herdu jî heman tiştî difikirin, em bêdeng dibin û serê xwe ji hev re dihejînin. Pişt re em diçin gund, navê gund Gir Ziyereta Çolê ye. Em fêm dikin ku kepçe jî ya meclîsa gel e û her karekî wî gundî û gundên derdorê ew kepçe dike.*

*Hemû gel û bawerî di bin parastina demokrasiyê de ne!*

*Mijareke ku divê mirov balê bikşîne ser jî; rejîma Sûriye, ne tenê li ser Kurdan, li ser hemû bawerî û gelên Sûriye, konevaniyên tûnd ferz kirine. Ev konevaniya bişavtinê û bedengkirinê, heya serdema şoreşê jî berdewam dike. Mesela gelê Ermenî ku li Bakurê Sûriye jiyan dike, piranî ji kesên ku ji qirkirina Osmanî-Tirkiye rizgar bûne pêk tê. Ji Komkûjiya 1915'an ku li Tirkiye çêbûye xwe rizgar kirine û pişt re derbasî Sûriye bûne. Hinekên wan jî di dema Komkûjiyê de xwe sipartine herêmên Bakurê Kurdistanê, lê piştî tepisandina serhildana Şêx Seîd, car din neçar mane ku xaka Tirkiye biterkînin. Piraniya wan Keldanî, Sûryanî û Ermeniyên ku ji bajarên weke Amed, Elih, Mêrdîn, Cîzre û Şirnexê koçber bûne ne. An jî Asûriyên ku piştî 1933'yan ji Başûrê Kurdistanê reviyane û li derdora Rûbarê Xabûrê bi cih bûne pêk tên.*

*Ji êrîşên ser şoreşê ku li Rojava destpêkirine û li hemû Bakurê Sûriyeyê belav bûne, ev gel hemû tesîr dibin. Çeteyên faşîzan, bi taybetî gelên nemisilman dixin navnîşana êrîşên xwe. Mesela dema ku em li Serêkaniyê digeriyan, me dît ku mal û dêrên ku aîdî Ermenî, Çeçen û Sûryanan e hatine talankirin. Ev gel hemû neçar mabûn ku koçber bibin. Lê tiştê ku herî zêde em tesîr kirin, hovîtiyên ku çeteyan li taxên Xiristiyanan anîbûn serê dêran bû. YPG'ê bi berxwedaneke mezin ev tax jî rizgar kiribû, dêr paqij dikirin û careke dîtir radestî xwediyên wan dikirin.*

*Li dijî faşîzmê Netewa Demokratîk*

*Li Rojava, peyva ku em herî zêde dibihîzin û dixwazin fêm bikin jî Netewa Demokratîk e. Me li gel endama Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê Remziye Mihemed û hê gelek kesên dîtir ev mijar nîqaş kir. Mihemed tîne ziman ku gelê Kurd dixwaze li gel hemû bawerî û gelên ku li wê erdnigariyê dijîn, jiyan û tevgerîneke hevpar pêş bixin. Ji zimanê ku dijberiyê ava dike, ji holê hatiye rakirin. Nûnerên partî û tevgerên ku ji hemû gelan pêk tên jî diyar dikin ku li dijî êrîşan ji bo yekîtiyê lez dane xebatên xwe. Diyar dikin ku antîpropagandaya "Kurd dixwazin serwer bibin û gelên dîtir nedîtî ve werin" ji holê rabûye. Naveroka Netewa Demokratîk jî, li gel rehendên din yên înşayê ku di nava pirtûkê de bi berfirehî cih digre, ev têkilya gelan dadigire.*

*Qesî ku ji destê me hat, li gel hevpeyvînan me di hemû beşên xebatê de hewil da ku çavdariyên xwe yên bi vî rengî bi we re parve bikin, lê dubare em diyar dikin ku dema me biryar da em vê xebatê bimeşînin, me rêgeza "wê şoreşger û şehîd vegotina şoreşê bikin" esas girt. Em dizanin hûn jî bi me-*

*raqeke mezin li bendê wê ne… Niha em dest bi hevpeyvînên ku me bi kesên ku di cihên girîng yên şoreşê de cih girtine re çêkirine dikin. Me, ev hevpeyvîn di dem û cihên cuda de çêkirin. Dibe ku ji ber şer di hin hevpeyvînên me de qutbûyin hebin, lê dema ku bi awayekî giştî mezîkirin çêbibe, hemû mijar û geşedanên girîng yên şoreşê di vê xebatê de cih digrin û hevdû temam dikin.*

## 1-Hevsengî, Nakokî û Pevçûnên Li Rojhilata Navîn, Sûriye û Rojavayê Kurdistanê

*Em dixwazin di destpêkê de li ser dîroka Sûriye û Rojavayê Kurdistanê, hevpeyvîneke berfireh çêbikin. Lewma em jî baş dizanin ku heya piştperdeya wê naye zanîn, mirov ne şoreşê, ne jî pêşketinên ku îro di nava şoreşê de pêş dikevin dikare binivisîne. Em li Qantona Cizîrê, sazî bi sazî digerin da ku em kesekî/ê bi awayekî têr û tijî bersiva pirsên me bide bibînin. Lê her kesê/a ku em pê re diaxifin, dema mijara me ya hevpeyvînê dibihîze sar nêzik dibe. Zêdetir dixwazin lehengî û pêşketinên ku di nava şoreşê de hatine jiyîn vebibêjin. Bêguman dê xebata me, li ser wê bingehe be. Jixwe bêyî ku ew lehengî û fedakarî werin nivîsandin, ti wateya ev xebata me tune ye. Lê ji wê re hê jî dem heye…*

*Ji bo bersiva van pirsan her kesê ku mabesta me fêm dike, kesekî ku hem ji aliyê siyasî ve, hem jî ji aliyê leşkerî ve li ser mijarê heyder e ji bo me pêşniyar dikin; Adil Qamişlo… Piştî ku em navê wî ji çend kesan dibihîzin, em li pêy şopa wî dikevin. Di dawiya dawî de, em wî di civîneke gel de dibînin. Di navberê de em mabesta xwe pê re dibêjin û hinekî zehmet be jî, ji bo hevpeyvînê wî qaneh dikin. Lê heya ku civîn xilas bibe, em li benda wî disekinin. Di wê navberê de em têra xwe wêneyên kesên ji gel ku tevlî civînê bûne dikşînin.*

*Piştî ku civîn xilas dibe, Adil Qamişlo me dibe maleke. Odeyeke biçûk ji me re tê veqetîn, di dîwarê odeyê de ala TEV-DEM û YPJ'ê û flamaya Ocalan hatiye daliqandin. Adil Qamişlo'yê ku di rê de her henek li me dikirin jî, di vê odeyê de şeweyeke fermî digre û di wateya 'ez amade me' de bêdeng dibe. Em jî vê yekê weke fersend dibînin û hema dest bi hevpeyvîna xwe dikin…*

***-Weke kes we di nava Şoreşa Rojava de cihê xwe girt, her wiha hûn pêşketinên dîrokî û siyasî yên Rojavayê Kurdistanê û Sûriye bi nêz ve dişopînin. Ji milê dîrokî ve li Rojavayê Kurdistanê kevneşopiyeke siyasî ya bi çi rengî heye, li Sûriye kevneşopiyeke dewletê ya çawa heye û nêzikatiya li hemberî Kurdan bi çi rengî ye? Her wiha weke tê zanîn Şoreşa Rojava piştî pêvajoya ku weke "Bihara Gelan" tê bi navkirin, pêş ket. Li Rojhilata Navîn û Sûriye, vî pêvajoyî çawa destpê kir û li ser Rojavayê Kurdistanê tesîreke çawa kir?***

**ADIL QAMIŞLO:** Bi guherîn û veguherîna Rojhilata Navîn re, ev pêvajoya ku wek *"Bihara Gelan*" an jî wek "*Bihara Rojhilata Navîn"* dihat binavkirin, pêvajoya guherîn û veguherîna herêmê çêbû. Vê îşaret pê kir ku ev wek kevirên domîno ji Tûnis ber bi hemû Rojhilat Navîn ve biherike, têxe bin bandora xwe û pêvajoya guherîn û veguherînê dê dest pê bibe.

*Wêne-1*

Tespîtên Serok Apo hebûn. Serok Apo salên 2000'î, wek salên kaosê bi nav kirin. Pêwîst bû ev kaos ber bi çareseriyê ve biçe. Ango nexşeyeke siyasî ya Rojhilata Navîn heye û ev nexşeya siyasî li gorî berjewendiyên gelan nehatiye çêkirin. Li gorî rastiya Rojhilata Navîn nehatiye çêkirin. Hinek gel hatine karanîn, hinek di bin navê yek dewletê de hatine perçiqandin. Di yek dewletê de, hinek netew perçe bûne û gelek dewlet çêbûne.

Ji bo vê şoreşên netewî yên li Rojhilata Navîn çêbûne û piştî Şerê Cîhanê Yê Duyemîn jî nexşeya siyasî ya heyî derketiye holê. Li ser esasê peymana Sewrê, Sykes-Picot û Lozanê hatibû çêkirin û rastiya herêmê nedabû ber çavên xwe. Bêtir dualî bû. Yek; li ser esasê siyaseta mêtîngerî ya feriq teset ango perçe bike û bi rê ve bibe, hatibû çêkirin. Du; lazim dikir ku pirsgirêk bimînin û ev pirsgirêk her dem di Rojhilata Navîn de wek birînekê bimînin û her dem werin xurandin. Kul bimînin. Lazim bû birîneke wisa bihata çêkirin.

Xala din; şoreşên ku bi navê şoreşên rizgariya netewî dihatin çêkirin, an jî di Rojhilata Navîn de şoreşên li hemberî melîkiyetê, li hemberî qraliyetê dihatin çêkirin, şoreş an jî avakirina devletên netewî ne li gorî pîvanên dewlet-netewe yên orjînal bûn. Hê bêtir wek inqilabên leşkerî bûn. Mînak; yek, Mistefa Kemal di artêşa Tirk a Osmanî de generalek e. Cemal Evdilnasir bi navê Dibatil Ehrar di artêşa Misirê de generalek bû. Her wiha Evdilkerîm Qasim jî wisa. Ango hê zêdetir wek inqilabên leşkerî bûn.

Du; li gorî rewş an jî tehlîlên logayê objektîf ji şoreşan re çênebûn. Yanî karekterên xwe yên bûrjûwayî hebûn lê hê bêtir texlîtên Rojavayî bûn; texlîta Ewropa bûn. Ji bo wê jî ne orjînal bûn, ne xwezayî bûn. Yanî wek mîladekî qesrî bû, ne xwezayî bû. Vê jî hişt ku her dem pirsgirêkên demokrasiyê di Rojhilata Navîn de bimînin. Lewre jî mirov dikare vê kaosê wilo îfade bike.

Ji milekî ve jî bi hilweşandina Dîwarê Berlîn û hilweşandina pergala Sosyalîzma Reel bi salên 90'î re hêzên emperyal û serokatiya Emerîka, xwestin bi navê pergala cîhanê ya nû serweriya xwe li ser cîhanê çêke. Wek aliyek, wek hêzeke bingehîn; bi çandî, bi aborî, bi siyasî û bi leşkerî li ser cîhanê destwerdan kir. Li gelek cihan bi çandî encam girt. Li gelek cihan bi siyasî û bi aborî encam girt û li gelek cihan neçar ma ku bi leşkerî destwerdan bike. Mirov dikare vê wek xeta yekem pênase bike.

Di herêmê de xeta duyem dewleta netewe bû. Ya din dewleta netewe ya ku me bahs kir li ser esasê inqilabê eskerî çêbûbûn, li gorî Rojhila Navîn nebûn. Demode bûne, modelên wan derbas bûne. Nikaribûn bibin demokrat, neçar man bibin totalîter, zext li ser miletan kirin, bûn dîktator, bûn faşîst, bûn şoven. Ji bo bikaribin temenê dewletên xwe dirêj bikin mecbûr man gelan biperçiqînin. Lewre jî pirsgirêkên demokrasiyê pir derketin pêş. Gelê Rojhilata Navîn di navbera çakûç û nal de ma. Li ser vî esasî di vê kaosê de gelê Rojhilata Navîn di navbera çakûçê hêzên emperyal ku dixwazin serweriya xwe li herêmê çêkin û nalê dewleta netewe ku dixwaze temenê xwe dirêj bikin û statûya xwe biparêzin de ma.

Li ser vî esasî ji bo ku kaos çareser bibe, ji her du aliyan ve jî reçete derdikevin holê; her du jî çareseriyê nayînin. Reçeteyên dewletên emperyalîst ji bo Rojhilata Navîn guherîn û veguherînê çêdikin. Emerîka pir hewl da, pir reçete anîn. Me ev reçete li Afqanîstanê dîtin, li Iraqê dîtin; çareserî nebûn. Pêşiyên me dibêjin; *"Mirov nikare li taxên misilmanan salyangozan bifiroşe."* Mirov nikare salyangoz bifiroşe. Ji ber ku taxa misilmanan e. Rojhilata Navîn jî reçeteya Emerîka nepêjirand. Lê belê dewleta netewe û rejîmên dîktator jî çareseriyê nayînin.

Ji ber wê pêwîstî bi hêzeke sêyemîn hebû; pêwîstî bi xeteke sêyemîn hebû ku bi navê îradeya gelan, bi navê azadiyê û demokrasiyê, hem li hemberî vê hêza hegemon nasnameya Rojhilata Navîn a çandî biparêze, hem jî li hemberî van dewletên netewe, ferasetên dewletên netewe û rejîmên dîkta; karibe gelan rihet bike û demokrasiyê bîne. Ji bo wê jî pêwîstî bi hêzeke sêyemîn hebû.

Tevgera Azadiyê, xwe wisa bi nav dike. Xwe wek xeta sêyemîn bi nav dikir. Di navbera hêzên emperyal ên hegemon û dewletên netewe yên paşverû, klasîk û stakûkoperest de xeta seyemîn bû. Kelandinek di Rojhilata Navîn de hebû. Xerîteyek siyasî ku îradeya gelan nas nekirî û bi zorê hatî çêkirin nabe bersiv, pir bi pirsgirêk in. Hema hema li her welatekî pirsgirêk hebûn.

Li Tirkiyeyê pirsgirêka gelê Kurd heye, gelê Laz heye; Gurcî hene, lê wek dewleta netewe, dewleta ûnîter xwe dide naskirin. Li Îranê Belûc hene, Fars, Azerî û Kurd hene, Ereb hene; lê em dibêjin wek dewleteke netewe ne. Dewletên Ereban yek netew in, lê 24 dewlet in. Di nav her dewletê de pirsgirêk hene. Di navbera Îran û Iraqê de li ser hin giravan pirsgirêk hene. Di navbera Tirkiyeyê û Yûnan de li ser Qibris pirsgirêk hene. Di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de li ser Îskenderûnê pirsgirêk hene. Pirsgirêk di nav dewletên Ereb bixwe de hene. Pirsgirêka Libnan û Filistîn heye.

Ev pirsgirêk hemû raber dikin ku di Rojhilata Navîn de kaos heye û êdî pêşketin çênabe, divê guherîn û veguherîn çêbe. Pêwîst e ev kaos çareser bibe. Ji bo vê xweşewitandina mirovekî li Tûnisê yê bi navê Muhammed Ebû Ezîzî; mirov dikare bêje, ji bo ev bombeya li Rojhilata Navîn çêbûyî rola fitîlê lîst. Ango wek çirûskeke agir bû. Pêvajoya guherîn û veguherînê da destpêkirin. Êdî gelê Tûnisê ji aliyekî ve zordestiya rejîma Îbnî Elî da aliyekî, ji aliyê din ve jî şoreşa Tûnisê bû çirûska biharekê nû.

***-Belê, di van salên dawî de Li Rojhilata Navîn gelek qetlîam çêbûn. Çima ev qetlîam nebûn çirûska şoreşa Rojhilata Navîn? Li Sûdanê çêbû, li Iraqê çêbû, li Afqanîstanê çêbû, li Libnanê çêbû, Refîq Herîrî hat kuştin. Gelek bûyer û tiştên wisa çêbûn. Çima di vir de û di vê demê de pêvajoyekî wisa destpê kir?***

Hin kes li ser şîrove dikin dibêjin; “*Ev wek nezeriyekê ye, mûemereyekê ye. Di wir de dest pê kir, ji derveyî îradeya gelan çêbû.*” Rastiyeke vê heye? Na! Qanûnên taybet ên pêşveçûna dîrokê hene. Em nabêjin; “Çima şoreşa Bolşevîk beriya deh salan çênebû. Şoreşa Fransa piştî bîst salan çênebû.” Li cihên şert û mercên cih û demê dibin yek, Ezmûneke çandî çêdibe; wê demê teqîn çêdibe, ango guherîna çawanî çêdibe. Li ser vî esasî ev dem diyarkirin îradeya cewherî tenê têrî nake.

Şerê ku Tevgera Azadiyê li Bakurê Kurdistanê meşandî deh qatî şerê li Rojava ye. Li Başûrê Kurdistanê her wiha. Ji bo wê dê rewşa konjonkturel, mercên cih û cewherî li kû kom bibin û encamê bigirin; ev pêşketineke taybet a girêdayî dîrokê ye. Ew diyar dike dê li kû pratîkî bibe.

Ez tiştekî din bêjim. Mînak; li Kurdistanê ji nakokiya Kurdistanê û ji nakokiya dê û bavê Serok Apo, ji zexta dewleta Tirk û ji rewşa Rojhilata Navîn giştî Serok Apo derketiye. Lê belê ev şert û merc li her derî hene. Çima serokek ji Batmanê derneket, çima ji Mêrdînê derneket, çima niha dernakevin? Dê û bavên gelek kesên wek ên Serok hene. Lê belê serok dernakevin. Divê hemû taybetmendî bibin yek. Hin taybetmendî têrî nakin. Ji ber wê gelek caran qetlîam çêbûne. Rast e. Gelek tiştên wilo hene, an ne amil in, ne giştî ne. An jî zirûfên herêmî jê re ne guncaw in. An jî gel tam ne gihîştiye wê radeya teqandinê.

Bi Tûnisê re gihîşt wê radeyê. Bi rastî jî ya Tûnis bi îradeya gel bû, spî bû, paqij bû. Tê de pir xwîn nehat rijandin. Gel bixwe rabû û şoreş kir. Fatûreya wê jî kêm bû. Zerareke pir zêde jî çênebû. Pişt re hatina wê ya ber bi herêmê ve jî ne xelet bû. Ji ber ên wek Îbnî Elî zêde bûn. Heta yên ji Îbnî Elî dîktatortir jî hebûn. Husnî Mûbarek tê zanîn. Ev bû sî sal wek melîkekî bû. Jixwe kurê xwe amade dikir ku bîne cihê xwe. Em bêjin; li Sûriyeyê her wiha. Yanî li gelek deveran ev pirsgirêk hebûn.

Lê belê dema ku mûdaxele li ser çêbû, bi îradeya gel tenê bi sînordar nema, destwerdana derve çêbû û şoreş ji xeta wê hate derxistin. Guherîn û veguherîn li cihê di xizmeta gelan de be gelek hêzan xwestin li ser hesaban bikin, destwerdan bikin, ev rast e.

Derketina wê bihar e, lê mirov niha nikare jê re bêje bihar. Ji ber ku gelek destwerdan li ser çêbûn. Pir zivistan hatin, pir berf hat. Ji bo wê mûdaxele ji derve ve hat çêkirin. Mînaka Lîbya li ber çav e. Lîbya jî bi veguherînên hundirê ve bimana dibû ku wisa nebûya, lê destwerdan ji derve ve çêbû. Em vê dizanin.

Dema şoreşa Tûnisê dibû, em wek hêzên şoreşger yên Rojavayê Kurdistanê, di civînekê de bûn. Di wê civînê de nirxandinên siyasî yên herêmê hatin kirin. Qeneat bi me re çêbû ku li Sûrî û Rojavayê Kurdistanê jî îhtîmala guhertin û veguhertinê zêde ye. Ji bo wê pêwîst e destwerdanek li ser Rojava û li ser Sûriyeyê were çêkirin. Ji bo şoreşê amadekarî were kirin. Li ser wî esasî ji bo Şoreşa Rojava bi ser bikeve, li ser sê taybetmendiyan hat rawestandin.

***-Ev taybetmendî çibûn?***

**Yek; yekîtiya netewî ferz bû.** Çima? Ji ber ku di dîroka Kurdistanê de, her Kurdekî ku îro tu jê pirs bikî û bêjê, “*pirsgirêka Kurdan a esas di dîrokê de çi bûye?*” Dê bibêje “*mesele ya yekîtiyê bû, nebûn yek. Ji ber wê parçe man; dijmin ew parçe kirin.*” Ji bo wê lazim dikir ku îradeyeke siyasî û civakî ji Rojavayê Kurdistanê derkeve. Ango çiqasî partiyên siyasî hene werin cem hev, enî, bereyeke hevbeş çêkin. Hemû enerjî û hêza xwe bixin xizmeta şoreşê. Yanî yek ji prensîbên me ew bû; yekîtiya netewî çêbe. Em dizanin ji bo wê pir hewldan çêbûn. Hewl hat dayin ku bi hemû partiyên siyasî re mecliseke hevbeş were çêkirin. Cebheyke hevbeş were çêkirin. Ev heta astekê hat pêkanîn. Gelek partî tevlî me bûn, gelek hêz tevlî me bûn. Lê belê gelek jî tevlî me nebûn.

**Prensîba duyemîn; rêxistin bû**. Ji ber ku Serok Apo dibêje, “*asta pêşketina civakekê bi asta rêxistina wê ve girêdayiye*.” Li ser vî esasî civaka rêxistinkirî dikare çalakiyê bike; dikare bibe hêza çalakiyê, ya bê rêxistin be parçe parçe dibe û nikare çalakiyan derxe holê. Ji bo wê rêxistina modela TEV-DEM’ê pir guncaw e, pir erênî ye. Çima? Ji ber ku hemû civakê li ser esasê konfederalîzmê digire nava xwe. Ji zarokan bigire heta ixtiyaran, ji jinan bigire heta ciwanan, ji karkeran bigire heta memûran her kes di hundirê TEV-DEM’ê de dikare îfadeya xwe bibîne, hêza xwe derxe pêş. Jixwe pêkhateyeke demokratîk e, konfederal e, dikare vê hêzê bike yek. Ji bo wê ya girîng rêxistin dana çêkirin e.

Ev rêxistin herî zêde bi keda şehîd Rustem, bi keda şehîd Şîlan û hevalên wê çêbû. Dîsa berê bi keda hevalên wek şehîd Rustem heta astekê hatibû. Ji ber wê ji bo bîranîna wan hevalan be jî pêwîst dikir ku TEV-DEM biba rêxistina ku karibe di Rojavayê Kurdistanê de îradeyekê siyasî, aborî, civakî derxe holê ku gel xwe bixwe bivîna xwe karibe şoreşê bike û xwe bi rê ve bibe. Di vî aliyî de heta astekê jî çêbû. Mînak meclîsên gel hatin avakirin, komîn hatin avakirin.

**Prensîba sêyemîn: Parastina cewherî bû.** Serok Apo dibêje; "*civakeke ku parastina wî ya cewherî tinebe, ew civak tineye, heke hebe jî ew civak kole ye.*" Aliyekî wî yê parastinê divê hebe, ji ber ku pêleke guherîn û veguherînê heye û şerek dê were meşandin. Li ser wî esasî divê hêzeke parastinê yê gelê Rojava hebe. Li ser wî esasî bi rêvebertiya şehîd Xebat Dêrik şaneyên destpêkê, yekeyên destpêkê, komên destpêkê yên YPG'ê hatin avakirin.

Heke îro em bêjin; ji tevgerên din cuda dikaribû bibe bersiv û şoreşê pêk bîne, di bingeh de keda şehîd Xebat û hevalên wî hebû. Ev yekîneyên parastina cewherî dema êrîş li ser Rojava were çêkirin dê bikarîbana bibin bersiv. Ji bo wê pêwîstî bi amadekariyan hebû. Gelek hêzên ku xwestin wisa erzan şoreşê bikin, bê rêxistin, bê hêzên parastinê, bê tevger hê zêdetir medet ji hêzên derve digirtin hebûn. Şaş bûn. TEV-DEM'ê ji ber ku li ser ev her sê prensîbên ku me hejmartî sekinî û bi amadekarî bû, pêvajo baş xwend. Xetek ji xwe re tercîh kir.

***-Xeteke çawa bû? Ew xeta siyasî ku we got hatiye hilbijartin, hûn dikarin hinekî din vekin?***

Xeta siyasî pir girîng bû. Di dema ku pêvajoya Sûriyeyê dest pê kir; du xet derketin holê. Yek rejîm bû. Rejîmeke statûkoyî, rejîmeke ku zilm kiriye, rejîmeke ku sî sal e malbatek bi rê ve dibe, ango olîgarşîk e, teokratîk e, rejîmek ku xwe bi sîstem kiriye heye. Demode bûye, statûkoyî ye, klasîk e. Lê belê pergaleke wê heye, dixwaze temenê xwe dirêj bike û alîgirên wê hene. Bi taybetî Îran, beşek jî Rûsya û Çîn. Ev wek xetekê bû. Em weke Kurd nikaribin tevlê bibin. Ji ber ku jixwe me zilm ji destê vê rejîmê dîtiye; wan mafê gelê Kurd nedayê û tu hêvî jî tê de tineye. Lazim dikir bihata derbaskirin.

Xeta duyem; ne li ser îradeya gelê Rojava û gelê Sûriye ye, hê bêtir xweziya xwe ji derve tînin bû. Wek teqlîta Iraqê, wek teqlîta Lîbyayê. Dê dewletên emperyal Beşar Esad bixin, xwe bigihînin Şamê û dê li ser sîniyeke zêrîn bidin gelê Sûriyeyê û dê bêjin, "*kerem bikin ji we re.*" Li ser vî esasî gelekan xwe di wê eniyê de didîtin. Bi taybetî yên di vê eniyê de hê bêtir ji ser Tirkiyeyê re êrîşî Sûriyeyê dikirin; di bin bandora Tirkiyeyê de bûn.

Di van de jî zêde hêvî tinebû. Çima? Ji ber ku hêzên li pişt van hêzan -dewleteke wek dewleta Tirkiyeyê- heke demokrat bûna, alîgirên guherîn, veguherîn û bihara gelan bûna, pirsgirêka Kurd heta niha di Tirkiyeyê de bê çare nedima. Yanî maqûl e dewleteke di hundirê xwe de 20-25 milyon Kurd diperçiqîne, mafê wan napejirîne; were ji welatekî din re azadî û demokrasiyê pêşkêş bike. Ne gengaz e. Dibêjin: "*Heke dermanê keçel hebûya dê serê xwe bida.*" Ji ber wê ew hêz bêtir bi wir ve hatibûn girêdan. Hin dewletên ku armanca wan ne şoreş bû, tenê têkwerdana Sûriyeyê bû, an jî ji bo xwe li Sûriyeyê rejîmek dana çêkirin bû. Ên ku wisa hewaya wan ne ya şoreşê bûn hebûn. Serkêşiya vê jî hê bêtir Tirkiyeyê û Qatarê kir.

Ji ber wê di vê xetê de jî cî girtin ne gengaz bû. Ji aliyekî ve mirov bibe alîgirê rejîmê jî nabe, ji ber ku rejîm jixwe dîktator û statoyî ye. Ji aliyê din ve yên ku ji derve ve jî êrîş dikin bi Tirkiyeyê ve girêdayîne. Ne bi niyeta şoreşa Sûriyeyê, bi niyeta destwerdan û berjewendiya van dewletan esas girtin. Ji ber wê bi wan re jî nedibû. Ji ber wê di Rojava de wek xeteke sêyemîn, pêşketina tevgerekê şert bû.

***-Tenê mesele xet bû yan mercên siyasî bûn?***

Xeta sêyem, nêrînên wê li ser şîdetê jî cewaz bûn. Wan xetên din rasterast şîdet wek rêbazên çareseriyê didîtin. Dema em dibêjin xet ne tenê wek eniyeke siyasî ye; mantiqek, rêbazek, felsefeyek, çareseriyekek rewa di nav de ye.

Heke Tirkiye welatekî demokrasîxwaz bûya, lê dîsa jî hêz bi kar anîba, Kurdan dîsa jî dikarîbû biketa rêbazên bi vî rengî, rêbazên şidetê? Na. Li ser rêbazê, cewazî hebû. Wek min got; pirsgirêk ne di

eniyeke siyasî tenê de ye. Rêbazên têkoşînê, armancên wê, wan dixwest li ser berjewendiyên xwe tevbigerin.

We jî dît, li ber çavê dinyayê, di Lîbyayê de rejîmek hilweşandin û rejîmeke alîgirên xwe dan çêkirin û berjewendiyên xwe di wir de dan avakirin. Niha mirov lê binêre miletê Lîbyayê tu sûd ji vê biharê nedît, tu sûd ji vê şoreşê nedît. Ji ber ku her qirkirin, her şerê navxweyî, her eşîrtî û her mezhebgerî heye. Ji ber wê di her duyan de jî mantiqek û rewabûneke çareseriyê nebû. Yek dixwaze temenê xwe dirêj bike û statûya xwe berdewam bike; yek jî dixwaze berjewendiyên xwe bi dest bixe. Ji bo netewa Sûriyeyê di her du riyan de jî çareserî tineye.

Ji bo wê me, di serî de şîdet wek rêbazeke têkoşînê esas wernegirt. Me guherîn û veguherîna demokratîk esas wergirt. Me destwerdana derve wek çareserî nedît. Du, me şîdet çareserî nedît.

Erê, me dizanîbû ev pirsgirêk ya netewa Sûriyeyê ye, divê netewa Sûriyeyê bîryarê bide. Ango hin hêz ji derve hatine ew nikarin di derbarê Sûriyeyê de, di derbarê îradeya Sûriyeyê de bîryar bidin. Esas yê bîryar û mafê çarenûsa xwe bide gelên Sûriyeyê bixwe ye. Ne ku piştgiriyê bikê, em ji bo wê tiştekî nabêjin. Dibe ku bi piştgiriya hêzekê ku dixwaze di hêrêmê de guherîn û veguherînê çêke baş e, ne tiştekî şaş e. Lê belê bixwe mûdaxele bikin û li gorî berjewendiyên xwe tiştan çekin, ew ne gengaz e.

Li ser wî esasî ji wan hêzên demokratîk wek cebheyekê çêbû. Yek; tev cebheya destpêkê nebûn, cebheya rejîmê nîn in. Tev cebheya duyemîn a ku Tirkiye û Qeter serkêşiya wê dikin ew nîn in. Hêzên demokratîk in. Bi rastî jî welatparêzên Sûriyeyê ne. Dixwazin di Sûriyeyê de çareseriyek demokratîk çêbibe. Di cebheyeke bi navê “Heyet Tensîq” xwe tevger kir. Vê di Sûriyeyê de wek cebhebûnekê da çêkirin. Yek rejîm e. Yek alîgirên çareseriya hundirîn, çareseriya demokratîk û ji bo pêşerojê rewabûna wê heye. Yek jî tenê bi hêzên derve dixwaze di rejîmê de guherîn û veguherînê çêke.

Wan jî destpêkê xwe bi navê “Meclisa Netewî” bi nav kirin. İxwanên Mislimîn serkêşiya wan dikirin. Piştre jî hin hêzên din jî yên alîgirên wan tevlî wan bûn û xwe wek “Îtîlafa Wetanî Sûrî” bi nav kirin.

Yanî êdî di Sûriyeyê de sê hêz derketin holê: Rejîm, Heyet Tensîq û Îtîlafa Sûrî.

Vê tabloyê xwe di Rojavayê Kurdistanê de jî wisa da der. Em dikarin di destpêka şoreşê de di Rojavayê Kurdistanê de jî qala sê hêzan bikin: Hezek, alîgirê rejîmê nebe jî baweriya wê bi guherîn û veguherînan nebû, ji rejîmê ditirsiya, alîgiriya rejîmê dikir û bawer nedikir wek deverên din bibe. Lewre jî rîsk nedida ber çavên xwe. Cesareta guherîn û veguherînê nedikir. Ji ber wê wisa bê helwest ma, an jî bi rejîmê re hereket kir. Beşekê bi îtîlafê û hêzên mûdaxele yên derve re hereket kirin. Beşa me jî; em bi Heyet Tensîq re û bi guherîn û veguherîna hundir re tevdigeriyan. Ev cebhebûna di hundirê Sûriyeyê de di heman demê de di Rojava de jî hebû.

Xala din ya me, ji xwendina pêvajoyê re ya rast çi bû? Bi awayekî rast pênasekirina me ya ji bo Sûriyeyê bû. Ji derveyî me ev hêzên din bi tevahî heke bi bin ketin an jî wek me bi ser neketin, di bingehê wê de tahlîleke rast ji civakê re, ji rastiya Sûriyeyê re, ji mozayîka Sûriyeyê re nekirin. Wilo fêm kirin ku bi awayekî hêsan wek li Lîbyayê çêbû, li Misirê çêbû; dê li Sûriyeyê jî çêbe. Ji ber wê hesabên pir erzan kirin. Li cihê ku civakê rêxistin bikin, bêjin; “*em hêzên parastinê çêbikin, yekîtiyê çêkin.*” Gotin, “*ne lazim e. Jixwe dê Hêza Navnetewî were li Beşar bixe û ji holê rake, em ê jî bi erzanî li ser sîniya zêrîn bigirin.”*

Me texmîn kir ku dê Sûriye wilo rihet nebe. Çima? Yek; Sûrî ne wek Lîbyayê ye, Sûrî ne homojen e; ne yekreng e. Di Sûriyeyê de Ereb hene, Kurd hene, di Sûriyeyê de Sûnî hene, Alewî hene, di Sûriyeyê de Tirkmen hene, Suryan hene, Ermen hene. Ev hebûn pirengiyê çêdike û dihêle ku çareserî zehmetir bibe.

Du; hevsengiya navnetewî li ser Sûriyeyê cuda bû, ne wek Lîbya bûn. Mesele Sûrî qereqoleke Rûsya ye. Lewre Rûsya zû bi zû dev jê bernade. Sûrî bazareke aborî ya Çînê ye zû bi zû dev jê bernade. Sûrî ji bo Tirkan girîng e, ji ber ku pirsgirêka Kurd di Sûriyeyê de çareser bibe dê Tirkiyeyê jî bixe zorê. Tirkiye Sûnî ye, ji bo wê dixwaze Sûrî jî rejîmeke Sûnî be. Îran Şîa ye, dixwaze ku rejîma Sûriyeyê Elewî be û girêdayî wê be. Başûrê Libnan Hizbulah e û hwd. Emerîka dixwaze ku li wir rejîmeke li gorî xwe bide çêkirin.

Yanî Sûrî navenda hemû nakokiyên navnetewî û herêmî bû. Pirsgirêka Sûriyeyê pirsgirêka Tirkiye û Îranê ye, pirsgirêka Sûriyeyê pirsgirêka Kurd û Tirkan e; Kurd û Ereban û Kurd û Farisan e. Pirsgirêka

Sûriyeyê pirsgirêka Emerîka û Rûsya ye. Sîleheke wan a li ser qereqolekê nîn e. Li ser wî esasî di demeke kurt de û bi awayekî hêsan ev pirsgirêk û hesab hemû çareserkirin ne gengaz e.

Lê tiştekî din jî heye; di Sûriyeyê de jî çareserî ji bo van hemî hevsengiyan çareseriyeke. Ango çarenûsa herêmê hinekî jî bi Sûriyeyê ve hat girêdan; bû girêka kor. Mînak li Lîbyayê mehan dirêj kir, li Tunisê mehekê dirêj kir. Li Misirê mehan dirêj kir. Lê belê ev çar sal in li Sûriyeyê tevlîhevî ye. Ji ber ku girêka kor e; hesabên gelek hêzan di Sûriyeyê de kilît bûn. Ji bo wê kî hesabên dirêj bike, hesabên stratejîk bike û hesabên rast bike ew ê qezenc bike.

Li gorî min, wek TEV-DEM'ê; li Rojavayê Kurdistanê û li Sûriyeyê xwendina me ya siyasî rast bû. Tespîtên Serok Apo yên berê hebûn; rast bûn. Hesabên ku me li ser civakê kirî; ji aliyê hêza parastinê vê, ji aliyê tevgerbûnê ve, ji aliyê yekîtiya netewî ve ji ber ku ev hesab rast bûn, fatûreya wê jî bi vî awayî encamekî baş girt.

***-Baş e. Berî em bikevin nav Rojava em pirseke din bikin. Niha Emerîka, Brîtanya û Israîl li gorî dixwiyên cebheyek in. Yanî di mijara Sûriyeyê de cebheyek in. Wek diyar e Tirkiye, Qeter û hin dewletên din jî cebheyek in. Ew cebheyê Emerîka û yên pê ve girêdayî Tirkiye û Qeter van ji bo meseleya Sûriyeyê di ku derê de li dijî hev bûn û di ku derê de bi hev re bûn?***

Heta mehek û du meh beriya ku bûyer li Sûriyeyê çêbe, Tirkiye-Sûriye-Îran; em bêjin 2011'ê îtîfaqeke wan li dijî tevgera Kurd hebû. Di kû derê de li dijî hev in, çima wisa çêbû? Qaşo ev di cebheyekê de bûn, bi hev re bûn. Hema ji nîşka ve di nava du-sê mehan de, hem îtîfaqa wan li hemberî Tevgera Azadiyê xira bû, hem jî ji aliyekî din ve hema cebheyek li dijî Emerîkayê, li hemberî Tirkiyeyê, Îsraîl û wan. Herî kêm berê wilo dihat xwiyakirin, wek yek cebheyekê bûn, hema ji nîşka ve bûn du cebheyê li dijî hev. Wek xwiya dibe ku, heta niha jî heta astekê berdewam e.

Niha piştî hilweşandina sosyalîzma reel di cîhana me de qarekterê tifaqan û cebhebûna bloqan hat guhertin. Yanî em bi wî mantiqê berê wek kêrê lê bixin, bejin, ev cebheyek e, ev jî cebheyek e, em nikarin li tu îtîfaqan binêrin. Çima? Ji ber ku ne li ser esasê nakokiyên îdeolojîk û stratejîk in. Berjewendiyên rojane, berjewendiyên tektîk dihêle ku du dewletên dijminên hev di rojekê de bibin cebheyek; du hêzên du cebheyan de piştî rojekê werin hemberî hev. Ji ber çi? Ji ber berjewendiyan e.

Li ser vî esasî em wilo wek berê nikarin lê binêrin. Berê du cebhe hebûn; cebheya sosyalîst û cebheya emperyalîst. An jî cebheya bi serkêşiya Emerîka û ya bi serkêşiya Sovyet/Rûsya hin dewletên alîgirên van hebûn, hinek alîgirên wan hebûn. Hin dewletên ku xwe wek dewletên serbixwe didan nîşandan hebûn, lê bi cewherê xwe ne serbixwe bûn. Teqez ew jî bi aliyekî ve girêdayî bûn. Lê piştî hilweşandina sosyalîzma reel ev cebhebûn têkilhev bû. Ev cebhebûna ku min berê bahs kirî hê rastir bû. Yanî hêzên emperyal ên hegemon hêzên dewleta netewe û civak. Ango hevsengiyeke wisa derket holê.

Ji bo vê berê dewletên rojavayî bi serkêşiya Emerîka dîsa Israîl bi wan re, heta Tirkiye û Qeter jî bi wan re xwe wek alîgirên guherîn û veguherînê dan nîşandan; lê di cewher de ne wisa bûn. Piştgirî dan hêzên guherîn û veguherînê didin çêkirin. Armanca wan ji vê çi bû? Şoreş jixwe dê çêbibin, civak hatiye ber teqandinê, dê were guhertin. Dibe ku ev guhertin li gorî îradeya gelan çêbibe, ji bo wê xwestin di xeta xwe de van guhertinan bînin. Gotin; "*her guhertin çêdibe bila guhertin di xizmeta min de be.*" Hêzên xwe derxistin pêş, mirovên xwe derixtin pêş, çek û cebilxane dan wan ji bo vê guhertinê li gorî wan çêkin. Wek Tûnisê berê bi îradeya gelan çêbû, lê piştî wê ji xeta xwe derket.

Bi Sûriyê re ev cebhebûn zêde bû. Ev cebhe bû cebheya Rûsya û Emerîka. Li gorî vê careke din wek cebhebûnekê hat çêkirin. Yanî em bêjin; alîgirên Emerîka, Îngilîz, Îsraîl; destpêkê Tirkiye, Erebistana Siûdî û Qeter jî bi wan re bûn. Li hemberî vê Rûsya û Çîn -ji ber ku van her du dewletan her red dikirin- beşek jî Îran. Bi Sûriyeyê re qereqtereke din ê mezhebî girt. Ev bû nakokiyekê Sûnî û Şîa. Kes naxwaze nav lê bike, lê di cewherê xwe de ev bû. Ji bo vê Îranê hema xwe bi tevger kir.

Amûrekî girîng bû. Îranê bi navê "*Cebheya berxwedanê*" ji xwe re wek hîlalekê, bloqek çêkir. Wek "Hîlala Berxwedanê" bi nav dike. Yanî Başûrê Libnanê, Hizbulah, Îran, Bahreyn, Iraqa Şîa û Sûriye. Xwest cebheyeke wisa yê berxwedanê çêke, temenê rejîma Sûriyeyê dirêj kir. Îtîfaqên xwe yên navnetewî yên stratejîk jî bi Rûsya û Çînê re hê zêdetir li pêş bû. Dewletên din ên Sûnî hê zêdetir bi Emerîka û Tirkiyeyê re tevger dikirin. Lê belê di hundirê eniya Sûnîyan de; di hundirê eniya Emerîka

de, bi meseleya Sûriyeyê re heta hê ne di meseleya Sûriyeyê de, di meseleya Misirê de perçebûnek jiyan kirin. Ne perçêbûneke stratejîk, perçebûneke tektîkî bû.

Li ser çi? Emerîka piştgiriya guherîn û veguherînan kir. Tirkiyeyê fîîlî di pratîkê de dimeşand. Destwerdana li ser Lîbyayê jî, ya li ser Misirê jî dimeşand. Tabloya ku li Rojhilata Navîn derket holê, tabloyeke Îslamî bû. Li Tunisê rejîmeke Îslamî, li Lîbyayê rejîmeke Îslamî, li Misirê rejîmeke "Îxwan Mislimîn" ya Îslamî. Vê hişt ku bi taybetî Israîl, dîsa Emerîka hesabên xwe ji ber çavan re derbas bikin. Wan xwest ku rejîma hevalbendên xwe çêkin, lê belê dîtin ku Tirkiye çi dike; li gorî berjewendiyên xwe boyaxeke Îslamî lê dixe. Ew dibêjin, "*Em biguherin.*" Dibêje; "*Baş e, biguherin.*" Xwest alîkariya yên gorankariyê dixwazin bike. Lê piştre Emerîka ferq kir ku Tirkiyeyê çi kiriye; çiqasî çek dane nedane hemû siyasetmedêran, hemû dane van koman û Îslamî derxistine pêş.

Ji bo wê di Misirê de rejîmeke wisa islamî hat çêkirin. Mursî wek AKP'ê nekir. Wî xwest tektîkê AKP'ê bimeşîne. AKP'ê ancax di deh salan de bû deshilatdar. Mursî xwest xwe di şeş mehan de bike wek AKP'ê. AKP berê îktîdareke siyasî bû, piştre hêdî hêdî xwe di nîzama polîsan de, di artêşê de, di dadgehan de, di aboriyê de; qadroyên xwe çêkir û piştre dest pê kir. Mursî wisa nekir. Mursî di roja destpêkê hatî de rengê xwe yê Îslamî derxist pêş. Vê wisa kir ku di nav Misirê de bertekek çêbe.

Îsraîlê dît ku ket nav dorpêça Îslamiyan. Lewre inqilaba bi navê "Sîsî" hat çêkirin. Vê inqilabê di eniya Sûnîyan de parçebûn da çêkirin. Qeter û Tirkiye ji vê înqilabê aciz bûn, li hemberî Sîsî helwest danîn û li Mursî xwedî derketin. Siûdî, Emerîka, Fransa û Îngîlîstan piştgiriya Sîsî kirin. Vê nakokî di nav wan de çêkirin. Yanî ez dixwazim li vir çi bêjim. Stratejiya Emerîka bû, lê ji ber di pratîkê de Dewleta Tirk hê bêtir nêzîkî bûyeran bûn destwerdan dikirin; Dewleta Tirk dixwest li hespê Emerîka siwar bibin û rengê xwe li meseleyê bixin. Rengê xwe lê bixin.

Emerîka ji vê tirsiya. Her çiqasî ji aliyê stratejîk ve Tirkiye û Emerîka yek bin jî, lê ji aliyê tektîk ve cewazî hat çêkirin. Vê di cebheya Sûnî de perçebûn çêkir. Di serî de Îranê, Sûriyeyê ji vê sûd wergirt. Vê temenê Sûriyeyê dirêj kir. Niha Emerîka difikire; heke di Sûriyeyê de guherîn were çêkirin û rejîmeke Îxwan Mislimîn, were şûna Beşar wê demê demokrasî nayê, Israîl jî dikeve bin gefê, Tirkiye xurt dibe, ku Tirkiye xurt bû jî cilq dibe, delalî dibe. Êdî Emerîka jî guhdarî nake. Yanî Emerîka xeteriyeke wisa dît, ji ber vê Emerîka mûdaxele kir.

Nexşeya Emerîka û Dewleta Tirk heta astekê yek e. Dewleta Tirk çi dikin; hîlebazî dikin. Dibêjin: *"Em ê jî di nav de bin, lê em ê jî ji xwe re gepekê jê bixwin, an jî em ê li gorî xwe çêkin.*" Ev di mijara Iraqê de derket holê. Plansaziya wan heye. Dibêjin: "*Bila plansaziya Emerîka hebe, lê em ê di nav plansaziya Emerîka de plansaziya xwe çêkin.*" Di Tirkiyeyê de pêşveçûnan bişopîne di hevsengiya wê de, di peralela wê de bi pêş ketin. Mesala Erdoxan bû Serokomar, hema xwest ji xwe re wek padîşahan serayekê çêke. Li ser çanda Osmaniyan bimeşe.

Rejîma AKP'ê ne rejîmeke demokratîk e. Gelek caran xwe bi rengê demokratîk boyax dike ji bo ku malê xwe bifiroşe, lê di heqîqeta xwe de faşîst in. AKP li ser mendelkirina gelê Kurd û li ser îmhakirina Tevgera Azadiyê hatiye avakirin. Tiştên ku Kenan Evren anî heta astekê dixwazin bi riya Îslamiya AKP'ê temam bikin. Plansaziya wan wisa ye. Bi rastî jî di destpêka şoreşê de an jî di destpêka guherîn û veguherîna Rojhilata Navîn de Tirkiyeyê xwe di cîhanê de wek model dabû pejirandin. Erdoxan di alema Erebî de wek lîderekî dihat dîtin.

Tê bîra we di wê bûyera ku li Dawosê hatî çêkirin de; ya ku wek bûyera "*wan minut*" hatiye bi navkirin, derketinek li hemberî Israîl çêkir; wek antî Israîl, piştre jî di Rojhilata Navîn de wek modelekê hat dîtin. Peywendiyên xwe bi dewletên Erebî re pêş xist, wek alîgirê şoreşan, wek alîgirê demokrasiyê hat naskirin. Tevgera Azadiyê û Şoreşa Rojava rûyê wê yê qirêj derxist holê û rûpoşa li ser çavê wê anî xwarê. Mesele heke Kurd li Sûriyeyê tinebûna û şoreş li Rojavayê Kurdistanê çênebûya dê heta niha jî Tirk wek alîgirên şoreşê, li dijî dîktatoran û wek ku bi îradeya gelan re ye dê helwest nîşan bida û dê wisa bida diyarkirin.

Yanî rûpoşa wê ji ser çavên wê nediket. Lê hat ku li Sûriyeyê şoreşê çêke, bi wê bang dike û xwe wek model dide nîşandan. Dixwest ku gelê Kurd jê sûdê wernegire. Çawa ku li Bakurê Kurdistanê Kurdan mendel dike û mafê wan nade wan, dixwest li Sûriyeyê jî wisa bike. Lê gelê Rojavayê Kurdistanê ji vê fersenda şoreşan sûd wergirt, bi nasnameya xwe û bi modela xwe derket holê. Ji ber wê Tirkiye li hemberî du rêyan hişt. An dê bêje; "ez bi şoreşê re me, ez ê piştgiriya Şoreşa Rojava jî bikim, bila Sûriye bibe demokrat." An na. Ger wisa bibûya dê pirsgirêka AKP'ê bi Kurdan re nebûya, jixwe dê

li Bakur jî pirsgirêk çareser kiriba. Lê belê AKP ne wisa ye. An jî dê ya li dijî wê be. Ya li dijî wê kî ye? Ya li dijî Şoreşa Rojava derdikeve kî ye? Ji ber ku Şoreşa Rojava serkeftî ye; wek model e, di tevahiya dinyayê de her kes bi heyranî lê temaşe dike.

Cihekî wek Rojhilata Navîn ku bûye wek dojehê, bê proje ne, bê demokrasî ne; wek giraveke demokratîk derketiye holê. Yê ku êrîş dikin ser kî ne? El Qaîde ne, DAÎŞ in û çete ne. Ji ber vê yan Tirkiye bi Kurdan re be, yan jî dê bi çeteyan re be. Ango tevgera Kurd a demokratîk, û Şoreşa Rojava AKP danî ser duriyanekê. Yan ê alîkariya şoreşê bike -ne gengaz e Erdoxan vê bike- ji ber ku ev cebhe li ser dijminahiya gelê Kurd hatiye avakirin. Wê demê yek alternatîfa wê maye alîgirê dijminê şoreşê be. Vê ew bi DAÎŞ'ê re kir yek. Niha tevahiya cîhanê nikare wek Tirkiyeyê bifikire. Mînak; Emerîka û Ewropa dibêje: "*Ez li dijî El Qaîde, li dijî DAÎŞ'ê me.*"

Du modêl hene: Modeleke xîlafetê heye. Xwe li Sûriyeyê û li Iraqê ferz kiriye. Piştî êrîşa Mûsilê li Iraqê jî bi cî bû. Modeleke demokratîk ku azadiya gelan û wekheviyê esas digire derketiye holê. Di heman demê de ev model şerê DAÎŞ'ê dike. Hêzên navnetewî yan wê bêjin, "*em şoreşê naxwazin, em bi DAÎŞ'ê re ne, em ê bi El Qaîdeyê re tevbigerin.*" Dê wê demê gelê xwe jî bixapînin; gelê wan jî, raya giştî jî vê napejirîne; yan jî neçar e piştgiriya vê modelê bike. Piştgiriya şoreşa demokratîk bike.

Li ser vî esasî raya giştî ya cîhanê, bi taybetî piştî berxwedana Kobanê dîtin ku du cebhe hene. Du cebhe hene û xwe li ser erdê ferz dikin; Yek DAÎŞ e, El Qaîde ye, faşîst e, paşverû ye. Yek jî Kurd in, lê demokratîk in. Çiqasî Kurd tên înkarkirin, wek terorîst tên naskirin û hwd. Lê demokrasiyê dixwazin, plansaziyeke wan heye û li dijî DAÎŞ'ê berxwedanê dikin. Şer dikin. Ji ber wê yan dê cîhan çavên xwe bigire û bibêje, "em tiştekî nabînin." An jî li gel hêzên azadîxwez bin. Lê raya giştî ne wisa ye, ji ber ku medyaya cîhanê van tiştan dişopîne; yan jî neçar in alîkariya şoreşê bikin.

Ji ber vê hêzên navnetewî neçar man ku di Kobanê de alîkariya şoraşa Rojava bikin û ruxmê Tirkiyeyê vê bikin. Cebheya wan perçe bû. Herhal ew jî wek Tirkiyeyê naçin û alîkariya DAÎŞ'ê nakin; neçar in alîkariya Şoreşa Rojava bikin. Yanî ez dişibînim çi? Ez dişibînim şerê cîhanê yê duyemîn û Rûsyayê. Mînak; Ingîltere û Emerîka dikarîbûn bêjin; "*em ê alîkariya Hîtler bikin, em ê şerê Rûsyayê bikin?*" Na! Milekî wan faşîst in, milekî wan ên din sosyalîst in. Keyfa wan ji Rûsya û sosyalîstan re tê? Na! Wan jî dijminê xwe dibînin. Lê belê li aliyê din jî Hîtler heye. Li ser vî esasî cebhe bi kî re çêkirin? Cebhe bi Rûsya re çêkirin. Neçar bûn şerê Hîtler bikin.

Îngîlîstan û Emerîka destek dan Rûsyayê, ne ku ji ber xatirê Rûsyayê bû. Ew destek pozîtîf bû. Lê belê destekdayîna Tirkiyeyê ya ji bo DAÎŞ'ê ne pozîtîf e. Ev destekdayîn dibe ku Tirkiyeyê jî bi xwe re perçe bike, an jî bibe rewşeke din. Hê jî di vê de israr dike.

**Partiya Yekîtiya Demokratîk - PYD**

***-PYD kengê û li ser esasê kîjan pêwîstiyan hate avakirin?***

Xebatekê bi navê PYD'ê di 2003'yan de dest pê kir. Her çiqasî berê jî li Rojava, li kêleka piştgiriya şoreşa Bakur ji bo xwe xweser xebatek hebe jî; lê belê wek partiyeke fermî, siyasî ev xebat di 2003'yan de bi avakirina PYD'ê derket holê ku em bêjin di xweseriya Rojava de xebatek ji bo Rojava were meşandin û partiyeke siyasî ji bo wê hat avakirin. Piştî wê, bi projeya Serokatî derxistî pêş ji bo "*Konfederelîzma Demokratîk*," xebatên xweseriyê yên Rojava pêş ketin. Piştre jî wek TEV-DEM'ê hat binavkirin. Pergala "*Netewa Demokratîk*" hat avakirin. Lê belê ev xebat ji ber zexta rejîma Sûriyeyê ya li ser gelê Kurd di warekî lewaz de ma. Bi tevahî ji holê ranebû, lê bi zextê re jî berxwedanek hebû; lê belê ne di wê astê de bû ku roleke mezin bileyîze. Heya pêşketina şoreşê, mirov weke xetekê dikare wisa binirxîne, lê mirov dikare hinekî din berfireh bigre dest.

*Nexşere-1

**Nexşeriya Siyasi Ya Rojava**

***-Beriya avabûna PYD'ê li Rojava hevsengî û siyaseteke çawa hebû? Piştî Şoreşê guhertinên çawa çêbûn?***

Berê hin partiyên siyasî hebûn. Piştre di salên heştêyî de tevgera Tevgera Azadiyê hat, dest bi têkoşînê kir û xwe bi hêz kir, xwe bi rêxistin kir û gel jî perwerde kir. Mirov niha hinekî wê xeta siyasî şîrove bike. Ew xet, bi qasî ku ez dizanim pazdeh partî hebûn. Niha sî û şeş partî hene.

Niha li Rojavayê Kurdistanê xerîteya siyasî bi şoreşê re hin guhertin çêkirin. Lê belê heke em beriya şoreşê lê binêrin, mirov dikare behsa sê rengan bike. Rengek; ew jî bi awayekî paralel bi şoreşa Kurdistanê ve girêdayî; mirov li tabloya siyasî ya Rojava binêre mirov dikare di derbarê şoreşa Başûr, şoreşên Bakur agahî bigire. Ango bi rabûn û ketin, bi serkeftin û bi binkeftin, ên di perçeyên Kurdistanê yên din de hatine çêkirin eynika Rojavayê Kurdistanê bû.

Li ser modela PDK di salên pênciyî de partiyeke siyasî bi navê Partiya Demokrata Kurdistanê ya Sûriyeyê hatiye çêkirin û heta demekê jî wisa maye. Bi guherînê di Başûrê Kurdistanê de çêbûn û bi taybetî salên şêstî perçebûna ku bi Mam Celal re dest pê kirî bandora wê li ser Rojava jî çêbûye û di Rojava de jî perçebûneke wisa çêbûye.

Bi vî awayî ji wê demê heta niha ji wê medreseya Berzaniyan her perçe bûne. Du sedemên van perçebûnan hene. Yek; siyaseta PDK'ê a ji bo Rojava şaş e. Ne ku ji bo Rojava bi îrade bibe, bi hêz bibe, ji bo berjewendiyên xwe nêzîk dibû. Peywendiyên wan ên bi Sûriyeyê re wek civakeke piştperde bi kar aniye. Du; hevsengiya wan di nav xwe bixwe de. Mesele çawa bû? Yek ji nav partiya xwe diçû li ser partiya xwe diaxivî, li ser serokê partiya xwe diaxivî, jê re digotin: "*Here tu bibe serok.*" Dihat perçe dikir, partiyek ji xwe re çêdikir. Yanî guherinên di hundirê wan de çêdibûn, perçebûn dida çêkirin. Yek ev e. Ji ber vê yekê, ji wî parçeyî dibe ku deh-duwazdeh perçe çêbûne.

***-Di navbera van partiyan û rejîma Sûriyê de têkiliyeke çawa hebû?***

Rejîma Sûriyeyê bi siyasetek pir bi hostatî nêzîkî wan partiyan bû. Yanî ji aliyekî ve bi redkirineke qebe ku wan partiyan redîqal bike nekir. Du; di ser PDK'ê re, di ser Berzaniyan re ew partî jî dixistin bin venêrîna xwe re û nedihişt ku ji venêrînê derkevin. Yanî di her kongreyekî de perçebûnek çêdibû; kongreyeke din dihat perçebûneke din çêdibû. Dibêjin di Dirbêsiyê de sêzdeh sekreterên van partiyan hene. Diyar e tiştekî wisa heye.

Ya girîng wê demê di navbera 50 û 60'î di nav wan de wek derketineke çep jî heye. Em qala wê jî bikin. Ew jî bi serkêşiya Osman Sebriyê nemir bûye. Yanî Osman Sebrî cara destpêkê li Rojavayê Kurdistanê li ser fikrê çep ê Marksîzmê xwestiye rêxistineke siyasî çêbike. Destpêkê xwestiye vê yekê di nav PDK'ê de bike, lê piştî perçe dibe wek Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Çep a Sûrî ava kiriye. Wê jî wek xetekê xwe rêxistin kiriye. Min got; perçebûna ku bi Mam Celal re çêbûye li Rojava jî xwe da der.

Bi vî awayî ew partiya demokrat bû du perçe. Hinek kes wek navê "Yemîn" û "Yasar" lê dikin. Lê ew bixwe bi serokatiya Hemîdê Hacî Derwêş wek navê "Partiya Pêşveru" lê dikin. Ew jî wek xeteke duyemîn wek berdewamkirina Mam Celal hene. Ev perçebûna di nav van partiyan de, heman demê de hinek partî jî bi Salihê Bedrê ve girêdayî çêbûne. Bi Îtîhadî Şahb a bi Samî Ebdirehman ve girêdayî BAAS'ek li wir çêbûye. Yanî guhertinên wisa pir çêbûne. Hinek partiyên sosyalîst jî xwestine çêbin lê di rewşeke marjînal de bûn.

'**Xeta Sêyemîn'**

***-Di nava ev nexşeriya siyasî ya Rojava de, konevaniya ku hûn weke xeta seyemîn pênase dikini, hûn dikarin hinekî vekin?***

Xeta Sêyemîn an jî em bêjin cebheya sêyemîn, modela sêyemîn; medreseya Tevgera Azadiyê, yanî ya Serok Apo bû. Li ser îradebûna gelê Rojava, fikrê azadiyê, fikrê demokrasiyê bi pêş xistin, bi

berxwedana Kurdistan û ya Tevgera Azadiyê re kirina yek. Mîraseke şoreşgerî, mîraseke berxwedanê ya mezin da çêkirin. Wek berhemeke sêyemîn hat dîtin.

Bi taybetî ji milê nakokiyên di nava partiyên Kurd de heyî ve; ji destpêka şoreşê ve hewldaneke me ya pir mezin çêbû ku em yekîtiyê çêkin. Me ked da wek meclîseke netewî, wek meclîseke gel ku hemû partiyên siyasî di nav xwe de bike yek. Lê belê zexta Tirkiyeyê, siyaseta PDK ya şaş nehişt ku ev yekîtî çêbe. Yek; Tirkiyeyê her dem soz dida van ku dê wek modela Iraqê bibe û divê li ser wî esasî hûn benê xwe bi Tevgera Azadiyê û PYD'ê ve girê nedin. Heke hûn bi PYD'ê ve werin girêdan ê alîkariya derve jî ji we re neyê kirin. Li ser vî esasî em dixwazin bêyî ku Tevgera Azadiyê hebe, bi we re alîkariyê bikin. Ji ber vê yekê wan partiyên din hemûyan, bê PYD'ê ji xwe re meclîseke bi navê "Encûmena Niştimanî" ava kirin.

Li ser vî esasî PYD neçar ma wek alternatîf "Meclîsa Gel" ava bike. Lê bi pêşveçûna şoreşê re pêwîstî bi yekîtiyê hat dîtin. Li ser vî esasî hewldan hat dayîn ku her du meclîs bibin yek. Di 2012'an de li Hewlêrê civînek hat çêkirin. Di wê civînê de li ser esasê di navbera her du meclisan de mecliseke têkelhev were çêkirin, destkeftiyên di şoreşê de hatî çêkirin hemû hêz û enerjî tevlî bibe, bi vî awayî Desteya Bilind hat avakirin. Desteya Bilind di navbera ENKS û TEV-DEM'ê de hat çêkirin. Li ser hin madeyên maqûl hatibû avakirin.

***-Lê çima îtîfaqa Desteya Bilind neçû serî, an jî negihîşt armanca xwe?***

Di bingehê wê de hesabên ENKS'ê yên şaş rê li pêşiyê vekir. Yanî çarenûsa xwe yê bi Tirkiyeyê re, çarenûsa xwe yê bi Îtîlafa Sûriyeyê re ku qet ferq û cudahiyên xwe ji rejîmê tinene, çûn tevlî îtîlafê bûn; bi îtîlafê re çûn Cenev. Lê belê yek bêje jî ne di civîna Cenev de, ne jî di rêziknameya îtîlafê de li ser Kurdan tinene. Qet ferqa xwe ji rejîmê tine ye. Lê wan bawer dikir ku ew îtîlaf bi alîkariya Emerîka û Tirkiyeyê di Sûriyeyê de bibe pergal û rejîmê bixin. Li ser wî esasî wan jî digot; "*Wek modela Başûrê Kurdistanê çawa ku piştî destwerdana Emerîka ya li ser Iraqê Mam Celal û Kek Mesud bûn serok û bûn desthilat, em ê jî wisa bibin.*" Digotin; "*dê niha li ser Sûriyeyê destwerdan çêbe, li ser wî esasî wek modela Iraqê dê Hekîm Beşar bibe serokê Rojava û dibe ku Hemîdê Hacî Derwêş jî bibe serokê Sûriyeyê.*"

Ew yekîtiya bi navê Desteya Bilind temenê wê dirêj nebû. Xira kirin. Pir hincet derxistin. Xwe nedan ber barê şoreşê. Ji ber ku ditirsiyan.

Piştî demekê bi taybetî berxwedana ku li Serêkaniyê çêbû, piştre ev berxwedan li hemberî DAÎŞ'ê li Til Koçer, li Hesekê, li Qamîşlo, li Kobanê, li Efrînê êdî gihîşt asteke bilind. Pergala bi navê kantona hatî avakirin ew li pêş bû, careke din wan di vê de hêvî dît, dîsa xwestin werin beşdar bibin. Ji bo vê, berî ku em kantonan ragihînin me bi ENKS'ê re di çerçoveya Desteya Bilind de hevdîtin çêkirin û me plansaziyeke vekirî pêşkêşî wan kir. Me got: "*Binêrin şoreş çêbûye; me bi hev re kir, YPG'ê li ber xwe da, ev nirx derxistin holê, me şehîd dan, lê tişt nabe. Hûn jî werin em ê pergaleke siyasî ji bo Rojava bidin avakirin. Em weke model kantonan pêşniyar dikin; em modela xweseriyê pêşniyar dikin. Dibe ku hûn federesyonê bixwazin; dibe ku hûn konfederesyonê bixwazin, em jê re rêz digirin. Ema werin em li ser hinek rêgezan li hev bikin û em bi hev re pergaleke siyasî ava bikin.*"

Li ser reşnivîsê nîqaş çêbûn. Niha jî ew reşnivîs di destê me de heye. Gelek xalên wê jî pejirandin. Ji bo bi me re tevbigerin wajo kirin. Niha wajoya ENKS'ê li ser wê taslaqê heye.

Di 2013'an de beriya ku em kantonan ragihînin me ji ENKS'ê re got: "Werin em ê bi hev re pergalekê ava bikin." Bi rastî jî me pergaleke demokratîk pêşniyar kiribû. Me got: "Em ê hevbeş çêkin." Yanî ne li ser esasê parvekirinê. Bila vekirîbe. Sî û şeş partiyên siyasî hene. Her partiyeke siyasî ku dixwaze tevlî vê bibe bila were vê reşnivîsê wajo bike. Dê pênc endamên xwe bîne. Ji van endamên ku ji hemû partiyan hatine ku sî û pênc partî hene, tê wê wateyê ku ew ê du sed (200) kes bûna, dê PYD jî bibûna pênc kes.

Davutoğlu, ew kişandin Enqereyê bi wan re hevdîtin çêkir. Reşnivîs li wir hiştin û gotin: *"Em tevlî vê projeyê nabin."* Pirsgirêkek derxistin holê. Ew çi bû? Xwestin artêşeke bi pergal bidin avakirin. Gotin "*Çima YPG heye, YPG ya PYD'ê ye, lewre divê hêzeke me jî hebe.*" Me li ser hemû madeyan li hev kir; me li ser vê madeyê li hev nekir. Ji bo çi? Me ji tecrûbeya Başûrê Kurdistanê ders derxistibû. Heke

Başûrê Kurdistanê îro lewaz e ku wek tê xwestin nabe îrade, di bingeha wê de artêşa her partiyeke siyasî heye.

Me jî ev got; dibe ku di Rojavayê Kurdistanê de pêncî partiyên siyasî hebin, bila bibin desthilat, bila bibin rêveber, bila têkevin hikumetê, lê dê yek artêş hebe. Gotin: "*Pêşmergeyên me hene, hêza me heye*." Me got; "*Ser çavan bila werin. Em ê di bin yek alê de, yek artêşeke Rojavayî çêkin. Bila ev hêz a Rojavayî be. Hêza gel e, ne ya PYD'ê ye, ne ya ENKS'ê ye, ne ya TEV-DEM'ê ye, ya gelê Rojava ye. Gelê Rojava bi hemû pêkhateya xwe; bi Ereban, bi Suryanan, bila her kes beşdar bibe. Bila pêşmergeyên we jî beşdar bibin.*" Gotin: "*Pirsgirêk ev in, ev in.*" Me got; "*Werin ji avanî heta rêveberiyê li wir çêkin. Bila pêşmergeyên we jî werin, hinek kesên leşkerî yên taybet hene em ê ji wan re pergaleke leşkerî ava bikin. Bila alîgirê tu partiyeke siyasî nebe; bila ev hêzeke netewî be; hêzeke çekdar a parastina gel be.*" Ev nepejirandin. Xwestin artêşeke bi redif hebe.

Heta eşkere digotin. Mînak di civînên ku li Hewlêrê çêbûne de, Hekîm Beşar wiha ji hevalan re gotiye. "*Sûleymanî ya YNK ye, Hewlêr jî ya PDK ye. Em jî modeleke wisa pêş bixin. Bila Efrîn û Kobanê ji we re be, bila Cizîr jî ji me re be.*" Her wiha hesabên li ser petrolê hebûn. Niyeta wan, xirap kirin bû. Digotin, "*an hûn ê sûltê bidin me û em ê xêr û berê wir parve bikin; an jî em ê xirab bikin.*" Me jî got, "*xêr û bêrê wir yên gel in, em nikarin parve bikin. Artêşa heyî jî ya gel e û gel diparêze; ger pirsgirekeke we ya parastinê hebe, bên tevlê bibin.*" Gotin, "*bila navê YPG biguhere.*" Me got, "*ew jî ne mişkûleye, bes bila artêş yek be û netewî be.*"

Dema ku ew nîqaş dihatin kirin, nêzikî hezarî şehîdên YPG hebûn. Êdî me weke xeta xwe ya sor diyar kir. Lewra tiştê ku pratîkê diyar kiriye jî ew bû. Yê ku ew gel parast û ser xist YPG bû. Jixwe xeteya esasî ku mûxalefeta Sûriye kir jî, ne yekdestiya di nava Artêşa Azad de bû. Her kesî bi xwe re hêzek derxist, her yek bi dewletekê ve girêdayî bûn. Diketin nava milet û talan dikirin, felsefeyek wan tine bû. Stratejî û tektîke wan ya parastinê tine bû. Hêzeke li ser esasê talanê hatibû avakirin û encamên wê jî diyar in. Ji ber vê me got, "em wê şaştiyê nakin." Her wiha weke Başûr jî me nedikarî bikin. Lewra ber çavan e, ji ber vê pergalê li Başûr ew qesa ciwan hatin qetilkirin.

Gelek derdoran jî ew siyaseta ENKS fêm kirin. Li gorî siyaseta Tirkiye dimeşiya, netewiyetek tine bû. Civakê nedifikirî. Jixwe gelekên wan mal û zarokên xwe revandibûn Ewropa. Ji Ewropa dihatin û bi me re tevlî nîqaşan dibûn. Ji ber vê ew cenabên Osman Sebrî hatin û tevlî me bûn. Yên çep ji wan qûtbûn û tevlî me bûn.

Niha di nava TEV-DEM'ê de şeş partiyên Kurdî hene. Pênc partiyên din re jî di nava îtîfaqê de ne. Li ser vê esasê di nava ENKS'ê de sê hizbên esasî mane. Piştre di nava xwe de yêkitiyek cûda jî çêkirin, lê weke pînekirinê bû. Di wir de jî parçebûn heye. Nexşerêya siyasî ya Rojavayê Kurdistanê bi vî awayî ye.

Yên ku bi TEV-DEM'ê re tevdigerin û pergala kantonan qebûl dikin, donzdeh partiyên Kurdî ne. Yên ENKS jî şeş partî ne. Lê sisêyên wan esas in. Lê van îflas kirin. Lewra PYD xwe îspat kir. Di berxwedana li Rojava hate kirin de her tişt îspat bû. Dîsa bi pergala ku kantonan ava kiriye, civakê hêdî bi hêdî dikşîne nava xwe. Yên ku berê bi van partiyan re tevdigerîn jî, êdî di nava berxwedanê de cih digrin. Lewra tevgereke ew qesa ber xwe da, gel parast û pergaleke demokratîk ava kir heye. Vê tevgerê berjewendiyên civakî dan pêş, di navbera gelan de îtîfaq dan çêkirin.

***-We qala têkiliya di navbera gelan de kir. Di vê serdemê de têkiliyên Kurd û Ereban çawa bûn? Gelê Erebû nunerên wan jî di nava vê bergalê de cihê xwe digirtin?***

Rast e, niha bi dehan eşîrên Ereb tevlî vê pergalê bûne, bi sedan ciwanên Ereb di nava YPG de cihê xwe digrin. Sûryanî û Aşûrî beşdarî vê pergalê bûn, ciwanên wan di nava YPG de cih digrin. Dîsa hêzên Ewropayî, piştî berxwedana Kobanê dîtin ku ew stratejiya tevgera me rast e. Li ser vê esasê ENKS bû qûrbana siyaseta teng ya van partiyan û dervayî vê berxwadanê ma.

Bi salên 1930'î re partiya Şûwayî Sûriye jî hatebû avakirin. Ew partiyeke Kurdî nebû. Her çiqasa zêdetirî endamên xwe Kurd bûn jî, weke partiyekê Sûriye bû. Piştî demekê di salên 70'î de parçe bû û weke dû cenahan lê hat. Li ser cenahekî Xalid Bektaş hebû, li ser cenahekî jî Feysal Yusuf hebû. Di cepheya BAAS de cih girtin.

Ji ber ku alaqatên Rûsya û Sûriyê baş bûn; Rûsya li ser hemû hêzên çepgir yên li Rojhilata Navîn ferz dikir ku li gel rejîma Suriyê tevbigerin. Ew nexweşiyeke çepgiriyê ya Rojhilata Navîn e. Vê hişt ku di êniya BAAS de cih bigrin. Di nava vê êniyê de partiyên Kurd tinebûn. Zêdetir partiyên Kurd, ne fermî bûn. Lê tekiliya wan bi îstîxbarata Sûriye re hebû. Piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî, hizba Şûyî ya Sûriye marjînal bû. Berê jî marjinal bû û nedikarî di bin siya rejîma BAAS de tiştekî bike, lê pişt re pir lewaz bûn. Qismekî wan bi awayekî marjinal hê berdewam dikin. Jixwe Xalid Bektaş mir, hevjîna wî demekê berdewam kir. Niha jî kûrê wî berdewam dike. Tesîreke wê ya li ser siyasetê tine. Di dema şoreşê de jî li gel rêjîmê man. Ji bo vê gelek endamên wê jê qût bûn û bi TEV-DEM'ê re tevgeriyan.

Îxwan-i Mûslîmîn jî piştî Misirê, di salên heştî de li Sûriye derket holê. Li Helep, Hûmûs û Hamayê ku bajarên sûniyan e, li hemberî rejîma BAAS serhildan kirin. Rejîma BAAS jî di salên 81-82'yan de bi awayekî dijwar û hişk li ser wan ve çû. Hinek kûştin, hinek jî bi dehan salan di zindanê de man. Hejmareke kêm jî reviyan û çûn Tirkiye. Vê perçiqandinê jî tirsek ava kir, jixwe piştî wê heya van demên dawî jî hê ji ser xwe ve nehatine. Hê nû li Tirkiye xwe hinek bi tevger dikin. Lê nêzikî bîst salan qet deng ji wan derneket.

Ji ber vê kesî din jî nedikarî di bin navekî siyasî de hizban çêke. Xala din jî, ji ber ku Sûriye alîgira Rûsya bû; fikrên çep li Sûriye zindî man. Dibe ku nebû sûlta û alternatîfek ava nekir, lê ji ber ku tû zext li ser wan tinebûn, xwe parastin.

***-We hinekî behsa Îxwan-î Mûslîmîn kir. Jixwe rejîma Sûrî jî, li ser esasê Elewîtiyê tevdigere. Li Rojavayê Kurdistanê tesîra ol çi bû, di kîjan astê de pêşketinên siyasî tesîr dikirin?***

Li Rojava û Sûriye di nava Kurdan de tarîqata Neqşîbendî bi bandor bû. Lê ji aliyê siyasî zêdetir, milê olî derxist pêş. Vê hişt ku tercîheke cûda ya Kurdan nemîne. Rejime jî nedixwest bi Nexşîbendiyan re bê hemberî hev, Nexşîbendiyan jî dîqat dikir. Ji ber vê jî li hemberî rejîmê alternatîfek derneket holê.

Bi rastî jî Sûriye mozaîka Rojhilata Navîn e. Niha kêmnetew û baweriyên li Rojhilata Navîn hene, li Sûriye jî hene. Sûriye weke modeleke Rojhilata Navîn e. Kurd, Ereb, Aşûrî, Tirkmen, Dûrzî, Sûnî, Elewî, Xirîstiyan hene. Lê di nava van kêmnetewan de tu caran şer çênebû. Rejîma Sûriye her hasas nêzikî van dengeyan bû. Hinek Ereb anîne, di navbera Kurdan de cih kirine, lê wisa di navbera gelan de îxfalek çênebûye. Di dema komkûjiya Qamişlo de îxfalek çêbibû. Lê gelek eşîrên Ereb ku wê demê li gel Kurdan cih girtin hebûn. Jixwe Sûryan û Kurd bindest bûn, Erebên hêremê jî bi çand û têkiliyên Kurdan bandor bûbûn. Nakokî di navbera van gel û rejîmê de çêbibin jî, di navbera gelan de pir zêde nakokî derneketin.

Her wiha kesên li ser navê BAASiyan faşizm meşandine û Kurd pelçiqandine jî hene. Lê felsefeya biratiya gelan ya Rêber Apo, li vê derê fêkiyên xwe dan. Ger li Rojavayê Kurdistanê şerekî mezhebî çênebibe, bingeha xwe ji fikrên Rêber Apo digre. Lewra gelek eşîrên Ereb û Sûryanan jî fikrên Rêber Apo esas digirtin. Li ser vê esasê xwe tevger dikirin. Ji aliyekî ve ji bo provaqasyonê jî vekirî ye, lewra li gelek cihan hejmara Ereban qesî ya Kurdan e. Lê siyasetek şaş nehat meşandin, di fikra Rêber Apo de israr çêbû. Vê yekê nehişt ku provaqasyon û şerek jî di navbera gelan de pêk were.

Ji bo vê qesî Kurdan, Ereb û Sûryaniyên Rojava jî, Şoreşa Rojava weke ya xwe digrin dest. Dibe ku di destpêkê de qesî Kurdan berdel nedabin û bi gûman nêzik bûn. Lewra digotin, "*dema Kurd bibe hêz dê çawa nêzikî me bibe?"* Metirsiyên wan yên bi vî rengî hebûn, lê heya niha di şoreşa me de bûyereke ku dijminahiya gelan pêş bixe çênebûye. Gelek derdoran xwestin vê tehrîk bikin, lê em nehatin tehrîkê û biratiya gelan, fikrên Rêber Apo li ser ketin. Ji ber vê îro Rojava di nava aramiyekê de ye. Jixwe tiştê ku hemû cîhan bi heyranî lê mezî dike jî ew e.

Mesela li Iraqê jî guhertinên şoreşî çêbûn, lê heya niha şerê di navbera Sûnî û Şîa de qet xilas nebûye. Li Rojavayê Kurdistanê ew qesa tehrîk çêbûn, lê ji ber fikra demokratîk ya Rêber Apo her kes dikare xwe îfade bike û tevlî şoreşê bibe. Ji ber vê jî pirsgirekeke bi vî rengî çênebû.

Wêne-4

TEV-DEM û PYD ferqa xwe ji van partî û komikên din nîşan dan. Rêxistineke civakî ye. Tiştê herî esasî ya vê tevgerê jî, tevgera jin ku di nav de cih digre ye. Civak bi tevgera jin hate rêxistinkirin. Dema ku tevgera jinê pêşengtiya şoreşê kir, her tişt aliyê me ve qûlibî. Beriya wê rejîma Sûriye li ser civaka Kurd pir texrîbat çêkiribûn. Piştî hevpeymana Edene ku di navbera Tirkiye û Sûriye de çêbû, konevaniya Sûriye ya li ser Kurdan pir cûda bibû.

Bi taybetî piştî salên 2006'an Sûriye, weke eyaleteke Tirkiye lê hatibû. Erdoxan jî digot, "*em dû dewlet in, lê em yek hikûmet in. Em taşteya xwe li Şamê dikin, firavîna xwe li Helebê dikin û şîva xwe jî li Stenbolê dixwin."* Ango bi hev re li ser gelê Kurd, konevaniyek dan meşandin. Hem ji aliyê siyasî ve zext li ser vîna gelê Kurd dikirin, hem jî ji aliyê civakî ve lîstik dimeşandin. Bi riya medya jî, lîstikên pir dervayî exleq dabûn meşandin.

Bi taybetî di bajarên Kurdan de fûhûş pêşxistin, tiştên hişbirî belav kiribûn. Berê li Rojava tiştên wisa tinebûn. Lê ew salên dawî bi awayekî pergal dihat pêş xistin. Êdî li Rojava bexçeyên heşîşê hebûn, dewletê jî teşwîq dikir. Gelek ciwan jî wisa hatibûn xistin, bê fikir hatibûn hiştin. Gelek rêzefîlmên Tirkan ku civaka Kurd biçûk dixin, di nava ciwanên Rojava de belav kiribûn. Dûblajî Erebî dikirin û li Rojava didan temaşe kirin. Şebekeyeke ajantiyê pir berfireh rêxistin kiribûn.

Bi taybetî ew pergala ajantiyê li ser jinê dimeşandin. Lewra dizanîn ku Tevgera Azadiyê, ji cihê ku ketina Kurdan lê çêbûye girt û ji wir derketinek mezin kir. Jina bê vîn û lewaz, kir hêza herî mezin. Dizanîn ku jin ciwak e. Ger tû jinê bixînê, dê tû civakê dixînê. Hin jin, bi pereyan û bi gelek rêbazên din yên qirêj xistibûn.

Ji ber vê serkeftina TEV-DEM'ê bi rewabûna wê ya civakî ve pir girêdayî ye. Rast e, di dema xwe de pêngavên siyasî jî avetin. Lê tiştê esasî ew rewabûna civakî bû. Li ser esasê azadiyê, jin kir vîn û hêz. Îro di nava YPG û YPJ de, jin li hemberî hovitiyê berxwedaneke mezin dike. Mesela mînaka hevala Arîn Mîrkan heye. Weke wê bi dehan jinên Kurd, di şoreşê de cih digrin û pêşengtiyê dikin. Vê hişt ku ew hêza civakê biqûlibe. Ew potansiyela civakê zivirî vîn û azadiya jinê. Li ser vî esasî bi demê re civak, di hemû aliyan ve hate guhertin. Li ser esasê aboriyê, perwerdê, tevgerên jin û ciwanan; ango ji hemû aliyên sosyolojik ve civak ji nû ve hate avakirin. Ew qirêjî rabû û bingeha civakeke demokratîk hate avetin. Hem ji aliyê berxwedana leşkerî ve, hem jî ji aliyê guhertina civakî ve hêzeke mezin da şoreşê.

Pergala BAASê, li Rojava xwe li ser jin û ciwanan rêxistin kiribû. Sûriye, dewleteke mûhabaretê ye. Bi taybetî jî li Rojava xwe li ser pergala mûxabaratiyê dimeşand. Lewra li Sûriye pêkhateya Elewiyan kêm in û rêveberî di destê wan de ye. Ji ber vê serweriya xwe bi rêbazên xwezayî nedikarî li Sûriye berdewam bike. Tenê bi van rêxistinên îstîxbaratî dikarî xwe rê ve bibe. Baskek bi navê Emîn Dewla, baskek bi navê Emîn Siyasî, baskek bi navê Emîn Eskerî, baskek bi navê Mûxabarat Cewiyê, baskek bi navê Mûxabarat Eskeriye, baskek bi navê Emîn Cînaye hebû. Ango pergaleke îstîxbaratê ku ji jor heya jêr ku di nava civakê de xwe rêxistin kiriye hebû.

Bi şkence mirov pelçiqandibûn û bêdeng kiribûn. Rejîmê ji hizbên siyasî re hûdût diyar kiribûn. Her hefte careke van hizban diçûn û tekmîla xwe didan mûxabaratê. Fermanên xwe jî ji wir digirtin. Dema ku hizbek piçekî xurt bûbûya jî, digot "bibin dû parçe." Pergala hizbên siyasî jî wisa dida meşandin. Yên ku fikreke cûda bigotana jî, diavitin hepsê û şkence li wan dikirin.

Dema ku em li gel Serokatî bûn; malbatek hatibû û bi Serokatî re diaxifiyan. Gotin, "*serokê min, em dixwazin tiştekî bibêjin."* Serokatî jî got, *"bibêjin*." Wan kesan got, "*Serokê min, gelek derdor dibêjin; Tevgera Azadiyê dev ji Rojava berdaye û dibêje 'Kurdên Rojava jixwe ji Bakûr hatine.' Tu vê derheqê de çi dibêjê?"* Serokatî jî got, "*gelek aliyên dewleta Sûriye ji min re dibêjin, 'berî ku tu werê Sûriye, Kurd weke çûkeke di destê me de bûn. Lê bi te re Kurdan jî îtîbar qezenc kiriye.'"*

Bi rastî jî Rojavayê Kurdistanê ji aliyê erdnigariyê ve cihekî biçûk e. Ew texrîbat û nakokiyên ku di nava van partiyên Kurd de çêdibûn, li ser vir bandor dikir. Ji ber vê jî şexsiyeteke bêbandor û parçekirî hebû. Vîn û hêz her ji derva digeriya. Ne tenê li hemberî rejîmê, li hemberî xwe jî hêza wî tinebû. Lewra ew qesa teslîm hatibû girtin. Di xwe de, hêz û vîna derketinekê nedîdît. Her di bin siya hinekan de bû. Jixwe pirsgireka van partiyan jî, rakirina gel ne bû. Her tasarûfa xwe li ser çêdikirin. Xwe bi xwe tatmîn dikirin. Yên ku rewşa wan ya madî zêde be, Rûsya pasaport ji wan re derdixist û dibir wir didan xwendin. Hinek diçûn Hewlêrê, ji xwe re karxane vedikirin, hinek diçûn Ewropa.

Ango hesab û berjewendiyên wisa şexsî di van partiyan de hebûn. Wisa ji bo pêşketineke civakî ew partî venedikirin. Mesela di nava wan de jinek tine bû. Heya vê dawiyê jî di nava nûnerên wan yên

Desteya Bilind de jinek tinebû. Di saziyên me de ji sedî pencî jin hebû, ji ber vê me got, "*divê di nava nûnerên we de jî jin hebin.*" Li ser vê jinek hilbijartin. Jixwe rêxistina xwe jî li ser van sozan didan çêkirin. Digotin, "*em ê we bişînin Ewropa, em ê we bişînin Hewlerê.*" Wisa îddîayeke ku ciwanekî bikin şoreşger, bikin şervan tinebû. Tenê xwe jiyan dikirin. Qarekterekî wisa lewaz û radest bûye hebû.

Dema ku me digot, "*em niha nakevin tevgerê, ger dema wê bê em ê şoreşê bikin.*" Wan digot, "*na, divê em gazî bikin. Da ku Artêşa Azad were û bajarên me rizgar bikin.*" Gelekên wan em sûcdar dikirin. Digotin, "*hûn şoreşê naxwazin.*" Lê me digot, "*em şoreşê dixwazin, lê em ne Kurdên berê ne. Kengê demê wê hat, em ê Şoreşa Rojava pêş bixin.*" Wan jî dixwestin ku ciwanên me tevlî Artêşa Azad bibin û biçin bajarên Ereban şer bikin. Da ku rejîm ket destê wan, mafê Kurdan bidin. Lê Ataturk û Hûmeynî jî wisa gotibû, dema ku deshilatdarî xistin destê xwe Kurd bîr kirin. Dixwestin, heman tiştî li Sûriye jî bikin. Me got, "*devê me ji şîr şewitiye, em pûfî mast dikin û dixun.*"

Lê van partiyan gelek ciwanên Kurd tevlî Artêşa Azad û El Nûsra kirin. Ji me re jî digotin, "*hûn hevalên rejîmê ne û hûn şoreşê naxwazin.*" Lê me jî rêxistinbûna xwe ya civakî û leşkerî ava dikir û xwe amade dikir.

Niha jî li Sûriye hem ji aliyê siyasî ve, hem jî ji aliyê leşkerî ve sê hêz mane. Yek rejîm e; bi alîkariya Rûsya û Îranê xwe li ser piyan digre. Hêzek DAİŞ e. Gelek cihên di destê wan de hene. Hêzek jî TEV-DEM û YPG ye. Yên din nemane. Mesela Artêşa Azad belave bû û çû. Derket holê ku ne xwediyê soza xwe ne û ne rewa ne. Hinekên wan li gel Tirkiye piştgiriyê didin DAİŞ'ê. Li Rojava jî dû-sê heb van partiyên din hene, lê hemû malbat û zarokên xwe derxistine derva û li pêy berjewendiyên xwe ketine. Rejîma heyî jî, ne mayinde ye. Diyar bû ku nêzikatiyeke xwe ya guhertinê tine. Ne li gorî demê ye. Bi awayekî leşkerî û bi zextan li çend bajaran sultaya xwe dimeşîne. DAİŞ, ji çaxa navîn maye. Ne di qada Rojhilata Navîn de, ne jî di qada navnetewî de rewabûneke wan tine ye. Rê û rêbazên wan hovane û paşverû ne. Li ser vê esasî şansê wan tine.

Hêza ku rewa ye û dibêtiya pêşeroja Sûriye ye, TEV-DEM û PYD ye. Dixwaze bi perspektîfa Konseya Sûriyeya Demokratîk, çareseriya Sûriye jî pêk bîne. Ew erka jî ket ser Kurdan û Şoreşa Rojava. Ne ew ketîbên Tirkiye, ne yên Qatar, ne jî yên Siûdiyê mane.

ENKS jî, li Rojava ne hêzeke wisa rêxistinkirî û mûxalîf e. Tenê hinek malbatên wan yên qlasîk hene. Weke alîgirên taraftarên fûtbolê ne. Ew jî li ser berjewendiyên takekesî bi Başûr ve girêdayî ne. An na bi siyasetê ve tû alaqata wan tine. Lewra dervayî şoreşê man. Mesela beriya şoreşa Bolşevîk, li Rûsya gelek partiyên din ku ji Lenîn xurtir hene. Lê dema ku şoreş pêk tê û fedakarî dikin, xwe rêxistin dikin; ji wan partiyên din yek jî namîne. Li Rojava jî civak dibîne ku tu xwînê dirijînê, ked didê, civakê ava dikê, şoreşê mayinde dikê. Lê yên din li pêy hesabên şexsî ketine.

Me ew qesa got, "*dê bên em hilbijartinan çêkin, em rêveberiyên hevpar çêkin.*" Lê nehatin. Lewra ji xwe nebawer in. Ji ber vê di demên nêzik de, ez van derdoran di siyaseta Rojava de weke hêmaneke nabînim. Jixwe li ser esasê netewa demokratîk, konfedaralîzma demokratîk pergalek pêş bikeve û teqez bibe, altarnetîfeke din jî nikare pêş bikeve. Dibe ku hin hêzên navnetewî hê jî me weke terorîst dibînin, lê alternetîfeke wan ya cûda tine. Rûsya jî hez nakin, lê neçar dimînin ku pê re têkiliyan daynin. Jixwe îtîraf jî dikin.

Mesela li Iraqê hemû hêzên rejîmê û peşmerge kom dibin; ew qasa çekên giran didin wan û teyare alîkariya wan dikin, lê nikarin DAİŞ'ê ji bajarekî derbixin. Lê YPG ne wisa ye. Tevahî ku xwediyê îmkanên kêm e, lê YPG kûder xwestiye, ew der ji DAİŞ girtiye. Ew rista YPG, PYD û TEV-DEM'ê diyar dike. Xeynî vê bibêjin, *"dê em ê DAİŞ'ê re tevbigerin û em bi we re têkiliyan danaynin.*" Ew dizanin. Mesela heya dûh li Cenevê heya ber derî jî em çûn; lê qet em guhdar jî nekirin, lê niha gelek wezîr û serokwezîrên dewletan dixwazin bi me re rûnin, sedema vê çi ye? Niha di qesran de serokên PYD pêşwazî dikin. Vîna gel xwe li cîhanê da qebûl kirin. Vîna gel ku li Kobanê û Serekaniyê derketiye, xwe da qebûl kirin. Ne ku Ewropa û Emerîka pir li me hez dike; lê raya demokratîk û vîna gel zextê li ser wan çêdike, neçar dimînin ku me nas bikin.

Niha li Rojava, fikrekeke ku ji ya Rêber Apo pêşketîtir û di nava gel de dibe alternatîf tine. Ji vê jî wêdatir, fikra Rêber Apo ji hemû Sûriye û Rojhilata Navîn alternatîf û çareseriyeke datîne holê. Xeynî vê hêzeke ku bibe alternatîfa civakê tine. Jixwe ew hêzên ENKS xwe weke mûxalîf jî nabînin. Di nazara gel de jî tû risteke wan tine. Bi giştî rewş û nexşereya siyasî ya Rojava em dikarin wisa binirxînin.

*Nexşere-2

**Barana ku li gel tîrêjên ewil yên rojê hûr hûr dibare dibe hevala me ya rê. Diyare barana ku êvar ve dibare ax têr kiriye, lewma kortikên di nava rê de tijî av bûne. Ev jî leza maşînaya ku em tê de ne dexîne. Lê ew dereng çûyina maşîneya me, ji bo amadekariya hevpeyvîneke din demeke berfireh ji bo me derdixîne holê. Li gel amadekariyên hevpeyvînê ku em di nava maşîneyê de dikin, M. Emîn bêyî ku bêhna wî teng bibe her camên maşînê paqij dike û dîmenên xwezayî yên derva temaşe dike, ez jî bi heman awayî bi kameraya xwe ya destan dîmenên detay dikşînim. Avantaja me ya herî mezin jî Rûstemê ku ji me re bûye hevalê rê û di heman demê de maşîneyê diajo ye. Bêyî ku em bipirsin, zanîn û bihîstinên xwe bi me re parve dike. Ji navê wan bigre heya dîroka wan a nêzik hemû gundên ku em tê re derbas dibin, yek bi yek ji me dide nasîn.*

*Her bajarok û gund bi peyvên "Gir" û "Til" destêpê dike, em weke mijareke balkeş vê yekê jî weke nîşeyeke li qûncikê lenûska xwe dinivisînin. Dema ku em di navbera xwe de nîqaşa vê yekê dikin, Rûstem careke din hûnera xwe nîşanî me dide:*

*Dibêje, "di dema dagirkeriya Fransayê de, li her gundekî girekî çêdikin. Her girek weke ku girê gundê dîtir bibîne tên avakirin. Dixwazin di navbera gundan de bi rêka van giran têkiliyê daynin. Bi vî awayî ji seriyekî heya seriyê din dikarin têkilî daynin." Weke ku bixwaze pergala li wê derê tê înşakirin bi me bide nasîn dibêje, "niha jî her gundek parastina xwe û meclîsa xwe rêxistin dike."*

*Di rêvitiya xwe de em dibînin ku di ketin û derketina hemû gund û bajarokan de cihên qontrolê yên YPG'ê hene. Di hinekan de maşîneya ku em lê siwarin tê sekinandin, lê dema fêm dikin ku em rojnamevan in, ji bo rêvîtiya me ti astengiyan dernaxînin. Lê di mijara ewlehiyê de em têra xwe semîneran digrin. Di nava bajaran de jî maşîneyên asayişê digerin. Piştî ku em ji cihekî din yên qontrolê derbas dikin, Rûstem axaftina xwe didomîne;*

*"Cemîl Kobanê... yek ji fermandarên YPG'ê ye. Li çar aliyên Kurdistanê jî di nava têkoşînê de cih girtiye. Ji ber vê yekê di asteke mezin de danehevên leşkerî kom kirine. Hevalekî ji Kobanê ye, ji destpêka Şoreşa Rojava ve jî di nava têkoşînê de cih digre. Her wiha di şerên ku hersê kantonan de pêşketine de jî cihê xwe girtiye." Piştî van gotinên Rûstem, em rûyê hev û din dinêrin... ji bo hevpeyvîneke nû, hemû taybetmendiyên ku em lêdigerin jî di nava gotinên Rûstem de derbas dibin...*

*Dema ku maşîneya me li ber baregeheke leşkerî disekine, bêyî ku Rûstem ji me bide nasîn em fêm dikin ku ew kesê ku em lêdigerin li vir e. Em silavê didin şervanên YPG'ê ku îçtîmaya xwe dawî dikin û ji bo hevpeyvînê li gel Cemîl Kobanê qûncikekî bêdeng dibînin û dest bi karê xwe dikin.*

***-We jî nakokî û hevsengiyên li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê ji nêz ve şopandine. Dewleta Sûriye li ser kîjan esasan hate avakirin û konevaniyên wê yên li ser Kurdan û Rojavayê Kurdistanê çi bûn?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Kurdên Rojava, piştî peymana Lozanê ku ji milê hêzên navnetewî ve hat çêkirin, ketin bin serweriya hêzên biyanî. Hêzên navnetewî, piştî şerê Cîhanê yê Yekemîn xwestin li Rojhilata Navîn xwe bikin hêz û ji milê aborî, çandî, siyasî û civakî ve berjewendiyên xwe li vê qadê bidin meşandin. Xwestin Rojhilata Navîn, ji xwe re bikin qadeke dagirkirinê û dewlemendiyên vê erdnigariyê ji xwe re bigrin.

Bi taybetî konevaniyên Îngîlîz, Fransiz û dewletên ku îro jî tinehesibandin û îmhayê dimeşînin, li Rojhilata Navîn hin hevsengî avakirin. Di peymana Lozanê de bîryar hat girtin ku Kurdistanê bixin çar parçayan. Li gorî berjewendiyên xwe Kurdistan ji bin serweriya Osmaniyan derxistin û kirin çar parçe. Ji bo ku deshilatdariya xwe teqûz bikin û berjewendiyên xwe bimeşînin, li her parçeyekî jî li gorî xwe kar kirin. Ji ber ku wê demê heza serdest ya herêmê Osmanî bûn, ji bo ku Osmaniyan lewaz bikin û

konevaniyên xwe yên Kurdistan, Iraq û Sûriye bikaribin pêk bînin, dîsa Kurd ajotin pêş. Xwestin wan serhildan û berxwedanên Kurdan jî wisa kar bînin.

Rojavayê Kurdistanê jî di encama van peyman û konevaniyan de ji Kurdistanê qût bû. Sînor xistin navbera Rojavayê Kurdistanê-Sûriye û Bakûrê Kurdistanê-Tirkiye. Rojavayê Kurdistanê jî wê demê ket bin deshilatdariya Sûriye û Fransa. Heya şerê Cîhanê yê Duyemîn jî Sûriye û Rojavayê Kurdistanê di bin dagirkeriya Fransa de bû û hemû konevaniyên dagirkirin û tepisandinê yên rojane Fransa dimeşandin. Her çiqasa van hêzên hegemon wê demê li ser navê azadiya netew û miletan diaxifin jî, ji bo gelê Kurd û gelên Rojavayê Kurdistanê tiştekî şênber ku pêk aniye tine ye. Piştî 1946'an rêveberiya Sûriye, cara yekemîn dikeve bin serweriya Sûriye bi xwe.

Dema ku Sûriye ji Osmaniyan qût dibe, giştî serhejmara Sûriye 8 milyon e. Bi Kurd, Ereb, Ermenî, Aşûrî, Tirkmen, Dûrzî, Suryanî û Elewiyên ve hejmara giştî ew qes e. Navê wê jî weke *"Komara Ereb ya Sûriye"* diyar dikin. Mirov dikare bibêje Sûriye, ji milê netewan ve jî dewlemend e. Di avabûna Sûriye de, cara yekemîn Mîşhel Alfak deshilatadiriyê digre. Deshilatdariya xwe îlan dike û dixwaze hûkmê Sûriyeyê rê ve bibe.

Heya salên 1957'an li Sûriye rêveberiyeke ku bikaribe bi însîyatîfa xwe tevbigere, pirsgirekên gelê xwe çareser bike tine ye. Sûriye jî feraseta netewe devletê girtibû û li gorî wê dixwest sînorên xwe û welatekî xwe ava bike. Di wê serdemê de rêveberiya heyî, rêveberiya herî lewaz e. Gelek nakokî û pevçûnên navxweyî jî hene.

Piştî 1957'an li ser Sûriye jî bandora Cemal Abdul Nasir heye. Cemal Abdul Nasir, li hemberî parçekirina Ereban weke bertekekê derket holê. Bi dirûşmaya "*yekîtiya xakên Rojhilata Navîn, yekîtiya Ereban"* têkoşînê dimeşîne. Sûriye jî bi Cemal Abdul Nasir re îtîfaqê dike. Wê demê Libnan jî di bin serweriya wî de bû. Jixwe Ûrdûn bi serê xwe bû. Fîlîstîn, li gel Îsraîlê di nava nakokî û aloziyan de bû. Cemal Abdulnasir bi girtina cihoka Sûweyşê, li hemberî dewletên deshilatdar rizgarî û serxwebûna xwe îlan dike. Bi vî awayî dixwaze axa hemû Ereban jî bixe yek. Li ser vê bingehê, îtîfaqa Sûriye çêkir û Sûriye bi xwe ve girêda.

Piştî wê heya sala 1963'yan ew îttîfak berdewam dike. Di 1963'yan de ew dewletên Ereb, cara yekemîn êrîşî dewleta Îsraîlê dikin. Armanc ji holê rakirina Îsraîlê bû. Lê ser nakevin û belav dibin. Dema ku Îsraîl, bersiveke tûnd û tûj dide wan, careke dîtîr îttîfaqa van dewletan xirab dibe û Sûriye cereke dîtîr dizivire hûndirê xwe. Di şêwegirtina Sûriyeya îro de rista partiya BAAS pir zêde ye.

### Siyaseta Xeta Sor

***-Pir balkêş e, ji milê şêwegirtin û avabûna ve dewletên ku li ser Kurdistanê dagirkerin pir dişibin hev û din. Di Tirkiye de jî Mustafa Kemal û Îtihat Teraqî risteke wisa dîlîze. Dîsa li Îranê di dema Riza Şah de pêşketinên bi vî rengî hene. Di konevaniyên li ser Kurdan meşandine de gelo şibandin hene?***

Belê, çawa ku di nava dewleta Tirkiyê de Îttihat û Terakî heye û her şêwe dide dewleta Tirkiye, di nava Sûriye de jî hizba BAAS heye û hêdî bi hêdî xwe rêxistin dike. Her wiha dewleta Tirkiyê jî piştgirî dide Sûriye ku ji Misirê qût bibe û bibe netew dewleteke serbixwe. Di navbera wan de îtîfaq û têkilî jî hene. Bi peymanan Sûriyeyê, ji Misirê qût dike. Piştî qûtbûna ji Misirê, di nava Sûriyeyê de careke dîtir nûbûn û zindîbûnek destpê dike. Ji nû ve avabûnek çêdibe.

Di heman demê de li ser Kurdan jî konevaniyên taybet tên pêş xistin. Ew konevaniyên ku Îttihat û Terakî li Bakûrê Kurdistanê dane meşandin, li Sûriye jî dest pê dikin. Bi taybetî li ser Kurdan konevaniyên Sûriye û Tirkiye, pir dişibin hev û din. Lî hemberî Kurdên Rojava jî konevaniyeke tinehesibandin û îmhayê dest pê dike. Di encama peymana *'Xeta Sor'* de hewl didin ku Kurdên li ser sînor ji sînor dûr bixin, eşîrên Ereban bikin navbera wan û Kurdan ji cewhera wan dûr bixin. Lê ew îtîfaqa Tirk û Sûriye bi giştî pêk naye. Hêza dewleta Sûriye têra vê konevaniyê nake. Lewra divê ji Efrînê heya Dêrîka Hemko li ser hemû sînor ew konevanî pêk anîbana.

Dema ku dewleta Sûriye nikare vî tiştî bike, bi nêzikatiyên cudatir dixwaze armancên xwe pêk bîne. Bi şêwaz û ûslûbekî nermtir vî karî dikin. Li ser ava Firatê gelek bendavan çêdikin, gundên Ere-

ban di bin de dihêlin û wan koçberî xaka Rojavayê Kurdistanê dikin. Bi taybetî xakên herî zêde dewlemendin û berhem didin, dan wan Ereban. Bi taybetî li herêmê Cizîrê, ew Ereb bi cih kirin. Ax û milkê gelek gundên Kurdan, bi vî awayî desteser dikin. Ew nêzikbûn li Rojavayê Kurdistanê, êdî dibe şêwazeke îmha û tinehesibandina Kurdan.

***-Siyaseta dewletê ku we bal kişande ser, gelo tenê bi wan ve sînordar e?***

Bêguman ne wiha ye**.** Destpêkirina van konevaniyên îmha û tasfiyê jî, bi bûyera şewitandina sînemaya Amûdê destpê kir. Di wê derê de gelek zarok û rewşenbîrên Kurd şewitandin. Îstîxbarata wê rojê ew tespît kiribû, gotibû "*divê em vî gelî bi awayekî tasfiyê bikin. An na potansiyeleke wan ya serxwebûnê heye, potansiyeleke ku pergala me qebûl neke heye. Dê pêşerojê de li ser me bibe xeterî.*" Raporek wisa ya îstîxbaratî nivîsandibûn. Piştî raporên bi vî rengî û îttîfaqa bi Tirkiyê ve, hewldan û lêgerînên gelê Rojavayê Kurdistanê ji giştî Kurdistanê qût kirinê dest pê dikin. Lewra di navbera gelê Rojavayê Kurdistanê û gelê Bakûrê Kurdistanê de têkiliyeke xurt heye.

Şoreşên ku li Bakûrê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê tên jiyankirin, li ser Rojavayê Kurdistanê jî bandor dike. Piştgiriya wan kirin, xurtkirin û tevlêbûna wan şoreşan heye. Her çiqasa li Rojavayê Kurdistanê, tevgereke şênber ya serhildanê çênebe jî, Rojavayê Kurdistanê her dem bûye wargeha van şoreşên Bakûrê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê. Ji bo xurtkirin û tevlêbûna van serhildanan, li Rojavayê Kurdistanê gelek hewldan hatine nîşan dayin.

Fikir û hestekî welatparêz jî her zindî maye. Vê yekê têkoşîneke giştî ya Kurdistanê jî li Rojavayê Kurdistanê pêş dixist. Ew tişt jî dibin sedem ku raporên îstîxbarî yên ku me mînaka wê da, êdî derbikevin holê û konevaniyeke berfireh ya înkar û îmhayê destpê bike. Bi komkûjiya Sînemaya Amûdê ya 61'an jî êdî vê yekê bi awayekî şênber derdixe holê.

Konevaniya yekemîn, bi hejmareke zêde Ereb anîn û li Rojavayê Kurdistanê cih kirin bû. Konevaniya duyemîn jî bi hejmareke zêde li Rojavayê Kurdistanê medreseyan vedikin, da ku bikaribin bişavtinê ser bixin. Bi riya medreseyan Kurdan bielimînin  zimanê Erebî û wan marjînal dikin. Ya seyemîn di Rojava de projeyên aborî pêş nexistin bû. Ji çandîniyê bigre, her cureyên dewlemendiyê di xaka Rojava de hebûn. Lê ji bo ku berê gelê Rojavayê Kurdistanê her bidin derva projeyên aborî nehatin pêş xistin. Ya çaremîn herêma Cizîrê ji bo ku bikin bin dagirkeriya xwe weke qadeke leşkerî girtin dest.

Ji ber vê yekê niha jî herêma Cizîrê weke qadeke leşkerî ya dewleta Sûriye ye. Ji ber ku madeyên weke petrolê yên bin erdê hebûn û rihekî xurt yê welatparêziyê hebû, kirin qadeke leşkerî. Pergala xwe ya leşkerî di wê herêmê de avakirin û bi demê re jî xurtir kirin.

Konevaniyeke din jî Kurd xistin sê beşan. Hinek xistine hemwelatiyên Sûriyeyê, bi vî rengî wan qebûl dikin û li gorî wê siyasetekê dimeşînin. Bi taybetî li Kobanê û Efrînê ew yek hat pêşxistin. Li Cizîrê beşeke kêm kirin hemwelatî; beşek kirin mûhacîr, ango weke ku ji derva hatine hesibandin; beşek jî weke mektûm girtin dest, ango weke kesên qaçax girtin dest. Ew beşa seyemîn, ne hemwelatî ne, ne muhacîr in. Ango di fermiyetê de ew kes tine ne. Bê destura dewletê hatine wê herêmê. Ew kesan li ku bên dîtin, dewlet dikare li hemberî wan her cureyê konevaniyê bimeşîne.

Ew tişt jî didin diyarkirin ku siyaseta hêzên navnetewî yên weke Fransa û Îngîlîstan, dewletên statûkoperest yên weke Tirkiye û Sûriye li ser gelê Rojavayê Kurdistanê çiqasa bi plan û amadekirî ye. Her tiştî radixe ber çavan. Ji salên 50'î şûnve li ser gelê Kurd her ew siyaseta dihat ferzkirin. Ew nêzikbûnên wan heya roja îro jî didomin. Tiştekî ku Kurd pê hebûna xwe îspat bikin, çand û zimana xwe pê bimeşînin, pê debara xwe bikin ji holê nehiştine. Her di bin tepisandinekê de hiştine, her birçî hiştine. Da ku berê xwe bidin koçberiyê û mûhtacî dewletê bibin. Kurdên me ku îro li Şam û Helebê û bajarên din yên Sûriye bi cih bûne, ji ber van siyasetan e. Ji bo ku bikaribin debara xwe bikin û hebûna xwe bikaribin berdewam bikin, koçberî van bajaran dibin û li wan deran her karî dikin. Ji ber ku di axa wan de tiştek nehiliştine, tiştek ava nekirine, gelê Kurd jî berê xwe dide cihên dîtir. Hemû jî weke karker di van bajaran de cih dibin û karê herî zehmet dikin.

Pergala xwendinê jî li gorî wê siyasetê hatibû çêkirin. Di destpêkê de bi medreseyên ku li Rojavayê Kurdistanê ava kiribûn, ew zarok û ciwan rastî bişavtinê dihatin. Konevaniyê Erebkirinê li ser wan dimeşandin. Piştî ku 9 salan ew medrese xilas kirin, ji bo ku pêşerojekê xwe re ava bikin û bibin tiştek, divê di destpêkê de bûbana ajanên dewletê. Divê biketana nav ew pergala sîxûrtiyê ya Sûri-

yeyê. Rejîma BAAS pergaleke wisa dabû avakirin ku ger kesek dixwzae bixwîne, divê bi awayekî pergal agahiyan bide devletê. Divê her hefte biça gund, an jî bajarê xwe, li wê derê çi diqewime raporek binivîsanda. Da ku bikaribe xwendina xwe berdewam bike.

***-Wê demê jî li gorî herêman li Rojavayê Kurdistanê konevaniyên cuda dihatin pêşxistin, an li ser hemû Kurdan yek konevaniyê dimeşandin?***

Nêzikatiyên giştî li ser Kurdan hebûn. Dervayî vê li Efrîn, Kobanê û Cizîrê, li gorî her herêmekê tiştekî cudatir didan şixûlandin. Mesela li Kobanê nakokiyên eşîrî pir kar anîn. Ji bo ku yekîtîyeke xurt çênebe, her eşîr dixistin nava nakokiyan û bera hev didan. Her ew nakokî dikirin xizmeta xwe û heya dawiyê jî didan şixûlandin. Gelê Kobanê jî pir koçber bûbû. Mesela gundên Kurdan yên herêma Babê bi piranî ji Kobanê koçber bûne.

Efrîn jî herêmeke ku zêdetir hatibû bişavtin. Li wir wan neteweyên din yên weke Ermeniyan jî kar dianîn, marjînal dikirin û dixwestin ji cewhera wê derbixin. Li ser Efrînê, bandora pergala rejîmên Tirkiye û Sûriye pir heye. Bi taybetî di nav di ciwanên Efrîn*ê de* ew pergal di asteke de xwe ferz kiribû. Xwendina medreseyan, ferzkirinên rejîmê qebûlkirin û li bajarên dîtir yên Sûriye xwendin çêbûye.

Bi vî rengî heya salên 1970'î devleta Sûriye, siyaseta xwe ya li ser Kurdan çêkiribû û dabû rûniştkandin. Ji her alî ve dida meşandin û li ser gel ferz dikir. Li Bakûrê Kurdistanê ew siyaset piştî 1925'an destpê dike, li Sûriye jî piştî 1946'an gav bi gav heman siyaset dikeve meriyetê. Di sala 73'yan de bi hatina Esad û bi şerê li hemberî Îsraîlê hatiye kirin, rejîma BAAS serweriya xwe îlan dike. Hêz û siyaseta wan bi awayekî giştî derdikeve holê. Rejîma BAAS çawa derket? Dewleta Sûriye, di salên 60'î de şerê Îsraîlê kir, lê binketin jiyan kir. Hin cihên di destê xwe de jî winda kirin. Lê di şerê 73'yan de Sûriye hin cihên winda kirine, dîsa girtin.

Her wiha piştî salên 73'yan fikrê sosyalîzmê pêş diket, Hizba BAAS êdî deshilatdariya xwe xurt kiribû û netewe dewleta xwe ava kiribû. Di vê navberê de di bin navê sosyalîzmê de gelek hizbên şoreşger derdikevin. Piştî şerê Cîhanê yê yekemîn û duyemîn, Sovyet jî li cîhanê bi nav û deng dibû û tesîra xwe li ser Sûriye jî dikir. Bi vî awayî gelek hizbên komînîst û sosyalîst pêş ketin. Ji welatên Ereban jî gelek xwendekaran diçû li Rûsya dixwendin û dema ku dihatin dixwestin heman pergalê li welatên xwe jî bidin avakirin. Lê yên ku Sûriye xwestin vê yekê bikin, li gorî rewşa Sûriye girtin dest û li gorî rêgezên hizba BAAS rê ve çûn.

Gelên cudatir yên Sûriye hebûn, pirsgirek jiyan dikirin. Cihê ku di pratîkê de ji van pirsgirekan re bibin bersiv, her ser girtin. Hewldanên bi vî rengî hebin jî, di dema avakirinê de çêbû û di asta xwestekê de ma. Van hizbên komînîst, nedixwestin zirareke cîdî bidin dewletê. Ji ber vê yekê di çareserkirana pirsgirekên gelan de û avakirina pergaleke alternatîf de, kêm man.

Li Rojavayê Kurdistanê jî gelek partî hatin avakirin. Hemû jî bi navê sosyalîzm û komînîzmê bûn. Lê ji ber ku nikarîn ji nava pergala dewletê derkevin û hin gavan biavêjin nikarîn tiştekî bikin. Her çiqasa bangawaziyên wan çêdibûn jî, li hemberî dewletê nedikarîn têkoşîneke xurt bidin. Çi bikirana bi rêka dewletê dikirin. Li gorî qanûnên hizba BAAS diçûn. Dewletê jî li gorî feraset û qanûnên xwe tiştên ku dixwestin pêk dianîn, tiştên ku nedixwestin pêk nedianîn.

Bi vî awayî ew hizbên demokrat û sosyalîst hemû bûn dûvikên rejîma BAAS. Jixwe gelek şiyar û dirûşmeyên demokratîk yên Hizba BAAS jî hebûn. Bandora Sovyetan jî li ser hebû. Lê tu hizban jî nekarî li Sûriye reform û guhertineke bingehîn bide çêkirin. Piştî wê tevgerên olî pêş ketin. Dîtin ku ew rewşa heyî xurt nabe, di bin navê ol de tevger çêbûn.

Mesela ji wan tevgeran yek jî Îxvan-î Mûslîmîn bû. Di sala 1980'î de Hama li hemberî rejîmê serî rakir. Bingeheke wan çêbûbû. Lewra her çiqasa rejîma heye, bi dirûşmaya sosyalîzmê tevbigere jî ji pirsgirekên gel û civakê re nedibû bersiv. Çinayetî dihat jiyankirin, pirsgirekên ol û netewan hebûn, binpêkirina mafan hebû. Ji ber vê yekê gelek êş û azar dihatin kişandin. Ji ber vê yekê jî tevgera Îxvan-î Mûslîmîn bi awayekî xurt derket holê û li hemberî pergalê serî rakir. Lê dewleta Sûriyeyê bi awayekî komkûjiyan çû ser wan.

Gotin, *"em ê Hama ji nexşereyê derbixin."* Dehan teyare rakirin û li Hama xistin. Bajar bi erdê ve kirin yek. Yên mirin jixwe mirin, yên mayî koçber bûn. Dewletê xwest hovaniyeke wisa nîşan bide, da

ku careke dîtir li hemberî wan serîrakirinek çênebe. Ji ber vê yekê wisa dijwar çû ser wan û komkûjî pêk anîn.

***-Ger wisa be, tesîra van guhertin û pêşketinan li ser rewşa siyasî ya Rojava tesîreke çawa kir? Ya duyemîn, di vê demê de rêxistinbûna gelê Kurd çawa bû?***

Piştî ku BAAS deslihatdariya xwe teqûz kir û Hafiz Esad hat ser deshilatdariyê, bandor li ser rewşa Kurdan jî kir. Her çiqasa weke parçeynê dîtir yên Kurdistanê qirkirina fîzîkî çênebibe jî, bi siyaseteke nerm dixwestin Kurdan bixin nava xwe û bidin meşandin. Siyaseteke marjînalkirinê dihat meşandin û bi ziman û çand xistina Kurdan ya nava pergalê çêbûn.

Piştî hatina Hafiz Esad têkoşîneke gelê Rojavayê Kurdistanê li hemberî dewletê pêş neketiye. Ji ber wan siyasetên zirav e. Wisa serî rakirin û mafên mîsoger xwestin tine bû. Êdî qebûlkirinek hebû. Bi vî rengî tenê jiyana xwe ya fîzîkî dimeşandin. Heya salên 1980'î wisa bû. Digotin, "*ger em tehrîkên siyasî li hemberî dewletê nekin, em dikarin jiyana xwe bidomînin."*

## Li Rojava Pêşketina Felsefeya Apogeriyê

Piştî sala 80'î fikra şoreşgerî û Apogeriyê li ser Rojavayê Kurdistanê û Sûriye bandor kir. Bi taybetî derbasbûna Rêber Apo ya Sûriye, careke din rihê şoreşê û rihê welatparêziyê pêş ket. Careke dîtir ew pergala netewiyetê pêş ket. Rêbertî ew siyaseta ku li ser gelê Sûriye dihat meşandin baş dizanî û li gorî vê li hemberî dewleta Sûriye siyasetek dida meşandin.

Esasekê xebat û têkoşîna Serokatî, li ser esasê xurtkirin û meşandina şoreşa Bakûrê Kurdistanê bû. Lê tiştê herî wate jî, di nava giştî gelê Kurd de rihê welatparêzî û têkoşîna hebûnê dida meşandin. Ji vî milî ve di Kurdên Sûriyeyê de jî baweriyek ava kir. Êdî qûwet û baweriyeke Kurdên Rojava jî, bi vê têkoşînê pêş ket. Bêyî ku tu cihên dîtir hêvî bikin, êdî dikarîn xwe bi xwe pergala xwe ava bikin. Bi vî awayî xebat û seferberiyek çêbû.

Li ser vê esasê di salên 80-90'î de Kurdên Rojava, ji milê siyasî, çandî, civakî ve dikarîn bi xwe hin tiştan pêş bixin. Jixwe piştî salên 85'an bi awayekî pratîkî tevlîbûna şoreşa Tevgera Azadiyê jî bûn. Ji milekî ve beşdarbûna şoreşê çêdibû, ji milê din ve jî zanebûneke siyasî ku li hemberî devleta Sûriye bihata karanîn çêdibû. Di bin navê alîkarî kirinê de, di bin navê xebat û karên şoreşê de cara yekemîn gelê Kurd dihat gel hev û kombûyinek çêdibû. Bi civîn û nîqaşan gelek hewldan nîşan didan.

Piştî hatine Serokatî, êdî cejnên netewî yên Kurdî li Rojavayê Kurdistanê dihatin pîrozkirin. Gel remz û nirxên xwe yên netewî xwedî derdiket. Bi taybetî xebatên çandî, bi komên hûner û çandê, bi mûzîkê, bi şanoyê pêş diketin. Lê van xebatan hemûyan kombûyin çêdikirin. Van xebatan ji bo netewiyetê bingeha xwe rêxistinkirinê, hebûna xwe diyar kirinê, bingeha zîhniyet û fikrê rihê Kurdiniyê ava dikirin. Hebûna xwe wisa îfade dikirin û dimeşandin. Rêber Apo ew yek pêş xist.

Li ser van xebatan bingeheke ku gelê Rojavayê Kurdistanê, êdî bikaribe xwe bi xwe rê ve bibe, bibe xwedî vînekê, bibe xwedî rêxistin û siyasetekê hate avakirin. Ew hemû ked û hewldanên Rêber Apo yên 20 salan çêbûn. Xebatên ku Serokatî li wê derê dikirin, ne tenê ji bo şoreşa Bakûrê Kurdistanê bû, di heman demê de ji bo Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bû.

Jixwe hemû xebatên Rojava re jî Rêber Apo eleqedar dibû. Ji gel re civîn dardixistin, sohbet dikirin. Gelek kadro dikşandin û perwerde dikirin, welatparêzan re civîn çêdikirin, nîqaş dikirin. Nerînên wan digirtin, pêşniyar digirtin. Bi gel re her di nava danûstandinekê de bû. Serokatî bi xwe li ser van xebatan disekinî. Pirsgirekên civakê çareser dikirin, pirsgirekên eşîrî ji holê radikirin û hewl dida ku di nava Kurdên Rojava de yekîtiyekê çêbike. Ji holê rakirina rê û rêbazên ew siyaseta ku dewletê li ser gel ava kiriye, digeriya. Kadroyên herî zîrek û xwedî ezmûn, dişandin cem gelê Rojava û wan kadroyan jî xebateke kûr dimeşandin.

Heya dawiya salên 90'î van xebatan her pêş ve çûn. Hatina Rêber Apo ya Rojava ji bo gelê Rojava bû qûvet û heyecanek çêkir. Her roja ku derbas dibû jî ew tişt baştir dihat fêmkirin û li derdora Rêber Apo kombûyinek çêdibû. Ew gelê ku jiyana bindestî û koletiyê, siyaseta îmha û înkarê ya rejîma BAAS qebûl kiribû; careke dîtir bi ser xwe ve hat, rêka rizgarbûn û qûtbûna wê pergalê dîtin. Dema ku di

encamên xebatên Rêber Apo de, gelê Rojava ew rastî dîtin, di wan de girêdanbûneke xurt çêbû. Dîtin ku yê fikir, ziman, çand, zanistî dide Rêber Apo ye.

Bi wê baweriyê her malbateke Rojava, herî kêm zarokekî/ê xwe tevlî şoreşê kir. Zarokên xwe bi destê xwe dianîn û radestî Serokatî dikirin. Dayina zarokên xwe, bersiva dayinên Serokatî ji gel re bûn. Kes, an jî malbatên ku zarokên wan ne di nava şoreşê de be, şerm dikirin. Ji wan re weke eybekê bû. Kesên wisa ji welatparêzî û berxwedanê dûr dihatin destgirtin. Di nava gel de jî bi çavekî biçûk û sûcwarî li xwe mezî dikirin. Di nava gel de nedikarîn serbilindî biaxifin.

Berê jî hin pîvan hebûn, gelekan digot *"ez serokeşîr im, ez sosyalîst im, ez xwedan partî me."* Lê li hemberî rastiya Serokatiyê ew pîvan bin ketin. Lewra rastiya şoreşê, têkoşînê û berxwedanê Rêber Apo nîşan dida. Ger şoreş pêwîst be, divê her kes tevlî şoreşê bûbûya. Lê yên ku nedixwestin tevlî xebatên şoreşê bibin û dixwestin xwe bidin jiyankirin, pir tengav dibûn. Lewra pratîka her tiştî li holê bû. Van kesan ji bo ku bibêjin, *"vaye em jî welatparêz in, em jî têkoşînê dimeşînin. Lê şêwazên me cuda ne"* tevlî van partiyên yên komên piçuk dibûn. Jixwe wê derê jî têkoşîn û xebatek tine bû. Di pratîkê de tevlêbûna têkoşînê bûbû pîvanek. Yên ku şoreş dixwestin divê beşdarî şoreşê bûbûya, can bida, xwîn bida, berdel bida. Ger ew tişt nekiribana nedikarîn bibêjin, em welatparêz in. Di nava civaka Kurd de pîvaneke wisa çêbûbû.

Ew pîvan heya roja me jî xwe diparêze. Yên ku dibêjin, em ji bo şoreşê hene, divê bi mal û canê xwe bi tevahî hebin. Yên tinebin jî, jixwe bi awayekî zelal tine ne. Lê van komikên din dixwestin di van pîvanan de şîlîbûnê ava bikin. Têkoşîna Rojavayê Kurdistanê heya salên 2000'î jî bi vê şêwazê hat meşandin. Ew têkoşîna ku Serokatî li hemberî dewleta Sûriye meşand, bi xwe re gelek fersend derxistin. Bingeheke têkoşînê çêbû. Tevger û rêxistinbûnek çêbû. Gelek kesan ji vê zemînê sûd wergirtin.

Gelek kesên ku nedixwestin di nava vê têkoşînê de cih bigrin, li ser navê Kurdbûnê di nava rejîma Sûriye de cihê xwe çêkiribûn. Ji milekî ve temsiliyeta gelê Kurd dikirin, lê ji milê din ve memûrtiya dewletê dikirin. Nedikarîn şoreşgertiyeke bikin, ne jî dikarîn xwe ji siyasetê qût bikin. Nedikarîn tam têkoşînekê bikin, ne jî dikarîn xwe bidin aliyekî. Siyaseteke wisa navgînperest dimeşandin. Di navbera gel û dewletê de dîlîstin, mejiyê milet şolî dikirin. Di nava gelê Kurd de digotin, "*em ê ji we re rêkan vekin, kerebeyê bînin, medreseyan vekin.*" Têkoşîna wan jî ew bû.

Wisa behsa koletî, bindestî, azadî, têkoşîn û şoreşê nedikirin. Ango rê û rêbazên bûyina BAASî û di saziyên dewletê de cihbûnê nîşan didan, propagandaya vê dikirin. Feraset û zîhniyeta wan jî bi vî rengî dihat meşandin. Di nava şoreşa 19'ê Tirmehê de jî ew sekna wan zelaltir derdikeve holê.

Li ser vê bingehê derketina Rêber Apo li Rojava û komploya navnetewî ku li ser Serokatî hate meşandin, tesîreke pir cîdî kir. Lewra yê ku yek bi yek gelê Kurd re eleqadar dibû Rêber Apo bû. Ji ber vê yekê derketina Rêber Apo, pir giran û zehmet bû. Bi têkoşîn, fikir û sekna Serokatî ve girêdanbûnek xurt çêbûbû. Lê dema ku komploya navnetewî çêbû, ew zêdetir girantir bû. Gelê Kurd bi grevên birçîbûnê, bi çalakiyên cur bi cur, bi beşdarbûna gerîlla, bi agir berdana canê xwe xwest tola komployê rake. Li hemberî komployê rihekî wisa yê tolhildanê çêbû.

Ji milê din ve jî valatiyek hate jiyankirin. Gel êdî ew hîs dikir. Digotin, "*yê ku heya niha em didan meşandin, em ronî dikirin, bawerî dida me Rêber Apo bû. Piştî vê em ê çi bikin, çiyê were serê me? Weke Kurdên Rojava qedera me çi bibe*?" Fikarên bi vî rengî hatin jiyankirin.

Beriya ku Serokatî ji Sûriye derkeve, bingeha Partiya Tecema ava kiribû. Divê Kurdan di wê partiyê de xwe temsîl bikirana û li ser wê esasê têkoşîna xwe bi awayekî qanûnî şênbertir bikirana. Piştî Serokatî jî ew partî hate avakirin, lê ser neket. Lewra wan kesên ku di pratîkê de ew partî rêxistin kirin, ketin bin tesîra pergalê û marjînal bûn. Ji ber ku rê û rêbazên Serokatî jî pêkneanîn, ketin nava çerxa pergalê û nikarîn xwe jê rizgar bikin. Nikarîn temsîliyeta gelê Kurd, di wê derê de bikin û têkoşîna gelê Kurd bidin meşandin. Ji ber vê yekê ew partî belav bû.

Li rûxmî her tiştî divê gelê Rojava têkoşîna xwe bida meşandin. Jixwe her çiqasa Serokatî ketibe zindanê jî, ji bo gelê Rojava her nêrîn û perspektîf pêş dixistin. Çawa dikarin di Sûriye de têkoşîneke siyasî, çandî û qanûnî bidin meşandin, Serokatî careke dîtir ew tişt zelal dikirin. Daxwazên gelê Kurd jî, di vê mijarê de hebûn. Jixwe gelê Kurd, li Sûriye neteweyeke herî bi bandor bû. Sê milyon Kurd, li Sûriye bê hebûn, bê nasneme û bê siyaset bûn. Ew jî êdî nedihat qebûlkirin.

Divê têkoşînek li hemberî vê bihata dayin û ji ber vê jî divê pergala dewleta Sûriye biguheribûya. Lê dewleta Sûriye ji vê yekê re ne amade bû. Jixwe piştî komkûjiya Hamayê, tu kes nedikarî li hemberî

pergala heyî serî rake. Kes nedikarî bifikire jî. Ne Ereban, ne Dûrziyan, Ne Sûryanî û Aşûriyan tu kes nedikarî fikreke wisa pêş bixe. Kes nedigot, *"ji bo pergala Sûriye, guhertinek pêwîst dike."* Jixwe piraniya wan jî di nava wê pergalê de cihê xwe digirtin. Lê bi awayekî marjînal bûn, serdestên wan bi rejîmê re hevkirinek çêkiribû. Hin axa û serokeşîrên Kurd jî xistibûn nava pergalê û weke nûnerên Kurd digirtin dest.

Jixwe dewleta Sûriye, xwe demokrat nîşan dida, dirûşmeyên demokratîkbûnê vedigotin. Ji ber vê yekê jî divê li hemberî wan tu serhildan û têkoşînên cuda çênebana. Ger bihatana çêkirin jî bi giştî ji holê dihatin rakirin. Ew pergal her ku diçû hov dibû. Kes nedikarî derkeve dervayî qanûn û rêgezên hizba BAAS û saziyên wê avakirine. Jixwe mûhabaret, polîs, artêş, emin eskerî, emin dewle, şûrta, ceyş, ajan û gelek saziyên din yên îstîxbaratê û kontrolê ava kiribûn. Di her bajarekî Kurdistanê de pergaleke wisa xurt dabû avakirin. Jixwe her BAASiyek jî ajanek bû.

Serweriya xwe li her cihî bi awayekî hişk ava kiribû. Ger yek li malekê, an jî kargehekê li hemberî dewletê tiştek bigota, yekser malûmût ji dewletê re diçû û roja dîtir dihat girtin. Jixwe gelek kes wisa hatin girtin û heya roja îro jî girtîne. Gelek bijijk, rewşenbîr û siyasetmedar jî hê winda ne. Kesek bigirtana, êdî çi bûba ne diyar bû. Ne qanûn hebûn, ne dadgeh hebûn, ne parastin hebû, ne daneyên girtinê hebûn, ne parezer hebû. Di devletên dagirker de jî hin pîvanên navnetewî hene, lê di dewleta Sûriye de ew jî tine bûn. Kes wêrekî nîşan nedida ku bibêje, "*ez Kurd im, bila zimanê min jî Kurdî be.*"

Ew zext li ser gelên dîtir û Ereban jî ferz dikirin. Mesela sê milyon Kurd hene, milyon û nîvek Erebên Elewî hene, hejmara civakên dîtir jî kêm e. Yên mayî hemû Erebên Sûnî ne. Wan Erebên Sûnî jî nedikarî nêrîneke bîne ziman. Ji ber vê her kes ew pergal qebûl kiribû, ji bo guhertin û rûxandina wê pergalê nediket nava hewldaneke. Tenê rejîmê dikarî guhertinan bike û fermanan bide. Lê di mijarên çareserkirina pirsgirekên gelan de, rejîmê jî gavek nediavit.

Vê yekê li hemberî dewletê derdoreke ku pir bi hêrs û ji teqînê re amade çêkir. Her diavitin hundirê xwe. Nekarîn derxin derva, an jî bibêjin. Di hûndirê xwe de her bertekek hişk çêdikirin. Lê tiştê herî girîng kes nedikarî serî rake. Tu kes nedikarî ew pergala dewletê bişkînin. Di nava Kurdan de jî wisa serî rakirinek tine bû. Têkoşîna Serokatî hebû, ji bo siyaseteke zirav dimeşand û ew siyaseta Partiya Tecema jî wisa pêş xist. Lê dema ku Partiya Tecema jî di nava rejîmê de heliya, êdî rêxistinbûneke şênber li holê nema.

***-Tûndî û tepisandinên dewleta Sûriye, ango rejîma BAAS ku di vê demê de zêde bûne, hûn dikarin hinekî şênber bikin? Her wiha li hemberî vê pergalê têkoşîneke çawa dihat meşandin?***

Ger Kurdekî dengê xwe derbixista dihat girtin, dihat îşkence kirin, dihate qetilkirin. Bi vî rengî Kurdan jî nedikarî tevgereke pir xurt pêş bixin. Lê hinek siyasetên me yên taybet jî hebûn, di polîtîkaya rojane de bi hevsengî nêzikbûn hebû. Wan jî heya asteke dikarîn hebûn û rêxistinbûna me ya wê derê qebûl bikin. Ger bi awayekî vekirî tu li hemberî rejîmê kar nekê, tu dikarê xebatên xwe yên dîtir pêş bixê. Lê di encamê de pergaleke ku fikir, vîn, çand û hebûna gelan qebûl nedikir hebû. Dewleteke dîktatorî hebû.

Esad 73'yan de hatibû ser hikum. 7 salan careke hilbijartin çêdibûn. Li gorî qanûnên Sûriye jî, piştî sê serdeman kesek nikare bibe serokdewlet. Ango kesekî herî zêde dikarî 21 salan serokomariyê bike, piştî wê divê bihata guhertin. Lê dema ku kêrî wan nedihat, qanûnên xwe jî binpê dikirin. Jixwe ji hilbijartin û vîne gel zêdetir hizba BAAS her tişt diyar dikir. Kî bibe Serok-komar, kî bê kîjan wezaretê, kî bibe parlementer diyar ew dikirin.

## Pêngava Ji Nû Ve Avabûna Siyaseta Azadîxwaz û Komkûjiya Qamişlo

Bi têkoşîna me kiriye, me hewl dida wê pergalê biguherînin. Mesela me hin cihan parlementer derdixist, da ku vîna gelê Kurd temsîl bikin. Lê di pergala dewletê de her kes ji jor ve dihat diyarkirin, ango dihat tayinkirin. Heya 2000'î vê rewşê wisa berdewam kir.

Piştî 2000'î, ku Rêber Apo ji Sûriye derketibû, stratejiya me guherî bû; divê her parçeyekî Kurdistanê pergala xwe ava bikira û xwe bi xwe rêvebibira. Li gorî zûrif û derfetan, divê her parçeyekî Kur-

distanê bi wê dewletê re têkoşînek bida meşandin. Ji bo şoreşa Sûriye jî, dîsa yên ku li ser piyan mabûn û rêxistinkirî bûn gelê Kurd bû. Jixwe xebat û bingeha ku Rêber Apo pêş xistiye, gelê Kurd li ser piyan û rêxistinkirî digirt.

Li ser vê esasê ji nû ve nirxandinek çêbû û gav bi gav amadekarî hatin kirin. Li ser wê esasê me dest bi serdemeke nû ya têkoşînê kir. Di salên 2002-3-4'an de em li Rojavayê Kurdistanê ketin serdemeke nû. Ew yek ji bo Sûriye gaveke nû bû.

Ji bo ku şoreşa 19'ê Tirmehê baş bê fêmkirin, an jî kê pêşengtiya şoreşa Sûriye kiriye, baş be dîtin ew mijarên ku me vekirine girîng in. Weke min got, her tişt di bin serweriya hizba BAAS de ye. Li gorî kêfa xwe her tiştî pêk tîne. Bingeha tevgereke rêxistinkirî ku li hemberî vê yekê derkeve li Sûriye tine. Giştî Rojhilata Navîn, tiştekî wisa tine. Civakên Rojhilata Navîn, bi taybetî gelên Ereb çi jiyan dikin? Li hemberî ew dîktatoriya ku jiyan dikin çiqasa dikarin alternatîfeke ava bikin.

Lê tevgera me bi konevaniyekê taybet li Sûriye tevdigeriya û piştî salên 2000'î jî pêngava xwe ji nû ve rêxistinkirinê pêşxist. PYD avakirin jî, parçeyekî vê pêngavê bû. Ji bo ku siyaseteke demokratîk li Rojavayê Kurdistanê û hemû Sûriye bê meşandin girîng bû.

Di 2001'ê de Hafiz Esad jiyana xwe ji dest da. Li gorî qanûnên Sûriye, divê yekî di temenê Beşar Esad de nehatiba cihê bavê xwe. Lê ji ber ku qanûn di destê wan de bû, li gorî berjewendiyên xwe di rojekê de qanûn guhertin û Beşar Esad hat ser deshilatdariyê û monarşiya bavê xwe da berdewam kirin. Wî jî dixwest di Sûriye de hin guhertin bike. Mesela siyaseta modernîzmê li Rojavayê Kurdistanê zêdetir kir. Mesela saziyên weke medreseyan zêdetir vekirin. Piştî 2000'î bi vekirina zêdetir medreseyan, vekirina kargehan û zêdekirina memûrên xwe dixwestin hêsantir gelê Kurd bigirin nava pergala xwe. Beşar Esad projeyek wisa da pêşiya xwe.

Ji milekî ve jî tevgera me xwe rêxistin dikir û dixwest di nava Sûriyeyeke demokratîk de têkoşîna gelê Kurd bimeşîne. Dewleta deshilatdar ew yek baş dîdît û ji bo ku wê berxwedaniyê ji holê rake careke din bi komkûjiyan derket hemberî gelê me. Piştî avakirina PYD, ew siyaseta ji salên 1950'î ve li Sûriye li ser gelê Kurd dihat meşandin, bi awayekî xurtir ket devrê û hat meşandin. Ew siyaset bi komkûjiya 12'ê Adarê ya Qamişlo destpê kir. Nîjadperestiya Ereban jî ketibû destê dewletê û bi awayekî şovenî komkûjî li ser gelê Kurd hate meşandin. Bi qetilkirin û girtina sedan mirovên Kurd, bi talankirin û wêrankirina cihên Kurdan siyasetek nû kete dewrê. Derket holê ku bîryar dane, li herêma Cizîrê dersekê bidin gelê Kurd, ji ser gelê Kurd ve biçin, vîna wan bişkînin û qetil bikin.

Wêne-5

-***Çima Cizîr hat hilbijartin?***

Ji berê ve Cizîr weke qadeke leşkerî dihat dîtin û hêza wan ya leşkerî di Cizîrê de pir zêde bû. Ji ber vê yekê ji Cizîrê dest bi komkûjiyan kirin. Dê cihên dîtir jî serî rakirana û bihatana tepisandin. Lê "dersa dewletê" bi taybetî bidana Cizîrê. Jixwe li gelek cihên Cizîrê alay û tabûrên leşkerî yên dewletê bi cih kiribûn. Di Cizîrê de 5-6 alayên leşkerî hebûn; milê derîkê yek, li Qamişlo yek, li Amûdê yek, li milê Serêkaniyê û Dirbêsiyê yek, li rojavayê Hesêkê yek, li rojhilatê Hesekê yek alayên leşkerî hebûn. Bi ew hêza xwe bi awayekî rehet dikarîn komkûjiyeke çêbikin.

Ji ber vê tehrîkek çêkirin û hemû hêzên xwe yên leşkerî, polîs û şûrteyên xwe li gel şoveniya Ereban xistin meriyetê û ketin nava Cizîrê. Bi vî rengî komkûjî kirin. Ji ber ku li Hesekê hejmara Ereban ji Kurdan zêdetir bû û navenda şovenîzma Ereban bû, mal, xanî, taxên Kurdan hemû talankirin. Rêxistinên weke Îxvan-î Mûslîmîn jî li hemberî Kurdan sorkirinek çêkiribû, weke Kurd ne misilman in, propagandayên reşkirinê kiribûn. Bi vî rengî Kurdên wir dan koçberkirin û talan kirin.

Li Qamişlo û Amûdê heman tişt kirin. Li Dirbêsiyê û Derîkê heman tişt kirin. Li kuderê fikrên welatparêziyê û nêrînên têkoşînê hebin, ew der tepisandin. Wan digot, em ê vê komkûjiyê pêk bînin, lê li hemberî vê tu bertek çênabin. Lê dîdîtin ku Kobanê piştgirî da berxwedanê. Lê ser saziyên îstîxbarat û Emîn dewle, Emîn eskerî êrîş çêbûn. Her wiha li Efrîn û Helebê, Şamê serhildan çêbûn. Dîtin ku ji bo pergala wan xeterî hene û nikarin ji bin derkevin, êrîşên xwe yên leşkerî nerm kirin û gav bi gav hinek derdor xistin navberê. Dewletê got, *"ew şoveniyeke Ereban bûye û em dixwazin bidin rawestandin."*

Bi vî awayî bingeha şoreşa demokratîk, bi vê pêvajoyê de di 12'ê Adara 2004'an de destpêkir. Dibe ku pir ne bi plan bû, lê xwesteka avakirina pergaleke demokratîk di wê demê de derket holê. Jixwe PYD jî, li ser wê esasê kar dikir. Digot, "*ew pergala Sûriye êdî ji bo gel û netewan nabe bersiv.*" Ji ber ku rejîmê dît ku nêrîna gelê Kurd ew e, ji bo ku ew nêrîn di nava Kurdan de jî belav nebe, nijadperestiya Ereban xist meriyêtê. Xwest nakokiyan bixe navbera Kurd û Ereban, da ku ger sibê gelê Kurd rabû, bi rehetî bikaribe bipelçiqîne. Lê nedikarî vê yekê bike.

Lewra her çiqasa gelê Kurd ji milê leşkerî ve xwe rêxistin nekiribe jî, ji milê siyasî, civakî û çandî ve xwe tanzîm kiribû. Berxwedan û serhildanên gel ne çekdarî bin jî, di dîroka Sûriye de cara ewil geşedanên bi vî rengî çêdibûn. Bi bîryar, bi awayekî zelal û hevgirtî tevahî gelê Rojava li hemberî rejîmê serî rakir. Bi rihê netewiyetê serhildan kirin û ew dîktatorî qebûl nekirin. Devlet ji ew vîn û hêza xurt tirsiya. Dewletê ferq kir ku dê ew bûyer bizivirin şerê navxweyî û rejîma Sûriye nikare vê rake, ji bo vê paş ve gav avit.

Paşve gav avetina wan, diyar bû ku vîna gelê Kurd li Rojava xurt e. Ji ber vê yekê çawa ku di salên 60-70'î de li gel Tirkiye peyman çêkiribin û li hemberî gelê Kurd siyasetên taybet meşandibin, careke dîtir ew yek pêş xist. Îtîfaqa Edeneyê (1999) bi vî rengî ket meriyetê. Li ser ava Ferat û hin gavên aborî li hev kirin. Lê hevkirina wan ya esasî li ser dijberbûna Kurdan bû. Têkiliya her du devletan li ser esasê hebûn û tinebûna Kurdan bû.

Di wê serdemê de dewleta Sûriye hem di qada navnetewî de, hem jî di siyaseta li hemberî Kurdan ya navxweyî de tengav bûbû. Ew dîktatoriya rejîma BAAS, di qada navnetewî de êdî nedihat qebûlkirin. Lewra mûdaxaleyeke bi vî rengî li ser Iraqê jî çêbûbû. Ji ber van sedeman dewleta Sûriye paş ve gav avit. Ne ku hebûna Kurdan qebûl kirin û mafê wan danê. Siyaseta xwe ya li ser Kurdan hinekî din veşartî meşandin.

Çawa ku di salên 90'î de Bakûrê Kurdistanê, Çîlerê li ser Kurdan siyaseteke taybet meşand. Piştî 2003'yan bi hevkirina rejîma Erdoxan û rejîma BAAS heman siyaset li Rojava hate meşandin. Ne ku wisa bi avayekî vekirî komkûjî dikirin, lê bi hezaran mirov girtin. Gelek welatparêz û xebatkarên PYD yên weke Bavê Cûdî girtin û ji şikenceyê re derbas kirin. Ew yek bi awayekî veşartî dan meşandin.

Îstîxbarata Tirkiye û Sûriye ketibûn nava xakên Rojavayê Kurdistanê, tax bi tax, kolan bi kolan, mal bi mal digeriyan û kesekî ku bigota "*ez Kurd im û ez dixwazim bi hebûna xwe jiyan bikim*" hebûya li holê radikirin. Kîjan xebata siyasî hebe, kîjan xebata çandî û civakî hebe, ger hesteke welatparêzî hebe, bi şerekî taybet ser ve çûyin, tirsandin, girtin û qetilkirin didan meşandin.

Di 2008'an de bi wê şêwazê êrîşkirina ser pîrozbahiya Hesekê gelek mirovên me qetil kirin. Me dixwest êdî em bi awayekî rehet newrozan pîroz bikin, lê ew jî ji bo xwe xeterî dîdîtin. Piştî salan 2003'yan ji vî milî ve gelek hewldan û xebat hatin pêş xistin. Lê dewleta Sûriye jî her bi tûndî ser van xebatan ve dihat. Mesela hevala Şîlan, hevalê Zekeriya, hevalê Cemîl, hevalê Ciwan ji ber vê qetil kirin. Qetilkirina Bavê Cûdî ku rêveberiya PYD bû, qetilkirina Mamoste Osman ku rêveberiya PYD bû bi wê şêwazê çêbû.

Hinek qetlîam kirin ku ne gengaz bû tenê hêza dewleta Sûriye têrê bike. Di 12'ê Adarê de dît ku nikare ji navê derkeve, paş ve gav avit û bi dewleta Tirkiye ve peyman kir û bi vî rengî êdî her tişt bi hev re meşandin. Dewleta Tirkiye bi MÎT û JÎTEM a xwe ket hûndirê Sûriyeyê. Bi vî rengî qetilkirin û talankirin çêbûn. Hevalên me digirtin û radestî îstîxbarata Sûriye dikirin, wan jî her cure şikence û hovîtî li ser hevalan dikirin.

Van tûndiyan tirseke mezin di gel de ava kir. Rêveberiya partiya siyasî neçar ma ku ji Rojava derkeve. Serokên partiyê hemû derketin. Da ku bikaribin siyaseta xwe bi ewlehî bimeşînin. Gelê me jî her çiqasa bi rihekî lehengî ber xwe dabû jî, li hemberî ew siyaseta hovane neçar mabû ku bêdeng bimîne. Lewra kê bigota ez Kurd im, dihat girtin û şikence dibû, êdî ew bihata berdan û nehatiba berdan ne diyar bû. Ger kesek bihata bin çavkirin, êdî kes nedikarî pêy bikeve û bibêje "*ew kes miriye, an maye*" jî. Ger kesek bihata girtin, êdî weke ku jiyana xwe dest dabe dihat hesapkirin. Ewlehiya canê ti kesê tunebû.

Dema ku ew qesa tûndî û komkûjî hatin kirin, diyar bû ku ji bo Rojavayê Kurdistanê xebatên parastinê pêwîst dikin. Li ser vê esasê êdî parastin ket rojevê. Êdî diyar bû ku tenê bi rêbazên siyasî, xebat pêş nakevin. Divê di giştî gel de zanebûna xwe parastinê pêş biketa û rêxistinbûneke bi vî rengî

çêbûbûya. Di destpêkê de hin gavên bi vî rengî jî hatin avitin. Lê dewleta Tirkiye, di bin navê dewleta Sûriye de, li hemberî van xebatan jî têkoşîneke dijwar da meşandin.

Şervanên ku amadekariya parastinê dikirin, dihatin binçavkirin, şikence dihatin kirin û dihatin kûştin. Vê yekê jî bi xwe re tiştekî nû derdixist holê. Digotin, *"em ne siyaseta we, ne parastina we, ne hebûna we, ne jî jiyana we qebûl dikin."* Êdî Kurd weke mirov jî nedîdîtin û li hemberî her hewldaneke bi awayekî dijwar têkoşîn dikirin.

Dema ku em digihiştin salên 2010'an li Rojava rewşeke wisa dihat jiyankirin. Wê demê li Sûriye tu netew û gelên ku dixwestin li hemberî rejîmê serî rakin, an jî şoreşê dar bixin tine bûn. Ereb, Ermenî, Sûryanî, Dûrzî, Aşûrî hemû jî li hemberî qetlîam û têkoşîna Kurdan bêdeng man. Dewleta Sûriye ya dagirker, bi hevkariya dewleta Tirkiye dikarî Kurdan qetil bike, koçber bike, bigre, şikence bike û mafê jiyanê jî nedê.

Gelek rêxistin û derdorên ku digotin em nûnertiya Kurdan dikin jî, di nava pergalê de bûn û li hemberî wan kiryarên dewletê wan jî dengê xwe dernexistin û serî ranekirin. Yek rojekê di meclîsa Sûriye de negot, "*gelê min tê qetilikirin, em vê helwestê qebûl nakin, ev helwest dervayî mirovahiyê ye.*" Dervayî PYD hemû jî di nava pergala Sûriye de bûn. Rejîmê jî ew kontrol kiribûn û wisa qebûl kiribûn. Ji 2003'yan heya 2010'an ew siyaset li ser gelê Kurd hate meşandin. Ti partî, gel û ti derdoran li hemberî vê siyasetê dengê xwe dernexistin. Kes dijberî van komkûjiyan derneket.

Ger mirov ew têkoşîna gelê Kurd ku piştî 2003'yan li Rojava hatiye meşandin nebîne, mirov nikare rastiya Şoreşa Rojava û şoreşa Rojhilata Navîn jî fêm bike. Ji ber ku ew yek naye fêmkirin, îro jî gelek kes bi awayekî rast wate nadin têkoşîna nûjen. Rast fêm nakin û li gorî ferasetên xwe dinirxînin. Lê ew derket holê û zelal bû. Gelê Kurd herî kêm li parçayê Rojavayê Kurdistanê jî hebe, dê xwe bi xwe pergala xwe ava bike. Dê di mijarên siyasî, civakî, aborî û çandî de gelê Kurd bi xwe qedera xwe diyar bike.

Ew nêzikbûn jî ji felsefe û têkoşîna Rêber Apo girt. Li ser vê esasê dikare xwe rêxistin û bi plan bike. Dikare bi vî rengî xwe bide meşandin. Her çiqasa berdelên wê giran û bi êş dibin jî gelê Kurd bîryara xwe ya şoreşê ku di 2003'yan de girtibû, dê pêk bîne. Dervayî wê ji bo gelê Kurd tu çare tine. Li ser vê bingehê di 2011'an de piştî şoreşa Rojhilata Navîn û şoreşa Sûriye, şoreşa gelê Kurd pêş ket.

***Me berê xwe da Kobanê...***

*Di gera me ya Rojavayê Kurdistanê de, ji ber ku êrîşên çeteyan pir zêde bûn û gelek cih di destê çeteyan de bûn, me zû bi zû nedikarî xwe bigihînin hemû kesên ku em dixwazin pê re biaxifin. Dibe ku em di vê derê de nikaribin bînin ziman, lê çend caran em neçar man ku derbasî Bakur bibin û wisa biçin bajarekî dîtir yê Rojava. Her wiha me gelek rekên dîtir jî ceribandin. Gelek xeteriyên van ceribandinan hebûn, lê ji ber ku me xistibû serê xwe ku em biçin her cihekî Rojava û bi dîtina şoreşê vê xebatê bimeşînin, divê me hinek tişt bidana ber çavên xwe. Her ku em di nava şoreşê de diman û me ew hîs dikir, ji vî alî ve di me de jî wêrekiyek pêş diket, an jî me di asteke de tirsên xwe dişkandin.*

*Ji aliyê dîtir ve, binpêkirina her qanûneke dewletên dagirker ji me re weke çalakiyeke azadiyê dihat. Dê me çima sînorên ku dagirkeran danîne, pêşiya xwe asteng bîdîtana; me çima xaka xwe ku hatiye dagirkirin, ji xwe re qedexe bikira. Ji ber vê me gelek caran ev sînor derbas kirin.*

*Da ku em bi hin şoreşgerên ku li Kobanê kar dikirin re jî hevpeyvînan çêbikin, divê em biçana Kobanê. Dema ku em destpêkê çûn, hê jî kantona Kobanê û Cizîrê nebûbûn yek. Lê piştî ku Girê Spî hate girtin û kanton bûn yek jî, em derbasî Kobanê bûn.*

*Li Kobanê, kesên ku ewilî me pê re hevpeyvîn kirine Meryem Kobanê û Mehmûd Berxwedan bûn. Di çûyina ewil de hê jî projeya me ya pirtûkan zelal nebûbû, me kişandina hin dîmenan ji bo wê demê bes dîtibû. Ji ber ku Şoreşa 19'ê Tirmehê li Kobanê destpê kiribû, weke çirûska şoreşê dihat dîtin. Lê piştî ku Kobanê ket nava şerê sedsalê û şahîdî bi berxwedaniyeke dîrokî re kir, ji bo hemû cîhanê bû remzek. Meryem Kobanê û Mehmûd Berxwedan jî, ji wan kesên ku di nava wê berxwedanê de cih girtine û şahîdiya wan lehengtiyan kirine bûn. Ji destpêka şoreşê heya berxwedana dawî ya Kobanê, gelek tiştên ku em bi wan re nîqaş bikin hebûn.*

*Dema ku me agahî girt ku wê Meryem Kobanê tevlî merasîmeke leşkerî ku li ser Girê Miştenûr tê kirin bibe, me hema berê xwe da wê derê. Lê dema ku me Mehmûd Berxwedan û Meryem Kobanê bi hev re dîtin, me fêm kir ku em çiqasî bi şans in. Her wiha li ser Girê Miştenûr ku bûye remza*

*berxwedanê, nîqaşeke wisa pêş xistin pir bi wate bû. Piştî ev hevpeyvîna yekemîn, me li cihên dîtir jî bi wan re hevpeyvîn çêkirin, lê me cihekî pîroz dest bi hevpeyvînên xwe kiribû.*

*Me berê xwe da Kobanê ku ji nû ve tê înşakirin û dest bi nîqaşên xwe kir. Di nava vegotinên xwe de cih bi cih çavên mêvanên me tijî dibûn, bi taybetî jî dema ku qala şerê bajarê Kobanê dihat kirin, bi têliyên xwe kolan û taxên ku şer lê qewimîne nîşanî me dikirin û kelecana wan digihêşt lûtkeyê.*

*Wêne-6*

***-Ji milê dîrokî ve nakokiya gelên Rojhilata Navîn û pergala dewletên heyî, hûn çawa dinirxînin? Di vê mijarê de hûn dikarin çi bibêjin?***

**MERYEM KOBANÊ:** Ev 200 salî zêdetire li ser Rojhilata Navîn destwerdanek heye. Lê bi rastî di demen dawî de ji sala 2003'an şûn ve êrîşên ABD yên li ser Iraq'ê hatî çêkirin ve destwerdanek fîîlî li ser Rojhilata Navîn hate meşandin. Ji wir destpê kir heta roja me ya îro berdevam dike. Bin navê; *'li Rojhilata Navîn demokrasi nîne, desthilatdarî heye û dê ji Rojhilata Navîn re demokrasi bînin'* viya dike. Dewletên netewperest yên ku li Rojhilata Navîn xwe bi cih kirine, bi taybet welatên Ereban yên weke Yemen, Tûnis, Iraq, Misir, Sûriye û hwd. bi sîstema qraliyetê dimeşiyan û heta roja me ya îro jî berdevam dike. Di vir de tişteke ku tê diyarkirin, rejimên heyî tû caran îradeya netewa berçav negirtiye. Ya rastî ne tenê destwerdana leşkerî hat çêkirin, pêşiyê destwerdana zihnî hat çêkirin. Belkî bi şiara 'demokrasî' hatin Rojhilata Navîn, lê di hundir de tiştê ku avakirin nakokiya Şîa-Sûnî, dîsa nakokiya netew-dewletê bû. Yanî tiştê ku derket holê dij demokrasiyê bû.

Herî dawî mudaxeleya Sûrî, mudaxeleya li Efganîstan hat kirin. Xwestin ew tiştên ku li Iraq'ê bikin û serneketin, vê carê li Efxenîstan'ê çêbikin. Lê bi rastî tu guhertin çênekirin. Em dikarin bejin ev mudaxeleyên ku hatine kirin hem ji aliyê civakî ve, hem aliyê cografîk ve bandorek cuda avakirin. Rewşa Rojhilata Navîn ya niha, pirsgirekên hundirîn yên jiyanî, krîza aborî, zihniyeta dewletên dagirker û her wiha pirsgirekên din tên jiyankirin dide nişandan ku êdî bi vî awayî di nava cihana global de, ji bo jiyana netewan nikare bibe bersiv. Êdî pêdiviyên mirovan yên herî mezin di jiyaneke demokratik, wekhev de dibîne. Mirovatî jî careke din ji bo ku li ser xaka xwe şîn bibe pêwîst e li kû dere winda bûye li wê derê lê bigere.

Ew raperîna li dewletên Ereb destpêkiriye, bêgûman li Rojhilata Navîn hinek bandora xwe kir. Sala 2011'an li gelek dewerên Ereban ev şoreş destpêkir. Di van dewletan de pir kesan jî jiyana xwe dest dan. Mînak li Lîbya çar hezar insan hatin kuştin. Gelek cih wêran bûn. Guhertinek cidî jî nehat çêkirin. Pirsgirek heta niha jî didome. Bi milyonan mirov koçber bûn. Gelek Serokên dewletan hatin kuştin. Ji aliyê erdnigariyê ve guhertinek hate çêkirin. Pir welatan xwestin çekên xwe li ser van welatan biceribînin. Di vê pêvajoyê de li her welatekî ku raperîn lê çêbûye hêzeke muxalefetê derkete holê. Vana jî bi gûman bûn ka ser kîjan armancê derketin holê.

Ev pêla raperînê herî dawî li Sûrî derkete holê. Cudabûyîna rejîma Sûrî, ji welatên din heye. Hem ji aliyê jeopolitik ve, hem aliyê siyasî ve, ji dewletên Ereb cudahiya xwe heye. Rewşa wê li Rojhilata Navîn, ji aliyê dîrokî, coğrafik, sosyolojîk ve stratejîk e. Hem li ser gelek behran wek deriyekî ye, hem cihekî dîrokî ye, hem gelek netewên cuda têde cih digirin. Pergaleka wê ya ku li ser malbata Esed tê meşandin heye. Ya rast Sûrî ji aliyê Fransa ve tê rêvebirin. Ji ber ku berê jî di bin mêtîngeriya Fransa da bû. Bandora wê li ser vî welatî zêde heye.

***-Hûn dikarin di vê mijarê de çi lê zêde bikin?***

**MEHMUD BERXWEDAN***:* Şoreş jixwe bi *Bihara Ereban* re ku di 2010'an de li Tûnis, Misir û gelek welatên din ên Ereban dest pê kiribû û di çarçoveya ku gel di Rojhilata Navîn de di welatên Ereban de ji zilm û zora van rejîmên heyî, hatibû asta teqînê. Welê lê hatibû ku gel li benda tiştekî biçûk bûn da ku biteqin.

Mînak li Tûnisê bi bûyereke biçûk şoreşê dest pê kir. Dema erkdarên dewletê destkarî li kesekî bi navê Muhamed Ebû Ezîzî ku ji xwe re li ser erebokekê tişt difiroşe kirin, wî kesî xwe şewitand û bûye-

ran dest pê kir. Esas ew bûyera ji bo destpêkirina şoreşekê tiştekî biçûk bû. Ew kîn û nefreta ku milet di dilê xwe de li dijî van rejîmên zordar hewandî bû ew derdixistin derve.

Ji derve jî wisa xuya dibû. Berteka milet li dijî van rejiman heye, milet dixwaze ji van xelas bibe. Lêbelê hêzên derve û bi taybet jî hêzên emperyalîst bi armancên cuda destwerdan vê rewşa gel ku li ber bi xwe dide. Naxwe eger bê gotin ku ev rabûnên gel destpêkê xirab bûn wê tehlîleke şaş be. Jixwe milet ji van rejîman bêzar e û teqiya jî. Lê hêzên derve ev rewş dîtin û xwestin li gorî xwe şiklekê bidinê, bixin roteyekê. Jixwe wisa jî kirin. Mînak li gorî berjewendiyên xwe bûyer beralî kirin. Zêde behsa wê pêvajoyê û wan bûyeran nakim, lê ev şoreşên ku li welatên Ereban û li derve çêbûne, zemîna ku li Rojhilata Navîn heyî weke ku agirek bipeke, pekiya Sûriyê.

Niha berî ku agirê li Tûnisê bipeke wisa xuya dikir ku wê bê welatên Ereban û di hedefê de Sûriye heye. Ji bo wê her kesî li ser Sûriyê hesabên xwe kirin ku wê li Sûriyê çi çêbe û çênebe. Helbet gelek şîrove li ser Sûriyê hebûn. Wê çaxê jî şîrove hebûn ku wê Sûriyê çawa çêbe, çawa bikeve. Li Sûriyê şoreş di dawiya Adara 2011'an de dest pê kir.

Coxrafyaya Sûriyê ji welatên Ereban, ji Îranê cuda xwediyê rewşeke stratejîk e. Hêzên ku ev rewşa Sûriyê rast nirxand û şîrove kir, paşî ew bi ser ketin. Hêzên ku rewsa Sûriyê wekî welatên Ereb yên din nirxandin jî wenda kirin. Niha Sûriyê hem di milê coxrafîk û hem jî di milê siyasî de girîngiyeke xwe ya cuda di Rojhilata Navîn de heye. Yekemîn, di aliyê gelên ku tê de jiyan dikin de, mozayîkeke gelan e. Li Sûriyê tenê Ereb tine ne; Kurd, Asûrî, Sûryanî hene. Dîsa wek mezheb Sûnî û Elewî hene. Yanî di aliyê gelan û di aliyên çandên cuda de xwediyê dewlemendiyeke mezin e.

Xala din, li milekî Rûsya û li milekî jî Emerîka, hêzên li cîhanê siyasetê diyar dikin. Dewletên weke Îran û Tirkiye jî ku li Rojhilata Navîn sîyasetê diyar dikin li Sûriyê giraniyeke wan heye. Sûriye ji bo wan xwediyê girîngiyekê ye. Ji bo me jî wateyeke Sûriyê hebû. Ez bi awayekî kurt bêjim; mînak girîngiyeke Sûriyê ji bo Rûsya heye. Çima giraniya xwe dayê? Ji ber ku Sûriyê keliha herî dawî ya Rûsya ye. Kelehên wê yên li Rojhilata Navîn hemû ketin. Yanî çi ye? Sûriye keleha wê ya herî dawî ye. Di Rojhilata navîn de tenê têkiliyên Sûriyê bi Rûsya re hene. Bingehên leşkerî yên Rûsyayê li bajarê Sûriyê Tartûsê hene. Li tevahiya Rojhilata Navîn bingehê Rûsya tenê li Tartûsê heye. Ji ber wê Rûsya nexwest Sûriyê wenda bike. Wendakirina Sûriyê, ji bo Rûsya tê wateya wendakirina van bingehên xwe yên leşkerî. Ji bo wê Rûsya bi hemû giraniya xwe Sûriyê weke parçek ji axa welatê xwe dît û wisa nêzîkatî li Sûriyê çêkirin. Ji bo ku hikmê Sûriyê bimîne bi hemû giraniya xwe ve nêzîk bû.

*Nexşere-3

Sûriye ji bo Îranê jî pir girîng bû. Lewre Îran dixwest hîlala Şîa were parastin. Ji bo wê Sûriye pir girîng e. Îran, Iraq, Sûriye, Libnan, Hizbûlah yanî weke hîlalekê, weke zîncirekê ye. Eger Sûriyê hilweşe, Libnan jî dikeve rîskê an ku xetereyê. Bandora Îranê li ser Îsraîlê kêm dibe. Derfetê wê yê ku Şîayên Yemen, Bahreyn û Libnanê destek bike, kêm dibe. Ew hîlala ku di Rojhilata Navîn de heyî dişke. Ji bo wê yekê, Îran jî Sûriyê weke parçeyek ji xwe dît û çiqas derfeta wê hebû bi kar anî.

Çîn jî bi heman awayî tevgeriya. Çîn yek ji welatên ku di eniya Rûsyayê de ye. Ya din jî ji bo Çînê, Sûriye deriyekî kirîn û firotinê ye, deriyekî aboriyê ye. Lewre Çînê jî li gel Rûsya û Îranê ji bo ku rejîma Sûriyê bimîne hewl da. Hemû giraniya xwe nîşan da ku bimîne; çi di aliyê navneteweyî de çi jî di aliyê dîplomasî de yanî tiştê ji dest hat pêk anî. Keleha din ya Îranê yanî Hizbulaha Libnanê eger niha ji Sûriyê derkeve girîngî û pişta wê jî namîne. Lewre jî hemû hêza xwe dixe dewrê. Xaleke din jî hejmara Elewiyan di Sûriyê de kêm e.

Ji ber wê yekê Elewiyên Sûriyê jî yên Libnanê jî hemû hebûna xwe bi mayîna Beşar Esad ve girêdan û hêza xwe danê ku ew bimîne. Vê rastiyê jî cebheyek ava kir. Hêzên ku xwestin Beşar bimîne berjewendî û hebûna xwe di mayîna wî de dîtin. Yên din an ku cebheya din Tirkiye, Siûdî, Qetar û welatên din siyaseta xwe li ser çûna Beşar diyar kirin. Çima? Yek, eger Beşar biçe, desthilatdariya Sûnîyan tê. Yanî li gorî berjewendiyên Siûdî, Qatar hukmek tê. Li gorî Tirkiyê jî eger Sûnî werin ser hukma nû baş e û ya din jî ew e ku piştî Esad, Kurd tiştekî bi dest nexin. Rejîma piştî Esad ji bo Kurdan wê ji Esad xirabtir be. Lewre rejîma nû wê Kurdan qir bike, tine bike. Dewleta Tirk siyaseta xwe li gorî vê diyar kir. Hêzên dîtir jî yên weke Emerîka, Ewrûpa û hêzên kapîtalîst yên din digotin bila Beşar biçe, bila hukmeke din were. Wan jî hêza xwe li gel Tirkiye kirin yek.

Niha hêzên derve yên dixwestin Beşar biçe, herî kêm yên weke Emerîka û Ewrûpa bi tecrûbeyên ku ji Efxanîstan û Iraqê derxistibûn, nedixwestin Beşar di yek carê de biçe. Çawa? Herî kêm dixwestin alternatîfa wî amade bikin. Paşî hêdî hêdî Beşar bixin. Ji bo wê qada herî destdayî ku lê alternatîfa Beşar amade bikin, Emerîka wek Tirkiye diyar kir. Yanî ya wê Siûdî bûba, ya wê Tirkiye ba yan jî wê Misir ba. Yanî yê ku herî nêzîk di sînor de ye û dikare alîkarî bide Tirkiye bû. Ji bo wê navenda muxalefetê wek Tirkiye diyar kir. Wexta ku navenda muxalefetê bû Tirkiyê, Tirkiyê jî bi temamî ew muxalefet li gorî berjewendiyên xwe bi rêxistin kir. Yanî derfetên Emerîka, Ewrûpa Siûdî û Qatarê hemû girt, xwest li gorî xwe jî şiklekê teqez bide wê muxalefetê.

Rojava jî ji bo wan xwediyê girîngiyekê mezin bû. Lê ji herkesî bêhtir Rojava, ji bo me xwediyê girîngiyekê bû. Ji bo me girîngiyeke Rojava a mezin heye. Ya yekemîn welatê me ye, parçeyekê Kurdistanê ye. Dem çi dibe bila bibe pêwîst e azad bibe, rizgar bibe. Gelê Kurd li wê derê azad jiyan bike. Li Rojava ewqas keda Rêber Apo û şehîdan heye. Ev divê bigihê armanca xwe. Ji wê zêdetir çareseriya li Sûriyê çêbibe ew e ku bandora xwe li tevahiya Rojhilata Navîn bike. Çareseriya girêka li Suriyê weke çareseriya Rojava ye û Rojhilata Navîn wê li gorî wê şikil bigire. Li ser esasê azadiya gelan çareserî çêbibe wê tevahiya Rojhilata Navîn bandor bibe. Eger li gorî dewleta Tirk dixwaze çareseriyek çêbibe wê Rojhilata Navîn jî li gorî wê çêbibe. Lê li gorî gelan çêbibe evê bibe çareseriya gelan. Yanî çareseriya Sûriyê esas ji bo Rojhilata Navîn modelek e, modeleke avakirinê ye, modeleke ji nû ve çêkirinê ye. Esas modela ku li Iraqê çêbûyî serkeftî nebû. Yanî Emerîka jî di navê de serkeftin nedîtin. Lewre jî dixwestin Sûriyê bikin model. Ji bo wê jî herkesî girîngî da Sûriyê. Di serî de ji bo me jî ev çareserîya li Rojava û Sûriyê çêbibe, wê çareseriyeke demokratîk be. Li gorî ramanên Rêber Apo ev ê bibe modeleke nû ya Rojhilata Navîn. Esas derfeteke ku pratîka me ya nû li tevahî Rojhilata Navîn belav bibe, serwer bibe heye. Ev ji bo me girîng bû. Ji bo me ya herî girîng jî ew e ku gelê me azad bibe. Ji vê rewşê derkeve û êdî statuyekî Kurd hebe. Ev encama şoreşê ye, divê şoreş bigihîje hedefa xwe. Ji bo wê girîng bû, weke mijara man û nemanê bû.

***–We bal kişand ser nexşereya siyasî ya Sûriyê, dema ku we ji bo Şoreşa Rojava gavên ewil diavêtin, tesîra ev rewşa Sûriyê li ser Rojava çi bû?***

Çima li ser vê mijarê disekinim? Ji ber ku ev hîn berdewam e. Hindek pêşketin çêbûnê, hatine çêkirin, hindekê li şûna xwe rûniştiye lê berdewam e. Em li gorî vê tevgeriyan. Piştî 6-7 salan derket holê ku siyaseta herî rast ya herî di cih de ya me bû. Ya bingehîn ked û perspektîfên Rêber Apo hebû û tevgera me TEV-DEM'ê jî li gorî wan perspektîfan, xeteke ava kir.

Niha di destpêka şoreşê de em çawa tevgeriyan? Berî her tiştî li ser wê erdê tiştek tinebû. Çend Heval li Rojava ya hebûn ya tinebûn. Yanî xebata me di astekê de hatibû tengav kirin. Rêxistin çawa hat çêkirin, çawa meş hate li darxistin, ev siyaseta heyî çawa meşiya û heta niha çawa hat? Mirov dikare niha bi temamî binirxîne. Yani yek siyaseta ku me danî ev bû: Sûriyê ne weke dewletên derdorê ye, ne weke Iraqê ye. Ne weke ku dewleta Tirk difikire, hineke din difikirin. Li gorî wê me siyaset diyar kir. Ya din jî me li gorî paradîgmaya xwe siyaset diyar kir. Yanî ewqas hêz li Sûriyê têkoşîn dimeşinîn û hemû li dijî hev in. Esas siyaseta ku emê bimeşînin wê çawa be?

Siyaseta me, em bi xeta sêyemîn bi nav dikin. Yanî yekemîn, em li hemberî rejîma BAAS'in. Bi rastî jî tiştekî ku bi serê Kurdan nekiriye nema ye. Mafekî herî biçûk jî tine ye. Ji bo vê yekê li hemberî vê rejîmê sekinandin pîroz e. Divê em êdî rejîme BAAS ji bajaren xwe derxin, bajarên xwe bi xwe rêvebibin. Ya din jî muxalefet e. Muxalefeta çêbûyî û çêdibe, çi garantiya wê tineye ku di dema pêş de mafê Kurdan bide. Heta muxalefeta heyî ji Esad paşketîtir e û hîn zêdetir Kurdan înkar dike. Weke min destpêkê anî ziman jixwe ev muxalefet li Tirkiyeyê çêbû. Hişmendiya ku ev pê çêbûyî, ne hişmendiyek bû ku muxalefeteke demokratîk pêş bixe. Muxalefetek ku li ser esasê desthilatî û berjewendiyên Tirkiyê, Siûdî, Qatar û derdorê hatiye avakirin e. Yanî mafên gêlên Kurd û mafên gelên ku li herêmê jiyan dikin li ber çavan girtin tine ye. Muxalefeteke ne demokratîk çêbuye. Lewre jî bi wê muxalefetê re tevger ne rast bû. Her çendî em li dijî rejîmê ne, heman demê em ne li gel wê muxalefetê ne ku di destpêka şoreşê de çêbûyî ye. Ji bo wê xeta me jî xeta seyemîn e, xeta demokratîk e. Em ne rejîmê, ne jî muxalefetê demokratîk dibînin. Xeta seyemîn, xeta demokratîk ya li ser esasê berjewendiyê gelan e. Bi xetên giştî siyaseta me ev bû. Ji bo xeta me ya siyasî Rêbertî ev got: *"Kî mafê gelê Kurd*

*qebûl bike em ê bi wan re bin.*" Ev tê wateya ku eger kî qebûl neke, em ne bi wan re ne. Wê çaxê her du hêzên din jî qebûl nedikir. Yanî ne muxalefetê û ne jî rejîma BAAS qebûl dikir. Mafê gelê Kurd qet qebûl nedikirin. Ji bo wê serbixwe sekinandin, serbixwe siyasetek avakirin; ev ji bo Rojava hê rastir bû. Yanî mirov siyaseteke serbixwe biafirîne…

Ji ber ku me xeteke serbixwe hilbijart û em li ser meşiyan, êrîş li ser vê pêş ketin. Destpêkê êrîşên siyasî pêş ketin. "*Şoreşa Sûriyê"* jî destpêkê ne leşkerî bû, gelêrî bû; yanî li hemberî rejîmê meşên civakî dihatin li dar xistin. Lewre jî li ser vê sekna me êrîşên siyasî pir çêbûn. Rejîmê dixwest Kurdan di aliyê xwe de bigre da ku em neçin aliyê muxalefetê û em di refên rejîmê de li dijî muxalefetê bisekinin, şer bikin, siyasetê bikin. Me ev rast nedît û me qebûl nekir jî. Ji ber vê yekê rejîmê li hemberê me helwest danî. Got ku "*an hûn li gel me ne, an jî li dijî me ne û li gel terorîstan in, terorîst in*." Berovajiya wê jî çêbû. Yanî muxalefetê got, "*werin li gel me bisekinin, eger ku hun li gel me nesekinin wê demê hûn hevkarên rejîma Suriyê ne, Şebbîha ne, bi rejîmê re ne."* Dewleta Tirk ev yek pir bi kar anî. Hem dewleta Tirk û hem jî yên ku pê re dixebitin gotin "ev Şebbîha ne."

Hem jî rêxistinên weke ENKS li hemberê me dest bi propagandayake reşkirinê ya pir mezin kirin. Yanî weke ku tiştekî hê çênebûyî reş bikin, wisa nehêlin gel pê re rabe û hê şoreş çênebûyî xirab bikin. Helwesteke wisa, zêde pêş ket. Yanî di Sûriyê de niha her kes dixwaze BAAS bikeve û tu bibêjî "*ev bi rejîmê re ne.*" Yanî wek tu bibêjî *"ev bê namus e.*" Di înternetê de, di çapemeniyê de û bi giştî di medyayê de, gotin "*ev bi rejîmê re ne."* Bi taybet jî hindek "*partiyên Kurd"* ev yek pir bi kar anîn.

Berovajî vê yekê, heyanî şoreş destpê kirî jî ev partî li gel dewleta Suriyê bûn. Ji xwe piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê me belgeyên dewletê girtin, navê hemûyan di van belgeyan de wek "ajan" derbas dibe. Kê çend caran ajantî kiriye, îxbar kiriye, hemû nivîsandî bû û diyar bû. Yên ku êşkence didît, dihate çewisandin û şehîd dayî tevgera me bû. Şoreş dest pê kir, xwestin nîşan bidin ku qaşo em li gel rejîma Sûriyê ne û ew jî şoreşger in. Êrîşeke mezin li ser tevgera me çêbû, ji bo ku me paş de bixin û em bi ser nekevin. Ne tenê ev, dixwestin êrîşên din jî pêş bixin.

Yanî êrîşên fîzîkî jî dixwestin pêş bixin. Nîşanên vê derdiketin holê. li Rojava rewşeke wisa pêş ket. Hevalên me yên ku di destpêkê de li Rojava dixebitîn hemûyan xebatên siyasî û xebatên rêxistinkirinê kirin. Rêxistina me û xebatên me, ji ber çewisandina rejîmê hatibûn ber sifirê. Hemû hedefa me ya destpêkê ji nû ve avakirin, ji nû ve rêxistinkirin bû. Hemû Heval li wê derê bi vê armancê tevgeriyan. Jixwe hê destpêka şoreşê jî qarektera leşkerî derneketibû pêş. Yanî raya giştî wisa bawer dikir ku wê bi meş û mîtîngan rejim bikeve. Mesela hemû muxalefeta Sûriyê weke ku bi navê "bihara Ereban" serhildanên li Tûnisê û Misrê çêbûyî, her roja înê û piştî nimêja înê meş dikirin. Yanî bi van meşan rejîma Tûnisê ket, ya Misrê ket. Li Misrê meydana Tehrîr hebû, milet çû wê derê, serî hilda û bi wê rejîma Misir ket. Bê têkoşîna çekdarî ket. Her kesî bawer dikir ku wê Sûriyê jî wisa bikeve. Ji bo wê jî her kesî hêzên siyasî amade dikir ku dema rejîm bikeve wê ew hêz bikevin şûnê. Tirkiyê jî xwe wisa amade dikir.

**2-Di Nava Aloziya Rojhilata Navîn De Şoreşa Rojava**

***-Qesî ku em dizanin we jî demên dirêj li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê xebatên siyasî meşandine, we di nava partiyên siyasî de rêveberî kiriye. Beriya ku Şoreşa Rojava pêş bikeve, li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê rewşeke çawa hebû?***

**ROZA EFRÎN:** Rast e. Berî şoreşê jî min li Rojava xebatên siyasî meşandin. Di xebatên Rojava de min cih girtibû. Nêzikî heft salan, li hemberî dagirkerî û tûndiya rejîma Sûriye, hewldanên me yên rêxistinkirina gel çêbûn.

Berî şoreşê xebatên ku dihatin meşandin li ser navê TEV-DEM'ê dihatin pêş xistin. Lewra pergal hê li wê derê hakîm bû. Di wê demê de xebatên tanzîma gel dihatin meşandin. Gel dihat rêxistinkirin. Li ser esasê paradigmaya Serokatî xebatên înşa û xweseriya demokratîk destpêkiribûn. Ji 2009'an ve xebatên înşayê destpê kiribûn, lê herî zêde di 2010-11'an de ew xebat pêş ketin. Kongre û konferansên gel ji vî alî ve dihatin avakirin. Li ser ew amadekariyên ku hatine kirin, li seranserê Rojava bingeha xweseriyê çêdibû. Lê belê ew destpêk bû, bi piranî kadro û xebatkarên zîrek ku bikaribin vî karî bikin, di bin siya vê xebatê de dihatin perwerdekirin.

Ji vî alî ve hêvî û amadekariyeke gelê Ereban ku bikaribin serî rakin tine bû. Nêrîneke wisa giştî ku bûye alternatîf jî tine bû. Lê ew alozî û qeyrana heye nîşan dida ku ihtimala teqîneke heye. Di hevdîtin û nîqaşên ku me dikirin de, di şexsê hinek kesayet û derdoran de, me nêzikbûnên ku ecizbûnê û dibêjin, *"êdî bes e"* dîdîtin. Çi Ereb, çi jî ji gelên cûda dibe, ew nerazîbûn dihat dîtin.

Dema ku li Tûnisê serhildanan destpê kir, çirûskên wê li hemû Rojhilata Navîn belav bûn. Bi taybetî li hêrema Ereban dihatin belavkirin. Êdî ew çirûsk bû gilokek agir û xwe berda nava hêremê. Vê bi xwe re wêrekiyek jî anî. Heya wê demê metirsî û xofek hebû. Digotin kes nikare li hemberî van dewletên Rojhilata Navîn serî rake. Serhildana Tûnisê diyar kir ku gel hemû amade ye û serkêşiyeke dixwaze.

Dibe ku ji bo gelê Kurd ne tiştekî nû bû. Lewra têkoşîna me ya azadiyê zêdetirî çil salî ye dimeşe. Di 2004'an de jî çirûskên vê serîrakirinê derketin holê. Jixwe li parçeyên din yên Kurdistanê jî ew berxwedan hebûn. Bi rastî jî serî rakirina 12'ê adara 2004'an êdî weke şoreşekê bû û pergala heyî re digot, *"êdî bes e."* Ew destpêkek bû. Lê weke tê zanîn ji ber dem û mekanê û şert û mercên wê demê nikarî bi heyvan xwe bigre û bizivire şoreşekê. Lê belê di 2011'an de bi meha adarê re, pijandin û bûyina şoreşê êdî gihiştibû astekê û teqiya.

Wêne-7

***-Weke siyasetmedar û rêxistinên şoreşger, wê demê we ew rewş çawa dinirxand?***

Wê demê em ne di giraniya şoreşê de bûn û me ne dizanî ku dê şoreş bi kûranî xwe berde her cihî. Lê me fêm kir ku êdî teqînek çêbûye û ji xwe re riyeke digere. Ew ji bo me bû şoqek. Her kesî li xwe dipirsî û bawer jî nedikir ku tiştekî wisa çêbibe. Lê ew yek çêbû.

Li seranserî welatên Ereban, serhildan belav bûn. Bajarekî li pêy yê din serî radikir. Lê ji bo ku derbasî Sûriye bibe, hê nîşaneyên diyar tinebûn. Her kes li hêviye bû ku teqînek çêbibe. Weke gelê Kurd, em ji gelek tiştan re amade bûn. Em ne gelekî ku nû bi nû xwe rêxistin bikin bûn. Gelê herî zêde haya xwe ji şoreş û xwe rêxistinkirinê hebû, gelê Kurd bû. Gelê Kurd xwediyê şansekî wisa bû. Ezmûnên çil salî û bi taybetî jî hişyariyên Serokatî li vê qadê, berpirsyarî û hişyariyek dabû gel. Li gorî vê tevgerînek jî hebû. Îhtimala şoreşê jî zêde dibûn. Dema ku serhildan teyisîn ser Sûriye, ji aliyê rêxistinbûnê ve me pir pirsgirek jiyan nekirin. Heya asteke hişyarî jî hebû.

Ji aliyê parastina rewa ve jî amadekariyek hebû. Ew xebat berê hatibûn meşandin. Tê bîra min, ji 2000'î ve û bi piranî jî piştî 2004'an xebatên parastina rewa di nava gel de dihat meşandin. Di nava bajar û gundan de dihatin rêxistinkirin. Li gorî ku li seranserî Rojava ew xebat bên rêxistinkirin, hewldanên veşartî hebûn. Amadekariya wê heya cihekî hebû. Tevdîrên wî ji aliye rêxistinê ve hatibûn girtin.

Li ser vê esasê êdî ew serhildanên mezin yên gel hatin teşwîqkirin. Weke berê bi civîn û kombûyinên biçûk nedibû. Divê bi hezaran mirov derketibana kolanan û mafê xwe bixwastana. Divê êdî rejîm ji welatê me bihata derxistin. Hinek ji vî alî ve amadekarî hatin kirin.

Lê rastiyek din jî hebû. Hê ew tirs ji dilê gel derneketibû. Ew pergala ku bi salan tirs xistibû dilê gel, hê jî tesîra xwe berdewam dikir. Dema ku me got em ê meşê lidarbixin, hinekan gotin, *"em ê çawa meşê lidarbixin, hê dewlet heye*." Salîh Mûslim wan jî, ji hinek tevgerên din yên Kurd re jî hevdîtin kirin da ku meş bê lidarxistin.

Di wê demê de meşek çêbû, bi hezaran kes tevlê bûn. Du cihên cûda hate darxistin. Ew meşa yekemîn bû ku tirs ji dilê gel derxist. Hêzên dewletê jî hinek derdorê kom bûn, xwestin hin mûdaxaleyên biçûk jî bikin, lê nikarîn.

Bi wê re êdî rewş vegeriya destpêkirina şoreşê û divê bi hemû rengî em jê re amadebana. Divê me gel jî ji bo vê amade bikira. Hem weke xebatkar, hem jî weke gel me ew yek ferq kir. Bi vî rengî tevger çêbûn û xebat pêş ketin. Tevgera esasî dê 19'ê Tirmehê de bihata kirin. Lê heya wê demê pir zêde nikaribin tevgerê bandor bikin jî, hinek komên çekdar li ser gel gef dixarin. Nedihiştin gel xwe rêxistin bike. Ew hem ji aliyê rejîmê ve, hem jî ji aliyê hin derdorên din ve çêdibû. Hemû hêremên Rojava dixwestin tevlîheviyê derbixin. Hin gotinên weke, *"Kurd veqetîn û cûdabûnê dixwazin"* derxistin pêş. Nêzikbûnên wisa komplogerî çêdikirin.

Lê hem ji aliyê rêxistinê ve, hem jî ji aliyê girsê ve haya me ji van komployan hebû. Ji ber vê mecalê ku lîstikan pêş bixin û ser bikevin nehat dayin. Rêxistin hem bi awayekî giştî hişyar bû, hem jî gel xistibû wê giraniyê. Ji bo vê heya 19'ê Tirmehê, bi awayekî serkeftî xebat hatin meşandin.

***-Di sala 2011-12'an de berxwedaniya Kurd ku bû bingeha şoreşê çawa pêş ket, rengê xwe çawa da diyarkirin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Di wê demê de şert û mercên navnetewî û Rojhilata Navîn jî hin guhertin bi xwe re anîn. Beriya ku em bikevin sala 2011'an Rêber Apo digot, "*dê bihara gelan were û êdî gel hebûna xwe bi vê yekê bidin îfadekirin. Wê gel vîna xwe nîşan bidin. Divê her netewek jî li gorî vê amadekariyên xwe bike.*" Tespît û nêrînên Serokatî di vê çarçoveyê de bûn.

PYD jî amadekariyên xwe li ser vê bingehê çêkirin. Dema ku şert û mercên dewletên Rojhilata Navîn de jî guhertin çêbûn, li hemberî rejîmên dîktator û faşîst serî rakirinek çêbû. Di sedsala 21'emîn de, ji bo civakan pergalên dîktatorî meleykat bin jî têrê nedikir, nedibû bersiv. Ji ber ku netewên Rojhilata Navîn bi dîrok û çanda xwe dewlemend bûn, di nava xwe de jî her alternatîfek dihewand.

Li ser vê bingehê li Tûnisê, bi agir berdana xwe ya ciwanekî bi navê Muhammed Ebu Ezîzî, serhildanên gel destpê kirin û çirûska bihara gelan ya Rojhilata Navîn jî diyar bû. Mirov ji milekî ve dikare bibêje agirê Şoreşa Rojavayê Kurdistanê bi wê çirûskê destpê kir. Li Tûnisê, ji bo ku ew serhildanên gel bên şikenandin rêbazên leşkerî hatin karanîn û bi tundî çûn ser gel. Lê êdî tiştekî nedikarî gel bide sekinandin. Piştî wê li Misirê, Mexrîbê û Yemenê jî serhildanan destpê kir. Bi vî rengî vegeriya şoreşa Rojhilata Navîn.

Ji bo piştgiriya van serhildanan bê kirin, li Humusa Sûriye jî hin çalakiyên protestoyî çêbûn. Ji bo ku ew çalakî û serhildan berfirehtir û mezin nebin, êrîşên dijwar yên rejîma Sûriye çêbûn û di encamê de ciwanekî 12 salî hate kûştin. Bi vê yekê di nava Sûriye de jî pêla serhildanan destpê kir. Di hundirê dû mehan de van serhildan tevahî Sûriye û Rojhilata Navîn belav bûn. Li Iraqê jî her roj teqîn û kûştin çêdibûn. Ew şoreş weke "bihara Ereban" bi nav dikirin, lê me weke *"bihara gelan"* pênasa kir.

Li ser vê bingehê giştî Sûriye têkoşînekê destpê kir. Lê têkoşîn û berxwedaniyeke me berê ve hebû. Ji bo wê min got, yê ku serhildana 12'ê Adarê fêm neke, nikare wate bide berxwedan û şoreşa me ya Rojava. Wê demê bi çalakiyên 8'ê Adarê de me rengê xwe diyar kir û piştgirî da şoreşên ku di Rojhilata Navîn de çêdibin.

Bi 8'ê Adarê û 16'ê Adarê protestoyên komkûjiya Helepçe destpê kir. Di 21'ê Adara 2011'an de jî gelê Kurd li Sûriye bi serhildanên herî mezin Newroz pêşwazî û pîroz kirin. Ew rihê têkoşîn û serhildanê yê ku di Newrozê de çêbûye, ji bo Rojavayê Kurdistanê, tevahî Sûriye û Rojhilata Navîn tiştekî nû bû. Guhertin ve veguhertineke cîdî hebû. Rêbaz û şêwaza çalakiyên me ne bi awayekî şovenî bû, ne ji bo komkûjî û talanan bû. Me ûslûbekî bi vî rengî tu caran kar neanî. Ûslûbekî li gorî heqîqeta şoreşê, li gorî çand û siyaseta xwe me dimeşand. Da ku guhertin û veguhertinên pergalî li Sûriye çêbibin. Ne li ser esasê hilweşandina pergalê bû, veguhertina zîhniyet û pergalê esas dihat girtin.

Di dîrokê de jî bi piranî kê şoreş kirine, yek rûxandine û bi xwe ketine cihê yê berê û yên ku şoreş kirine îcar bûne deshilatdarên herî mezin. Bi taybetî di Rojhilata Navîn de ew yek pir şênber e. Kê li hemberî zilm û dagirkeriyê serî rakiribe, piştî ku ew pergala heyî hatiye rûxandin, pergaleke hişktir û dijwartir pêş xistiye û ji bo ku ew pergala xwe bide rûnişkandin jî komkûjiyên mezin çêkirine. Li ser gel, çand û baweriyên cuda komkûjiyên mezin dane meşandin.

Di Rojhilata Navîn de ew nêzikbûn bi fikir û hewldanên Rêber Apo hatibû teşhîr kirin. Her wiha ji Sykes-Pîcot bigre heya roja me siyasetên ku di her serdemekê de li ser gelê Kurd hatibûn meşandin teşhîr bûbûn. Lê divê bermahiyên wê siyasetê jî vala bihatana derxistin, ji bo vê zanebûn, têkoşîn û hewldaneke mezin pêwîst dikir.

Di vê serdemê de ya yekemîn, siyaseta dewleta Sûriye ku me qebûl nedikir hebû. Ya duyemîn, nêzikbûn û siyasetên ku em di fikir û armancê de pê re bûn, lê di şêwazê de em ne pêra bûn hebûn. Şêwazên wan li ser esasê xirabkirin, talankirin û redkirinê bûn. Ew jî li hemberî me dibû xetek. Bi vî awayî bi rêgez û siyaseta xwe, bi rêbaz û armancên xwe me xeta seyemîn hildibijart. Me li ser vê esasê jî dixwest têkoşîna xwe bimeşînin. Me ne deshilatdarî qebûl dikirin, ne jî rêbaz û şêwazên

mûhalîfan hildibijartin. Ger me ya duyemîn qebûl bikira, dê pêşî li gelek nîqaş û pirsgirekên cudatir re rê vekiribûya. Tu kes nedifikirî ku em ê wê şêwazê bimeşin.

Her kes digot, *“gelê Kurd zilm, komkûjî, tûndî dîtiye. Ji ber vê gelê yekem ku xwe biavêje vê şêwazê Kurd in.”* Ango dixwestin dîsa yên ku di navbera rejîm û mûxalîfan de bên qetilkirin Kurd bin. Gelek derdoran li ser hebûn û vîna gelê Kurd hesap û planlamayên şaş çêdikirin. Lê ji ber ku gelê Kurd çand û zanebûneke têkoşînê girtibû, dê xebatên pergala xwe bidana meşandin. Ji ber ew nêzikbûna me, mûxalîfan digot, “*gelê Kurd radestî nîzama Sûriye bûye. An jî naxwaze nîzama Sûriyeyê hilweşe û ji holê rabe*.”

Ger wisa be, dema ku di 12’ê Adarê 2004 de ew komkûjiya Kurdan pêk hat, dema ku heya salên 2012’an li ser Kurdan her cureyên tepisandin û tûndiyê pêk hat, hûn li ku bûn? We çawa digirt dest û we çawa piştgirî dida gelê Kurd, ger wisa be Kurd îro çawa piştgiriyê bidin we. Dema ku ew tiştan dihatin ziman her tişt zelal û vekirî dibû.

Gelek partiyên ku xwe Kurd nîşan didan û di nava rejîma Sûriye de bûn û ji hizba BAAS ve girêdayî bûn, dîtin ku dibêtiya serketina mûxalîfan hebû, xwestin hebûna xwe di nava pergala wan de çêbikin. Çawa ku pergala Beşar berê deshilat bû û di nava wê de cihê xwe digirtin, bi hesabê ku dê ew pergal weke Tûnis û Misirê hilweşe û mûxalîf bên ser deshilatdariyê vê carê jî di nava mûxalîfan de cih girtin. Digotin, “*ji bo ku em bê cih û war nemînin, divê em bikevin nava pergala wan.”*

Ew ji bo xwe siyaset meşandin. Di nava gel de jî li hemberî rejîmê bertekek hebû. Lewra bi salan rastî zilm, tepisandin û qirkirinên pergalê hatibûn. Van partiyên dîtir xwestin ji vê yekê sûd werbigrin. Çawa ku Erebên Sûnî, li hemberî Erebên Elewî hatibûn tijîkirin û sorkirin, gelê Kurd jî li gorî berjewendiyên xwe sor dikirin. Nedihêliştin ku siyaseteke aqilane û li gorî demê bê meşandin. Çawa ku nakokiya Sûnî, Elewî û Şîa xistin nava Sûriye û xwestin li ser wan nakokiyan bibin deshilatdar, wan partiyên Kurd jî dixwestin bi bertekên gelê Kurd ji xwe re hin cihan çêbikin.

Wêne-8

***-Lê çima Kurd beşdarî xeta mûxalîfan nebûn?***

Bi vî awayî Erebên Sûnî rabûn serhildanê û rastî komkûjiyên rejîmê hatin. Yê Dûrzî yekser neket nava bûyeran û bendê ma ku piştgiriya xwe bide yên serketine. Her wiha gelên Aşûrî û Sûryanî jî wisa nêzik bûn û di destpêka şoreşê de bêdeng man. Hinekên wan jî ji ber ku hebûna xwe di dewletê de dîdît, piştgirî didan dewletê. Beşeke Elewî û Ermeniyan jî ji ber ku hebûna xwe di nava dewletê de dîdîtin, piştevaniya rejîmê dikirin.

Di nava van gelan de hêza ku herî xurt û rêxistinkirî gelê Kurd bû, ger serî rabikira dê rûxandina dewletê yekser çêbûbûya. Ji milê şer û zanebûnê de jî gelê Kurd xurt bû. Ji ber vê yekê çavê her kes li ser Kurdan bû. Lê weke gelê Kurd em rasterast neketin nava geşedanan. Gelek hêzên navnetewî, mûxalîfên Sûriye û wan partiyên din yên Kurd, her dixwestin Kurdan bikşînin nava ew aloziya Sûriyeyê. Lê çima em bi şêwazeke wisa beşdarî xeta mûxalîfan nebûn? Divê di destpêkê de gelê Kurd hebûna xwe garantî bikira û divê siyaseteke ku pêşeroja xwe zelal bike bimeşanda.

Di dewleta Sûriye de ew nêzikatiya ku hebûn û pêşeroja gelê Kurd qebûl dike tine bû. Di heman demê de di nava van hêzên ku xwe weke mûxalîf û şoreşger bi nav dikirin de jî ew nêzikbûn û piştgirî ji bo Kurdan tine bû. Ji ber van sedeman divê gelê Kurd, di xeta seyemîn de siyaseta xwe bimeşanda û xwe ava bikira.

Ew siyaset ji gelek derdorên Kurd re û ji van partiyên ku di bin navê Kurdiniyê de tevdigerin re şaş dihat. Tevlênebûna geşedanên Sûriye xelet dîdîtin, bertek nîşan didan û digotin, “*weke gelê Kurd, çima em serhildanan nekin?”* Lê gelê Kurd şoreş dikir, her roj di serhildanan de bû û her di nava têkoşînekê de bû. Xwe rêxistin dikirin. Lê her tişt bi rêbazên demokratîk û di cih û dema wê de dikirin. Lê hin partiyên ku berê di nava pergala nîzamê de bûn, ji bo ku bikevin nava pergala mûxalîfan û pêşerojeke xwe çêbikin li hemberî me derdiketin. Propagandayên reşkirinê dimeşandin. An jî ji bo ku gelê Kurd yê Rojava bi felsefe û nêrîna Rêber Apo tevnegere, çi ji destê wan dihat dikirin.

Îro ew yek zêdetir diyar bûye. Gelê Rojavayê Kurdistanê ku bi felsefeya Rêber Apo xwe hesiyaye, xwe rêxistin kiriye û bûye xwedî vîn, dixwestin ji felsefeya Rêber Apo dûr bixin û bi xwe ve girê bidin. Rûxandina rejîmê, an jî di nava mûxalîfan de cih girtin jî, ji bo vê dikirin hincet. Dixwestin bixin bin

tesîr û serweriya xwe, her wan kontrol û araste bikin. Yên ku wisa dikirin partiyên derva ku bi navê Kurdiniyê tevdigeriyabûn. PDK berê ve li gel dewleta Sûriye dengeyek avakiribû û partî û rêxistinên xwe li gorî wê didan meşandin. Heya cihekî vekirî, cihekî şûn ve jî bi awayekî veşartî di nava pergala rejîmê de cih digirtin. Lê dema ku dîtin deshilatdariya hizba BAAS di nava hejandinekê de ye, xwe di nava mûxalîfan de nîşan dan û xwestin berê gelê Kurd yê Rojava bidin mûxalîfan.

Ji bo vê yekê bikin, PYD û bi giştî Tevgera Azadiyê pêşiya xwe asteng dîtin. Li ser vê esasê li hemberî me teşîr û reşkirinek meşandin. Partiyên girêdayî PDK digotin, *"PYD bi nîzamê re ye û naxwaze şoreş pêk were. Ji ber ku PYD girêdayî Bakûrê Kurdistanê ye, girêdayî PKK ye, girêdayî Ocalan e, ne partiyeke Sûriye û Rojava ye. Bawerî û vîneke PYD ku xwe li Sûriye rêxistin bike tine ye. Jixwe PKK jî naxwaze gelê Rojava bibe hêz û vîn, Bakûrê Kurdistanê esas digre. Lê weke partiyên Kurd, em dikarin bibin berdevk û nunerên Kurdên Sûriye û ji bo vê jî divê em piştgiriyê bidin hêzên ku li hemberî rejîmê şer dikin."*

Hinek partiyên girêdayî YNK jî, di destpêkê de xwe weke bêalî didan meşandin û digotin, "*kî bi hêz be, em ê beşdarî wan bibin."* Perspektîfa siyasî ya YNK jî, ji bo partiyên li Rojava girêdayî wan in, ew bû. Wan jî li gorî wê xwe rêxistin dikirin û dimeşandin.

Çawa ku li Sûriye sê xetên siyasî û sê stratejî hebin, di nava gelê Rojavayê Kurdistanê de jî sê xet û fikir hebûn. Fikra yekemîn, fikra PYD û TEV-DEM'ê bû. Ya duyemîn fikra partiyên bi PDK ve girêdayî yên weke El Partî bûn. Fikrek jî ya YNK bû û Partiya Pêşverû pêşengtiya wê dikir. Bi vî awayî em di sala 2011'an de ketin nava şoreşêkê. Ji ber vê yekê ji destpêkirina şoreşê re em dibêjin, şoreşa 11'ê Adarê. Her çiqasa ji berê ve têkoşîn û berxwedaneke gelê Kurd hebû, di 11'ê Adarê de ew yek zelal bû. Ji ber vê dema ku rejîma Sûriye, ew şêwaza têkoşînê dît; nexwest gelê Kurd bide hemberî xwe û di wan de bertekan ava bike. Ji ber ku dizanî li ser gelê Kurd, PDK bi tesîre nedikarî pêşiya PYD jî bigre. Lewra di 12'ê Adar 2004'an de dema ku xwest pêşiyê bigre dît ku rastî çi tê.

Bi vî awayî di sala 2011'an de, di rêmza 8'ê Adarê, 11'ê Adarê, 16'ê Adarê û 21'ê Adarê de şoreşeke nû li Rojavayê Kurdistanê destpê kir. Divê êdî ew şoreş bihata tanzîm kirin. Bi vî awayî em ketin nava amadekarî û rêxistinkirinên şoreşê.

Destpêka 2011'an tabloyekî wisa derdixist holê ku bi xwe re gelek nêrîn û nêzikbûn derdixistin holê. Di destpêkê de gelek tişt ne diyar bûn, ji ber ku em pişt re ketin nav û her tişt zelal bû, em dikarin van nirxandinan bikin. Tevlêbûna me ya vê şoreşê ji bo me jî şansekî mezin bû. Di warê pratîkî û parastinê de ji komkûjiya 12'ê Adarê re tam bersivek nehatibû dayin.

Ji bo ku heman tişt di şexsê gelê Rojava de careke dîtir dubare nebe û em bikaribin bi awayekî rast parastina şoreşê bikin, beriya ku em bikevin nava liv û tevgerê me amadekariyên xwe dikirin. Ji milê parastinê ve berê li wir bingehek çêbûbû. Êrîşên dewleta Tirkiye û Sûriye hebûn û li hemberî vê berxwedanek her çêbûbû û xebateke parastinê jî pêş ketibû. Ew derdorên ajantî dikin, di nava pergalê de cih digrin û pêşiya têkoşîna gelê me dibû asteng, bi yekîneyên parastinê ve rû bi rû diman û yekîneyên parastinê li hemberî van derdoran xwedî helwest bû.

***-Di nava ew aloziya Rojhilata Navîn de, Şoreşa Rojava çawa xwe rêxistin kir?***

**MERYEM KOBANÊ:** Raperîna Sûrî meha Adarê li Dera destpê kir. Ew raperîna destpêkirî, êdî li Sûrî sekinî. Pişt re jî pir dewletên wekî ABD, Rûsya, Îran xwestin li Sûrî polîtîka bimeşînin. Di vir de berjewendiyên siyasî, dîrokî, aborî hene. Niha Îran şerê xwe di Sûrî'de dimeşîne. Parastina xwe di Sûrî de dike. Tirkiye parastina xwe di Sûrî'de dike. Pir dewletên navnetewî yên ku bi salan dijbertiya hevdu dikirin îro ji ber berjewendiyên xwe siyasetek konjokturel didin meşandin. Wekî din di Sûrî de gelek netewên ku dihatin perçiqandin, pirsgirekên ku derdiketin, dagirkeriya ku li ser zîhnê mirovan dihate avakirin bi xwe re teqînek çêkir.

Wek rêxistin me çawa xwe di vê şoreşê de bi cih kir, me çawa nirxand, ji bo me ya girîng ew e. Xala esasî ku em ser bisekinin, şoreşa me ya li Rojava ye. Tê zanîn ku Rêbertî li Sûrî bi salan hem di aliyê gel ve, hem ji aliyê rêxistinkirinê ve xebatek girîng meşandibû. Bi hezaran keç û xortên me li vî perçeyî tevlî şoreşê bûne. Rojava, yêk ji parçeyê Kurdistanê ku li Lozanê kirine çar parçe ye. Bi vê kêliya dîrokî ve ew derfeta dîrokî kete destê me.

Hêjayê gotinêye ku em behsa 2004 bikin. 12 Adar'a 2004 şerê li Qamişlo çêbûyî de bi sedan ciwanên Kurdan hatin girtin. Piştî wê rewşa me li Sûrî hinek hate guhertin. Bêgûman beriya wê jî, ji aliyê rejîma Sûrî ve li ser gelê Kurd êrîşên cûr bi cûr hene. Rewşên wekî girtin, sirgunkirin, şkence û hwd tên jiyankirin. Ji aliyê din jî siyasetek nerm ya ku hêdî hêdî asîmîle dike dihat pêş xistin. Ji bo gel perçe bike kembera Ereban çêkiribû. Bi viya ve gelê Kurd, ji erde xwe xerîb hiştibûn. Polîtîkaya ku dihat meşandin; *'yan tê bibe Ereb yan jî mafê jiyankirinê nîne'* bû. Ji ber van sedeman hemûyan, ji bo ku em gelê xwe biparêzin pêwîstî bi rêxistinbûyînek xurt hebû. Viya hate kirin.

Ji bo ku gel xwe bi xwe biparêze ya rastî lêgerînên parastinê di wê deme de bi şekleki çalak destpêkir. Heya wê deme piranî xebatên siyasî, rêxistinî dihatin meşandin. Piştî wê deme şûn ve pêwîstî hêzeke leşkerî jî hat dîtin. Dibe ku bi rengekê hucreyan bû lê destpêkirinek çêbû. Ji bo ku em bikaribin xwe nû ve rêxistin bikin, di destpêka şoreşê, ango sala 2011'an de, em jî wek rêxistin, ketin nava pêvajoyekî nû.

Paradigmaya me ya nû jî, li ser esasa şerê gelê şoreşgerî û pê ve girêdayî civakeke exlaqî, polîtîk, azadixwaziya jinê bû. Da ku em li ser vê esasê bikaribin xwe rêxistin bikin, lêgerîn û tekoşîna me hat pêş xistin. Di Sûrî de bi şiara ku 'bila Beşar biçe' meş hatin lidarxistin. Di encamê de gelek girtin, kûştin, binçavkirin hatin çêkirin. Di vê rewşê de yê ku herî zêde xwedî avantaj em bûn. Li ser esasa avakirina civakeke exlaqî û polîtîk, civakeke ku xwe bi xwe dide meşandin, me şoreş destpê kir. Weke tevger me xeta seyemîn esas girt û li ser vê xetê me şoreş ava kir.

**Li Sûriyeyê Xeta Seyemîn**

Wê deme Artêşa Sûrî ya Azad hatibû avakirin. Di nava rejîma Sûrî de perçebûyîn çêbibû. Cihên cuda cuda li hemberî rejima Esad raperîn çêdibûn. Dewleta Sûrî pir lewaz bibû. Bandora rejîma Sûrî her ku çû kêm bû. Destê derve jî kete nav. Hêza bi navê Cebhet-el Nûsra bi salan xwe di nava rejîma Sûrî de rêxistin kiribû. Gelek komutanên ji artêşa Sûrî qutbûn, hatin tevlî vê hêzê bûn. Rewş hinek jî vegeriya meseleya Şîa-Sûnî, yanî meseleyekê mezhebî. Ew dewletên wekî Katar, Erebîstan û hwd. ketin nav û êdî ji kontrole derket.

Bi vî şêwazî gelek bajarên rejîmê vala kirin, gelek mirov qetilkirin, bi sedan leşkerên Sûrî, piraniya wan teslîm bûn, hinekan firar kirin, hinek hatin kuştin. Di nava artêşa Sûrî bi xwe de êdî valatiyek çêbû.

Yê ku herî zêde xwest vî agirî gur bike yêk jî Tirkiye bû. Demekê têkiliyên Tirkiyê bi rejîma Sûrî re asta herî jor de bûn. Lê bi demê re yê ku herî zêde piştgirî da muxalefetê di welatê xwe de cih dayê yêk jî dewleta Tirkiyê bû. Van hêzên muxalif, dewletên weke Tirkiye, Katar, Siûdî Erebistan bi cih kirin. Çekên ku di Sûrî de hatin şûxilandin piranî ji van dewletan hatin. Hêzên bi navê Cebhet-el Nûsra, Ehrar El Şam, Suwar El Reqqa, Sûwar Der Alî hemû deran xwe avakirin. Ji derveyî viya her eşîrek Ereban ji xwe re ketîbeyek çêkir. Heta dawiya 2012'an artêşa azad êdî ji bin kontrole derket.

Dewleta Sûrî jî bi rengekî hişk çû ser van hêzan. Lê Artêşa Azad gelek cihên wekî Helep, Dera û hwd dewlet derxist û xwe cih kir. Di nava van hêzên muxalîf de her cure kes hebûn. Hinek ji bo diziyê, hinek ji bo welatparêziyê, hinek ji bo talankirinê, hinek ji aliyê dewletan ve hatibûn amadekirin, yanî rewşeke tevlîhev derketibû holê. Di encamê de bi hezaran mirov hatin kuştin, bê cih û war man.

Li hemberî vê rewşa ku dihat jiyankirin, rewşa me çibû, viya ji me re girîng e. Ew rewşa ku hebû him di warê siyasî de hem di warê civakî de hat nirxandin. Bêgûman beriya wê jî kedeke Rêbertî ya 20 salan zêdetir hebû. Encama xebata bi salan bi tevlîbûyîn çêbibûn. Bi sedan şehîdên me hebûn. Yanî Şoreşa Rojava ser hîma Serokatî ya bi salan û xebatên rêxistinî hat avakirin. Weke siyaset jî hilbijartina xeta sêyemîn hişt ku em şoreşê ser bixin.

Piştî girtina Serokatî hindekî rewşa rêxistinê lewaz ket. Rûxmî ku şovenîzma BAAS zêde jî bû, refleksa li hemberî wê bi demê re hatibû lewazkirin. Taybet ji sala 2001'an heta 2004'an, vê rewşê berdewam kir. Di nava gel de rewşa aborî xerab bûbû, krîza civakî mezin bibû di encamê de koçberbûyîna derveyî welat pêşketibû. Ya rastî ev benda teqînekê bûn. Ji raperîna li Qamişlo çêbûyî û wir ve, ne tenê Qamişlo wek Kurdên Rojava cara yekemîn li hemberî dewletê serî radikirin. Belkî bi plan nebû, lê ji ber ku cara yekemîn bû, girîng bû û dewlet jî ciddî tirsand.

Deverên wekî Serêkaniye, Dêrik, Amûdê, Kobanê, heta Dêra Zorê jî ev serhildan çêdibûn. Hêjayî gotinêye ku cara yekemîn di Kobanê de dewlet tê derxistin. Ya rastî kîna Sînemaya Amûdê jî di gel de zêdebû. Bi wê bûyerê ve hişyarbûyînek jî çêdibû. Ji ber ku di wê dema bûyer çêdibe de refleksa gel pêş nakeve. Lê piştî bûyera Qamişlo gel dikeve ferqê û serî hildide. Gel êdî dizanî ku dewlet dixwaze hebûna wan tine bike, jiyana wan xerab bike. Rejîma BAAS li hemberî gel polîtîkayek nerm dida meşandin, ji bo wê jî li hemberî van êrîşên sînsî refleks nedihat avakirin, lewaz dima. Dema ku me ji nû ve xwe rêxistin kir, me van hesaban kirin. Yanî me got *'ger em xwe bi awayekî rast rêxistin nekin, dê weke 12 Adar'ê bibe.'*

Aliyê gel ve rêxistinkirina me wisa hêsan nebû. Her çiqasî tekoşîna bi salan hebû jî, kêleka wê di gelê me de jî dûrbûyînek, çavtirsandinek hatibû çêkirin. Me destpêkê gel rêxistin kir. Em mal bi mal geriyan, kes bi kes me bi gel re axaft, me civîn çêkir, ji bo ku em şoreşê bi wana bidin fêmkirin. Di encamê de me bi gel da fêmkirin ku ev derfeteke dîrokî ye ku ketiye deste Kurdan, pêwîst e em vê derfetê baş binirxînin, em êdî xizmeta xwe bikin, bibin aîdê xwe. Di bin slogana; *'civakeke exlaqî û polîtîk, civakeke ku xwe bi xwe dide meşandin*' em meşiyan; me xwest em valatiyên ku derketine holê dagirin.

Rêbaza ku me di nava rêxistinkirina gel de dida meşandin, bêgûman di çerçoveya projeya Serokatî de avakirina meclis, komûnan bû. Bi vî awayî mal bi mal, tax bi tax, gund bi gund em geriyan û me rêxistina xwe çêkir. Ne tenê welatparêz, me xwest em xwe bigihînin hemû derdoran û rêxistin bikin. Ji bo ku em projeya Xweseriya Demokratîk gel bidin fêmkirin me viya kir.

Wêne-9

**'Em dixwazin xwe bi xwe rê ve bibin...'**

Di vir de tiştekî girîng heye. Gel destpêkê baweriya xwe zêde pê nedianî. Digot; *'yan em bibin aliyê dewletê yan jî em bibin aliyê muxalefetê.*' Heta welatparêzên me jî digotin ku divê em aliyekî bigirin. Bawerî nebû ku em xwe bi xwe rêxistin bikin, rê ve bibin. Lê me digot; *"em ne aliyê dewletê dibin, ne jî aliyê muxalefetê. Eger kî projeya me bipejirîne em ê aliyê wan bin. Yanî em wan red nakin, lê weke civak, weke rêxistin em ê xwe bi xwe rê ve bibin.*"

Bêgûman viya wisa hêsan nebû. Pir mirovan digotin "*hûn alîgirên dewletê ne"* û êrîş li ser me dikirin, em tawanbar dikirin. Hinek kesan jî digotin dewlet hêz e, pêwîst e em aliyê dewletê bin. Digotin "*eger wisa nebe, em ê ber lingan biçin*". Yên ku ji hinek partiyên Kurd yên muxalîf pêk dihatin, heta niha jî hene, digotin *"em aliyê muxalefetê ne"* û li ser vê nêrînê rabûn meş kirin, protesto kirin. Heta 2012'an meha Pûşberê me jî li ser esasa ku 'em dixwazin xwe bi xwe rê ve bibin' zêdetir meş lidarxistin.

Pişt re jî di bin ew qasî zextan de, ji bo ku em hem di aliyê civakî, siyasî, rêxistinî ve, xwe ji nû ve avabikin, me kongreya TEV-DEM'ê dar xist. Di encama kongreyê de her bajarekî û heremekê meclîsên wê derketin. Hevserokên meclîsan hatin hilbijartin. Wê demê PYD jî hebû lê ji bo ku rêxistinkirineke nû wê çêbibe pêwistî hat dîtin ku TEV-DEM were avakirin. Pişt re hemû bajarên Rojava hevserok hatin hilbijartin.

Bi avakirina meclîsan ve bîryar hate girtin ku her înê meş were lidarxistin. Di bin slogana; 'em azadî dixwazin' gel derket kolanan û meşiyan. Ji ber ku roja înê roja xutbêyê ye, ji bo misilmanan rojeke girîng e, meş di vê rojê de dihatin lidarxistin. Di hemû şoreşên Rojhilata Navîn de, meş roja înê dihatin lidarxistin. Cara yekemîn li Dera 18'ê Adar'ê meşa înê li dij dewletê hat lidarxistin. Êdî weke kevneşopiyekê her roja înê, ji bo azadî, wekhevî, demokrasiyê meş dihatin lidarxistin. Di bin slogana '*Kurdistaneke serbixwe, Sûrîyeyek demokratik'* meş didomîn.

***-We jî di nava pêvajoyê şoreşê de cihê xwe girt û ji nêz ve şopand. Şoreş li ser bingeheke çawa pêş ket?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Di sala 2011'an de ez tevlî xebatên Şoreşa Rojava bûm. Wê demê şoreşê destpêkiribû. Şoreşa gelan bû. Li gelek welatên Ereban jî hebû, li Rojava jî destpêkiribû. Dema ku îro em lê mezî dikin, asta ku şoreş gihiştiyê; gelê Rojavayê Kurdistanê xwe bi xwe rêve dibe û vîna xwe derxistiye holê. Lê bingeheke vê heye. Wisa bi serê xwe çênebûye.

Di van pêşketinan de kedeke pir mezin hatiye dayin, ew jî keda Rêber Apo ye. Keda hevalên şehîd e. Divê di serî de mirov vê bibîne. Ger ne ji Rêber Apo bûya, ne ji hevalên şehîd bûya, îro ew şoreşa ku li Rojava pêk hatiye; xweseriya xwe îlan kiriye û gel xwe ji rê ve dibe û dengê xwe ji cîhanê olandiye, dernediket holê. Hem ji aliyê xwe parastinê ve, hem jî ji aliyê pergala xweseriya demokratîk ve wisa ye. Hemû êrîşên tên ser Rojava, bi alîkariya hêzên ku xwe li ser paradigmaya Rêber Apo perwerde kirine hatine şikenandin. Li ser vê esasê pêşketinên şoreşgerî çêbûne. Keda Rêber Apo, di vê şoreşê de risteke sereke dilîze. Divê mirov nebêje ku wisa bi rehetî bihara gelan destpê kir û Şoreşa Rojava çêbû, ne wisa ye.

Berî vê jî hin partiyên din hebûn, ji PKK jî kevntir bûn. Lê tiştek nekirin, niha jî tiştekî nakin. Lê Tevgera Azadiya Kurd PKK bi rêberiya Serokatî, ji sala 79'an ku derbasî Rojavayê Kurdistanê dibe û vir ve kedeke pir mezin dide. Rêber Apo xebateke giranbiha lê meşandiye û bi hezaran mirov perwerde kirine. Gel tanzîm kiriye û heya roja îro jî perspektîfên vê dide. Dê gel çawa xwe tanzîm bike, çawa ber xwe bide û çawa pergala xwe ava bike; perspektîfa vê hatiye dayin. Me jî bi vê perspektîf cihê xwe di nava vê têkoşînê de girt. Me riya ku ew vekirin, berdewam kirin.

Diyar bû ku ew tevlîheviyên ku li bajarên Ereban de çêdibûn, dê tevahî Sûriye bida ber xwe. Ji ber vê jî divê tevgerbûna gelê Kurd ku li wê derê ye xurtir bûya. Lewra weke me got, ew qesa ked û xebat hebûn. Ew qesa şehîd û şoreşger hebûn. Dema em çûn, ji aliyê guhertin û pêşketina civakê ve gelek tişt çêbibûn.

Piştî ku Rêber Apo ji wir derket û heya 2010'an pergala Sûriye jî hinek xirab bibû. Gelek hevalên me girtibûn û radestî Tirkiye kiribûn. Rêxistinbûna gel jî, li gorî berê hinek lewaz bibû. Li ser ew nifşa nû ku deh salên dawî pêş ketiye, tesîreke dewletê çêbibû. Tesîrek pergala kapîtalîst li ser çêbibû. Li ser malbatên şehîdan, derdorên ku têkilî bi tevgerê re hebûn û yên ku Serokatî rêxistin kirine hê jî cewherîbûyinek hebû. Lê yên din ketibûn bin bandora pergalê. Dîsa jî di demeke kin de em ketin nav û bi xebatên lez û bez gel ji nû ve tanzîm kir û komî ser hev û din kir. Berê jî têkoşînek hebû, lê di vê astê de ne rêxistinkirî bû.

Bingehek jî berê hebû, mînak di 2004'an de dema ku komkûjiya Qamişlo çêbû bingehek parastinê ji bo gelê Rojava çêbibû. Li ser esasê parastina cewherî bû. Lê bi giştî ne weke ku tê xwestin bû. Dema ku pêvajoyê şoreşê destpêkir, hêzên me bi navê Yekîneyên Xweparastinê yên Kurdistanê-YXK xwe tanzîm kiribûn. Ew pêşiya me destpêkiribûn û ji berê ve li wir kar dikirin, bingeha xwe parastinê û pergala xweseriyê bi navê TEV-DEM'ê ava kiribûn. Ji bo ku bajarên Kurdistanê êdî xwe bi xwe rêvebibin û biparêzin, xebatên xweseriya demokratîk pêş diketin û pergala me jî li wir hêdî hêdî dihat avakirin. Hevalan nedihişt ku valatiyek bê jiyankirin.

Ji aliyê parastinê ve jî, pêwistiyeke mezin hebû. Lewra êrîş pir bûn, şerekî xurt li hêremê hebû. Bi vî awayî hêzên parastinê jî xwe ava dikir û roj bi roj xwe mezin dikir. Di destpêkê de min hinek karê rêxistinkirina gel kir, piştre derbasî xebatên YPG bûm. Di serî de YXK bû, pişt re bû Yekîneyên Parastina Gel -YPG.

Li Sûriye jî qûwetek derketibû holê, digotin em ê li hemberî Beşar Esad şer bikin. Lê zîhniyeta wan yek bû. Nîzama Beşar çawa ku vîna gelê Kurd nas nedikir, ew hêzên din jî wisa nêzik dibûn. Cih bi cih ji rejîmê jî xiraptir bûn. Ew tiştan pir derdiketin pêş. Gelek hêzên weke El Nûsra, hêzên girêdayî El Qaîde hebûn. Van jî vîna gelê Kurd nasnedikirin. Li kûderê Kurdekî behsa berxwedaniyê bikira, bi awayekî nepenî ew Kurd ji holê radikirin.

Li vê derê, çiqasa şer di hûndirê Sûriye de çêbibe jî; tiştê ku me esas digirt, parastina cihên ku Kurd lê dijîn û avakirina pergala xwe bû. Pergaleke weke xeta seyemîn me pêş dixist. Em ne bi rejîmê re, ne jî hêzên ku digotin em ê rejîmê têk bibin re tevgerîn. Me digot em ê xeta demokratîk ya seyemîn pêş bixin. Li ser esasê bîrdoziya Rêber Apo, avakirina xweseriya demokratîk û belavkirina konfederalîzma demokratîk li Rojhilata Navîn me dikir armanc. Armancên dûvdirêj jî li ser esasê felsefeya Rêber Apo bûn. Bi vî rengî jî xwe rêxistinkirin çêdibû.

Roj bi roj valatî çêdibûn, rejîma BAAS paşve diket. Pergala me jî roj bi roj xwe xurt dikir, xwe ji nû ve ava dikir. Rejîma BAAS li gelek cihan darbe dixwar. Di 2012'an de teqîniyeke pir mezin li Şamê çêbû û gelek reyadarên nizama BAAS li wir hatin kûştin. Darbeyek pir mezin xwarin û gelek cih ketin bin serweriya Artêşa Azad.

Kurdan jî rewşa xwe nirxandin û di 19'ê Tirmehê de, li Kobanê xwepêşandanek darxistin û hemû hêzên rejîmê ji Kobanê derxistin. Her wiha ew yek belavî Derîk, Efrîn û bajarên din bû. Hinek bajar di demeke kin de hatin paqij kirin û pergala Xweseriya Demokratîk li van deran hate îlan kirin. Ji ber vê 19'ê Tirmehê ji bo Şoreşa Rojava û hemû gelê Kurd rojeke dîrokî ye.

Ew yek ji bo tevahî gelê Kurdistanê, bû sedema moraleke pir mezin. Rast e, gelek caran serhildan û têkoşîn çêbûne; lê vê carê pêşketinên ku çêdibûn, li ser esasê xwe ava kirin, îlan kirin û parastinê bûn.

**3-Şoreşa 19'ê Tirmehê**

***-Bi Xetên giştî be jî hûn dikarin ji me re behsa pêşketina şoreşa 19'ê Tirmehê bikin. Çirûskên ewil yên şoreşê çawa pêketin?***

**ADIL QAMIŞLO:** Li Rojava gelek hêzên ku derfetên xwe yên madî ji me zêdetirin û xwestin vê şoreşê pêk bînin hebûn, lê nikarîn. Lewra şoreş pêkanîn ne tiştekî wisa erzan e. 19'ê Tirmehê ne destpêka şoreşê ye, ne jî hemû şoreş e. Di vê rojê de Kobanê hate rizgarkirin û weke rizgariya Rojava hate qebûlkirin. Lê xebatên ku beriya wê hatibûn kirin hebûn. Di rizgarkirinê de gavek hate avitin. Mişqûleya esasî parastin bû. Fedakarî û berxwedana esasî di parastinê de hate kirin. Parastina wê, ji rizgarkirina wê jî zehmetir bû. Mesela di rizgarkirina hemû bajarên Rojava de, penc-şeş heval şehîd ketin; lê di parastina wê de hezar û pensid heval şehîd ket. Wisa be jî şoreş berdewam dike.

Guhertin û veguhertina Sûriye û Rojava baş hate xwendin. Teqwîmeke baş hate diyarkirin. Mesela beriya 19'ê Tirmehê em biketina tevgerê, hê rejîm xurt bû û dibe ku êrîş jî bikira. Ger derengtir bimana, dibe ku Artêşa Azad, El Nûsra û DAİŞ biketa Rojava. Ji ber vê teqwîm di cih de bû. Beriya wê civak hatibû amadekirin, rêxistin pêş ketibû. Hem jî teqwîma şoreşê baş hate diyarkirin. Gelekan ew texmîn nedikir û digotin,"*ger hûn bajarekî bigrin, rejîm pir xurt e û dê komkûjiyan bike."*

Mesela ENKS, peşmerge jî perwerde kiribûn; lê cesaret nedikir ku gaveke wisa biavêje. Digotin, *"dê Artêşa Azad bajarên me jî rizgar bike û dê me jî tevlê bikin*." Hêza wan ku şoreşê çêbikin tine bû. Piştî me bajar rizgar kirin jî digotin, "*dê an rejîm, an jî DAİŞ ji we bigre."* Digotin, *"we ji firsendekî îstîfade kiriye û emrê wê ne dirêj e.*" Rast e, me ji firsendan îstîfade kir; lê bingeha wê jî xurt hatibû danîn. Wisa hêzeke nedikarî bê û ji destê me derxe. Yek jî mekanîzmayeke me ya parastinê hebû.

Şoreş tenê ji aliyê girtina bajaran ve çênebû. Ji aliyê kesayet ve jî çêbû; gel bi vîn û bi bawerî bû. Civakeke azad, tê avakirin. Pergaleke demokratîk pêş dikeve. Ew hemû berhemên şoreşê ne. Mesela cara ewil, fikir û felsefeya Serokatî li Rojava pratîze bû. Ji bo vê li parçayên din yên Kurdistanê û hinek cihan hewldan çêbûn, lê li Rojava ji hemû aliyan ve fikrên Serokatî şênber bûn. Fêkiyên wê derketin holê.

Êdî fikrên Serokatî, tenê weke xeyalekê em nikarin bigrin dest; êdî mînaka wê derket holê. Hêza jin û ciwanan binêrin, asta perwerde û nêzikatiyên fikrî binêrin, pergala demokratîk û mirovî binêrin; van hemûyan îspat kir ku dema ku em fikrên Rêber Apo di pratîkê de pêk bînin civakeke bi hêz û pergaleke demokratîk derdikeve holê.

Xeynî van tiştan şoreş bûyerên demdirêj in. Tenê bi girtin û rizgarkirina hin cihan bes nake. Têkoşîn û guhertinên demdirêj pêwîst dikin. Dem jê re pêwîst dike. Mînaka Rûsya heye; digotin, *"ew kesên berê hemû kapîtalîst bûn, lê niha bûne sosyalîst.*" Tenê bi boyaxekê mirov û civak naguherin. Piştî heftî salî êdî vê civakê alozî jiyan kirin. Lewra bi darê zorê çêbûbû, wisa bi perwerdeyan û bi bêhfirehî çênebûbûn. Ji ber vê ne karê rojek û dûdûyan e. Ji karê îdarî bigre, heya aborî û parastinê gelek tişt pê re pêwîst dikin.

Lê niha pêşiya vê vebûye. Di vê mijarê de jî, her ku te gavek avit tu zêdetir baweriyê dide gel û pêşiya pêngava din vedikê. Mesela di destpêkê de gelek kesên ji civakê reviyan û çûn, niha dîsa vedigerin. Lewra hin tiştan şênber dibînin. Dema ku perwerdeya çekdarî bîbîne, dikare xwe biparêze. Ew

yek dîtin û ew bawerî di gel de çêbû. Mesela li ser esasê koperatîf û çandiniyê aboriyek pêş bikeve, dê gel dikare xwe bi xwe rêve bibe. Ew jî di gavên hatiye avitin de şênber hate dîtin.

Di mijara parastinê de, di serî de zanistiyek tine bû. Ew refleksên parastinê lewaz bûn. Ji ber vê erkdariya leşkerî ya mecbûrî me derxist. An na zanebûneke parastinê tam pêşketibûya, di şoreşan de tiştên wisa pêwîst nakin. Lê baweriya Kurdan bi xwe tinebû. Dema ku teqînek çêbû gotin, "*dê DAİŞ were, me hemûyan bikûje.*" Ji ber vê reviyan. Lê di pratîkê de dîtin ku ne wisa ye. Diyar bû ku keçeke Kurd, dikare xwe di DAİŞ de biteqîne û DAİŞ'ê di cihê wê de bide seknandin. Vîna wan ciwanan dîtin. Bi hezaran mirovên ku bi awayekî dildar tevlî xwe parastina cewherî dibin jî hene, lê ew mantiqa parastinê hê jî di Kurdan de baş rûneniştiye. Tu erdnigariyeke fireh diparêzê û hejmareke mezin ya parastinê pêwîst dike. Ger ew bi dil çêbe, baş e. Lê na, tu neçar dimînê ku erkdariyeke wisa bide her kesî.

YPG jî xwe îspat kir ku ne hêzeke hizbî ye. Di nav de hemû gelên hêremê hene. Partiyên din di nav de hene. Ji bo parastina hemû pêkhateyan, berxwedanê dike. Mesela li Til Temir, DAİŞ'ê êrîşî gundên Sûryanan dike. Lê YPG nêzikî sed şehîdî da û ew der paqij kir. Miletê Sûryan jî ew dît. Dîsa miletê Hesekê, ji nivî wan Ereb in. Lê YPG ji bo rizgarkirina wan, ew qesa berdel dan.

***-Hun di vê mijarê de dikarin çi bibêjin? Beriya Şoreşê û piştî wê pêvajoyekî çawa hebû, hûn dikarin ji me re rawa bikin?***

**MAHMUD BERXWEDAN:** Di sala 2012'yan de êdî ji binî ve aliyê leşkerî derket pêş. Helbet, xebata me ya nava gel timî hebû. Bi giştî li Sûriyê jî meşên înê ku dest pê kiribûn, kêm bûn û çalakiyên leşkerî dest pê kirin. Êdî gelek bajar, bajarok û navçeyên biçûk ji destê rejîmê derketin. Mewziyên rejîmê li gelek navçeyan lawaz bû.

Rejîma Sûriyê esas xwe bi hêza îstixbaratî bi rê ve dibir. Lê hêza îstixbaratî wexta ku bû şer, têrê nekir. Di aliyê xwe de pêwîst bû hemû navçeyan, bajaran biparêze. Ji bo wê bi armanca ku derbeyê nexwe ji gelek navçeyên biçûk xwe vekişand. Mînak li Helebê li cihên weke Hirêtanê, Mari, Anedan, li Ezaz yanî li Bakurê Helebê hema hema rejîmê serweriya xwe winda kir. Yanî kontrol kete destê hêza leşkerî ya muxalefetê. Paşî herêmên nêzî sînorê Tirkiyê yanî Cerablûs kete destê muxalefetê.

Derdorên herêmên me jî, mînak derdora Efrînê bi piranî kete destê muxalefetê. Mesele Anedanê, Bat Ezê, Ezazê, Hirêtanê yanî derdora Efrînê hemû ket destê muxalefetê ya bi navê "*Artêşa Azad.*" Derdora Kobanê jî wisa bû. Derdora Minbic, Cerablûs, Sirrîn, Girêspî, derdora Reqayê û gelek cihên din ketin destê Artêşa Azad. Li bakurê Helebê hemû wisa şerên giran tê de çêbûn û kete destê muxalefetê. Êdî derfet çêbû ku em jî gavekê biavêjin û derbasî pêvajoyeke nû bibin. Helbet heta wê çaxê di asta rêxistinî û leşkerî de me gav avêtibû.

Lê pêwîst bû ku em gaveke din biavêjin. Çi bû ev gav? Êdî rejîmê di herêmên me de dema xwe xelas kiriyê, diviyabû me êdî ji gelek navçeyên me rejîm biavêta. Dema wê hatibû. Vaye ev jî di 19'ê Tîrmehê de çêbû. Ev pêvajo, 19`ê Tîrmehê 2012'an li Kobanê dest pê kir. Şert û mercên wê derê êdî temam bûbûn ku em gavê biavêjin.

**Ev welat yê me ye...**

Destpêkê me rejîm ji Kobanê avêt. Di şevekê de hemû saziyên dewletê yên ku di bajêr de heyî, bi rengekî plankirî bi hev re me dest danî ser. Jixwe tu şer çênebû, dewletê jî pir şer nekir. Yên heyî hatin girtin, çekên wan û navendên wan desteser bûn û bi vî rengî bajarê Kobanê azad bû. Heta vê dîrokê navê YPG'ê kesî nedizanî, belav nebûbû. Me rêxistin çêkiribû, hêz hebû. Lê me navê xwe îlan nekiribû. Bi rizgarkirina Kobanê re me YPG'ê jî îlan kir. Bi vî rengî, me ji her kesî re ev peyam da:

*"Ev welat yê me ye, ev bajar yê me ne û `Yekîneyên Parastina Gel` jî hêza leşkerî ya gelê me ye, ev bajar me rizgar kir û ewlehiya vê derê ji me tê pirsîn. Êdî divê tu kes neyê û nêzî nebe. Çi hêzê ku were vî bajarî, em ê pê re şer bikin. Ji ber ku ev bajar bajarê me ye û me rizgar kiriye. Me rejîm jê avêtiye."*

Bi vî awayî me Kobanê xiste lîsteya bajarên rizgarkirî. Bi heman rengî, ji ber ku şert û merc çêbûbûn, Efrînê jî pêwîst bû gaveke wisa biavêta. Piştî Kobanê bi du rojan di 21'ê mehê de Efrînê jî gaveke wisa avêt. Hem ji aliyê gel û hem ji aliyê hêza YPG'ê ve hemû saziyên dewletê yên di Efrînê de heyî, di bajêr de di navçeyan de hatin desteserkirin. Ev di dîroka me ya Rojava de şoreşek bû. Şoreşek

ku dihate hêvîkirin bû. Lê mixabin ev şert û mercên li Kobanê, li Efrînê, li derdora Helebê û li Bakurê Helebê çêbûyî, li Cizîrê çênebûn. Li Cizîrê hîn gule jî nehatibû teqandin. Lê li Cizîrê PDK'ê bi şêwazeki cidî ev pêşketin dîtin û xwest ji van sûd wergire. Çawa me li Rojava YPG'ê ava kir, wan jî ciwanên Rojavayî yên ku direvin, ji welat derdikevin, hinekê jî bizanebûn hêzek wisa rêxistin kirin, kişandin û birin Başûr. Li Başûr perwerde kirin. Bi perwerdeyeke leşkerî ew amade kirin, navê wê hêzê jî 'Pêşmergeyên Rojava' danîn ku werin û Cizîrê bistînin. Yanî wan jî plana xwe wisa çêkiribûn.

Wan wiha digot; *"Jixwe Kobanê û Efrînê Apoger in. Karê me bi wan deran zêde tine ye. Ne pirsgirêk e. Ew der diyar in, em bixwazin jî em nikarin bistînin. Lê Cizîrê ya me ye û ji me tê pirsîn. Alîgirên me tê de pir in."* Ya din jî li ser sînor amadekariyên herî mezin kirin, pêşmerge perwerde kirin û amade kirin. Wê şeva 23'ê Tîrmehê derbas bûna. Plana xwe çêkiribûn ku di wê dîrokê de bên û Dêrîkê ku nêzî sînor e, bistînin. Yanî bên pêşî sînor bigrin, jixwe dema sînor girtin wê werin bajêr jî bistînin. Agahî dabûn hêza xwe ya siyasî ENKS'ê jî. Li wê derê amadekariyên wan kiribûn, hinek çêlek kirîbûn. Dema pêşmerge hatin wê ji wan re ser jê bikirana. Helbet me ev rewş zû ferq kir. Di plana me de jî di destpêkê de standina Dêrîkê tinebû. Ji ber ku şert û merc çênebûbûn, me ji bo demeke din hiştibû. Lê piştî van pêşketinan, beriya ku ew bikevin tevgerê, me hereket kir.

Di 22'yê mehê de me sînorê Dêrîkê hemû girt. Me bi rejîmê re şer kir û me sînor girt. Kobanê û Efrînê hemû me bê şer standibû. Lê sînorê Dêrîkê me bi şer girt. Me ji serbazgeha rejîmê ya Zihêriyê ku gundekî li ser sînor, me di seat 9'ê de dest pê kir. Armanca me ew bû ku em sînor bi tevahî bigrin. Piştî ku me sînor girt jixwe kî were nav axa me, kî were em ê lê xin. Em nahêlin kes were, ev erdê me ye. Seat 3`yan yanî bi van pêşketinên li ser sînor re, milet bi înisiyatîfa xwe rabû û bajar bi xwe teqiya. Bajar hemû, hemû miletê ku çeka xwe heyî, heta bi çifte-çeka nêçîrê, dar û beran hemûyan êrîşê rejîmê kirin. Li bajêr şer derket. Hevalan got "*bajar tevlîhev bûye, xwe bigihînin bajêr*." Li ser vê agahiyê seat derdora sê û nîv em gihîştin bajêr. Milet navendên dewletê girtibûn û ketibûn tê de. Em`in dewle, Cinayî, Koşk û Qeymeqamtî girtibûn. Tenê Em`in Eskerî mabû, yanî tenê navendek mabû û yê din hemû hatibûn girtin. Dema em hatin li du deran şer hebû, milet û dewletê li hev dixist.

Li wê derê Hevalêk bi navê Bawer şehîd bû. Ev heval, nexweş bû, lê tevî wê rewşa xwe, bi rastî jî sekneke wî ya hêja hebû. Rewşa wî ya fîzîkî dest ne dida û nikariya bimeşe. Dijmin lê dixe û li pêşiya Em`in Eskerî şehîd dikeve. Heta seat 6`an me bajarê Dêrikê kontrol kir. Destpêkê bajar ne di înisiyatîfa me de rabûbû û beriya wî şerî zêde tecrûbeyeke me ya şerê bajaran jî tinebû. Lê hêzên dewlet amade bûn, derketibûn ser bînayan, mewziyên wan berê hebûn, cihê leşkerî bûn. Em jî wisa li cade û kolanan bûn yanî tehlîkeyeke mezin bû. Lê piştî şer û aloziyê bajar ji aliyê me ve hate kontrol kirin û gel aram bû. Cihekî wan yê leşkeriyê ku mezin bû li derveyê bajêr mabû. Li sînor jî du cihên wan mabûn.

Yanî bi vî awayî di nava sê rojan de yanî ji 19'ê Tîrmehê heta 22-23'yê mehê bi giştî sê bajarên Kurdistana Rojava ji bindestê rejîmê derket. Ev tiştekî nû bû. Yanî di dîroka me de piştî demeke dirêj, cara destpêkê bû ku bajarên me diketin bin kontrola me. Ev ne tenê şoreşeke leşkerî bû; şoreşeke civakî, çandî û hişmendî bû. Yanî şoreşeke bi hemû awayî ya hêvî û baweriyê bû. Piştî nêzîkî sedsalek bi têkoşîneke mezin ev encam hat girtin. Bi vê pêngava dîrokî re bi şêwazeke fermî hêzeke leşkeri, YPG di Rojavayê Kurdistanê de hate ragihandin. Ev di Rojavayê Kurdistanê de qonaxeke nû bû, gaveke nû bû. Dema me ragihandina YPG`ê di televizyonan de temaşe dikir, me kelecaneke nayedîtîn jiyan dikir. Yanî bi rastî jî moraleke pir mezin bû.

Lê ji hêla din ve şoreşê bi qasî barê heyî sê qatê dîtir bar avêt ser milê me. Em êdî bi rêxistin kirin û pêdiviyên civakê re rasterast rû bi rû bûn. Tevî vê yekê li ser me ambargoyeke giran an ku dorpêçeke aborî jî çêbû. PDK'ê jî ambargo danî ser me. Dewleta Tirk û Sûriyê jî danî. Ji her milî ve ambargo hat danîn. PDK'ê ji me re digot, hûnê werin ser xeta me. Heta PDK'ê em bi tiştekî hesab nedikirin. Mînak, dema me destpêkê ji xwe re doçqeyek kirî em ê ji kêfxweşiyan bifiriyana. Lê PDK'ê bi rê de girt û neda me. Em çiqas bi pey ketin jî neda me. Yanî ev ambargo ji her alî de li ser me hebû. Di vî milî de deriyê sînorî yê bi PDK`ê re bi navê *Sêmalka* girîng bû ku cihêkî li ser ava Dîcle ye. Berê navenda dewleta Sûriyê bû û têkiliyên wan û PDK'ê xweş bûn. Pirsgirêk tinebûn. Dema ku me girt PDK`ê pirsgirêk derxistin. Digotin *"ala xwe li wê derê daneynin".* Yanî heta vê astê! Helbet me ev nêzîkatî qebûl nekirin.

Êdî ji bo bajarên din jî hêvî çêbû. Mînak li Qamişlo coşeke pir mezin çêbû, rêxistineke pir xurt çêbû. Tevlêbûneke xurt ji YPG'ê re çêbû. Li bajarên din ên weke Dirbêsiyê, Amûdê û bajarên dîtir, li

Helebê û li her derê wisa hêviyeke ku wê azadî were çêbû. Mînak, Amûdê rabû û rejîm ji nava xwe avêt. Piştre jî Dirbêsiyê avêt. Yanî wisa derfet çêbûn û me nirxand. Helbet hêzên dîtir jî ketin nava hesabên ku çawa wê pêşiya hêza me bigrin. Heta Dewleta Tirk digot "*rast e, bajar girtin lê wê nikari-bin biparêzin.*" Jixwe piştî van pêngavan berê êrîşên çeteyên xwe bi giranî zivirandin ser me.

Ji hêla din ve xebatên me yên rêxistinî jî berdewam kirin. Guhertina ku di sala 2012'yan de çêbû, avakirina *Desteya Bilind a Kurd* bû. Desteya Bilind di navbera Meclîsa Gel û ENKS'ê de çêbû. Her du meclîsan li Hewlêrê civîn li dar xistin ku qonseyeke bilind a Rojava çêbikin. Pênc kes ji Meclîsa Gel û pênc kes jî ji ENKS'ê… Ev weke lihevhatinekê gihişt fermiyetê. PDK'ê dixwest bi vê yekê bibe hevparê Rojava û ji aliyê din ve jî hêdî hêdî hêza xwe ya leşkerî bîne.

Partiyên di ENKS'ê de timî digotin ku YPG'ê wek hêza rewa nabînin û dixwestin YPG'ê lawaz bibe. Li benda binkeftineke YPG'ê bûn ku bêjin "*binêrin, YPG nikare Rojava biparêze bila pêşmêrge were biparêze*." Lê bîryara destpêkê jî ew bû ku ew qonseya siyasî ya ku çêbe ji bo mijara hêza leşkerî komîsyonekê ava bike û li ser kar bike. TEV-DEM û Meclîsa Gel gotibûn "*ji bo mijara leşkerî divê hûn bi fermandariya YPG'ê re rûnîn*." Ji bo wê em carekê sê heval bi Desteya Bilind re rûnîştin. Me ji wan re ev got, "baş e em piştgirî dikin, em amade ne Desteya Bilind wek hêza xwe ya siyasî qebûl bikin. Lê divê Desteya Bilind jî derkeve bêje '*YPG'ê hêza me ya leşkerî ya fermî ye.*'" Wekî din me got ku ji der-veyê YPG'ê tu hêzên cuda weke hêza leşkerî napejirînin û em amade ne di bin banê Desteya Bilind de kar bikin. Helbet tiştê ku wan dixwest pêk nehatin. Ji bo wê rewabûna Desteya Bilind jî hêdî hêdî lawaz bû, cihê xwe negirt.

## BEŞA DUYEMÎN
## DI ŞOREŞA ROJAVA DE XEBATÊN XWESERIYÊ

### 1-Di Nava Şoreşê De Pêşengtiya Jinê

***- Di nava şoreşê de, rêxistinbûna jinê çawa bû? Risteke çawa lîst?***

**ZELAL EFRÎN:** Dê jin çawa bibe vîn, çawa xwe bi rê ve bibe? Li ser vê yekê pêşketin çêdibûn û pergaleke wisa dihat tekûz kirin. Em dibêjin, ger em jinan rêxistin bikin, em ê civakê jî rêxistin bikin. Jixwe gelek pirsgirekên jinan yên xweser jî hebûn. Jinan bi xwe jî, komîteya aştiyê ya jinan ava kiribû û pirsgirekên jinan çareser dikirin. Berê jî bingeha vê pergalê hatibû avêtin, lê di dema şer de belav bû.

Me bi çavên xwe dît ku dema mirov ked dide, mirov encam digre. Ji bo vê divê mirov ji xebatan xwe nede paş. Mesela li Kobanê pirsgirêkên jinan pir bûn. Gelekên wan di temenekî biçûk de hatibûn zewicandin. Di dema koçberiyê de di bin navê namûs bê parastin de, ew keçên ciwan zewicandibûn. Hinekan nedixwestin tevlî şoreşê bibin, ji ber wê hema dizewicandin, an jî sînordar dikirin. Dema ku me wan pirsgirekan dîdît em hêrs dibûn. Me nedihêlişt ku tu malbat di temenekî biçûk de keçan bi-zewicînin.

Me rêxistina xwe ya xweser ya jinê bi navê *Yekîtiya Star* lidarxistibû. Jixwe divê pêşnûmeya Yekîtiya Star û di makezagona kantonan de, ew tişt bûbûna bîryar. Divê pirzewacî ji holê hatiba raki-rin. Rewşa jinê di nava civakê de ketibû. Ji bo ku ji nû ve bilind bibe jî zanebûn û ferqkirin pêwîst dike. Me pir caran li ser vê esasê semîner û civîn çêdikirin. Me dikir mijara perwerdê. Divê me dayik û ew keçên ciwan perwerde bikirana, da ku bikevin ferqa vê yekê. Ji bo vê jî weke Yekîtiya Star, me digot divê em gundekî jî bê Yekîtiya Star nehêlin. Divê me bikarîbûya xwe bigihanda hemû gundan û ew rêxistin bikirana. Lê ew kevneşopiyên ku di nava hezar salan de hatibûn çêkirin, di nava çend salan de çareser nedibûn. Yekîtiya Star bi xwe jî di ferqa wê de bû û li gorî wê xebatên xwe dimeşandin. Hêrsa jina jî hebû û dixwestin di nava xebatan de cih bigrin. Lewra gelek zehmetî dîtin û ketin ferqa hin tiş-tan.

Wêne-11

Di felsefeya Rêber Apo de, ya ku pêşengiya xweseriya demokratîk dikin jî jin in. Ji dîroka me bigre, heya roja me ya îro jî, her li hemberî pêşketinên jinan êrîş hene. Di civakê de jî wisa ye. Dema ku mirov dibêje, bila jin xwe perwerde bikin û xwe pêş bixin; zilamê serdest hêrs dibe, vê yekê hezim nake. Ji bo vê yekê pergal tehlîlkirin û jin perwerde kirin pir girîng e. Tirsa herî mezin, yek jî ji pêşketina jinê ye. Ji ber ku îro pêşengîtiya pêşketinê Rojhilata Navîn dike, li ser jinê ew qesa êrîşên mezin çêdibin. Bi destdirêjiyê re rû bi rû dimînin, bi kûştinê tên tehdît kirin. Di civakê de jinek çiqasa pêşketî be, zilam ew qesa bertek nîşan dide. Ji ber wê jî avakirina pergala jinê, esas bû. Herî dawî me digot, divê gund bi gund jin vîna xwe derxin holê.

Divê hem di meclîsên TEV-DEM'ê de hem jî di meclîsên Yekîtiya Star de cih bigirtana. Avakirina pergaleke wisa zehmet bû, lê dema ku mirov zehmetiyê bide ber çavan û bi ser de biçe çê dibe. Ji ber vê yekê jî komînên jinan xwe ji her tiştî re amade dikirin. Lê xebatên vê pergalê hê berdewam dikirin. Hem di bajêr de, hem di gundan de ji nû ve pergal avakirin û di her tiştî de bi jinê destpê kirin, esas bû. Ji bo vê jî pergala xweseriya demokratîk ku li Rojava pêş ketiye, ji bo her çar parçeyên Kurdistanê û Rojhilata Navîn modelek e.

Paradîgmaya Serokatî ku dibêje, *"bi vîna gelan herkes xwe bi rêvebibe"* li Rojava tê meşandin. Dibe ku kêmasiyên wê hebin, lê di her sê kantonên Rojava de xwe bi rêxistin kirin. Ji bo vîna wê zêdetir derkeve pêş, perwerde pêwîst dike. Îro di tu pergalên cîhanê de ew rista jinê derneketiye pêş. Di nava tevgera me de pêş ketiye û li kantonên Rojava jî di nava gel de şênber dibe. Xwe îspat kiriye. Ji rêveberiya kantonê bigre heya komîna gundekî hevserok yek jin e, yek zilam e. Di rêveberiyê de jî jin û zilam wekhev cih digrin. Li Rojava di xweseriya demokratîk de vîna jinan li pêş e. Jin di her cihî de hene û bi pergala Yekîtiya Star xwe bi rê ve jî dibe. Di PYD de jî heman pergal heye.

***-Li Rojava beriya şoreşê ji aliyê siyasî, civakî û parastinê ve jin di asteke çawa de bû, bi şoreşê re jinê risteke çawa girt ser xwe û rêxistinbûna xwe çawa pêş xist?***

**MERYEM KOBANÊ:** Li Rojavayê Kurdistanê, ji milê civaknasiyê ve ger mirov jinê binirxîne; divê mirov di destpêkê de balê bikşîne ser hin mijaran. Bi salane ku têkoşîna azadiya gele Kurd xwe li Rojavayê Kurdistanê bi cî kiriye. Di şexsê rêheval Dîcle de li Kobanê, di şexsê rêhevala Rûken de li Efrînê, di şexsê rêheval Sozdar û Edalet de li herêma Cizîrê û di şexsê rêheval Berçem de ev jinên ku ji Rojavayê Kurdistanê tevlî têkoşîna azadiyê bûne, bandoreke xwe ya mezin li ser civakê çêkirine.

Bi taybetî nêrîn û feraseta jinê, bandora rejîma BAAS a dewletparêziyê, her wiha bandora rejîmê ya li ser malbat û jinê û gelek nimûneyên din, rê da ku saziya malbatê û jin bê çewisandin. Ji ber van sedeman jin di civakê de, ji aliyê aborî û xweseriya xwe ve pir lewaz bû. Lê bi derketina van jinên şoreşger ên ku tevlî têkoşîna azadiyê bûne, her wiha di şexsê rêheval Ş. Şîlan, Ş. Şervîn Dêrik û Ş. Dîlan de bi sedan jê jî tevlî karwana şehîdan bûne, bêguman li ser civaka Rojavayê Kurdistanê bandoreke mezin çêkirine. Lê piştî girtina Rêbertî û tesîrbûna pergala kapîtalîst, di warê civakî de ji aliyê ku bibe hêz û vîn, jin felc kirine. Mirov bi hêsanî dikare vê rewşê bibine. Di pêvajoya şoreşê de ev tesîra pergala kapîtalîst bi têkoşîneke dijwar di asteke mezin de ji holê rakir.

Di xebatên me yên rêxistinkirina jinê û civakê de tevlîbûna jinan, ji bo ku karibin pêşengî bikin her zêde bû. Ji ber vê jî mirov dikare bêje ku Şoreşa Rojava, şoreşa jinê ye. Him ji aliyê rêxistinkirina civakî û him jî ji milê leşkerî ve hejmara hevalên zêdetir dibû. Di mijara komîn û meclîsan de jin her çalak bû. Ev jî di nav gel de da zanîn ku; jin dikare ji civakê re pêşengiyê bike. Ji ber ku feodalî rehên xwe di civaka me de berdabû û şaxên wê digihan her quncika civakê. Bo wê jî bivê nevê ji aliyê jinê ve gelek astengî di civakê de hebûn.

Lê piştî ku tevlîbûnên refên têkoşînê zêde bûn û jinan xwe da karen civakî ev nêrîn guherî, riziya û bandoreke erênî li ser civakê kir. Ev jî di nav gel de hişyarbûn û baweriyê dide avakirin. Destpêkê hemû karen me bi hev re û di nav hev de dihatin meşandin. Piştî ku beşên rêxistinî, civakî û leşkerî ji hev cuda bûn; bi taybetî di beşa leşkerî de jinên ciwan fermandarî kirin.

Bo nimûne; li Helebê fermandara yekemîn hevaleke jin bû. Her wiha li gelek navçeyên Kantona Efrînê hevalên jin pêşengiyê dikirin. Li herêmên weke Mabata û Recoyê hevalên jin berpirsiyarên yekemîn bûn. Her wiha li hin herêmên Kantona Kobanê jî hevalên jin di rêzên destpêkê de xwedî berpirsiyarî bûn. Li Kantona Cizîrê jî heman rewş heye. Li Hesekê û Til Temirê hevalên jin ên ciwan fer-

mandarî dikirin. Dîsa li Girkê Legê û Dêrikê jî fermandarên leşkerî yên bajêr hevalên jin bûn. Li gelek herêmên din jî di rêvebirina bajaran de bûn. Mînak; li Kobanê Şehîd Jînda, li Tirbespiyê jî hevala Şehîd Warşîn bû.

Mirov bi hêsanî dikare bêje ku di destpêka avakirina şoreşê de hevalên jin cih digirtin. Di despêka şoreşê de li herêmeke weke Reqayê bi tenê hevaleke jin berpirsiyar hebû. Her wiha li Minbîc û Cerablûsê jî hevalên jin ev karî dikirin. Ango li nîviyê erdnîgariya Rojavayê Kurdistanê bêhtir hevalên jin berpirsiyarên yekemîn bûn. Hevalên xort arîkariya wan dikirin. Vê jî di civakê de bandora jinê zêde kir.

Di rêxistinkirinên despêkê de me gelekî zehmetî kişand. Ji ber ku li Rojavayê Kurdistanê jineke ciwan tevlî karan kirin û piştî rojan vegera ew jina ciwan a malê zehmet bû, ango civak ji vê rewşê re ne amade bû. Bo nimûne, berê li Rojava jin tevlî PKK dibûn û derbasî qadên çiya dibûn. Ango bi carekê ve ji malê qût dibûn. Lê bi Şoreşa Rojava re pêvajoyeke nû destpê kir. Ev jî şoreşgeriyê di nav gel de bû. Ev yek bo xortan dibe ku ne pirsgirêk be, lê ji boyî hevalên jin pirsgirêkeke mezin bû.

Bi taybetî piştî girtina Rêbertî ango pêvajoya 99'an, li ser civakê lîstokên mezin pêk hatin. Pergala kapîtalîst ji aliyê vîn û hafizayeke civakî ve polîtîkayên gelekî qirêj meşandin. Ev mijarana jî ji me re pirsgirêkan didan avakirin. Gel jî ji vê rewşê nerazî bû. Riya rizgariyê jî di PKK de didît. Dema gel didît ku hevalên jin kar û barên rêxistinî dikin û perwerdehiya leşkerî didin, pê pir bandor dibûn. Bo vê jî gel hêdî hêdî fêrî vê pêvajoya nû dibû.

Bo nimûne; dema di taxekê de jineke ciwan pir nedihat naskirin û hisabkirin. Lê piştî ku ew jina ciwan tevlî karên rêxistinî dibû, di dest de çek û parastina gel, ev yek dikir gel bi çavekî din yê erênî lê dinêrî û hurmetê nişan dida.

Zilamên temendirêj berê dema hevaleke ciwan a çekdar didîtin, digotin, "*Tew tew, tu yê niha parastina me bikî û em ê jî rihet rihet razên, ne wisa?*" Em baş dizanin ku di bin vê gotinê de biçûkdîtin û bêbaweriyeke hezar salan heye. Lê piştî şerê li dijî çeteyan û rizgarkirina bajaran a ji rejîmê hat dîtin ku jin di gelek qadên şer û civakê de pêşengiyê dikin û bi rê ve dibin. Vê jî di nav civakê de lêgerînekê da avakirin. Lewra ew jina ku nas dikir bibû jineke dîtir. Helbet ev rewş bi sere xwe xaleke lêpirsîn û lêkolînê ye. Êdî di nav gel de nêrîneke bi vî rengî; "*Divê êdî ez bi feraseta xwe ya berê li jinê nenêrim*" derxist holê. Vê yekê helbet di zilam de jî guhertin ava kirin. Ev jî bo civak li ser jiyana hevbeş û wekhev a jiyana xwe bidomîne bandoreke erênî kir.

Bo nimûne dema em diçûn li gel malbatan malê ji me re digotin; *"xortên malê bibin lê keç û jinên me nebin. Cîran û derdorên me pişt re wê çi bejin, em hevza xwe ji van rewşan dikin."* Ku ev nêrîn û feraseteke hezar salan bû û şikandina wê jî gelekî dijwar bû. Me vê feraseta şaş a paşverû bi bilindkirina Şoreşa Rojava, rizgarkirina bajaran şikand.

Bi taybetî di şerê Serêkaniyê de kordîneya giştî a leşkerî hevaleke jin bû. Her wiha li şerên destpêkê yên Heleb û Efrînê koordîneya giştî hevalên jin bûn. Ev yek di nav gel de jî, bi taybetî di nav dijmin de bandoreke mezin ava kir. Êdî hat asteke wisa ku çeteyên El-Nûsra bi xwe propagandaya hevalên jin dikirin û digotin; "*BKC'yê bi serkeftî bi kar tînin, pir xurt tevlî çalakiyan dibin, di sekvaniyê de zîrek in û hwd."* Her wiha hevalên nû tevlî dibûn jî dema vê rewşê didîtin bêhtir ji xwe bawer dikirin. Ketin wê ferqê ku ew jî dikarin şer bikin û axa xwe bibarêzin.

Dijmin li ser bêtêlan bangî me dikirin û digotin; *"Ma çima hûn jinên xwe didin pêş? Ger hûn ewqasî zîrek bin, hûn bi xwe werin pêş me*." Bi vî awayî dixwestin antî-propagandaya hevalên jin bikin. Lê di şer de dema ku dengê hevalên jin diçû çeteyan kezeba wan diqetî û ditirsiyan.

Ango hevalên jin cuda didîtin û bi vî awayî wan mezin dikirin. Bêguman ev jî derûniya çeteye ku diçû şer tevlîhev dikir. Lê belê bingeheke vê jî hebû ku ew jî şervaniya hevalên jin bû. Berî niha her tim di qada cengê de zilam bi zilaman re şer dikirin. Lê ev rewşeke nû û li gorî dijmin pir cuda û tirsnak dihate dîtin.

Mirov dikare bêje ku; ew jina ku kiriye milkê xwe yê taybet, ew bê vîn hiştiye, ji gotina wî dernediket, ango digotin bihuşta jinê di bin lingê zilaman de ye. Lê roja îro ew jin bihuştê ji wan re kiriye dojeh û li hemberî çeteyan şer dike. Ew jinên ku wan biçûk didîtin û heta di jiyanê de weke ferdekê nedihesibandin, îro ew zilaman ji ber jinên şervan direvin. Her wiha ev rewş di milê civaknasiyê de guherînên mezin dike.

Ango jin êdî li hemberî her awayê dagirkeriya zilam disekine û wê têk dibe. Dagirkeriya zilam napejirîne. Ev jî him li ser civakê û him jî li ser dijmin bandoreke mezin ava dike. Vê rewş bi taybetî li ser

Erebên Serêkaniyê û Cizîrê tesîr kir. Şêxên Ereb ên wê herêmê dihatin û ji me re digotin; "*Em dixwazin ew şervanên jin bibînin.*"

Her wiha piştî şerê Serêkaniyê tevlîbûna jinê ya di her milê şoreşê de qat bi qat zêde bû. Ev hemû bûyer û qewimîn ji bo YPJ'ê, bo hêzeke jinê, ceribînên zêrîn bûn.

Mînakeke taybet jî hevala Bêrîvan ku jineke Êzdî, ku ew bi tevlîbûna xwe ya şer dîrokekê nivîsand bû. Bi taybetî di şerê Serêkaniyê de; ji Dêrik, Dirbêsiyê, Amûdê, Hesekê, Til Temir û ji gelek herêmên din hevalên jin pêl bi pêl dihatin û tevlî refên şoreşê dibûn. Di nav me de hevala herî ciwan Reşê Amara jî, di vî şerî de ketibû koma êrîşê. Wê demê hevala Reşê, ruxmî temenê xwe yê biçûk bûbû fermandarê yekîneyê. Lê di 2015'an de tevlî karwana şehîdan bû.

Piştî van şerên destpêkê yên Şoreşa Rojava, ceribînên me yên salan bi şerê bajaran ve xwe gihande lûtkeyê. Ev jî li ser encama şer û civakê bandoreke mezin ava kir. Bêguman ev yek di dijmin de jî xofeke mezin ava kir. Her wiha di qada navnetewî û ya dîplomasiyê de jî bal kişand. Bi taybet di civakên cîhanê de meraqekê bi vî rengî da avakirin ku; ev artêşa jinê çawa hatiye avakirin, xwe bi xwe çawa xwe rêxistin dikin, di şer de çawa wisa serkeftî dibin?

Piştî konferansa giştî ya li Rojava pêk hatî; me bîryara avakirina navendan da û pişt re me navendên xwe yên jinê ava kirin. Her wiha bîryara perwerdehiyê jî me da. Bi taybet rêhevalên ku nû tevlî Şoreşa Rojava dibûn, pêwîstiya wan him bi ceribînên me, him jî bi bîrdoziya me hebûn. Bi taybetî me dixwest ceribînên xwe yên ji şerê Qestel Cindo, Serêkaniyê û Helebê, navendên me ji rejîmê paqij kiribûn bajarên mîna Girê Zîro, Dêrik, Til Temir, Hesekê û Kobanê girtî bi van hevalên ciwan re parve bikin.

Bi taybetî dixwazim vê têbiniyê jî parve bikim; yekemîn car hevaleke jin a bi navê Jînda, îlana YPG'ê dike. Ku pişt re ew jî tevlî karwana şehîdan dibe. Dixwazim bîranîna vê hevalê jî bi we re parve bikim. Di rizgarkirina Gırê Spî de hevala Şehîd Jînda jî cih digire. Piştî ku heval bajêr ji çeteyan paqij dikin hevala Şehîd Jînda diçe li ber deriyê sînorê bi Tirkan re û ala Tev-Dem'ê didaliqîne. Jixwe em ê, di beşa YPJ'ê de ji milê leşkerî ve rêxistinbûna jinê berfirehtir vebikin.

### 2-Li Ser Şopa Şehîdan Xebatên Ciwanên Şoreşger

***-Weke ciwaneke jin, hûn jî bûn şahidê Şoreşa Rojava û we di nava xebatên ciwanan de cih girt. Di nava şoreşê de xebatên ciwanan çawa dihatin rêxistinkirin û rista ciwanan di şoreşê de çibû?***

**BERÎTAN QAMIŞLO:** Rojava mînaka hemû lehengî û destanan e. Ji ber wê her kes dixwest di nav de cihê xwe bigre. Min di sala 2013'an de di nava xebatên Ciwanê Şoreşger de cih girt. Beriya me gelek xebat hatibûn kirin û gelek lehengî çêbûbûn. Her wiha Rojava, cihekî ku Serokatî lê xebat meşandibû. Di xeyala hemû jinên Kurd de dîtina Serokatî jî heye. Dibe Serokatî bi xwe ne li wê derê be, lê felsefeya wî û berhemên xebatên wî li wê derê bûn. Yek jî şoreş, bi berxwedana hevalên şehîd gihiştibû wê astê.

Di xebatên ciwanan de keda hevalê Lewend û Serhat pir bû. Hê ku dewlet li Rojava hebû, dest bi xebatan kiribûn. Pir caran ji bo xwe biparêzin li kolan û parkan mabûn. Lê mal bi mal ketibûn nava dilê gel. Zarok bi taybetî pir bi wan ve hatibûn girêdan. Jin û xurtên ciwan pir bi wan ve hatibûn girêdan. Hesta girêdanbûnê û rakirina tola wan ji mirovan re ava kiribûn. Hevalên kevn dihatin bîra mirov. Wan hevalên kevn çawa xebat pêş xistine û xwe xistine dilê gel, Şehîd Lewend û Şehîd Serhat jî wisa bûn. Ez wan mînak didim, lê bi sedan hevalên weke wan hebûn. Hevalên ku şopa wan dimeşînin jî hê hene. Hezkirin û hûrmeteke wan ya pir zêde li hemberî hev û li hemberî ciwanan û gel hebû. Çawa ciwan perwerde dikirin, çawa xebat dimeşandin, çawa têkilî datanîn; her kes qala vê yekê dikir.

Di şerê Serekaniyê de, di destpêkê de hevalê Serhat şehîd dikeve. Di lingê hevalê Lewend de hinek seqetî jî hebû, lê nikarîbû xwe bigre û di şerê Serekaniyê yê ewil de her du hevalan jî cih girtibû. Jixwe hevalê Lewend jî, rojeke piştî hevalê Serhat şehîd dikeve. Weke jiyana wan, şehadeta wan jî bi hev re bû. Ciwanan jî xebatên xwe li ser ew bingeha ku wan hevalan avitiye pêş xistin.

Pergal bi giştî ya me bû, divê me ava bikira. Serokatî behsa komîn, meclîs û rêxistina gel dike. Xebatên ciwanan yên li wê derê di bin navê *Ciwanên Şoreşger* de pêş diket. Tevlêbûna wan ya nava YPG û YPJ çêdibû. Karê herî esasî perwerdekirin û tevlêkirina şoreşê ya ciwanan bû. Pergala BAAS, li

ser ciwanan pir lîstîbû û helandineke zêde hebû. Hêrseke pir mezin li hemberî pêrgala BAAS'î tine bû, lewra di mêjî de helandin hebû. Mesela li Bakûrê Kurdistanê, ji her alî ve êrîş û zext li ser ciwanan hebûn. Lê li Rojavayê Kurdistanê, ji bin ve helandineke mêjî hebû. Armanca xebatên ciwanan jî, şiyarkirin û zane kirina ciwanan bû. Jixwe beriya me jî hin xebat hatibûn meşandin û şiyarbûneke mezin çêbûbû. Lewra bi awayekî lehengtî xebat hatibûn meşandin. Lê mirov hê jî şopên pergala BAAS'î dîdîtin. Her wiha mirov bandora kapîtalîzmê ya li ser ciwanan li wê derê dîdît.

***-Şêwaza rêxistinbûna ciwanan çawa bû?***

Şêwaza rêxistinbûna me jî; di bin navê Ciwanên Şoreşger de dihat meşandin. Akademiyên me yên perwerdê hebûn. Tevlêbûn çêdibûn. Di bajêr de komîn û komîte çêdibûn, bingehek hatibû avakirin. Di dema şer de hemû ciwanên ku hatine rêxistinkirin di nave şer de cihê xwe digirtin. Li gel YPJ-YPG û Asayîşê di heciz û çeperan de cihê xwe digirtin. Hevalên ciwan yên kadro jî pêşengtiya wê kiribûn. Ji ber vê yekê di her demê de ji bo perwerde, komîn û komîteyan her xebata ciwanan pêş ketiye. Lê ji ber rewşa şer, ew kar jî hinekî nîv mabûn. Divê ciwan bihatana şiyarkirin ku li welatê me şer heye û tevlêbûna vê divê çêbibe. Hevalan pergaleke wisa girtibûn dest. Ji bo akademî, komîte û komînan jî bingehek hatibû avitin, lê heval her neçar mabûn ku di nava şer de cihê xwe bigrin û gelê xwe biparêzin.

Wêne-14

Çawa ku Tevgera Ciwanên Şoreşger hebû, Tevgera Jinên Ciwan yên Şoreşger jî hebû. Bi hev re kar dikirin. Xwesertî hebû, hevalên jin civîn, perwerde û çalakiyên xwe xweser dikirin. Lê di gelek cihan de jî bi hev re kar dimeşandin. Ji gelek milan ve bi hev re girêdayî bûn. Jinên ciwan pêşengtiya ciwanên şoreşger jî dikir. Ew xurt dikirin û ber bi welatparêziyê ve dibirin. Lewra welatparêziya jinê di Kurdistanê de kûr e. Bi taybetî li Rojava, ew yek zêde derdiket pêş. Pêşengê YPG û YPJ jî, jin bû. Pêşengiya Yekîtiya Star û TEV-DEM'ê jî jinê dikir. Ji her alî ve jinan pêşengtiya şoreşê dikirin. Di xebatên ciwanan de, çi di avakirina komîn û komîtayan de dibe, çi darxistina perwerdeyan de dibe, çi jî di xebatên heciz û şer de dibe jinên ciwan pêşengî dikirin. Di bajaran de jî ji rêveberiyê bigre, heya hemû karên dîtir hevalên jin rista xwe dîlîstin. Lê li keleka wê hevalên xort jî berpirsyariyên xwe dianîn cih û germahiyeke welatparêziyê di nava wan de jî hebû.

Di nava ciwanan de, kar û barên xwendekaran jî hebûn. Ew jî bi Ciwanên Şoreşger ve girêdayî bûn. Lê me vekirî nedigot. Lewra wan hizbên dîtir jî tevlê dibûn. Di destpêkê de hevalan xwestibû rêxistineke zêdetir xweser ava bikin. Mesela her lîseyêkê rêxistinên xwe avakiribûn. Kar û barên xwe, semînerên xwe di dibistanan de çêdikirin. Perwerdeyên xwe jî xweser dikirin. Mesela di nava akademiya Ciwanên Şoreşger de, akademiya xweser ya xwendekaran hebû. Di nava xebatên giştî de jî cih digirtin, lê bi xwesertiya xwe jî kar dimeşandin. Ji bo ku em bikaribin ciwanên bi wan hizbên din ve girêdayî jî ber bi xwe ve bikşînin, xebateke xweser ya xwendekaran pêwîst dikir.

Wêne-15

Her wiha pergala konfederasyonê hebû. Dîsa Ciwanên Şoreşger, pêşengtiya wê dikirin û felsefeya Serokatî dimeşiya. Lê wan zêdetir xweserî dixwestin. Lewra di dibistanan de, girseyeke mezin ya ciwanan hebû. Her çiqasa di dema şer de çûn û hatin zehmet be jî, xwendekar diçûn cihên weke Latkiye, Helep û Şamê. Hevalan jî ji bo wan bi fikrên Rêber Apo konfederasyon ava kiribûn û xwestibûn her kes cihê xwe tê de bigre. Dîsa ciwanên PYD hebûn, beşa siyasî jî cuda bû. Cuda xwe rêxistin dikirin, lê fikir yek bû. Pêşverû hebûn, fikrên wan hinekî cudabûn. Xwe nêzikî me dikirin, lê fikrên Yêkîtî li ser wan bandor kiribû. Têkiliyên me jî hebûn.

Kar li ser vî esasî pêş diketin. Ne ku şoreş çêbû û yekser gel ronî bû û her tişt pêk anî. Hevalên me tax bi tax, mal bi mal digeriyan. Şiyariya şoreşê pêş dixistin, ciwan rêxistin dikirin, perwerde lidardixistin. Gelek malên hizbên dîtir hebûn. Fikrên wan cuda bûn. Lê heval şev û roj di nava van taxan de mal bi mal digeriyan. Westandineke pir zêde hebû, hê jî berdewam dike. Lê mirov dikare bibêje her heva-

lek erkên xwe yên şoreşgerî pêk dianîn. Bi rastî jî zehmetiyên xebatên ciwanan jî hebûn. Pergala BAASî li ser ciwanan pir lîstibû. Ciwan bi giştî ji cewherê dernexistibin jî, şêwaza wan guhertibû, mêjî parçe kiribû. Lê bi şoreşê kombûyinek çêdibû. Bêguman pergala dagirker dîsa li ser kar bû. Mesela şoreşeke ew qesa mezin bû, lê hewldanên xirabkirinê yên PDK'ê jî hebûn.

Me ciwan rêxistin dikirin, me dixwest em xwe bigihînin hemû ciwanan. Yên ne Apoger jî me dixistin nav xwe, ji vî milî ve em serkeftî bûn jî; lê dîsa tiliya xwe dixistin navê û dixwastin xirab bikin. Hewl didan ku şoreşa pêş ketiye lewaz bikin, propagandayên reşkirinê dimeşandin. Ew şehadetên ku hatine jiyankirin manewiyetek ava kiribû, lê wan dixwest binê wê jî vala bikin. Rûxmî her tiştî hêza wan têra vê yekê nedikir. Lê her li ser kar bûn. Bi konevaniyên sînsî ew yek pêş dixistin. Di bin navê Kurdbûnê de dikirin, lê her tiştî wan dijberî Kurdiniyê bû. Dixwestin ciwanan ji şoreşê dûr bixin û penabertiyê ava bikin. Ji bo vê yekê hemû cihan bûbû yek, lewra tirseke pir mezin li hemberî vê şoreşê hebû. Pêşengên vê şoreşê YPJ û YPG bû, pêşengên wan jî bêguman ciwan bûn. Yên ku şer dikirin û pêşengtî dikirin jî ciwan bûn. Ji ber vê sedemê li ser ciwanan jî konevaniyeke pir mezin hebû.

Hevalê Goran di xebatên ciwanan de şehîd ket. Risteke pir mezin lîst. Bi eslê xwe ji Serêkaniyê bû. Ew jî di şerê Serekaniyê de şehîd ket. Min li Dirbêsiyê kar dikir. Li wir jî hizbên cuda û lîstikên wan hebûn. Lê hem di gundan de, hem jî di bajêr de em rêxistinkirîbûn. Yên ku di nava hizbên din de cih digirtin jî, berê xwe didan me. Şiyarbûnek çêdibû.

Hevalê Rênas Amed hebû, me heft mehan bi hev re kar kir. Ez dixwazim hinekî behsa wî jî bikim, lê anîna ziman hinekî zehmet e. Ev heval ji Amedê hatibû tevlî şoreşa Rojava bibû. Çi şer derketîba, çeka wî milê wî bû û diçû wir. Digot, "*we cihî şer çêbûye û vaye ez diçim.*" Yekser hinek ciwan jî digirtin û diçû. Dema te nedihiştî jî, pir israr dikir. Her dixwest di nava şer de cihê xwe bigre. Hemû ciwan dixwestin biçin şer, lewra gelek lehengî dihatin jiyankirin û di wê berxwedanê de her roj heval şehîd diketin. Me karê rêxistinkirin û perwerdekirina ciwanan dikirin. Derdora me komên ciwanan jî hebûn. Lê rêveberiyê me digot, *"Têrê nake, divê ciwanekê ku hûn xwe negihîninê û rêxistin nekin nemîne. Bila werin şer, an jî bila hecizan bigrin.*" Ji ber vê yekê me hemûyan her nedikarî em biçin şer. Lê hevalê Rênas her bi xwestek bû û şiyarbûneke wî hebû.

Bi piranî di xetên gundan de kar dikir. Dayikan, zarokan û ciwanan pir jê hez dikirin. Hevalekî esmer bû û her rûyê wî bi ken bû. Her mirov jê moral digirt. Çiqasa moralê wî bikeve jî, rûkeniya wî hebû. Dema ku li Şengalê jî şer derket, israr kir ku biçe Şengalê. Demekê çû qampa Newrozê û di nava gelê me yê wir de kar kir, li qampê hê jî behsa wî dikin. Li Qamişlo demekê kar kir, mohra xwe li wir jî da. Dema ku şerê Kobanê dirêj kir jî, hemû hevalan dixwestin biçin Kobanê. Lê hevalê Rênas pir zede israr kir û di dawiyê de hevalan şandin Kobanê. Ji bo şer çû, divê piştî şer jî karê ciwanan bimeşîne. Vî hevalî 45 rojan bê navber û bêsînor di êniya pêş ya Kobanê de cihê xwe girt û şer kir. Dema em bi telefonê pê re diaxifîn jî bi moral û bi ken bersiv dida. Digot, *"xwesteka min pêk hatiye, ez di nava vê berxwedanê de me. Ez ne dervayî vê lehengiyê me*."

Malbata wî jî hatibû ser sînor, dizanîn kurê wan li wê derê ye. Ne tenê ji bo kurê xwe, lê ji bo hemû hevalan li wir bûn. Piştî berxwedaniya 45 rojan hevalê Rênas şehîd ket. Dema ku her hevalek şehîd dikeve, parçeyekî te bi xwe re dibe û barê te girantir dibe. Şehîdbûna hevalê Rênas jî, ji hevalên ciwan re pir giran hat. Bi rastî jî pîvanên wî pir xurt bûn. Tesîra wî li ser min jî pir bû, li ser gel jî pir bû.

Bi sedan hevalên weke wî hene, barê me pir giran kirine.

Wêne-16

Dîsa hevala Jiyan hebû. Keçeke ji Derîkê bû. Malbata wê pir welatparêz bû, xûçkeke wê li gerîlayê PKK ye, xûçkeke wê di nava YPJ de ye. Bi xwe jî xebata ciwanan dikir. Li Kobanê, Amûdê, Derîk û Serekaniyê karê ciwanan meşand. Di berxwedaniya Serekaniyê de jî cih girt. Li her cihî mirov şopên wê dîdîtin. Ruyê wê jî her bi ken bû. Dema ku mirov hê jî wêneyên wê mezî dike, mirov dibêje ew heval çiqasa jiyanê hez dike? Ji hevaltiyê re heya dawî bi hûrmet bû. Dema ku di 2014'an de bîryar hat dayin ku biçe Kobanê, pir kêfxweş bû. Digot, "*gelê Kobanê pir zêde ked dayinê heq dike."* Di rêveberiya ciwanan ya Kobanê de cih digirt. Dema ku şer destpê dike, bi komek heval ve diçe êniya herî pêş. Di şer de bi awayekî leheng şehîd dikeve. Miletê Kobanê jî, miletê Cizîrê jî hê behsa wê dikin. Her heva-

lek jî wê her bîr tîne. Wê jî barê me girantir kir. Jineke ciwan ku xweşiktiya jinê di hûndirê xwe de vedişêre bû. Vê xweşikbûnê xwe diteyisand ser rû û kenê xwe.

Wêne-79

Dema ku hevala Jiyan şehîd ket, di şîna wê de bi dehan jinên ciwan rabûn û soz dan ku tola wê rakin. Gelek heval li ser vê esasê tevlî xebatan bûn, tevlî YPJ bûn û navê Jiyanê rakirin. Weke gelek hevalan, me nikarî xwe bigihînin cenazeyê wê jî. Hevalan û malbata wê pir pêy ketin lê nikarîbûn bibînin. Dayika wê, hevaleke wê ya birîndar dibîne û jê dipirse. Bi hev re diçin ew girê ku hevala Jiyan lê şehîd ketiye. Heval dayikê re dibêjin, "*dayê me bi dehan caran li vê derê mezî kiriye, lê me nedîtiye, were em vegerin.*" Dayik dibêje, *"na, heya ku ez Jiyana xwe nabînim ez naçim."* Lê wê derê qîr dike û dîgrî.

Dayikek pir xurt bû, di şîna hevala Jiyan de jî qet negirî, lê li wê derê digrî û dibêje, "*Jiyan tu li kuderê yê, ka xwe nîşanî min bide.*" Piştî demeke din lêdigerin, dayik bi xwe cinazeyê hevala Jiyan dibîne. Li cihekî ax ketibû ser cinazeyê wê, dayikê vekiribû û dîtibû. Jixwe wê demê salvegera şehadeta hevala Jiyan bû.

Dayikê bi xwe ji me re behs dikir, dema ku me guhdarî dikir me nedizanî em çi bikin. Me di wê derê de hestên dayiktiyê didîtin, ew xwedavendiya ku di dîrokê de tê behs kirin, me hîs dikir ku winda nebûye û li pêşberî me ye. Di şexsê dayika şehîd Jiyan de, gelek dayik û jinên me yên Kurd bi vî rengî hene.

Li Efrînê jî ji milê xebatên ciwanan ve, pir pêşketin çêbûbûn. Komîte û komînên ciwanan hatibûn rêxistikirin. Her tax û malê de rêxistinbûn çêbû. Bi awayekî pergal perwerde hatibûn darxistin. Di xebatên Efrînê de jî, bi taybetî jin pêşeng bû. Hem di xebatên ciwanan de jinê pêşengtî kiribû, hem jî di xebatên giştî de wisa bûn.

Hevalê Çekdar Amed, ji bo xebatên ciwanan çûbû Efrînê. Hevalêkî ji Amedê bû. Di demekê kin de milet pir jê hez kiribû, pê ve hatibûn girêdan. Nirxekî pir mezin danê. Bi komploya PDK şehîd ketibû. PDK dixwest li wê derê rêxistina xwe bide avakirin. Bi taybetî ji milê ciwanan PDKê ve hevalê Çekdar li pêşiya xwe asteng dîtibûn. Lewra ciwanan pir rêxistin dike, gel li derdora xwe kom dike. Ji ber vê yekê di 2012'an de bi komployekê şehîd dixin. Lê gelê Efrînê lê xwedî derdikevin, bi taybetî dayik û jin pir jê hez dikin. Hinek dayik ji Amedê jî hatine ser merasîma wî, lê dayikên Efrînê gotine, "*dayikên şehîd Çekdar em in.*"

Wêne-17

Niha jî bi navê wî ketîbe û tabûr tên avakirin, bi navê wî saziyên ciwanan tên avakirin. Gelek ciwan navê xwe dikin Çekdar û tevlî şoreşê dibin. Di vê dawiyê de peykerê hevalê Çekdar jî çêkirin. Bi sedan hevalên wisa hene. Lê bi taybetî mirov hevalê Çekdar dikare weke mînakê rêxistinkirin, hezkirin û pêşengê ciwanan binirxîne. Li gorî ku behs dikin, hevalekî weke ciwa bûye. Dema ku diçûye civînan û rapor dinivîsandine, her dagirtî bûye. Wî hevalî jî risteke mezin lîst. Hevalên weke hevala Jiyan, Rênas û Çekdar mînak in. Bi dehan hevalên ku di qada xwe de rista xwe bê kêmasî anîne cih hene. Mirov bi rojan jî behsa wan bike, têrê nake.

Dîsa şehîd Dilşêr hebû, bi eslê xwe Kobanê bû. Li Kantona Cizîrê kar kiribû. Hevalekî ku di wê germahiyê de 24 seatan bi motorê gund bi gund û tax bi tax digerî bû. 24 seatên xwe bi kar derbas dikirin. Di xebatên ciwanan de kedeke pir mezin daye. Pêşniyara xwe her li ser esasê tevlêbûna şer dida. Hevalekî her bi coş û kelecanî bû. Bi rastî jî hevalekî ku layiqî hezkirinê bû û layiqê bû ku mirov pê re bibêje şoreşger. Ew heval jî di şerê Til Hemis de şehîd ket.

Di dema şerê Til Hemis de, hevalan gotin, "*şerê Til Hemis heye, divê ciwan jî tê de cihê xwe bigrin.*" Jixwe hemû şerên ku çêbûne de, ciwanan rista xwe anîne cih. Me ji komîn û komîteyên xwe re civîn çêkirin û me amadekariyên xwe kirin. Lê tiştekî pir li ser min tesîr kir. Xûçk û birayek hatin û gotin, "*em jî dixwazin biçin.*" Jixwe birayekî wan jî kadroyê ciwanan bû. Malbat hemû di nava me de bû. Me ji wan hevalan re got, "*nabe ku hûn her du bi hev re biçin.*" Lê wan gotin, "*em dixwazin her du bi hev re tê de cih bigrin.*" Me telefonî dayik û bavên wan kir û me got, "*tiştekî wisa heye.*" Ji me re go-

tin, “*ma zarokên me ji yên ku şer dikin çêtir in? Pêwîst bike, em ê jî li gel zarokên xwe yên dîtir werin.”* Vê yekê li ser me pir bandor kir. Hinek malbatên me gihiştibûn wê astê.

Van her du xûçk û birayan di şerê Til Hemis de cih girtin. Her du jî xebatkarên ciwanan bûn. Dîsa du bira hatibûn û navê xwe ji bo şer nivîsandibûn. Lê ji bo ku em pêşiya wan nebin asteng negotibûn, em bira ne. Pişt re hevalan xeber me re şandin û gotin, “*we çima şandine*?” Di nava milet de jî, gelek dayik û bav hebûn û dema ku zarokên wan tevlê dibûn kêfxweş dibûn. Malbatên ku zarokên xwe ji me vedişartin jî hebûn. Bi taybetî lîstikên van hizbên din jî hebûn. Digotin, “*ew şer e, mirin heye, we dibin kûştinê.*” Hezar fîtne dihat kirin. Lê fikrên Rêber Apo û kedên hevalan dihêlişt ku milet zane be û neye lîstikên wan. Milet dizanî ku kî nunertiya wan dike. Cih bi cih milet ji wan bandor dibû, lê ji aliyê din ve jî berxwedaneke mezin hebû.

Weke me di destpêkê de jî got du xet hebûn. Lê xeta xiyanetê lewaz bû. Dîsa jî dilê mirov hev dixist. Rûxmî her tiştî jî xeta îxanetê li Rojava bin ket. Xeta Serokatî li ser ket. Teyisîna vê ya xebatên ciwanan jî dibû. Beriya ku YPG bê avakirin jî, di destpêkê de bolûk û yekîneyên ciwanan hebûn. Çawa ku niha li Bakûrê Kurdistanê, ciwanan pêşengtî kir; wê demê li Rojava jî wisa bû. Di hemû şoreşan de wisa ye. Yên ku lîstikên pergala BAAS vala derxistin, yên ku tola herî mezin ji pergala kapîtalîst girtin bi taybetî xebatên ciwanan bûn. Ji ber ku bi taybetî lîstik li ser jin û ciwanan bûn, bi sekna xwe ya tevlêbûna şer û bi sekna xwe ya rêxistinî jin û ciwanan ew lîstik vala derxistin.

Gelek mînak û lehengiyên ku li Rojavayê Kurdistanê hatine jiyankirin hene. Mirov bi rojan behsê bike jî xilas nabin. Mirov bi çiqasa behsa keda wir ku hatiye dayin û pergala ku hatiye avakirin bike jî pênaseya wê kêm dimîne.

***-Ji aliyê vesazbûna ciwanan ve hewldanên bi çi rengî hebûn? Hin mînakên şênber hûn dikarin bidin?***

Mesela li Qamişloyê ciwanan di her taxê de xwe cih kiribûn û saziyên xwe vekiribûn. Medîne Şebab hebû, berê cihê ciwanên BAASî bû. Lê me ew der girtibû û kiribû cihê ciwanên Kantona Cizîrê. Cihekî mezin bû, ji ber vê her beşek cuda hatibû rêxistinkirin. Beşek cihê sporê bû, cihek saziya çandê ya ciwanan bû. Cihê çandê û xebatên wê, me weke cihekî zanebûnê û tevlêbûnê vesaz kiribû. Xebatên çandî yên ciwanan bi giştî wisa ne. Rast e, ji aliyekî ve çand û folklora Kurdî dihat fêrkirin, lê ji aliyekî ve jî em çanda şoreşa azadiyê fêr dikin. Jixwe piştî wê zanebûnê ciwan tevlî pergala te dibin.

Ji ber vê yekê çand û hûner pir girîng e. Em dizanin pergala dagirker li ser çandê çi lîstikan dide meşandin. Lê çanda ku Tevgera Azadiyê dixwaze bide rûnişkandin cuda ye. Pir pir berfireh e. Çandeke exleqî û polîtîk e. Çandeke ku xirab nebûye, an jî li gorî cewherê wê çanda xirabûyî ji nû ve afirandin e. Ciwanan ew esas digirtin. Li ser vê esasê xebatên çandê li hemû bajarên Rojavayê Kurdistanê dihatin pêş xistin. Ji folklorê bigre heya şanoyê, ji mûzikê bigre heya ziman gelek xebat pêş ketibûn û hê berdewam jî dikin.

Her wiha xebatên me yên sporê hebûn, hevaleke jin pêşengtiya wan dikir. Li hemû bajaran digeriya û li ser esasê her cureyê sporê perwerde dida. Di Medîne Şebab de jî, di bajarên din de jî li hemberî sporê hezkirineke sporê hebû. Armanca me ciwan anîna gel hev bû û ew pêşderaziyên ji bo sporê pêş ketine şikenadin bû. Pergalê li ser esasê spor û çandê ciwan didan şûxilandin, lê me dijberî vê dikir. Me dixwest di nava ciwanan de yekbûnêkê çêbikin. Li ser vê esasê gelek cihan qadên me sporê hebûn.

Xebatên me yên ragihandinê jî pêş diketin. Warekî şiyarbûnê ye. Me kowar derdixistin. Li Rojavayê Kurdistanê çandeke xwendinê ya mezin hebû. Hinekî sedema xwe ji çanda şehîd Rûstem wan jî digre. Lewra wan jî di vê warê de gelek ked dabûn. Hîmê çanda xwendinê wan avitibû. Lê ew qesa lîstik li ser ciwanan hebûn, berê ciwanan didan tiştên weke tv û tiştên cuda. Me jî aliyê xwendinê derdixist pêş û ciwan teşwîqî wê dikirin. Du kovarên me bi navê *Silava û Dengê Ciwanan* dihatin derxistin. Dîsa *Cerîda Xwendekaran* dihat derxistin. Dibû sedem ku şiyariyek çêbibe û tu xwe bigihînê gelek ciwanan. Me dixwest wan fêrî xwendinê bikin û di wan de lêpirsînê bidin avakirin. Her wiha bernameya ciwanan ya bi navê *Ronahiya Ciwanan* hebû. Ew jî li ser esasê ronîkirin û teyisandina xebatên ciwanan bû. Ciwanan lê temaşe dikir.

Xebatên perwerdê jî pir girîng bûn. Anîna perwerdê ya ciwanan, li hemberî perwerdê hezkirina ciwanan ava kirin, zehmet bû. Lê piştî demekê bi xwe bi perwerdê ve dihatin girêdan. Jixwe her ciwanekî ku tevlî perwerdê dibû, pişt re an tevlî xebatê dibû, an jî di nava avakirina pergalê de cihê xwe digirt. Dibû sedem ku gavên mezin biavêjin.

Xebatên komîn û komîteyan jî esasê rêxistinbûnê bû. Em her dibêjin, di dîrokê de hev û din windakirin û parçebûnek hatiye çêkirin. Bi riya komîn û komîteyan, tu dixwazê dîrokê ji nû ve zindî û serast bikê. Mesela em dibêjin, di civaka xwezayî de jiyana komînal û hevkarî hebû. Lê di roja me ya îro de êdî kes cîranê xwe xwedî dernakeve. Bira ji hev û din nakin. Lê ji bo civakê bizivirînin cewhera wê û pergala ku Rêber Apo pêş dixe ava bikin divê pir xebat bihatana kirin. Lewra ne hêsan e. Heval gund bi gund, tax bi tax digeriyan û xebat dimeşandin. Xebatên ciwanan jî wisa bûn. Gelek gund jî ji hev û din dûr bûn. Lê heval derdiketin ser riyan, êdî çawa çûn. Da ku xwe bigihînin gel û ciwanan. Bi taybetî di şexsê hevalên şehîd de westandineke pir û kedeke mezin çêdibû.

Mesela hevalek ciwan hebû, navê wê Gerîla bû. Hevala Gerîla di nava van xebatên komîn û komîteyan de pir ked da. Bi xwe ji malbateke welatparêz tevlê bûbû. Bi eslê xwe Kobanê bû. Wek jinêk ciwan xwe perwerde kiribû û tevlî xebata şoreşê bibû. Bi emrekî biçûk tevlê bûbû, birayê wê jî tevli refên gerîla bibû. Temenê wê biçûk bû, lê mêjî û dilê wê pir mezin bû. Bi rastî jî zarokên Kurdan pir zû mezin dibin. Hevala Gerîla jî, di xebatên komîn û komîteyan de pir ked da, di şiyarkirina ciwanan de risteke mezîn lîst. Hevala Gerîla pir bala min kişand. Hevaleke temen biçûk bû, lê axaftinên bi bandor dikirin. Mirov dîdît ku mêjî û dilê wê pir xurt e. Hêvî û baweriya wê mezin bû. Demeke kin di nava xebatên ciwanan de ma, lê bi israrên xwe tevlî YPJ bû.

Wêne-18

Di dema şerê Kobanê de, bi awayekî leheng şehîd dikeve. Şehadeta wê pir bi êş e, gelek hevalên me digêhêjin Kobanê û yekser şehîd dikevin. Hevala Gerîla jî ji wan hevalan bû. Bi tevahî koma xwe diçe wir û piştî çend rojan şehîd dikevin. Ji ber ku nû çûne heval wê nas jî nakin. Lê berîka wê mezî dikin ku nûmaraya du telefonan di berîka wê de hene. Yek birayê wê ye, yek jî hevalek ji rêveberiya ciwanan e. Heval telefonî vê hevalî dikin û meseleyê jê re dibêjin. Bi cewherî hevala Gerîla jî, lehengeke vê berxwedanê bû.

Me behsa hevalê Rênas jî kir. Dema ku ew şehîd ket, gelek hevalan navê wî li xwe kirin. Li Qamişlo ciwanek hebû, pir dişibiya Şehîd Rênas. Rûyê wî jî her bi ken bû. Di jiyanê de pir zêde bi hûrmet û hezkirin bû. Dema ku tevlê bû, 24 seatan li gel hevalan kar dikir. Di Akademaya Şehîd Çekdar Amed de perwerde dît. Di 18 saliya xwe de tevlê bûbû. Lê hezkirin û kelecaniya wî ya li beramberî jiyanê pir xurt bû. Hevaltiya hemû hevalên ku tevlî wê dewrê bûne, qezanc kiribû. Me pê re digot, “*tu weke cewiyê Şehîd Rênasê.*” Ji hemû aliyan ve wisa bû. Mesela careke li ser akademiya me êrîş çêbû, em dûçûn ku kontrol bikin. Lê bazda û pêşiya me çû. Me got, “*heval bisekina em binêrin, pişt re tu were.”* Got, “*na divê ez di pêş de biçim.*” Her tim rext û çeka wî di milê wî de bû.

Piştî ku dewreya wan xilas bû, adara 2015’an de derbasî Kobanê bû. Dema ku hevalan gotin, divê ji vê dewrê hinek heval biçin Kobanê. Hevalê Rênas hat bîra hemû hevalan, lewra ji milê leşkerî ve her teqûz bû. Lê ji ber ku temenê wî biçûk bû, ji aliyekî ve jî hevalan nedixwest biçe. Me digot, “*hevalekî xwîn germ e, hevalekî pêşketinê re vekiriye, divê hinekî din bê perwerdekirin.*” Lê weke ku hevalê Rênas ji bo Kobanê hatibû avakirin. Hevalan gotin, *“divê hevalekî rêk û pêk, hevalekî bi tesîr biçe Kobanê.*” Wê demê careke dîtir çavên hemû hevalan zivirîn ser hevalê Rênas.

Dema çû Kobanê jî, hezkirineke mezin ya gelê Kobanê jê re çêbûbû. Hemû ciwan li derdora wî kom dibûn. Behsa kesekî dîn dikin, dibêjin hezkirina wî jî kezenç kiribû. Bi xwe Amûdê bû û navê Şehîd Rênas rakiribû. Digot, *“ji bo min çûyina cihê şehîd Rênas, moralek e. Lewra şehîd Rênas li Kobanê ew qesa ber xwe dabû û bûbû lehengek. Ez ê têkoşîna wî berdewam bikim, ji bo min rûmetek e.”* Dema ku çû jî cih bi cih şer berdewam dikir. Hevalan digot, “*hevalê Rênas komeke amade bike*!” Yekser diçû komek amade dikir û digot, *“ew kom weke min dîn e, jixwe ez jî dînê Amûdê me. Em hemû serhişk in û em şer hez dikin.”*

Dema ku komkûjî li ser gelê Kobanê çêbû, hevalê Rênas xeber dabû hemû hevalan û gotibû, “*çete ketine Kobanê, bila her kes şiyar be.”* Bi xwe jî dikeve bînaya hemberî çetayan. Çeka xwe digre û li

hemberî wan şer dike. Ne dikarî xwe bigre. Dema ku şer dike jî her serê xwe radike û gule li ser çetayan de dibarîne. Dema ku seriyê xwe radike, bi sekvaniyê wî şehîd dixin.

Ne hevalekî ew qesa kevn bû, lê pir dihat hezkirin. Hevalekî ew qesa jiyanê hez dikir, li Kobanê û şehîd ket. Ji bo tevgera ciwanan jî ew yek pir giran bû. Dema ku merasîma cenazeyê wî çêbû jî, ji her bajarê Rojava ciwanan berê xwe dan Amûdê. Hemû komîn û komîteyên ciwanan, hêzên parastinê yên ciwanan li wir  bûn. Bi yek dengî digotin, *"Rênas tu namirê, em ê tola te rakin."* Gelek ciwanan digot, *"wî navê şehîd Rênas rakiriye û tevlê bûye. Em ê jî navê wî rakin."* Dîsa bi dehan heval tevlê bûn û navê her du Rênasan bi hev re rakirin. Her du jî li Kobanê şehîd ketin.

Di van deman de divê xebatên me berfirehtir bibana. Lewra xweserî hatibû îlankirin, pergal pêş ketibû, ragihandinê xwe berfireh kiribû, komîteyên me yên siyasî pêş diketin. Jinên ciwan jî di 2014'an navê xwe guhertin û kirin *Tevgera Jinên Ciwan*. Da ku hemû jinan bigrin nava xwe. Lewra me dixwest ku em jinên xwendekar û yên ku di bin tesîra hizbên din de jî mane bigrin nava xwe û fikrên Rêber Apo bidin wan. Di konferansekê de ew bîryar hate girtin.

Wêne-102

Divê Ciwanên Şoreşger jî navê xwe biguherta. Lewra ciwanên xwendekar hebûn, kordînasyon hebû, ciwanên PYD hebûn, kar û barên ciwanan yên kantonan hebûn, hizbên din yên ciwanan hebû. Jixwe gelek hizbên ciwanan hebûn, pir kêm endamên wan hebûn. Tenê Hizba Pêşverû hinekî zêde bû. Ya herî xurt tevgera me bû. Lê ew jî me weke dewlemend dîdît. Me bîryar da ku em navê Ciwanên Şoreşger biguherînin û bikin *Yekîtiya Ciwanên Rojava-YCR*. Divê hemû tevgerên ciwanan di nav de cihê xwe bigirtana û di rêveberiya wê de jî nunertiya her hizbî hebûya. Dê komîteya siyasî de û pergala xweseriyê de bihatana gel hev û din û mehê careke civînên xwe çêkin. Pergala tekmîlan çêbû. Jixwe gelek tevgerên din yên ciwanan jî hatin feshkirin. Di Nîsana 2015'an de kongreyeke wisa berfireh hat çêkirin û bîryarek wisa hate girtin. Ew jî bû mînakeke demokratîk.

**Ciwan, Pêşengên Şoreşê ne...**

***-Di pêşxistina şoreşê û di nava xebatên giştî de ciwanan çi kar dikirin?***

Ciwan rista xwe bi her avayî dîlîstin. Meş û çalakiyên taybet dikirin. Ji meşên giştî re jî pêşengtî dikirin. Di hemû meşên TEV-DEM'ê, Yekîtiya Star çêdikirin, pêşengên wan ciwan bûn. Di şer de jî, rista xwe dilîstin. Çiqasa şer çêdibû û dibû seferbertî, ciwanan çekên xwe digirtin û digotin, "*em ji bo hemû tiştî amade ne."* Me çiqasa rêxistin bikira, ew qesa amade dibûn. Di asayîş û hecizan de, di nava YPG û YPJ de jî tevlêbûna xwe dikirin. Dema ku mûdaxaleya Şengalê çêbû jî, hem jinên ciwan, hem jî giştî ciwan çûn û tevlî pêngava Şengalê bûn.

Hinek heval wê demê birîndar bûn, hevalê Zinar şehîd ket. Ciwanekî ji Qamişloyê bû. Hinek hevalên jin jî xwestin tevlî pêngavê bibin, lê hevalan gotin, "*bên û di qampa Newrozê de xizmetî gel bikin*." Ji ber ku pir zêde gel dihat û di rewşekê perîşan de bûn, divê alîkarî û xizmeta wan bihata kirin. Yên ku keçên xwe winda kirine, yên ku zilamên xwe winda kirine, yên ku dayika xwe winda kirine hebûn. Êşeke gelê Kurd bû. Ciwanan di wê derê de jî rista xwe lîstin û di êniya pêş de jî cihê xwe girtin. Bi nasnameya ciwanan çûn şer kirin û dema ku şer hinekî asayî bû, dîsa zivirîn cihê xwe.

Erka ku dikeve li ser milê ciwanan pêşengtî ye. Ciwanên Rojava ew yek jî kirin. Bêguman kêmasî jî hene. Lê qesî ku hatine rêxistinkirin û zane kirin di her cihê de rista xwe lîstin. Ji Til Hemis bigre heya Serekaniyê, ji Şengalê bigre heya Hesekê tevlî hemû şeran bûn.

Dîsa di Nîsana 2014'an de xeber hat ku hevala Mîzgîn dîl ketiye. Hevala Mîzgîn ji Serekaniyê bû, di rêveberiya herêmî ya ciwanan de cihê xwe digirt. Pişt re tevlî YPJ bû û li gel hevala Bermal û hevalekî dîtir yê xort dîl ketin destê çeteyan. Wê demê em Dirbêsiyê bûn. Ciwanên Dirbêsiyê nikarîn xwe bigrin û dixwestin tola wan bistînin. Di nava nîv seatê de ew qesa ciwan li derdora me kom bûn. Em çûn wê derê û ciwanan di êniyên pêş de cihê xwe girtin. Jixwe hevalan cenazeyê wan hevalan jî ji destê çeteyan girtin. Hevalan girê di destê wan de jî girtin. Lê hovaniyeke wisa li ser hevalên şehîd

çêkiribûn ku mirov nikare bîne ziman. Merasîma wan jî pir bi heybet bû, gel û ciwan ji wan xwedî derketin.

Merasîma hemû hevalan li gel malbata hevala Mîzgîn çêbû. Lewra hevala Bermal ji Efrînê bû, hevalê xort jî ji Bakûr tevlî bibû, nikarîn cenazeyên wan bibin. Hevala Mizgîn jî, ji wan hevalên ku di nava xebatên ciwanan de cih girtine û tevlî YPG û YPJ bûne bû. Tesîreke pir mezin li ser ciwanan kir. Li ser wê esasê tevlêbûneke mezin çêbû û tola wan hate rakirin. Bi taybetî jinên ciwan xwedî lê derketin. Jixwe Hesekê bajarekî cuda bû. Her şer hebû, nîzamê êrîşî hevalan dikir, çeteyan êrîş dikir. Lê yên ku cihê xwe bernedan ciwanên Hesekê bûn. Bi rastî jî mirov moral ji wan digirt. Ji ber ku şer her zindî bû, komîna me ya herî xurt jî li Hesekê bû. Lewra şer di nava bajêr de bû û dixwestin ber çavên her kesî qirkirinê çêbikin. Ciwanan hemû tiştî dîdîtin û di êniya herî pêş de cih digirtin û rista xwe dîlîstin.

Di nava wî şerî de xebatên komîn û komîteyên ciwanên Hesekê jî her berdewam bûn. Xwe her tiştî re amade kiribûn. Hem ji bo YPG tevlêbûn çêdikirin, hem komîn û komîteyên xwe rêxistin dikirin, hem jî êniyên pêş de şer dikirin û heciz digirtin. Erka ku diket ser milên wan kêm zêde pêk dianîn. Yên ku di şoreşê de fedakariyeke mezin kirine, yek jî ciwanên Hesekê bûn.

Gelek heval jî li wir şehîd ketin. Ji wan yek jî hevalê Aram bû. Dema ku di Newrozê de teqîn çêdibe, birîndar dibe. Lê birîna xwe bi şûtikê girê dide û bi birîndarên din re mijûl dibe û wan dibe nexweşxaneyê. Di encamê de pir xwîn jê diçe û şehîd dikeve. Ciwanekî herêmî bû, xwe şoreşê re feda kiribû. Perwerdeya me jî dîtîbû û tevlî xebatan bûbû. Şehadeta wî li ser ciwanên Hesekê pir bandor kir. Bi fedakarî şehîd ketibû. Rûxmî ku birîndar jî bûbû, bi xwe re mijûl nebûbû û alîkariya gel kiribû. Jixwe ketîbeya hêzên parastina cewherî jî bi navê hevalê Mazlum ava bû.

Di pergala nû ya ciwanan de akademiya parastina cewherî vebû. Hemû hizbên di nava tevgera ciwanan de cih digirtin, dikarîn bên û tê de perwerdeya leşkerî û tektîkên şer bibînin. Akademî bi navê Şehîd Rênas Amed hat vekirin. Rista xwe jî lîst. Li her bajarî tabûr îlan dikirin û diçûn şer. Her bajarekî jî bi navê şehîdekî ketîbeyên xwe ava dikirin û tevlêbûna hemû hêzên leşkerî jî dibûn. Tabî heya ku ew bên gel hev û bên perwerdekirin, hevalan kedeke pir mezin jî didan. Ciwanan di şer de rista xwe dîlîst. Lê Serokatî digot, *"şoreşa zîhnî ava bikin. Divê şoreş bibe malê gel. Bila gel lê xwedî derkeve."* Di akademiya şehîd Rênas de jî me xwest em wê yekê bikin.

Di ciwanan de lehengtiyên pir mezin hebûn. Min tenê navê çend hevalên pêşeng got. Xeynî vê gelek hevalên ku rêveberiya ciwanan de cih digirtin û şehîd ketin hebûn. Gelek heval tevlî YPG û YPJ bûn. Bi mîrasa wan ciwanan xwe rêxistin dikir û xebatên xwe dimeşandin. Wan bingehek ji bo me ava kiribû. Mîrasa YPG û YPJ jî ew bû. Lewra dema ku her şehîd dihat, soza ciwanan xurtir dibû. Rast e, hestiyarî jî çêdibû. Lê dayikan digot, serê gelê Kurd û serê Rêber Apo sax be. Her ciwanekê ku ew dibihîst hestên tolhildanê diketin dilê wê. Li gorî wê jî gav dihatin avitin.

Xebatên ciwanan pir bi kelecan û bi tevger in. Enerjî û coş dixwaze. Pir hevalên ku ew coş û nûbûyin xist nava ciwanan, tevlî kerwana şehîdan bûn. Gelek heval jî hê wî mîrasî berdewam dikin. Ciwanan li ser vî mîrasî di şerê Rojava de, rista xwe lîstin.

Hevala Berîtan, hevala Canfeda û hevalê Mazlum Tolhildan hebûn. Van heval jî hevalên me yên nû bûn. Dema ku şer dikeve Tirbêsiyê û Çilaxa, ew heval diçin ser hecizan û dixwazin tola xwe ya salan rakin. Lewra hemû qirêjiya dewleta Tirk jî, di wan çeteyan de nunertiya xwe dikir. Ked û xebata wan jî pir zêde bû. Bi taybetî hevala Berîtan û Canfeda ji milê jinên ciwan ve pir ked dabûn. Beriya ku tevlê bibin jî xebatên ciwanan dimeşandin. Piştre perwerde didîtin û tevlibûnek profesyonel çêkiribûn. Dema ku xebar hat ku şer destpê kiriye, ew heval çûbûn ser hecizê Çilaxa. Li wê derê êrîş çêbûbûn û ew heval şehîd ketibûn. Bi navê wan jî gelek sazî hatin vekirin, bi navê wan dehan heval tevlê bûn. Jixwe ew yek bûbû çandeke xebatên ciwanan. Ji ber ku di nava gel û ciwanan de kar dikirin, dihatin nas kirin û piştî şehadeta wan tevlêbûn çêdibûn û navê wan li xwe dikirin.

Şehadeta van hevalan ji bo tevgera ciwanan windahiyeke mezin bû. Lê yek diçû û deh heval dihatin cihê wan. Giran bû û berdelên mezin bûn, lê bi armanca wan tevlêbûn û navê wan girtin jî pir bi wate ye. Min gelek hevalên şehîd re jiyan nekiriye, lê dema ku behsa wan tê kirin, weke ku min ew dîtibin û bi wan re jiyan kiribe hîs dikim. Van her sê heval jî wisa bûn. Di 2013'an de li Çilaxa şehîd ketin. Lê girêdanbûna xwe ya bi şehîdan re û Rêber Apo re nîşan dan. Di şexsê van hevalan de careke dîtir hemû şehîdan bi bîr tînim.

Li Rojava me pergalek ava kiribû. Lê taybetmendiyeke Kurdan jî heye, divê her mûhalîf bin. Bi taybetî di qarekterê ciwanan de ew yek heye. Her serhildêr in û mûxalîf in. Divê her hinek hebin ku em li dijî wan têkoşîn bidin. Rast e çete hebûn, lê li qada şer bûn. Ji ber vê yekê ciwanan berê xwe her didan şer. Di taybetmendiyê ciwanan de rihekî berxwedêr û zindî her heye. Bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê ew hat dîtin. Me car caran xebatên xwe jî lêpirsîn dikirin. Bi taybetî piştî bîryara nûbûna tevgera ciwanan, me careke dîtir rêxistinbûn û xebatên xwe ber çavan re derbas kirin. Her cihê ku ciwan û xwendekar hebûn me xwest em xwe bigihîninê. Me li her cihî komîteyên xwe ava kirin.

Weke Yekîtiya Ciwanên Rojava me rêxistinbûna xwe di nava dibistanên li dervayî Rojava û lîseyên li bajêrên Rojava jî berdewam kir. Her wiha di taxan de, me mal bi mal xebat meşandin û xebatên xwe yên taxan xurt kirin. Vê carê guhertina ku heye, hemû rêxistin û hizban bi hev re kar dikir. Vê yekê xebat xurtir kirin. Teyîsîna vê li ser meş, çalakî û perwerdeyan çêdibû. Karekî me yê herî esasî jî bûbû perwerde, me dixwest tu ciwanên ku ji perwerdê re derbas nebûne nemînin. Gelek derdoran digot, "*van mejiyê ciwanan tijî dikin*." Rast e, li gorî pergala dagirker, me tiştên di serê wan de hildiweşandin. Lê li gorî mirovahiyê me ew ava dikirin. Li Rojavayê Kurdistanê ew yek bi perwerdeyan dibû.

Perwerdeyên parastina cewherî, perwerdeyên siyasî, perwerdeyên civakî, perwerdeyên çand û hûnerê, perwerdeyên sporê dihatin darxistin. Ji ber ku pergal ya me bû, jiyan jî bi her avayî bi perwerdeyan dihat dagirtin. Ew kesayeta mûxalîf dîsa hebû, ciwanan dixwest ku yek hebe, da ku mirov êrîşê bike. Lê me dixwest ew enerjiya ciwanan kanalîzeyê perwerdê bikin û ciwan di avakirina jiyana nu de rista xwe bîlîzin. Jixwe her ku bi wan karan re mijûl bûn, fêm kirin ku ew jî qadeke ku ciwan jê re pêşengtiyê bikine.

Berê hinek hizbên cuda hebûn, bi nêzikbûnên xwe dixwestin bibêjin, "*hûnê şer bikin, lê em ê siyasetê bikin.*" Lê dema ku şer çêbû, yek jî holê nema. Tenê ciwan man û tevgera Apoger ma. Pergal jî tevgera me ava kir. Yên ku bûn xûlamên Ewropa û reformîstên din li holê neman. Li ser dîkê jî ciwan û tevgera me ma. Her wiha di qada ragihandin û qada çand û hûnerê de jî pêşketin çêbûn. Ji ber êdî me hemû ciwan temsîl dikirin, hem xebatên me berfirehtir bûn, hem jî kûrtir bûn. Komek heval ji Bakûr hatibûn û xebatên sînemayê jî dimeşandin. Gelek heval fêrbûn û li ser berxwedana YPG û YPJ fîlmekî ciwanan jî hate kişandin. Xebatên dîtbarî jî bala ciwanan dikşand, li ser vê esasê perwerde jî hatin pêş xistin.

Her wiha me tabûrên ciwanan îlan kirin. Van tabûran rista xwe jî lîstin. Me xwest em bigihînin hemû gundan û li wan deran komîn û komîteyên xwe ava bikin. Lê vê dorê ne bi 10-15 kesan, me dixwest komînên ku me ava kirine, hemû ciwan di nav de cihê xwe bigrin. Bêguman vê yekê zêdetir ked û hewldan dixwest. Lê dema ku ew ked dihat dayin, serkeftin çêdibû. Ji ber ku ew qesa lehengî û berxwedan jî pêş diket, di tevlêbûnê de jî xwestek hebû. Bi kurtasî me xebatên xwe hemû ji nû ve girtin dest û şêwazê de hin guhertin çêkirin. Di encamê de nûbûnek jî çêbû.

Li Til Temir jî careke dîtir şer destpê kir. Til Temir jî weke Kobanê lê hatibû, hemû derdorên wê hatibûn dorpêçkirin. Dema ku şer derket, me hemû komîn û komîteyên xwe rêxistin dikirin û dişandin wir. Mesela sê gundên êniya pêş, ciwanan diparastin. Dîsa du cihên dîtir de, tevgera ciwanan li gel YPJ rista xwe dîlîst. Weke êniyeke ciwanan lê hatibû, her tişt ciwanan bi xwe dikir. Hemû qadên ciwanan heval dihatin û diketin çeperan û cihê xwe bernedidan. Me carna hevalên xurt diguhertin jî. Lê komeke hevalên jin hebû, digotin "heya ku em negihêjin Çiyayê Evdilezîz em dev ji şer bernadin." Carna hevalên YPG û YPJ jî dihatin guhertin. Lê wan hevalên jin 3 mehan bê navber, di qada şer de man. Bi rastî jî heya ku neçûn û pêlî axa pîroz ya Evdilezîz nekirin, nezivirîn.

Girêdanbûna jinê ya bi welatê xwe re, girêdanbûna jinê bi axê re di şexsê ew koma hevalên jin de xwe careke dîtir îspat kir. Dema ku komeke jin bi angaşteke ew qesa mezin ber xwe dida, ji bo me jî dibû moral û hêz. Rizgarkirina Til Temir û Çiyayê Kizwanan jî dîtin û wisa zivirîn. Di wî şerî de du hevalên ku pir bala mirov dikşandin hebûn. Mesela hevala Berîtan, ji Til Temirê bû. Hemû malbat wê jî di nava rêxistinê de bû. Çete jî ketibûn bajêr, lê malbatê bajar bernedabû. Di meclîsa YPJ'ê de cihê xwe digirt. Pişt re li Çiyayê Kizwanan şehîd ket. Rihekî ciwantiyê pê re bû. Berê karê ciwanan kiribû, lê tevlî YPJ bûbû. Bi rastî jî mirov moral jê digirt. Jixwe di dema şer de jî, herî pêş de dimeşe û şehîd dikeve. Şehadeta wê hemû ciwan jî bandor kirin. Ez bi xwe jî pir tesîr bûm, şehadeta wê hêz da min. Jinên wisa xurt, di Şoreşa Rojava de pir derketin.

Hevalê Dilgeş hebû, ew jî ji Til Temirê bû. Tabûra wan bi giştî şehîd ketibû, çend heval rizgar bûbûn. Ew jî di nava ew hevalên rizgar bûne de bû. Hevalê Dilgeş dixwest, bibe bersiva wan hevalên şehîd. Hevalekî pir germ bû, heya dawiyê bêhnfireh û bi fêm nêzik dibû. Dizanî ku li ku derê çi henekê bike û çi axaftinê bike. Ew jî di şerê Mebrûka de şehîd ket. Temenê wî jî ciwan bû. Malbata wî hemû çûbû Başûr, lê wî nexwestibû dev ji axa xwe berde. Pir fedakar bû. Li cihê pir hevalan diçû haciz, her kar dikir. Ne dizanî westandin çi ye.

Di xebatên ciwanan de her zindîbûnek hebû. Her heval dixwest koma xwe ava bike û biçe şer. Pêwîst bû, ciwan tevlê jî bibin. Dema operasyona Girê Spî û vekirina riya Kobanê de jî, ji jinên ciwan komek heval çûn û heya dawiyê di şer de man. Gelek heval çûn, lê dihatin guhertin. Hevalên jin heya ku pêngav li ser neketiye venegeriyan. Berxwedana hevalên jin bi rastî jî mînak bû. Gelekên wan xwendekar bûn, karên wan yên dîtir hebûn. Lê nîşan dan ku di dema şer de dikarin dev ji her tiştî berdin û biçin şer. Ciwanên Rojava wisa bûn.

Me hinek behsa kantona Cizîrê kir, lê li kantonên me yên dîtir jî bi vê şêwazê xebatên ciwanan pêş diketin. Bi komîn û komîtayan, bi xebatên spor, çand û hûnerê, bi perwerdeyan xebat dihatin dimeşandin. Jixwe milê Efrînê ji berê ve tabûrên leşkerî hebûn. Ji milê çandî ve jî xurt bûn, jinê pêşengtiya wê dikir. Cihê ku jin pêşeng be, di sporê de jî kûrbûn çêdibe, di çand û hûnerê de jî kûrbûn çêdibe, di welatparêziyê de jî kûrbûn çêdibe. Li ser esasê girêdanbûna bîranîna şehîd Çekdar, wan karan berdewam dikir.

Rizgarkirina Kobanê jî, ji bo me xeyal bû. Her kes dixwest biçe wir û şer bike. Piştî rizgarkirinê em çûn. Kobanê dîtin, pêlî axa wir kirin û li wir jiyankirin, hesteke cuda ye. Moralekî pir mezin e. Her malek xwediyê bîranînekê ye. Di her gavekê de dema ku tu pêlî axê dikê, dilê te diêşe. Tu dibêjê teqez li vê derê lehengek xwîn rijandiye. Mesela dayikek ji Bakûrê Kurdistanê hatibû, dixwest biçe mala xwe. Lê çiqasa digeriya jî mala xwe nedîdît. Lewra her der wêran bûbû û mala xwe êdî nas nedikir. Pir bi êş bû. Lê serkeftina Kobanê, serkeftina mirovahiyê bû. Di çavê her dayikekê de mirov gelek tişt dîdîtin û mirov dikare bi rojan li ser biaxife. Ew berxwedanî û lehengî hemû di çavên dayikan de diyar dibûn. Di çavên wan de her tişt zindî ye.

Ciwanên Kobanê jî, gelek tişt jiyan kirine û hevalên xwe winda kirine. Xemgîniyek hebû. Lê di çavên wan de jî hêviya serkeftinê hebû. Dîtina Kobanê ji mirov dibe berdela gelek perwerdehî û gelek jiyankirinan. Hestên mirov pir xurt dibin, mirov pir jê tesîr dibe. Mirov ew qesa lehengî dibîne ku mirov nikare bîne ziman. Bi rastî jî gotin û dîtin nabin yek. Bost bi bost lehengtî hatine jiyankirin, xwîna ciwanan û gel hatiye rijandin. Ji ber ku koçberî hatibû jiyankirin û ciwan jî çûbûn Bakûr.

Piştî rizgarkirina Kobanê, di hemû tax û gundên Kobanê de ciwanan bi awayekî fedakar kar dikirin. Girêdanbûneke cuda çêbûbû. Dixwestin heyfa hevalên xwe rakin û bersiva tiştên hatine jiyankirin bidin. Mirov di baweriyeke pir mezin di çavên wan de didît. Gelek şikestin hatibûn jiyankirin, malên wan wêran bûbûn, ew qesa tişt jiyan kiribûn. Lê dîsa jî ji bo ji nû avakirinê pir bi xwestek û kelecan bûn. Hemû komîn û komîteyên xwe ji nû ve ava dikirin. Rûxmî ku tu amûrên wan tine bûn, dîsa jî komîteya xwe ya ragihandinê û komîteya çand û hûnerê ava kiribûn. Rûxmî ku amûrên wan yên mûzîkê, yên folklorê tine bûn; di xetên gundan de û taxên bajaran de kar dikirin. Lewra dizanîn ku çi lehengtî hatine jiyankirin. Dizanîn ku dê felsefeya Rêber Apo, YPG û YPJ dê her hebe. Heya ku di laşê hevalekî de xwîn bimîne, dê ew parastin her berdewam bike.

Baweriyeke pir mezin hatibû girtin û hişyariyeke taybet jî li Kobanê çêbûbû. Dîsa komîteya sporê ya ciwanan li Kobanê hatibû avakirin. 30-40 kes bûn, tenê gokek wan ya lîstikê hebû. Ew jî pir bi baldarî dişûxilandin. Êdî madî û manewî dixwestin her tiştê heyî biparêzin. Êşa wan jî pir nû bû, bi taybetî komkûjiya dawî ku çêbû pir zindî bû. Mirov dayik guhdarî dikirin, mirov pir bi hêrs dibû. Dayikekê hem kurê xwe, hem keça xwe winda kiribû. Ji malbatekê 11 kes şehîd bûbûn. Lê baweriya wan bi xwe hebû, digotin em li vê derê ne. Bi rastî jî Kobanê bû remza welatparêziyê.

Wan pir ber xwe dan, bi baweriyeke pir xurt tevgerîn. Yek jî ji dayikan bigre heya ciwanan, karê ku dikirin dixwestin bi ser bixin. Cihekî ku xirab bûye, hema bi hev re dikirin cihê jiyanê. Xebatên înşayê zehmet in. Li Rojavayê Kurdistanê jî guhertina zîhniyetê û avakirina pergalê ne hêsan bû. Divê tu roj bi roj zîhniyeta xwe biguherê, gavan biavêjê. Da ku tu bikaribê zîhniyeta gel jî biguherînê û gavan ji wan bidê avitin. Bi taybetî di xebatên ciwanan de ew esas bû. Li gel kêmasiyan, ew yek di astekê de dihat kirin jî.

Mirov wisa bi hêsanî behs dike, lê xebatên civakê pir hessas in, pir ked dixwazin. Tu heya ku fikra komînê bixê serê mirovekê û komînekê ava bikê, gelek tişt pêwîst dikin, divê tu ked bidê. Lê tiştekî bê ked tine. Divê her herikandin û nûbûn çêbibe. Tevgera me wisa ye, divê hêrikbar be, di cihê xwe de nesekine û qeşe negre. Li Rojavayê Kurdistanê jî wisa bû. Zehmetiyên wê hebûn. Em dibêjin heqîqet di dîrokê de veşartiye. Ji bo ku tu civakê careke dîtir bînê ser cewhera wê divê kedeke mezin bê dayin. Di astekê de tê dayin jî.

Rojava, şênberbûna projeya Rêber Apo ku ji bo hemû Rojhilata Navîn û çar parçeyên Kurdistanê danî ye. Rast e, ji bo vê gelek ked hatin dayin, gelek berxwedan çêbûn û lehengtî hatin kirin. Lê hê jî ked pêwîst dike. Pir berdel hatin dayin. Lê bi taybetî divê şerê zîhnî ku em weke şerê herî mezin pênase dikin, divê her berdewam be. Mirov çek bigre û parastina xwe bike, girîng e. Lê di şerê siyasî û zîhnî de, divê tu her rihê xwe û fikrên xwe zindî bigrê û di ber wê de kedeke mezin bidê.

Di xebatên ciwanan de tiştekî girîng jî koperatîf bû. Em dibêjin dayikê bi çandiniyê her tişt pêş xistiye. Niha li Rojava, em dixwazin wê çandê ji nû ve ava bikin. Rojava, ji aliyê çandiniyê ve cihekî dewlemend e û xwedî berhemên giranbiha ye. Lê divê jinên ciwan û giştî ciwanan bi reng û dengê xwe di nava vî karî de cih bigirtana. Mesela dema ku koperatîfên giştî dihatin ava kirin, lewaz diman. An jî ber bi tiştekî din ve diçûn. Lê dema destê jinê diket navê, cuda dibû. Jinên ciwan kom dibûn û dihatin gel hev, rihekî kolektîf diafirandin. Cara yekemîn jî li Rojava, ciwanan koperatîfa xwe bi baxçeyekî gulan çêkir. Li Rojava cara yekemîn tiştekî wisa di pêşengtiya tevgera jinên ciwan de hate pêş xistin. Alaqayeke pir mezin hate nîşan dan.

Pişt re jinên ciwan baxçe çêkirin û bi hev re berhemên wê rakirin. Hem te karekî kolektîf bi hev re dikir, hem jî te dikir mijara perwerdê. Bi giştî jî karên koperatîfê dihatin kirin. Lê bi taybetî tevgera jinên ciwan û Yekîtiya Star di vî karî de serkeftî bûn. Lewra di cewhera jinê de bi axê ve girêdanbûn heye, nêzikbûneke xwezayê heye. Ew nêzikbûna jinan jî mînak bû û dîrokî bû. Jinên ciwan çend karên wisa kirin û bûn mînak. Heval li dora xwe kom dikirin û komînalîteyek ava dikirin. Pişt re dar çandin, baxçe çandin, sewal xwedî kirin. Ew hemû projeyên jinên ciwan bûn û hê jî li pêş dixin. Di vî karî de encam dihate girtin.

Bi giştî dema ku em behsa Rojavayê Kurdistanê dikin, em dibêjin çi jî kêm dimîne. Tu dizanê ku di her kêliyekê de lehengiyek heye. Di her seatê de heval şehîd dikevin û leheng li ser wê axê çêdibin. Berxwedan û destana Rojava, ji bo hemû cîhanê bû mînak. Weke kes di nava vê destanê de cih girtin, min kêfxweş dike. Heya ku em li wê derê bûn, rojeke bê şehîd derbas nebû. Her roj me ew şehîd radikirin û her carê rexnedayin û soza xwe li hemberî wan şehîdan dida. Ji bo ku em layiqî wan şehîdan bibin, me soza xwe nû dikir. Gelek hevalên şehîd dihatin, êdî nedihatin naskirin. Lê me di rûyê wan de hemû xweşikbûn dîdîtin. Ji ber cenazeyên hevalan ditirsîn, her cure hovane li ser cenazeyên wan dikirin. Lê vê yêkê hêrsa ciwanan zêdetir radikir û soza wan ya girêdanê her roj xurtir dibû. Rojava bû mînaka hemû şoreşan. Li cîhanê xwe îspat kir.

Bi taybetî destana Kobanê, dengê Rojava gihand her cihî. Rista jinê ya dîrokê de derxist holê. Coş, kelecanî û morala li wê derê nîşanî her kesî da. Ew ciwanên Apoger, dema ku diçin ser mirinê jî bi kîjan rihî diçin, her kesî dît. Ne ku ew ji mirinê ditirsin, mirin ji wan ditirse. Bi hezkirin diçe ser her karî û her xwe fedakirinê re jî amede ye. Lewra dizane ku wê her bijî. Jixwe her hevalekê ku şehîd diket, bi dehan ciwanan navên wan digirtin. Bi rihê wan şehîdan jî azadî pêş dikeve. Rojavayê Kurdistanê û Kobanê jî mînaka vê ye.

**3-Li Rojava Xebatên Ziman û Perwerdê**

***-Qadeke girîng a şoreşê jî, milê ziman, çand û perwerdehiyê ye. Di çarçoveya xebatên înşayê de, xebatên ziman û perwerdehiyê li Rojava çawa dimeşiyan?***

**DILDAR KOBANÊ:** Piştî ku demekê min xebatên giştî yên şoreşê meşandin, ez derbasî xebatên ziman yên Rojava bûm. Qadeke fireh bû, lê yên ku kar bikin tinebûn. Ji ber vê pirsgirek dihatin jiyankirin. Ew jî qadeke şer bû. Mesela cihekî weke Cizîrê ku tu û dewlet di nava hev de ne, tu dixwazê perwerde bide. Jixwe li Kobanê û Efrînê dewlet nemabû. Lê li Cizîrê dewlet hebû. Pirsgirek derdixistin.

Di meseleya perwerde de heya dawî israr dikirin.  Ji bo ku em nekevin medreseyan, çi ji destê wan hat kirin. Gelek cihan ji mamostayan re pirsgirek derdixistin.

Herî dawî me got, mamosteyên me gihiştinê û em perwerdeya xwe bidin. Lewra wan mamosteyên ku ji dewletê pere digirtin, nêzikî me nedibûn. Me mamosteyên dildar perwerde kirin. Piştî vê me xwest em refa yeke bikin Kurdî. Li Efrînê gotin, “*heya refa şeşan em bikin Kurdî.*” Lê ew qesa derfetên me tinebûn. Bi milyonan pirtûk pêwîst dikirin. Jixwe li Rojava matbaayek wisa tine bû. Yên ku me li Bakûr çap dikirin jî, me nedikarî derbas bikin. Hinek bi awayekî veşartî derbas bûn, lê yên din nehiliştin.

Yek jî pirtûkeke ku li gorî Rojava bernameya perwerdê bide tine bû. Me qomîsyonek ava kir; hinek mamoste ji Efrînê hatin, hinek ji cihên din hatin, hin hevalên me jî di nav de bûn. Me got, *“ji refa yeke heya refa şeşan em bi Kurdî pirtûk amade bikin.*” Dema ku ez hatim jî ber xilaskirinê bû. Hevalan çapxaneyek ji bo wê amade kirin, dê îsal hemûyan çap bikin. Berê jî çapxane hebûn, lê têrî nedikir.

Bi kûrtasî pirsgirekên pir cîdî hebûn. Dema ku cara ewil me xwest bi Kurdî perwerde bidin, qiyamet rakirin. Gotin, “*xeynî zimanê Erebî tû kes nikare perwerde bide.”* Dewletê ne dixwest metrese ji destê wê biçe, lewra deshilatdariya xwe li ser vê ava kiribûn. Lê me guhdarî nekir, lewra êdî em li wan deran serwer dibûn.

Di 2011’an de me dest bi perwerdeyên ewil kirin, lê tenê li ser zimanê Kurdî bû. Lê tevahî ders, bi zimanê Kurdî pişt re çêbûn. Tenê Kurdî jî ne; yên dixwazin Erebî, yên dixwazin jî dikarîn bi zimanê Sûryanî bixwînin. Felsefeya we li ser netewa demokratîk bû, lê yên ku dixwazin bi zimanê xwe dikarin perwerde bikin. Me gotibû, heya safha sisêyan dê her zarok bi zimanê xwe bixwîne. Lê piştî wê zarokên Kurd neçar in ku perwerdeya Erebî bibinin; zarokên Ereb jî neçar in ku perwerdeya Kurdî bibinin. Ez bawerim îsal li Efrînê heya pola şeşe jî bi Kurdî perwerde tê dîtin. Li Efrîn rewş guncav bû, mamoste amade bûn. Lê pirtûk tine bûn. Ger niha ew jî hatibe hal kirin, pêşiya perwerdê zêdetir vedibe.

Lê rejîmê di destpêkê de pir pirsgirek derdixistin, dixwestin ji zarokan ew şiyarên BAASî bidin avitin. Lê hêdî bi hêdî me ew tişt ji holê rakirin. Ji bo Efrîn û Kobanê dibe ku rewş cûda be, lê ji bo Cizîrê me bîryarek wisa girt; me got, “*em ê bi safhaya yekemîn destpê bikin, lê her sal safhayekê zêde bikin.*” Îsal ji bo mamosteyan akademî jî hatin vekirin û dewreyên sê mehan tên darxistin. Her carê 40-45 mamoste diketin perwerdê û ji her alî ve dihatin perwerde kirin. Li Serekaniyê û Derîkê dû peymangeh hatin vekirin. Bîryar jî hatibû girtin, da ku li hemû bajaran bên vekirin. Peymangehên perwerdekirina mamosteyan bûn.

Di nava van pêşketinan de kêmasiyên ku tên jiyankirin jî hene. Li Rojava xala me ya herî lewaz, perwerde ye. Perwerde tê kirin, lê çawa? Perwerdeyên me derxistina xebatkarên şoreşê nake armanc. Mirovan kom dike û tevlî perwerdê dike, lê di nava wê dewreyê de 2-3 kes dernakevin. Her kes ya amade digere. Kes serê xwe naêşîne û ya hazir û amade dixwaze. Mesela di nava mamosteyên me de mirovên ji me xurtir jî hene. Bes tu bikarê rast perwerde bikê û rast amade bikê. Ger me ders û perspektîfek rast dabûya wan mirovan, dê encamên cûda derbiketina.

Ew tişt di hemû saziyên me de hene. Divê em hinekî wêrekî tevbigerin. Divê em perwerde bikin û însîyatîfê bidin gel. Divê em baweriyê bidin mirovan, da ku kar bikin. Mesela li Kobanê, di xebatên ziman de kadro tinebûn, di xebatên ragihandinê de kadro tinebûn. Lê karê xwe pir baş dimeşandin. Gelek mirov hene, bi serê xwe perwerdeyên xwe çêkirin, peymangehên xwe pêş xistin û ders dan. Ragihandin jî wisa bû. Lê li Cizîrê ew qesa kes hebûn, ne ji aliyê ragihandinê ve û ne jî ji aliyê ziman ve derketin pêş. Divê xebatkarên xwecihî jî bên gihandin. Ger guhertina zîhnî çênebe, dê xeterî ye. Hinek serokên komînan, erzaqên ku ji komînan bên belavkirin, ji derdora xwe belav kiribûn. Zîhniyeta dewletê ew e.

Mesela li welatekî din, yên ku dibin berpirsên komînan pere nagrin. Ji bo vê divê em hin pîvanan deynin. Di nava şer de, ew mirov hinekî jî dibin biyaniyê rastiya xwe. Mesela wan kesên çete çi dikin? Talan dikin, komkûjiyan çê dikin, destdirêjiyan dikin. Çima yên me tiştên wisa nakin, lewra zîhniyeteke me ya giştî heye. Lê divê bi perwerdê ew zihniyet bê kûrkirin. An na di nava şer de xeteriyeke wisa jî heye. Dê sibê tasfiyegerî çêbe, komplo pêş bikevin. Ji bo vê divê bi perwerdê pêşiya wê bê girtin. Ew meseleyên zîhniyetê ne. Divê zîhniyeta jiyana azad baş bê daqûrtandin û pergal bê ava kirin.

***-We jî di nava xebatên ziman û perwerdehiyê de cih girt. Di dema şoreşê de giringiya van xebatan çi ye û di kîjan astê de dihatin meşandin?***

**BERÎTAN DÊRÎK:** Gel ji ber bêperwerde hatibû hiştin, di wê demê de me pir giranî da perwerdê û rêxistinkirinê. Despêkê zêde kesî xwe nêzî xebatên ziman nedikir, ji dervayî hinek malên me yên welatparêz pê ve tevlêbûn pir tinebû. Despêkê bi çend kesan me dest bi perwerdê kir. Li gorî şert û mercên wê demê nêzî du mehan me perwerdehiyên ziman didan. Dema ku wan perwerdehiyên xwe xilas dikirin, hinekên din fêr dikirin, wisa ev perwerde dihat meşandin.

Li cihên cuda jî me saziyên xwe zêde kirin. Li bajarê Efrînê navçeya Şera gundê Doraqliyê, me navendek bi navê *Şehîd Fewzî* ava kir. Li kantona Kobanê ji bi navê şehîdan navendên perwerdê hatin vekirin. Li kantona Cizîrê binavê *Şehîd Reşo* navenda perwerdê ya yekemîn hat avakirin. Di van navendan de perwerdê ziman hatin dayîn û bi taybet jî li xwedî mafê xwe yê ziman derketinê xwe da pêş. Ev ji bo gelê Rojava pêdiviyek li pêş bû. Ji ber di demên borî de dema ku dewletê li ser gel zext dikirin û dixwestin tine bikin, bi awayekî veşartî di malan de tîpê zimanê Kurdî didîtin, bingehek ya ziman di wir de hebû. Hema hema nîvê civakê li ser tîpan perwerde dîtibû. Vê yekê jî di kar de hêsanîbûneke dida avakirin. Çendî zor û zehmetiyên xwe hebe jî daxwaz û coşa milet ya li beramberî rêxistinê û ziman pir zêde û bi xwestek bû. Di qonaxa despêkê de jixwe armanca me amadekirina mamostayên ziman bû. Divê em wan perwerde bikin û di nava gel de dest bi xebatên ziman bikin.

Ji aliyê din ve jî gelek kesan dixwest derbe li van xebatan bixin, digotin "*roj ne roja vê ye, hîna wext nehatiye, da ku ziman bê fêrkirin.*" Ji bona gel bêcoş bikin, pir nêzîkatiyên şaş dihatin meşandin. Rûxmî van nêzîkatiyan hemû cihên ku pêwistî hatin dîtin navendên ziman hatin vekirin û perwerde hatin dayin. Bi demê re daxwaza herkesê ji xebatê ziman re çêbû. Êdî ji derveyî Kurdan jî dixwestin Kurdî fêr bibin.

Di vê derê de rista jinê jî diyarker bû, pêşengtîkirina di xebatên ziman de jinê pir rol lehîst. Hem di dirokê de ya ku nehêlaye ziman winda bibe dayik e, hem jî di roja me ya îro de ya ku herî bi xwestek nêzik bû, zû fêr dibû û dida fêrkirin dîsa jin bû. Despêkê bi awayeke pergal nebû. Du mehan me perwerdehî didîtin û li ser xwestekê bû. Ruxmê ku bêderfetîya amoran jî pir zêdebû. Piştî demekê pêwîstî hat dîtin ku ev xebat bên firehkirin û me êdî xebatên ziman fireh kirin.

Dema ku me meyze kir, me dît ku berjewendiyên kesî pir pêş ketiye. Wisan lê hatibû ku armanc tenê girtina dîplome û qezenckirina pereyan bû. Ango nirxekî xwe yê manewî nemabû. Ji bo wê me xebatên ziman mezin kirin û pêwîstiyekî lezgîn bû. Jixwe ferqa Rojava ji parçên din yê Kurdistanê ew e ku çendî di dibistanê sîstemê de bixwînin jî, di malê de herkes bi hevre bi Kurdî dipeyivî. Vîya jî dihişt ku parastina çand û ziman hebe. Waneyên me tenê ne ew bûn ku hema bên û ziman fêr bibin. Li wir rastiya dijmin, çanda xwe parastin, wê çawa jiyan bike û çarenûsa xwe hemû dihatin nîqaşkirin, fêrkirin û dibûn mijarê waneyan. Kar û xebata giştî ya perwerda civakê, bi navendan hate despêkirin. Bingeheke perwerdê di civakê de jixwe hebû.

Di sala 2007'an de li bajarê Kobanê konferansa yekem ya zimanê Kurdî hatibû çêkirin. Piştê konaxa şoreşê jî civînên mezin yên ji bo hemû kar û xebatên civakî hatin li darxistin. Bi demê re rêxistina saziyan hat lidarxistin. Bi navê *Yekitiya Star* sazî hatin lidarxisatin û di bin sêwana Yekîtiya Star de xebatên xweser hatin lidarxistin.

Xebatên ciwanan di navendên wan de hatin lidarxistin, saziyên ziman avabûn, qada civakî hate avakirin. Bi vî awayî nimûneya yekem ya şoreşê hat avakirin. Di her ceribandinê de gelek tiştên erênî derdiketin û yên ku aliyê xwe kêm bû li ser wan jî sekinandin dihatin çêkirin û li ser esasê wê çawa baştir kar bê meşandin gav dihatin avêtin. Saziya aborî, saziya têkiliyên derve di çarçova xweser û di aliyê giştî de hatin avakirin. Bi van vesazkirinên sazîyan re qadên xebatê fireh bûn û li tevayî qadên civakê kar hatin meşandin.

Bi avakirina YPG, asayîşê bandora xwe li tevahî xebatan kir. Her xebateke ku hatî avakirin ji ber li gorî dema xwe, li gorî şert û mercên wê demê başbûn, dema ku gav pêş ve hatin avêtin me dît ku kêm dimîne û pêwiste bên gûhertin û bi vesazbûnekî nû re bê derbaskirin. Di xebatên TEV-DEM'ê de ji bona ku sîstem rûne meclis, komîn avabûn. Da ku bi rêka komîn û meclisan xebat were kirin, pisgirêkê civakê were çareserkirin, civak were perwerdekirin xebat hatin meşandin. Bi navê malên gel

saziyên gel hatin avakirin. Malên jinê hatin avakirin, navendên jinê hatin avakirin. Her ku pêdiviya civakê bi perwerdê çêbû akademî hatin avakirin.

Saziya me ya bi navê Ramanên Azad jî bi demê re kar û xebatên xwe berfireh kirin. Di her qadê de saziyên xwe, rêveberiya xwe ya xweser û giştî hatin avakirin. Di nava xebatan de perwerdekirina civakê ji her xebatê lezgintir bû û ew esas hat girtin. Di kevin de bi navê eniyê, xebat di nava civakê de dihatin meşandin, li gorî wê demê baş bû. Hema li gorî qonaxa nû ev têra rêxistinkirina civakê nedikir û sazîbûyîn pêwîst bû. Ji bo wê jî akademî ava bûn. Di bin sêwana her saziyekê de akademî hatin avakirin.

Di destpêka şoreşê de akademiya *Ramanên Azad* hate avakirin. Di van akademiyan de ramanên Rêbertî dihatin dayîn. Bona herkesê xwedî vîn, çand, ziman di van akademîyan de perwerdekirin esas dihat girtin. Di van akademiyan de pêwîstî bi perwerdeyên bîrdozî jî hate dîtin di her qadê de ev xebat hatin meşandin û xurtkirin.

Qonaxa despêkê pêwistî bi parastina gel hebû, ji bo wê hêzê parastinê hate avakirin. Ji bona êrîşên DAÎŞ'ê yên li ser Rojava bişkênin. Dewletê hişmendiyek bi civakê re dabû avakirin, digotin, "*tenê hûn dikarin bixwînin, dîploma bigirin. Heger karek hebe bikin.*" Wekî din mafekî jiyanê ne mûmkun bû. Yanî bi hemû awayî ferasetek mûçe dabû avakirin, weke din kes bibe xwedi raman, azad bifikire, xebat bike tinebû û nedihat qebûlkirin. Pêwîstiya gel ew bû ku li ser hişmendiya netewa demokratîk bê amadekirin û perwerdekirin, lê belê dewletê ew ji hemû nirxên wan yên pîroz, yên mirovahiyê dûr xistibûn.

Di despêkê de perwerde bi awayê semîner dihatin dayîn û viya jî ji bo civakê nedibû bersiv û pêwîstî bi navendên sazibûnê hatin dîtin. Daxwaz destpêkê pir hebû, lê belê di alîyê rê û rêbaz de ji ber kêm dima nedibû bersiv, xebat jî kêm diman û pêwist bû xebatê sazîbûnê bihata meşandin. Pêşengtî dihat xwestin, rêveberî dihat xwestin. Lê kêm dima, nedibûn bersiv, xebat wê çawa bê meşandin? Di vê mijerê de bê tecrûbeyî hebû. Ji bo wê bi xwe re zehmetiyên mezin dianîn. Di vir de bandora perwerdê pir cuda ye. Bi taybetî divê kesayet xwe perwerde bike. Bi demê re akademî avabûn. Kesên ku bixwazin xwe perwerde bikin, di van akademiyan de waneyên felsefaya Rêbertî, perwerdeyên pîşeyî, perwerdeyên xweser dîtin û sûdê xwe pir bûn. Di van perwerdeyan de her ku diçû kesayetê xwe ava dikir, hem jî dihişt ku bandor li ser kar û xebatan jî bike.

Piştî vê konaxê û şûn ve konferansên hemû sazîyan çêbûn. Konferansên Yekîtiya Star salê carekê çêdibûn, ji bona çêkera xwe ya desteya rêveber derxîne. Ya TEV-DEM wisa bû. Yê ciwanan wisa bû. Ya perwerdê û ziman wisa bû.

***-Li ser avabûna pergala perwerdehiyê û bi Kurdî pêşxistina dibistanan hûn dikarin çi bibêjin?***

Konferensa perwerdê û ziman, di 2012'an de li bajarê Amûdê hat li darxistin. Gelek bîryarên giring hatin girtin. Hem perspektîfên Rêbertî, hem jî perspektîfên rêxistinê di warê qada perwerdê de rol û misyona xwe ya mezin hebû. Bi vê ve me dest avêt dibistanên dewletê û ev gavavêtinek nû bû. Ji bo hemû parçan û bi taybet jî ji bo rojavayê Kurdistanê. Ezmûn hatibû girtin, mamoste çêbibûn. Di gelek aliyan de gel hatibû perwerde kirin. Lê belê ji bo xizmetê bi awayekî ji dil xwe dana pêş çênedibûn. Kesên ku kar jî dikirin hijmarê wan kêm bûn, lê belê bi demê re ev pêş diket.

Dema me dest bi dibistanên giştî kirin, di alîyê amûran de zor û zehmetiyên xwe yên pir mezin hebûn. Ji nû ve înşakirin, wê civakê li ser kîjan temelan perwerde bikî, çawa perwerde bikî, zorîyên xwe pir bûn. Ger pirtûk nebin, binesazî nebe ev astengiyên mezin tîne. Gelek kes li dijî me kar dikin, me reş dikin, bi taybet di mijara perwerdê de pir xwestin bi mêjîyê civakê bilehîzin, bi mejîyê ciwanan bilehîzin ku berê xwe nedin perwerda netewa demokratîk. Di akademî û di navendên giştî yên perwerdê de berxwedanek mezin hat meşandin. Li alîyê din jî kesên ku xwestin reşbûnê çêbikin derbe li sistema perwedê bidin, hemû vala hatin derxistin û tekoşînên pir dijwar hatin meşandin û gavên pir mezin hatin avêtin.

Wêne-20

Ev sîstem ji bo Rojava, ji bo me û ji bo hemû parçan nû bû, ev sistema perwedê û ya avakirinê ye. Her gavavêtina ku di vê qadê de dihat çêkirin dibû ezmûn û tecrûbêyên herî mezin ji bo parçeyên din

yên Kurdistanê. Di dibistanan de perwerde dihate dîtin, amadekariyên wê yê mezin Kantona Efrînê kir. Kantonên din hinek taybetmendiyên xwe cûda bûn. Di wê demê de ji ber ku dewlet di Kantona Cizîrê de bû, teybetmendiyên xwe ji kantonê din cûda bûn. Binesaziya wê cûda ye û gelek pêkhate tê de cih digirin.

Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê gavên mezin di Kantona Kobanê de çêbûn. Di destpêkê de me li Kantona Efrînê dest bi dibistanên fermî kirin. Me çêkera dibistanê li gor wê despêkê ava kir. Me mamoste amede kirin, ji bona ku em waneya zimanê Kurdî bixin nav waneyên dewletê. Gelê me di milekî ve pir bi coş nêz dibû û di milê din de jî matmayî dima. Yekem car bû ku zimanê Kurdî diket dibistanên dewletê, ev jî gel pir matmayî dihişt. Ji ber hertim dîtîbû dewlet her tişt e, lê belê piştî ku şoreş çêbû ev hat guhertin. Destkeftiyên ku bi saya keda şehîdan bi dest ketin êdî wisan lê hatibû ku gel matmayî dima û dewlet ji nedîtî ve dihat, êdî bawerî bi hêza xwe dianî.

Ji bona wê di dibistanan de heya astekê me pirtûk amade kirin. Ji ber bêderfetiyê li gor ku tê xwestin di gavavitinê de em kêm diman. Jixwe di despêkê de di akademiyan de komek hatibû perwerdekirin û ev bingehekî baş bû ji bo dibistanan. Hemleya perwerdê despêkê di sala 2012'an de li Efrînê me di gundan de da despêkirin. Di despêkê de hîna di bajaran de dewlet mabû, ji bona wê me di gundan de despêkirin. Jixwe mamosteyên gundan dixwest guhertinek wisan çêbibe, hê jî di bajaran de mamosteyên dewletê hebûn. Mamostayên gundan ji her tiştî re amade bûn, kîjan xebat mirov daniya pêşiya wan nedigotin na. Di bajaran de mamosteyên dewletê ji bo seata xwe dagire dihatin dibistanan, ji bona wan perwerde pêşxistin ne mijara gotinê bû û di xema wan de jî nebû. Jixwe tenê ji bo muçe bigirin diçûn dibistanan.

***-Dervayî Kurdî, di zimanên din de jî li dibistana perwerdehî hate dayin, ango we pergaleke perwerdehiyê ya pirzimanî esas girt, an na?***

Jixwe hemû zarok yên Kurdan bûn, ji bo sistema dewletê pêşketina wan zêde ne xem bû û ne dixwestin pêş jî bikevin. Ji ber viya ketina me ya dibistanên fermî pir bi wate bû û risteke xwe hebû. Tevayî xwendevanan pir bi vê kêfxweş dibûn û hêz digirtin. Pir caran hinekan digotin "*neçin dersê zimanê Kurdî, dema hebin jê derkevin tevlî nebin.*" Rexmî vê jî me di her awayî de perwerde pêş dixist û dixwest pêş bixîn. Li ser pêkhateyên Ereb, Sûryan û ji civakên din ferzkirineke me çênedibû. Kê dixwest dikarî di dersê de bimîne, kê jî dixwest dikarî derkeve. Ji bo civakên din nîn bû, hê zêdetir li ser temelê bi dil tevlêbûnê bû. Di dibistanan de hem di aliyê civak, hem jî ji aliyê xwendevanan ve hezkirinek mezin ji bo ziman çêbû û berê xwe dan zimanê Kurdî. Bi salan bû dewletê li ser civakê polîtika dabûn meşandin, rexmî wê jî dema ku Rojava de şoreş pêş ket êdî her kesê berê xwe da dibistanên Kurdî û ji xwe re Kurdî esas girtin, di dibistanên ku ji berê de dewletê ew tê de perwerde dikirin.

Di despêkê de tenê waneyek zimanê Kurdî, di waneyan de dihat bi cihkirin. Tirsa ji dewletê û nedana moçeyan, mûdûrên Ereb despêkê tirsek di nav wan de dan çêkirin û bi wê ve girêdayî nîjadperestiyên Ereb jî bandor dikir. Ew mamosta û mûdûrên dewletê milekî ji ber pêşkeftinên me û milê din jî ji ber tirsa ji dewletê berjewendiyên xwe diparastin û dixwestin menfeata xwe bidin meşandin. Di aliyê bernaman de despêkê hinekê teredût jiyan kirin van mamoste û mûdûran, hema piştî ku me bernameya xwe niqaş kir bi wan re sistem bi wan da niqaşkirin, erê kirin û nêzîkbûnên wan hatin guhertin.

Cara yekemîn bi pergaleke ku wisa re rû bi rû diman û bala wan pir dikşand û bi demê re jî wan bi xwe digot "*em jî dixwazin fêr bibin.*" Di despêkê de van kesan ret dikirin, qebûl nedikirin. Hema bi demê re hatin guhertin û bi xwe jî xwestin fêrî vê sîstemê bibin. Digotin *"bila zarokên me jî vê sîstemê bixwînin û em jî vê sîstemê bixwînin.*" Di despêkê de waneyê zimanê Kurdî di her refekê de dersek dihat dayîn.

Di qonaxa despêkê de heftê sê ders dihatin dayîn bi Kurdî. Pişt re hêdî hêdî her ku çû ev wane bûn pênc ders. Erkê mamosteyan ew bû; tenê derbasî waneya xwe ya ziman dibûn. Piştî ku waneya xwe ya ziman dida ji dibistanê derdiket. Heger pêwistî pê heba kesên ku pergal fêm nekirine re nîqaş dihatin meşandin. Bi viya ve girêdayî jî mamostayên dewletê yên ku perwerde didin jî fêrî zimanê

Kurdî dibûn. Pişt re karê mamostan nedisekinî. Di danê siharê de perwerde didan û piştî nîvro jî waneyên bîrdozî didîtin. Li ser rêziman, xwendin û nivîsandinê wane didîtin.

Di nava civakê de jî yê ku bixwaze xwe perwerde bike xwe perwerde dikirin, yê ku di xebatê meclisan de xebat dimeşandin, ji her kesimê civakê yê ku dixwest xwe perwerde bikin, dihatin tevlî akademî û navendên me yên perwerdê dibûn. Di heman demê de hêzên leşkerî jî perwedê ziman didîtin, yanî hemû kesimê civakê dest bi perwerdeyê ziman û bîrdozî kiribû. Hemû sazî û dezgehên Rojava bi perwerdeyên Kurdî re hatin derbaskirin û ji bo ku di xebatên îdarî de kar bi Kurdî bên meşandin xebat hatin meşandin û di saziyan de jî perwerde dayin hate rûnişkandin.

Despêkê ev perwerde li navendan hatin meşandin û pişt re belavî hemû qadên civakê hatin kirin. Ji bona di hemû kar û barên îdarî de bi Kurdî xebat bên meşandin, zimanê Kurdî bê peyivîn, xebat hatin meşandin û belavî hemû qadên civakê hatin kirin. Disa heger saziyekê pêwistî bi mamoste ditîba, dihatin şandin û dihatin perwerdekirin. Saziyên parastinê wisan bûn, mamostayên ziman dixwestin û dihatin şandin, da ku zimanê Kurdî pêş bikeve. Ji ber qûwetê leşkerî nedikarîn bên navendên perwerdê, mamoste dihatin şandin. Da ku di warê zimanê Kurdî de bên perwerdekirin. Saziya şarederiyê jî wisa bû, ji ber xweseriya qadên tê de xebat dikin mamoste diçûn wana perwerde dikirin.

Di van saziyan de jî yên ku bikarin di asta mamostatî de piştî perwerdê xebat bimeşînin diçûn qadên din xebat dimeşandin û perwerdeya ziman didan. Xebatên hiqûq, ragihandin, ramanên azad; hemû cihan ji bona bibin Kurdî, xebatên perwerdehiya Kurdî hatin dayîn û xebatên ji bo pêşketinê hatin meşandin.

Gav avitinên perwerdê xelek bi xelek pêş diketin. Bi vî awayî Kantona Kobanê jî, piştî kantona Efrînê ketin nava pêngava perwerdê. Di destpêka 2013'an de ketinê. Bandora kantonan jî li ser hev hebû. Cihê ku bingeh hebû, gav bi gav perwerde pêş diket. Di vê qonaxê de hem bi awayekî giştî hevalên mamoste, hem jî hevalên ku di saziyan de kar dikirin kêm bûn.

Di saziya me de jî, di wê qonaxê de şehîd Viyan Amara hebû. Bi rastî jî cihê bîranînê ye. Divê mirov wê hevalê jî bîr bîne, ked û hewldanên ji bo perwerdê dane bîne ziman. Di meha heftan ya 2012'an de yekser dest bi xebatên xwe kir. Xebatên perwerdê dimeşandin, avakirina mamostayan pêş dixist, di gundan de qûrsên perwerdê pêş xistin. Di her gundekî de xebateke bi vî rengî meşand. Lê rewşa Kobanê hinek zêde zehmet bû, pêkhateya Ereb zêde bû. Ji bo wê jî hevala Viyan zêde nedikarî derbasî her gund û cihekî bibe. Lewra pirsgireka wê ya ziman hebû. Rûxmî wê jî hevala Şîlan li gel wê bû û hev û din temam dikirin. Ji aliyê pergal avakirinê ve, ji milê mamoste gihandinê ve rista xwe dîlîst. Ne tenê ji milê pîşeyî ve, ji her alî ve tevlî xebatên avakirinê dibû.

Dervayî vê xebateke bi navê *Yekîtiya Mamostayan* di Rojava de hate pêş xistin. Piştî ku derbasbûna dibistanên dewletê çêbû, pêwîstiyeke wisa hate dîtin ku di nava mamostayên ku bi dewletê re kar dikin de jî rêxistinbûnek bê çêkirin. Di vê qonaxê de gelek kesên welatparêz, an jî dildar xwestin tevlî vê xebatê bibin. Di asta herî jor de jî tevlê bûn. Hem wan kesan bi ezmûn dibûn, hem jî hewldan dihat dayin ku tû mirovên me bê perwerde nemînin. Bi taybetî hinek taybetmendiyên wan mamostayên ku bi dewletê re kar kiribûn hebûn. Tenê ji milê berjewendiya xwe ve nêzik dibûn. Di kîjan astê de welatparêzî ji min re heye, pêwîstiyên vê çi ne? Pêwîstiyên ku ez gelê xwe re xizmet bikim çi ne? Gelek hewldan hatin nîşandan, ked hate dayin, civîn hatin çêkirin heya ku ew sazî jî hate avakirin.

Di her sê kantonan de jî ew sazî hate avakirin. Tirsek hebû. Dixwazin ked bidin. Yên ku li ser vê xakê kar dikin, berdel didin û şev û roj nesekinin hebûn. Lê tenê ji milê kar ve yekalî dima. Di encamê de ji bo mamostayên ku bi dewletê re kar kirine û dixwazin bi me re jî kar bikin jî rêxistinek hate çêkirin. Weke xebatên ziman û perwerdê pergala komîteyan hate avakirin. Di her dibistanekê de sê rêveberî cih digirt. Her wiha di her dibistanekê de rêveberiya fireh jî hebû. Ew komîte di bajaran de jî, di gûndan de jî hate vesazkirin. Li her cihî û li gorî pêkhate û hejmarên wan komîte dihatin avakirin. Hin cihan sê endamên rêveberiyê hebûn, hin cihan hejmara wan penç bûn.

Di heman demê de jinê pêşengtiya vê rêxistinê dikir. Di kar û xebatên ziman de, ji vî milî ve jî gelek hewldan hatin nîşan dan. Di qonaxên berê de jî hevalan ked dabûn û hin tişt avakiribûn.

Hevalekî ku di asta jor de ked da van xebatan jî hevalê Çekdar bû. Hinek xûsisiyetên kesayet yên bandorker hene, ew dihêle ku di dema xwe de damgaya xwe dîrokê bidin. Yek jî wan kesayetan jî hevala Viyan Amara bû. Rûxmî ku çend caran birîndar bûbû, nexweşiyên wê yên fîzîkî jî hîbûn; ti caran

kelecanî û morala xwe kêm nebû, rih û fedakariya wê kêm nebû. Zêdetir bi awayekî xurt xwe tevlê dikir.

Bi taybetî jî ji ber ku hevaleke jin bû, piraniya hevalên saziyê jî jin bûn. Ji vî milî ve avakirina çanda xweser jî hebû. Hevala Viyan pêşengtiya vê jî dikir. Hem jî ji milê perwerdekirinê ve gelek tişt kirin. Di van herdû milan ve jî rist û rola wê pir zêde bû. Bandora wê jî mirov di her qadê de dibîne. Bi taybetî di bajarê Kobanê de mirov bandora hevala Viyan pir zêde dibîne. Di pêşengtiya van hevalan de li her cihekî û bajarekî saziyên ziman û perwerdê hatibûn avakirin.

Li gel xebatên ziman, xebatên perwerdê jî dihatin meşandin. Lê ji ber kesên ku berê bi dewletê re kar kiribûn hebûn, gelek zehmetî û bargiranî jî bi xwe re dianîn. Gelek nêzikbûnên çewt ji ber ku di zîhniyeta wan de hatibû avakirin, li hemberî xebatên me jî gelek zor û zehmetî derxistin. Weke ku her tişt dîploma ye, digirtin dest. Ji ber ku dibistanên dewletê de gihiştibûnê, xwe ji her kesî zanistir û mezintir dîdîtin. Di nava kar û xebatên perwerdê de jî, pir bi zanebûn nebe jî, gelek caran nêzikatiyên ku kar û xebatên ziman biçûk dibîne derdiketin holê. Li gorî xwe nêzikbûn çêdibû û nedihêliştin ku ew ezmûnên ku di xebatên me de çêbûne, bên teyisandin.

Bi rastî jî avahiyeke me ya ciwan hebû, lê van mamostayên dewletê re kar kirine temen mezin bûn. Cihê ku van ezmûn bên parvakirin û alîkariya hev bê kirin, ji vî milî ve risteke neyînî dihat lîstin. Bêgûman kar û xebatên wan jî hebûn, hejmareke kêm be jî pergala wan hate avakirin, komîteyên wan çêbûn. Weke her qada xebatê, wan jî bi awayê meclîsê xwe rêxistin dikirin. Meclîseke wan hebû, rêveberiya wan ya teng û ya fireh hebû. Lê yekser bi kordîneya xebatên ziman re pêwendîdar bû. Bi vî awayî jî bi awayekî hevbeş karên xwe rêvedibirin. Lê ezmûnên wan li ser pergala nû ku me dixwest em ava bikin pir zêde tine bûn. Li hemberî wê jî têkoşîneke pir dijwar dihat meşandin. Ji bo ku zêdetir xwe tevlê bikin, hevalên xwe zêdetir tevlî xebatê bikin û derdora xwe rêxistin bikin; gelek ked û hewldan hatin dayin. Beşeke wan tevlî van xebatan bû. Lê ne li gorî ya ku tê xwestin bû.

Ew proje û plansaziyên ku me didan pêşiya xwe, gelek caran pêk nedihatin. Lewra piraniya wan xwedî mal bûn, piraniya wan diçûn dibistanan û piraniya wan karên cûr bi cûr ve girêdayî bûn. Vê yekê jî nedihêlişt ku xwe yekser tevlê bikin. Her wiha nêzikatiyên min hejmartine jî pêşiya vê yekê dibûn asteng.

Di nava pergala heyî de, divê xwe bigihandina her mamosteyek, divê civîn çêbikirana. Divê pergala me bidana naskirin, di nava pergala me ya perwerdê de hin rêgez û pîvan hatibûn rûnişkandin, divê ew bihatina teqez kirin. Ew pergala ku dikeve bin karanîna bazirganiyê, ango ew pergala ku bi mûçe û pereyan kar tê kirin; divê bihata şikenandin. Her wiha li hemberî wê pergalê divê têkoşîneke mezin bihata meşandin. Lê ji xwendevanên diçin dibistanê bigre, heya dayikên dixwazin fêr bibin, hemû qûrsên perwerdê bi pere bû. Ji bo her waneyeke ku bê xwendin, di her mehê de sed hezar lîrayên Sûriye dihatin razandin. Ji bo ku ew perwerdeya dibe sedema bazirganiyê were kêm kirin û pêşiya van tiştan bi hişmendiyeke kûr bê girtin, divê perwerde bihatana darxistin. Li her bajarekî saziyên wan hatibûn vekirin û di navbera wan de têkiliyek hebû. Lê ew xebat pir bi çalak nehatin meşandin. Di gelek tiştan de hincet nîşan dayin û xwe bi sînor kirin hebû.

Hin mamostayên Sûryanî jî hebûn û bi me re kar dikirin. Me xwest em di heman demê de vê pergalê di nava Sûryanan de jî bidin meşandin. Wan mamostayan jî kar û xebatên xwe dikirin. Bi zimanê xwe di dibistanên fermî de perwerde didan. Li ser vê esasê jî rêxistinbûnek hate çêkirin. Hin bajaran welatparêz û dostên me jî hebûn, ji ber ku tevlî vê xebatê dibûn dewletê karê hinekên wan didan sekinandin. Dema ku çend heb ji erkê hatin girtin û mûçeyên wan hatin qût kirin, van gaveke xwe paşve dan. Digotin *"ger em bi we re kar bikin, em ê bê mûçe bimînin û zarokên me dê birçî bimînin. Ma kî ye alîkariya me bike."*

Dibe ku ferasetên bi vî rengî hebin, lê li gorî şert û mercan alîkariya madî jî ji wan re dihat kirin. Xwedî lê derketina kesên ku ji erkê hatine girtin jî hebû. Lê ew hişmendiya ku dewletê di wan de daye avakirin, zû bi zû derbas nedikirin. Ji bo wê jî nedikarîn kar û xebatên xwe berfireh bikin. Her bajarekî nêzikî 30 meclîsên wan hebûn, sê rêveberiyên teng hebûn, 15 rêveberiyên fireh hebûn. Di heman demê de komîteyên wan yên cûr bi cûr hatibûn avakirin. Di hûndirê pergala wan de beşên xebatên cûda hene. Mesela komîteyek hatibû avakirin, bajar bi bajar digeriya û li ser karên ku ew perwerdeyên bi pere dihatin dayin disekinî. Bi mûdûrên dibistanan re têkilî datanîn.

Di destpêkê de me mûdaxaleyî mûdûran nedikir. Ger di bernameya perwerdê de astengiyek bê derxistin, an jî pirsgirekek cûdatir bê jiyankirin. Ew mijar bi Yekîtiya Mamostayan ve girêdayî bûn. Vesazkirina bernameyên dibistanan girêdayî wan bû. Di heman demê de bi vê yekê em derbasî dibistanan dibûn, me dişopandin, astengiyên ku hene me tespît dikirin. Li hemberî mûdûrên ku astengî derxistine me helwest datanî, şiyar dikirin. Her wiha gelek kesên nîjadperest jî hebûn, li hemberî wan jî gelek helwestên cûda hatin stendin. Da ku di perwerdê de astengî pir dernekevin. Zor û zehmetiyên vê xebatê jî hebûn, lê rûxmî wê pêşketinek jî hebû. Hewldanên tevlêbûnê zêdetir dihatin çêkirin. Bi taybetî mirov dikare Kobanê weke nimûne bigre dest. Yê ku li wê derê ew xebat da rûnişkandin jî hevala Viyan bû.

Bajarê Efrînê jî, pê ve girêdayî hevalên Yekîtiya Mamostayan li wir jî heman kar dikirin. Li wê derê ezmûnên wan jî pir bûn. Ew pergal li Efrînê jî hate rûnişkandin. Li wê derê zêde zehmetî tine bûn, lewra dewlet pir zû ji wê derê hate derxistin. Ji ber vê her ku diçe xebat berfireh dibûn, tevlêbûn zêde dibûn. Ji bo vê xebatên ziman û perwerdê li Efrînê pêşketîtir bûn. Bingeha pergalê jî hatibû avitin. Weke me got, pêngava yekemîn ya Yekîtiya Mamostayan li Efrînê hate avitin. Ya dûyemîn Kobanê bû, ya seyemîn jî Kantona Cizîrê bû.

Taybetmendiyên Cizîrê hinek cûda bûn. Lewra hem dewlet tê de hebû, hem jî pêkhateyên din zêde bûn. Mesela li Qamişlo ji ber ku van salên ku me anîn ziman de dewlet jê derneketibû, xebat û perwerdeyên ziman bi awayekî korsan bûn. An jî di navendên saziyan de xebat dihatin meşandin. Bi piranî li ser esasê perwerdekirina ciwanan û civakê bû. Lê bi awayekî fermî derbasbûna dibistanan çênebû. Di destpêka 2013'an de hevalan xwestin ji vî milî ve hin hewldanan nîşan bidin û derbasî dibistanên fermî yên dewletê bibin. Li ser vê esasê amadekarî hatin kirin, avakirina avahiya kesên ku perwerde bidin û materyalên perwerdê hatin pêş xistin.

***-Em bawerin bersivandina gelek pêwîstiyan derketiye pêşiya we. Tinebûna van pêwîstiyên esasî xebatên we çawa tesîr kirin?***

Belê, ji milê materyalan ve di hersê kantonan de jî zehmetî hebûn. Heya astekê amadekarî dihatin kirin. Li ser ezmûnên berê jî hin xebat dihatin meşandin, lê vê yekê têrê nedikir. Şert û merc bi demê re pêş ketin û vesazîbûna wê hat pêş xistin. Hevalên bi vî karî re mijûl dibûn, hêdî bi hêdî amadekariyên xwe dikirin ku derbasî dibistanan bibin. Hem dewletê, hem jî gelek kesên xirab ku dixwastin darbe li projeya netewa demokratîk ku hemû dewlemendiyan di nava xwe de dihewîne bidin.

Gelek kesên bi kiravat xwe sekreterya dîdîtin, tenê cihê xwe rûdiniştin û reşkirina hinek tiştan dikirin. Digotin, "*em pir zane ne.*" Zanebûna wan jî cihê şîroveyê ye. Digotin, "*ne dema Kurdîniyê ye, ne dema van gavan e. Ne dema waneyên Kurdî ye.*" Li hemberî vê jî têkoşînek dihat dayin. Dema ku di qonaxa ewil de hevalan xwestin derbasî dibistanan bibin, di bajarê Qamişlo de dewletê nêzikatiyeke tûnd nîşan da. Hemûyan xwe ji dibistanan kişandin û derî girtin. Gelek hewldan hatin nîşan dayin, lê kîlît jî nedan ku derî bên vekirin. Sûryan hebûn, gelek Erebên nîjadperest hebûn. Lê bi hewldanan hin cihan kîlît hatin stendin.

Dewletê mamosteyên xwe jî kişandin, lê di hinek cihan de mamosteyên me hebûn û kîlît hatin stendin. Li hemberî saziya perwerdê ya dewletê bertekên xwendekaran çêbûn, di asta serhildanan de xwepêşandin çêbûn. Meşên protestoyê û çalakiyên rûniştinê çêbûn. Di heman demê de hevdîtinek ji wan hatibû xwestin. Xwendekar ketibûn saziya perwerdê ya dewletê jî û bi çend heb erkdarên wan re hevdîtin kiribûn. Hin xebatkarên me jî hebûn, di asta profesyonel de kar dikirin. Ne kadro bûn, lê rojeke di mala xwe de rûneniştibûn.

Mesela mamoste Nesrîn û mamoste Hesen hebû. Bi wan re jî rûniştibûn. Di hevdîtinê de hevalan gotibû, "*ne ku em ji we hêvî dikin ku hûn vegerin. Pergala me ew e, hûn bixwazin jî û nexwezin jî em ê vê pergalê bimeşînin. Bên û bi xweşî deriyên dibistanan vekin, an na hûn dizanin.*" Hevdîtineke wisa kurt çêbû, çalakiyên xwendekaran jî pir bi bandor bûn. Gel û xwendekar jî bi awayekî girseyî tevlî meşan bûbûn. Rûxmî vê jî saziya perwerdê ya Qamişlo şûnve gav neavitin. Digotin, *"wezareta perwerdê ya Şamê heye, divê hûn bi wan re hevdîtinê bikin.*" Xwe pir pîspor dîdîtin û gûhdarî nedikirin. Piştî çend rojan em ketin hemû dibistanan. Li gorî hêza xwe, me dibistanan vesaz kirin. Mesela li Qamişlo 96 dibistan hebûn, lê hêza me têra hemûyan nedikir.

Li gorî hêza xwe me deriyên dibistanan şikenandin û em ketin dibistanan. Bi awayekî neçarî di destpêkê de me gaveke wisa avit. Dibistan jî pir zêde bûn, wane jî zêde bûn. Lê dewletê dîsa mamostayên xwe venegerandin dibistanan. Pêwîstî hebû ku di her beşê de wane bên dayin. Kantona Cizîrê, ne weke Efrîn û Kobanê bû. Xweseriyên wê zêde bûn. Vê jî karê me zehmetir dikir. Ji ber vê yekê bangawazî ji gel re çêbû. Kî dikare kîjan waneyê bide, divê xwe tevlê bikira. Bi taybetî jî gelek ciwanên zanîngeh xwendine û nehatine erkdarkirin hebûn, xwendekarên ku hê xwendina zanîngehê berdewam dikirin hebûn. Ji wan gelek piştgirî û alîkarî çêbû.

Dîsa xebatên konfederasyona xwendekaran hebûn, bi zanîngehan re mijûl dibûn. Wan jî pir piştgiriya me kir. Hem me perwerdeya ziman da wan û ji wî milî ve piştgiriya me kirin, hem jî wan ji milê biranşan de piştgiriya me kirin.

Bi vî rengî di astekê de me ew xebat ser xistin. Piştî sê mehan dewlet neçar ma ku vegere. Ked û hewldanên gel, hişt ku dewlet gaveke paş ve biavêje. Mamosteyên xwe pişt re vegerandin. Lê êdî weke ku ew cih ne cihê wane digirtin dest. Gelek caran waneyên xwe di nîv de dihêliştin, gelek caran xwendekar zû berdidan. Lê ji vî milî ve jî pir derfet ji wan re nehat dayin.

***-Di dibistanên dewletê de, we guhertinên berbiçav dikirin?***

Xaleke din ya girîng jî heye, hêjayî nirxandinê ye. Ew sirûda nîjadperest ya BAASiyan hebû. Di hemû dibistanan de hate qedexe kirin. Divê tû mamosteyan ew dirûşme nedabiya û tû xwendekaran ew dirûşme nexwenda. Cihê wê zarok li ser "*Ey Reqîp*" hatin perwerdekirin. Her xwendekarek jî baldar bû û bi xwestek bû û di demeke kin de hemûyan fêr kir. Yek jî derseke qewmî hebû, li ser pergala BAASî ew wane dihat dayin. Ew wane jî di hemû dibistanan de ji bernameyê hate rakirin. Hinek cihan bi giştî hate rakirin, hinek cihan jî ji ber rewş û dengeyên siyasî nermkirin çêdibû. Cihê wê waneyê jî waneya perwerdeya ziman hate bi cih kirin.

Bêgûman di her karî de kêd û berdel tên dayin. Her ku berdel tên dayin gavên pir mezin jî tên çêkirin. Ji bo wê di xebatên ziman de jî, ji berê ve gelek hevalan ked dabû. Dibe ku di asteke jor de ew xebat pêş neketibû, lê bingeheke wê hatibû avakirin. Hevalê Şehîd Baz jî divê mirov li vê derê de bi bîr bîne. Di qonaxa destpêka şoreşê de hevalê Baz hebû. Di wê qonexê de piştgiriya mamosteyên me yên her dere Kurdistanê û Mexmûrê jî çêbû. Wê demê mamoste dihatin ava kirin, li ser wê esasê perwerde dihatin darxistin. Komeke mamosteyên hatin Rojava, hinekên wan demekê man, hinek şeş mehan man, hinek salekê man. Ked û hewldana wan hevalan jî naye bîr kirin. Lewra di hersê kantonan de jî wan hevalan bingehek dan avakirin û rista xwe lîstin. Ew jî bû piştgiriyeke perwerdê ya herî mezin.

Di ew qonaxa yekemîn de hevalê Baz jî rista xwe lîst. Bi xwe ji bajarê Girkê Legê bû. Di nava giştî xebatan de cih girt, hevalekî têgihîştî bû. Bi vî awayî kar û xebat didan meşandin. Beriya şoreşê û beriya ku hevalê Baz bi awayekî çalak tevlî têkoşînê bibe, di qonaxên têkoşînê yên salên kevn de di nava civakê de ji milê perwerdeya ziman ve ristek lîstibû. Gelek mirov perwerde kiribûn. Di heman demê bi xwe jî xwendakarekî zanîngehê bû. Hem diçû zanîngehê, hem jî gelek cihan geriyabû û ciwan perwerde kiribûn. Dema ku qonaxa şoreşê destpê kir, gelek kesên ku dihatin perwerdê bibînin, digotin "em xwendekarên hevalê Baz in." Piştî demekê xebera şehadetê ya hevalê Baz hat. Ji ber ku li qadên şer bû, xebera şehadetê li wê derê hat. Bandoreke pir mezin li ser civakê kir.

Di her cih û xebatê de pêşeng derdikevin. Di xebatên ziman de jî hevala Viyan Amara wisa bû. Hevaleke xwedî ezmûn bû. Hem ji milê ziman ve, hem ji milê civakî û zanistiyê ve risteke girîng lîst. Di sala 2013'an de êrîşên destpêkê li ser Kobanê çêbûn. Li ser wê esasê pêwîstî tê dîtin ku hevalên xwedî ezmûn di nava şer de cihê xwe bigrin. Ez bi xwe ne li Kobanê bûm. Lê gelek hevalên şahîdî kirine, behsa wê dikin. Tevlêbûna xwe hem di asta xebatên giştî de dike, hem jî berpirsyariya xebatên ziman dimeşîne. Dema ku şer destpê dike jî, bêyî ku heval bişînin, xwe berpirsyar dibîne û bi komek heval ve diçe êniya şer. Di 19'ê Tirmehê de şer destpê dike û belavî gelek cihan dibe. Her ênî tê girtin.

Hem ji bo parastina giştî kantonê, hem jî ji bo şikenandina pêla êrîşa çeteyan hevala Viyan komeke heval digre û diçe Gundê Kendalê. Derdorê wî gûndî şer dikin û demeke li wir dimînin. Jixwe çete paş ve vedikişin. Dema ku gund paqij dikin, pevçûn derdikeve û li wê derê hevala Viyan şehîd dikeve. Bandora hevala Viyan hem li ser giştî gelê me hebû, hem jî li ser avahiya mamostayan pir bandor kiribû. Hevala Viyan demdirêj neçûbû wir, lê di demeke ew qesa kurt de li ser gel ew qesa bandor çêki-

rin, bi taybetmendiyên hevala Viyan ve girêdayî ye. Her kes nikare wan taybetmendiyan di xwe de bide çêkirin. Bi coş û kelecanî xwe tevlî xebat û jiyanê kir. Xwe gihandina her jineke, her mirovekê re danûstendin, bawerî û vîn dayina wan ji bo wê esas bû. Qet nedisekinî, di her demê de di nava çalakiyê de bû. Di heman demê de kesên derdora xwe jî rêxistin û zane dikirin.

Wêne-21

Tû kîjan kesê Kobanê bipirsê û bibêjê hevala Viyan çawa bû? Bi coş, kelecanî û xwesteka wê dest pê dikin û dawiya axaftina wan naye. Bandoreke ew qesa zêde çêkiribû. Ji milê civakî ve jî xwediyê taybetmendiyên vekirî bû. Dikarî xwe bigihîne her jinekê. Dikarî her kesî re bide û bistîne. Li gorî her temenî û her taybetmendiyê nêzikî mirovan dibû. Bi xwe jî temenê wê ne pir mezin bû. Lê dikarî mirovên di her temenî re bide û bistîne. Yek jî stranan pir hez dikir. Di heman demê de bi moral bû, te kengê dîdît stran digotin. Hinek kesan digot, "*me careke jî tu bêdeng nedîtiyê, her stranan dibêjê.*" Hêz, eşq û tevlêbûna wê ya jiyanê xûrt û herîkbar bû.

Bi van taybetmendiyên xwe hem mamoste, hem jî giştî jin û civak pir bandor kirin. Ew hevalên ku gel wê çûne êniya şer jî, pir jê bandor bûbûn. Hê jî behsa kesayeta hevala Viyan dikin. Kî biçe Kobanê, bandor û tesîra ku hevala Viyan li wê derê çêkiriye dikare bibîne. Mirov dikare bibêje şehadeta hevalê Dilovan jî wisa bû. Yên ku li Kobanê herî zêde tesîr kirine, ew herdû heval in. Kesekî ku hevala Viyan nedîtiye û nîqaş nekiriye, li Kobanê tine ye. Ew tiştên ku di kesayeta xwe de dabûn avakirin, dikarî bi hemû kesan re parve bike û bi hev re gelek tiştan bidin meşandin. Li gorî taybetmendî û derûniya wan nêzikî her mirovê dibû. Her mirovekê jî dikarî wê gûhdarî bike, taybetmendiyên wê nas bike û her kesî jî dikarî wê hez bike.

Di demeke kin de xwe kir dilê her kesî, ew jî diyar dike ku ji milê kar, xebat, hewldan û têkoşînê ve pêş e. Di şehadeta xwe de jî risteke wisa lîst. Bû pêşengeke jinan. Hem weke rêveberiya ziman û perwerdê, hem jî di xebatên giştî de, tû tiştê xwe weke asteng nedîtibû û her bi xwestek tevlê bûbû. Kesên ku li gel wê kar kirine jî, tû caran eciz nebûne. Di heman demê de pêşketinên mezin jî di wan mirovan de dan çêkirin. Bandora wê li ser Kobanê, bi rastî jî pir li pêş bû. Hêsta xwedî li bîranên wê derketinê, di asteke bilind de bûn.

Di heman demê de bi navê Viyan Amara gelek kar û xebat hatin kirin. Bi navê wê akademî û sazî hatin vekirin. Li bajarê Efrînê, li ser navê wê peymangeh hate vekirin. Ji bo şehîdan mirov çi bike jî kêm e. Lê li ser bîranînên wan gavên mezin avitin jî, layiqî wan bûyin e.

Ew pêngava derbasbûna dibistanên dewletê, di hersê kantonan de jî hem li ser civaka Kurd, hem jî li ser pêkhateyên din bandora xwe çêkir. Her wiha bandora hevalên ku pêşengiya vê xebatê kirine jî pir pir zêde bû. Dibe ku kar û xebatên mamostetiyê, ne hêsan bin. Demê wan sibê heya êvarê dagirtiye. Heya nîvro di dibistanên fermî de wane didan, piştî wê jî xwe perwerde dikirin. Di nava heftê de 3-4 rojan perwerdeyên xwe pêşxistinê, perwerdeyên têgihiştinê û perwdeyên xwe yên pîşeyî dar dixistin. Lewra ger di xebatên perwerdê têr û tijî nebin, ji milê civak û fêrkirina zarokan ve gelek ali wê kêm bimînin.

Di heman demê de ew pêşveçûn her ku diçû derdiket holê. Weke şêwaz, di destpêkê de weke komîteyên dibistanan xwe rêxistin dikirin. Li gorî şert û mercan, di nava heftê de 3 an jî 5 rojan waneyeke ziman dihat dayin. Piraniya mamostayan hevalên jin bûn; dayik bûn, keçên ciwan bûn, xwendekarên jin bûn. Li ser wê esasê komîteyên giştî û yên xweser dihatin rêxistinkirin. Piştî demekê bi berfirehbûna hemû xebatan, xebatên perwerdê jî berfireh dibûn. Êdî pergalê nûbûn dixwest. Di konferansa yekemîn de pergala perwerdê weke *Saziya Zimanê Kurdî* (SZK) hatibûn avakirin.

Wêne-19

Bi demê re pergala hevberdevkî pêş ket. Di vê pergalê de hem kotaya jinê, hem jî ya zilam tê de cih digirt. Di her bajarekî de berdevk hatin hilbijartin, di her kantonê de jî berdevk cûda bûn. Di heman demê de xebata Yekîtiya Mamostayan jî, bi vî rengî hat meşandin. Weke xelekeke zîncirê bi hev re dimeşiyan. Pergala hevberdevkiyê hinek ji wan re biyanî dihat, her kesî hema fêm nedikir, lê bi demê re hate nas kirin û serwerbûnek jî çêdibû. Ji bo wê jî pergala hevberdevkiyê cihê xwe girt. Zor û

zehmetiyên vê pergalê hebûn, lê gelek pêşketin jî ava dikirin. Hem ji milê şexs ve, hem jî milê pergalê ve bû sedema gelek pêşketinan. Pêwîstî dihat dîtin ku ew xebat xwe berfireh bike û şaxên xwe di nava civakê de belav bike.

Her wiha pêwîstî pê hat dîtin ku kongreyeke giştî bê darxistin. Ew kongre jî bi navê perwerdeya civaka demokratîk hate dar xistin. Ne tenê li ser esasê ziman bû. Lewra SZK hinek teng dima. Divê ji milê pergalî ve gavek bihata avitin. Bi navê SZK gelek kar û xebat hatin meşandin. Li gorî dema xwe cihê xwe jî girt. Lê her ku diçû ew pergal ji rewşa heyî û kar û xebatên derdikevin re nedibû bersiv. Ji bo wê jî pêwîstî pê hate dîtin ku kongreyeke giştî ya perwerdeya civaka demokratîk were darxistin. Divê di vê kongreyê de nîqaş bihatana kirin û xalên pêwîst de gûhertin û vegûhertin çêbûbûya. Li gorî wê jî amadekariyek hate çêkirin.

Yekîtiya Mamostayan jî her salê carekê konferansên xwe dar dixistin. Beriya ku konferansên xwe dar bixin, li her bajarekî civînên berfireh dihatin dar xistin, pêwîstî hebe konferansên bajaran dihatin çêkirin. Piştî wê jî konferanseke navendî û ya giştî kantonan dihat darxistin. Lê dema ku şerê Kobanê derket, jixwe rewşa perwerdê nema. Rewşa Kobanê tê zanîn, lê ji bo ku ew xebat nesekinin komeke mamoste derbasî Pirsûsê bû, komek mamoste di nava şer de ma, komek mamoste jî rastî koçberiyê hatin. Weke ku di nava gel û hemû xebatan de hatibû jiyankirin, di dema şerê Kobanê de hin mamosteyên ku koçberbûn jî hebûn.

Tû bixwazê nexwezê her kes nikare heya dawî xizmet bike û her li gel te be. Her çiqasa nêzikî me bin jî, di dema şer de belavebûneke wise çêbû. Lê li ser esasê zindîkirina şehîd Viyan Amara, gelek kesan jî têkoşîn meşandin û ber xwe dan. Bi taybetî gelek mamoste derbasî Pirsûsê bûn û bernameyên xwe yên perwerdê li wê derê berdewam kirin. Dema ku Kobanê rizgar bû, dîsa veger çêbû. dema ku gel jî vegerî, ew xebat ji nû ve hate rêxistinkirin. Her çiqasa berê jî bingehek hebe, belavebûn çêbûbû, ji nû ve rêxistinkirin pêwîst dikir. Jixwe dewlet nema bû, xebatên Yekîtiya Mamostayan jî nemabûn. Hemû dibistan bûbûn Kurdî. Ji bo vê di xebatên ji nû ve avakirina Kobanê de, pergala perwerdê jî ji nû ve hate dest girtin.

Di destpêkê de xebat li du cihên ku biçek bi hev û din ve mane, hatin meşandin. Êdî amadekarî ji bo sala 2015'an dihatin kirin. Di gûndan de dibistan hatin vekirin. Li gorî wê erkdarkirin çêbûn. Bi vî awayî di zûrifên awarte de perwerdeya kantona Kobanê hate meşandin, lê li Cizîrê û Efrînê pêş ve çûn berdewam bûn.

Li kantona Efrînê, xebatên perwerdê li gorî kantonên din pêştir bû. Ji ber ku hem şert û zûrifên hene, hem binesaziya xebatê heye, hem jî ked û hewldanên hevalên ku di nava van xebatan de cih digirtin pêştir bû, xebatê wir jî pêşketîtir bûn. Di qadên din jî ked û hewldan hebûn, lê şert û mercên her cihekî cûda ne. Ji ber vê yekê bandora van xebatan li ser gel jî cûda dibû. Ji ber van sedeman pêwîstî bi kongereyeke gûhertin û vegûhertinê hate dîtin. Beriya ku kongre bê darxistin, di hemû bajaran de di sala 2014'an de hin amadekarî hatin kirin. Perspektîfên rêxistinê jî hebûn. Divê pergala hevberdevkiyê bihata rûnişkandin û divê di hemû dibistanan de refa yekemîn bi giştî bûbûya Kurdî. Ew perspektîf di cihê xwe de bû, em dereng jî mabûn. Lê binesaziya wê nehatibû amadekirin, bi taybetî ji milê biranşan ve mamoste nehatibûn perwerdekirin.

Sedemek jî kêmaniya materyalan û amûrên perwerdê bû. Ji bo vê jî waneyên refa yekemîn hemû bûbûn Kurdî, lê me nikarî her cihê pêk bînin. Mesela li Efrînê heya refa seyemîn jî hemû wane bi Kurdî dihatin dayin. Lê li Cizîrê refa yekemîn dihat dayin. Di vê qonaxê de hikûmeta xweser jî hate vesazkirin. Xweseriya demokratîk di 21'ê reşemiya 2014'an de hate îlankirin. Bi vê re rewşa pêkhateyên ne Kurd jî, ket rojevê. Divê li gorî felsefe, nêzikbûn û paradîgmaya Serokatî me pergalek ava bikira û di perwerdê de hebûna pêkhateyên din jî esas bigrin. Ji ber vê yekê refa yekemîn ya perwerdê me nikarî bi giştî bikin Kurdî. Hûkimeta xweser jî nîwqaş kirin û wezareta perwerdê hinek bîryar sitendin. Da ku her pêkhate bikaribe bi zimanê xwe perwerde bibîne.

Bi vî awayî hem perwerdeya heyî berdewam kir, hem jî bi Kurdî perwerde hate dîtin. Sedemên wê jî min dan diyarkirin. Her çiqasa amadekariyên me kêm bin jî, her mamosteyekê dixwest ku em refa yekemîn bi giştî bikin Kurdî. Lê rewşa pêkhateyên heyî jî li ber çavan hat girtin û bîryar hate sitendin ku refa yekemîn nîv bi Kurdî be, nîv jî bi Erebî be.

Di sala 2014'an de xebateke wisa hate meşandin. Di cihkirina bernameyan de, li hinek cihan pirsgirek derketin. Di cihkirina mamosteyan de, tengasî dihatin jiyankirin. Ji ber ku perwerdeya mamos-

tayan jî her berdewam dikir, hejmara mamostayan jî her zêde dibû, lê li gorî dibistanên heyî nedibûn bersiv. Li gorî bername û projeyên ku me danîne pêşiya xwe, me xebat vesazkirin û mamoste bi cih kirin. Li gorî vê jî me dest bi pêngava 2014-2015’an kir. Gelek aliyên wê yên erenî hebûn, lê gelek mûdûrên dewletan jî astengî derdixistin. Li hemberî wan helwest hate danîn, gelek kes ji erkê hatin girtin.

Di salên borî de jî, di ew qonaxên ku ez behs dikim de jî ji bo ku em bawernameyeke bidin wan zarokên ku bi Kurdî dixwînin, me gelek zor û zehmetî kişandin. Jixwe di dibistanên de karnameyek te dayin, lê di salên destpêkê de cihê waneyêkê, waneya zimanê Kurdî hate bi cih kirin. Gelek zehmetî derketin, nepijirandin çêdibû. Dema ku me bi cih dikir jî, dewletê jê dibir. Gelek nêzikbûnên wisa nîjadperest derdiketin holê. Me têkoşînên cûr bi cûr li hemberî wê da û me nedihilişt ku li ser xebatan pir bandor bikin.

Mesela ew zarokên salekê waneyên zimanê Kurdî dîtine, nedihêliştin ku kêfxweş jî bibe û encamên xwendina xwe bibîne. Di salên ewil de, xebatên ziman li ser karnameya Erebî dihatin nivîsandin. Şert û zûrifên me rê nedidan ku em karnameyeke cûda çêbikin. Li gorî şert û mercan, ew rêbaz gûncav hatibû dîtin. Têrê nedikir, di destê her zarokek de karnameyek hebûya, dê baştir bûbûya. Lê derfetê wê tinebûn, ji ber vê jî me pir zehmetî dikşandin. Salên destpêkê bi vî awayî hatin meşandin.

Lê piştî sala 2014’an her ku çû derfet zêde bûn, karname hatin darxistin. Her wiha ji bo kesên ku tên perwerde dibînin û dixwazin bibin mamoste jî me bawername çap dikirin. Jixwe di sala dawî de heya refa seyemîn hemû wane bûn Kurdî, heya dibistana serateyî jî karname ji wan re hatin derxistin. Yên ku xwendine re jî bawername hatin derxistin. Ji vî milî ve gavên mezin hatin avitin. Ji ber ku vesazbûna hûkimetê re, wezareta perwerdê jî hate avakirin, gavên mezin hatin avitin. Di heman demê de jî pirtûk hatin çapkirin.

Di 2014 û 2015’an de heya refa seyemîn hemû wane Kurdî bûn. Li kantona Efrînê û Kobanê jî, heya refa şeşemîn Kurdî bû. Heya refa şeşemîn hemû waneyên Kurdî, bûn pirtûk û materyal hatin çapkirin. Her biranşeke, pirtûka wê cûda hate çapkirin. Di 2013’an de jî refa yekemîn hemû wisa bû. Hemû waneyên refa yekemîn hatibûn çapkirin, lê ji ber ku pirtûk kêm bûn me nikarî hemû xwendekaran belav bikin. Pirtûk tenê di destê mamosteyan de hebûn. Me dikarî tenê bi hejmareke kêm çap bikin. Jixwe gelek pirtûkên hatin çapkirin jî desteser kirin. hejmareke zêde ya dibistan û xwendekaran hebû. Ji ber vê me nedikarî ji bo her xwendekarekî/ê pirtûkan amade bikin. Heya salên 2015’an jî di derfetên perwerdê de, astengî hebûn. Rûxmi rewşa siyasî, civakî û aborî û astengiyên hene, pergala perwerdê dihat rêvebirin.

Ji bo pergala perwerdê sal bi sal em dixwazin bi awayekî berfireh binirxînin. Di salên 2012-13’an de ji bo ku refa yekemîn bi giştî Kurdî be, gelek ked û hewldan hatin nîşandan. Beramberî vê di gelek waran de zor û zehmetî hebûn. Bi taybetî partiyên din her çiqasa li Rojava lewaz bin jî, di her fersenda ku dîdît de ji bo perwerdehiya Kurdî astengî derdixistin. Rûxmî wê jî gelek pêşketin çêbûn û gavên mezin hatin avitin. Her roja ku diçû, xebat berfireh dibûn û hejmara me zêde dibû. Lê dîsa jî xebatên me yekser nedibûn bersiv, teng diman. Divê gavên berfirehtir bihatana avitin.

Ji ber vê jî di encama nîqaşan de derket holê ku divê kongreyeke giştî ya perwerdê û ziman bê dar xistin. Dê ew yek ji bo her gava ku bi awayekî şoreşgerane tê avitin jî bûbûya mînakek û bûbûya pêşî lê vekirinek. Ji bo vê jî Komîteya Perwerdê ya Civaka Demokratîk hat avakirin. Gelek amadekarî jê re hatin çêkirin, bi vî awayî jî di sala 2014-15’an de ber bi kongrebûyinê ve çû. Li gorî paradîgmaya Serokatî û şert û mercên Rojava pêwîstî bi gavên nû hebû. Dibe ku di her beş û qadên xebatê de pêngavên girîng dihatin avitin. Lê di warê perwerdehî û ziman de jî hewldanên bi vî rengî hebûn.

Bi taybetî jî ji bo ku rengê perwerdê zêdetir dewlemend bibe û ji bo ku her pêkhateyek rengê xwe bide vê pergalê hewldan nîşan didan. Li her kantonekê jî kesên ku ne di fikrên tevgera me de ne jî di nava de cihê xwe digirtin. Bi xwesertiya xwe tevlî vî karî dibûn, lê bes nedikir. Jixwe di bihara 2014’an de konferansek hatibû çêkirin, ew perspektîf û bîryarên ku di wê konferansê de derketine jî ji bo xebatên perwerdehiyê bûn pêşî lê vekirinek û li ser wê esasê divê gav bihatana avitin. Ji ber vê yekê jî li Rojava di asta giştî de vesazkirina kongreyekê pêwîst dikir.

Gelek beşên civakê di nav de cihê xwe digirtin; Ereb hebûn, Sûryan hebûn, her wiha gelek nûnerên saziyên ku perwerdê re eleqadar dibin hebûn. Nîqaşên gelek berfireh hatin çêkirin. Saziya hûkukê tevlî van nîqaşan bû, saziya Yekîtiya Star ku bi perwerdê re alaqadar dibe hebû, saziyên

pêkhateyên din hebûn. Ji ber vê gelek nîqaş hatin kirin ku nûnerên her pêkhateyê di nav de cih bigre û li gorî wê jî xwe pênase bike û projeyeke perwerdê ya hevbeş derbixe holê. Komîteyek jî hatibû avakirin, da ku bi hemû pêkhateyan re bide û bistîne. Bi taybetî li Cizîrê vê komîteyê gelek xebat meşandin. Ew komîte rista xwe lîst; gelek danûstendin kirin, gelek nîqaş meşandin.

Di encamê de jî van pêkhateyan di kongreyê de cih girtin. Piştî ku amadekariyên kongreyê hatin xilas kirin, ji bo ku li ser esasê bîranîna şehîd Viyan Amara bê darxistin, di 26'ê Tirmeha 2015'an de li Cizîrê kom bû. Kongre 2 rojan berdewam kir. Ji bo her pêkhateyeke hejmara tevlêbûnê hatibû diyar kirin. Ji bo Ereban sînorek nehatibû danîn, çiqasa tevlêbûn bixwastana dikarîn pêk bînin. Kotaya Sûryanan jî hebû, lê hejmara tevlêbûna wan jî ji kotayê zêdetir bû. Her wiha ji bo Efrînê û Kobanê kota hatibûn dayin.

Wê demê Kobanê jî di pêvajoya ji nû ve avabûnê de bû, hê nû bi nû xwe komî ser hev dikirin. Dîsa jî ji Kobanê nêzî 10-15 mamosteyan tevlî kongreyê bûn. Dervayî saziyên perwerdê û kesên têkîldar, nûnerên hemû saziyên xweseriya demokratîk hatibûn vexwendin. Ji Ereb û Sûryanan gelek kes tevlê bûn. Yekîtiya kongrê, pir berfireh bû.

Kongreyê 2 rojan berdewam kir, her pêkhateyeke rapora xebatên xwe yên salekê amade kiribûn. Bi taybetî jî SZK raporên xwe amade kiribûn. Perspektîfên Rêber Apo, perspektîfên TEV-DEM'ê hebûn. Ji milê rêxistinî ve jî gelek nêrînên cûr bi cûr û dewlemend derketin holê. Li ser esasê 2 xalên girîng nîqaşên berfireh çêbûn; divê perwerde nekeve bin xizmeta bazirganiyê û divê ji dervayî dewletê pergaleke perwerdê bê meşandin. Bi vî awayî bîryarên cûr bi cûr jî hatin stendin. Divê ezmûnên ku dewlet dar dixe nayen qebûlkirin û ezmûnên ji milê tevgera me ya perwerdê ve tên darxistin divê derbasdar bin. Divê bêyî dewletê perwerde bi awayekî serbixwe, bi vîn û hêza gel bê pêş xistin. Bi vî awayî kongreyeke dewlemend bû.

Beriya ku em biçin kongrê, di hersê kantonan de jî akademiyên ziman û perwerdehiyê hatin vekirin. Ya Efrînê, bi navê Akademiya Şehîd Viyan Amara hatibû vekirin. Li Kobanê jî rûxmî ku şert û merc pir tine bûn, akademî hatibû vekirin. Demekê tê de perwerde jî hate dîtin, lê şer destpê kir û akademî jî ji holê rabû. Li kantona Cizîrê jî, Akademiya Celadet Bedîrxan ya Wêjeya Kurdî hatibû avakirin.

Armanca van akademiyan çi bû? Her ku xebatên perwerdê pêş ve diçûn, mamoste ji milê bîrdoziyê ve jî dihatin perwerdekirin, lê wê têrê nedikir. Xebat û pêwîstiyên heyî re nedibûn bersiv. Ji ber vê bîryar hate girtin ku akademî bên avakirin û di perwerdeyên girtî de mamoste bên perwerdekirin. Perwerdeyên ku berê di navendên saziyan de dihatin dar xistin, vekîrî bûn û danekî berdewam dikirin. Ji ber ku dema wê jî ne pir dirêj bû, têra xebatan nedikir. Bi vekirina van akademiyan, her mamosteyek dikarî dewreyên demdirêj yên perwerdê bibîne. Her dewreyek 3 meh bû. Her awayî perwerde hebû; perwerdeyên bîrdozîk, perwerdeyên biranşê, perwerdeyên pîşeyî û hê gelek beşên din hebûn.

Ji ber ku mamostayan di vê derê de kesayeta xwe ava dikir, di perwerdeya civakê de jî dikarîn gavê pêştir biavêjin. Ew akademî heya astekê rista xwe lîstin. Her çiqasa têra tevî kantonê nedikir jî, her carê 40-50 kesan di nav de cihê xwe digirtin. Risteke van perwerdeyan jî avakirina kesayet bû. Mamosteyên ku kar û barê perwerdeyê dimeşînin, ger kesayeta xwe ava bikirana dê li ser hemû civakê bandor bikira. Piraniya mamostayan ji van akademiyan re derbas bûn, lê ji ber ku binesaziya wê pir ne xûrt bû, hemû mamosteyan nikarî ji akademiyê re derbas bibin. Lê rûxmî wê jî ew pergal hêdî bi hêdî hate pêşxistin.

Dema ku me heya refa seyemîn wane hemû kirin Kurdî, di dibistanên dewletê de jî alaqayeke pir mezin çêbû. di nava gel de coşeke mezin çêkir. Ji ber vê jî pêwîst dikir ku mamoste kêlî bi kêlî xwe pêş bixe. Divê ji aliyê bîrdozî û hişmendiyê de jî kurbûyinek bida çêkirin ku pirsgirekên heyî rê bibe bersiv. Divê hem kesayeta xwe çêbikirana, hem jî civak çêbikirana. Li gorî vê rastiyê gav dihatin avitin.

Piştî ku em ketin dibistanên dewletê, ji gelek aliyan ve vala hiştinek hebû. Jixwe her ku çû dewlet ji kantonan dihat derxistin, lê kantona Cizîrê dewlet di hinek cihan de mabû. Piştî ku di dibistanên dewletê de dû salên me derbas bûn, cihên di destê dewletê de vala hiştin û seranser nêzik bûn hebû. Cihên ku wan vala dihiliştin, me dikirin cihên perwerdehiyên bîrdozîk û perwerdeyên ziman. Ew dibistan me zivirandin navendên xwe. Bajarên mezin yên weke Qamişlo, di her taxekê de navend hatin avakirin. Her ku çû ew navend jî hatin berfireh kirin. Piştî kongereye jî me amadekarî kir ku em bikevin hemû dibistanên ku di destê dewletê de mane.

Beriya wê peymangeh hatin avakirin. Lewra weke me got tenê akademiyan nedikarî perwerdehiyên mamosteyan bibersivîne. Hem weke cih, hem jî weke pêwîstiyên perwerdê nedikarî pê re bibe bersiv. Ji ber vê pêwîstî hate dîtin ku her bajarekî peymangeh were vekirin û hejmara mamosteyan bê zêde kirin. Jixwe ew bîryara kongreyê bû jî. Her kantonekê kotayek hate dayin; divê di nava salekê de li Efrîn û Kobanê 2 hezar mamoste çêbûbana, divê li Cizîrê 4 hezar çêbana. Wisa hedefên mezin û nêz me dan pêşiya xwe. Da ku di demeke kin de mamoste bên avakirin û em bi amadekarî bikevin dibistanan.

Ji ber vê sedemê gelek nîqaş û amadekarî hatin kirin; dê bi çi avayî ew peymangeh bihatana avakirin? Di encamê de ew bîryar derket ku di demeke kin de bên avakirin. Lewra bîryar hatibû girtin ku li Cizîrê heya refa seyemîn, li Kobanê û Efrîn jî heya refa şeşemîn hemû wane bibin Kurdî. Ji bo ku em ew pêngave xwe bi ser bixin, me gelek nîqaş meşandin û di her bajarekî de me dest bi avakirina peymangehan kir. Jixwe li Efrînê hin peymangeh hatibûn vekirin, li Kobanê jî piştî vegera gel peymangehek hatibû avakirin, li Cizîrê jî di her 9 bajaran de peymangeh hatin vekirin.

Peymangeha yekemîn li bajarê Derîkê di 9'ê Nîsanê 2015'an de hate vekirin. Cihên ku kêrî dewletê dihatin, seata xwe derbas dikirin û diçûn, cihên ku kêrî wan nayen jî weke kavilan lê kiribûn. Lê di fereseta tevgera me de avakirin hebû. Cih hebe û nebe, divê tû biafrînê. Ew cihên weke kavilan kiribûn, me ser kar kir û peymangeh tê de avakirin. Di van peymangehan de perwerdeyên vekirî dihatin dar xistin. Civakê zû bi zû xwe nêzikî perwerdeyên girtî nedikir. Bi salane pergal li ser gelê me lîstiye, da ku wan bê vîn bike û yekrengî ava bike. Ji bo ku xwe nas neke û xwedî li mafê xwe dernekeve dewletê her tişt kiribû.

Di encama vê de, gelê me yê Rojava jî bi taybetî di tevlêbûna perwerdeyan de hinek zehmetî derdixistin. Perwerdeyên girtî, bi zehmetiyên mezin dihatin dar xistin. Ji ber ku perwerdeyên peymangehan vekirî bûn û danekî berdewam dikirin û gelek biranş tê de hebûn, alaqayeke mezin di gel de çêkir. Bi taybetî jî di ciwanan de alaqayek çêkir. Bîryareke wisa jî hebû, kêsên ku biçin dibistan û peymangehên dewletê nikarin bên û di peymangehên me de bixwînin. Ew helwesteke li dijî dewletê bû û me dixwest em konevaniyên dewletê pûç bikin. Di nava gelê me de, bi hezaran kes hebûn ku bi salan di dibistanên dewletê de dixwendin, da ku bawernameyeke bigrin û dest bi karekî bikin. Jixwe piraniya wan bawername jî girtibûn, lê dîsa jî nekiribûn karekî. An karekî cûda xwe re dikin, an jî bê kar dimînin û nikarin debara xwe bikin.

Her wiha gelek xwendekarên ku ji ber sedema şer nedikarîn biçin cihê xwe yên xwendinê jî hebûn. Ji ber vê yekê jî, dema ku me ew bîryara wê helwestê da, me gûman kir ku gel bi bertek nêzik bibe. Ji vî milî ve me gelek zor û zehmetî jî jiyan kirin, lê me helwesta xwe jî heya dawiyê domand û erenî hate bersivandin. Dema dewreyên peymangehan jî şeş meh bûn. Di van şeş mehan de, dû ezmûnên nivîskî û dû ezmûnên devkî dihatin çêkirin. Di peymangehê de waneya Îngîlîzî, waneya Kompûtir, waneyên pîşeyî û biranşan hebûn. Her kesek ku peymangeh xilas dikir jî di biranşa xwe de xebatek amade dikir û encamên perwerdê diteyisandin. Bi vî rengî di 9 bajarên Cizîrê de jî di dewreya ewil de şeş mehan perwerde hate dîtin. Li hinek cihan peymangeh zû hatin vekirin, hinek cihan dereng hatin vekirin, lê hemû bajaran hatin vekirin.

Bi sedema şer li Til Temir û Hesekê, hin kêmasî çêbûn. Ji ber şer, gel hinek koçber bûbû, ji ber vê yekê van herdû bajaran de peymangeh dereng hate vekirin. Lê hemû bajarên din perwerde bi awayekî çalak hate meşandin. Hejmara mamosteyan jî du qat zêde bûn. Berê xwendekar diçûn bajarên dûr û zanîngeh dixwendin. Lê vê carê her kes di bajarê xwe de peymangeh dixwend. Ji ber vê yekê di gel de coşeke mezin çêbûbû. Ji ber ku piraniya kesên tevlî perwerdeyên peymangehê dibin xwendekar bûn, ezmûnên xwe de jî serkeftî bûn. Divê em dûbare bikin ku piraniya wan jî jin bûn.

Bi vî rengî piştî ku 6 mehan perwerde dihatin dîtin û ezmûn derbas dikirin, dibûn mamoste û diketin nava pratîkê. Di merîyetê de jî gelek çalak bûn. Yên ku ji perwerdê re derbas bûne, ne tenê di mijara perwerdê de, di her xebatê de çalak bûn. Li Rojava gelek şer çêbûn û hê jî bandora wan li ser gel hebû. Di mijara parastinê de hê pirsgirek dihatin jiyankirin. Her wiha kesên ku dixwestin xebatên me vala derbixin, bi rêbazên cûr bi cûr astengî derdixistin. Dema ku di êniya şer de têk diçûn, dixwestin di nava gel de bandora xwe çêbikin.

Mesela di nava bajaran de teqîn çêdikirin, dixwestin moralê civakê lewaz bikin û tirseke bixin nava civakê. Lê belê van tiştan jî zêde encam nedigirt. Bêgûman berdelên giran jî me didan. Lê her çiqa-

sa berdel bên dayin û êş jî bên kişandin, li hemberî van hêzan têkoşîneke pir dijwar jî dihat meşandin. Di êniyên YPG û YPJ de, di êniyên asayiş û hêzên parastinê de, bersivên pir xûrt dihatin dayin. Mamastoyan jî nedigot, *“ez mamoste me û ez ê waneyên xwe bidim, tiştekî din jî min alaqadar nake.”* Perwerde jî li ser wî esasî nedihatin dayin. Di kîjan xebatê de pêwîstî hebûya û alîkarî bihata xwestin, mamosteyan di wê derê de xebat dimeşandin. Yanî mamosta me jî mamosteyên şer bûn.

Her ku perwerde pêş ket, pêwîstiyên saziyên me jî derdiketin holê. Hem di beşên ragihandin û hûquqê de, hem jî di saziyên din de, dema ku pêwîstî hebûya arastebûna mamosteyan li wê derê dihat çêkirin. Mamoste jî bi dil diçûn û gelek karên cûr bi cûr de jî cih digirtin. Bi taybetî jî, piştî ku xweseriya demokratîk hate avakirin, ew erka zêdetir ket ser milên me û ji bo bersivandina pêwîstiya her saziyê perwerde hatin dar xistin. Perwerdeyên saziyan jî hê berdewam dikin, heman pergal hê jî dimeşe.

Bi xebatên peymangehan re gavên mezin hatin avitin. Lewra hem hejmar zêdê bibû, hem jî çawanî. Naverok pir xûrt bûbû. Ew kesên ku berê kar û xebat dikirin, ji gelek aliyan ve kêm mabûn. Wan jî di van peymangahan de perwerdeyên xwe dîtin û ji milê bîrdozîk û pîşeyî ve kûrbûnek hate çêkirin. Di heman demê de ji bo giştî dibistanan pêş amadekariyek bû. Da ku ji bo salên pêş gaven mezîntirîn bên avitin. Xebateke din ya sereke jî amadekirina pirtûkan bû. Di sal û qonaxên derbasbûyî de li gorî şert û mercan pirtûk dihatin amadekirin. Lê tenê pirtûkek zimanê Kurdî hebû. Hînker, heya sê beşan hebû. Ew jî ya Enstîtûya Stenbolê bû. Yên ku ew beş xilas kirine, dibûn mamoste. Nêzikî 3 mehan, li ser vê pirtûkê perwerdeyeke lezgîn û tijî dihat dîtin, yên ku ew her sê ast derbas kirine dikarîn bibin mamoste û di her dibistanekê de dikarî perwerde bide.

Van mamostayan hem dikarîn di dibistanan de perwerdeyên ziman bidin, hem dikarîn perwerdeyên pîşeyî bidin, hem jî di navendên saziyan de dikarîn kesên dixwazin fêrî ziman bikin. Hem weke civak, hem jî weke xwendekar hejmareke zêde hate perwerdekirin. Lê ji milê xizmetkirin û xwe tevlî xebatên perwerde kirinê de hê jî lewazî hene.

***-Di amadekirin, zêdekirin û belavkirina pirtûk û çavkaniyên waneyan de we rêbazeke çawa şopand? Astengiyên çawa derketin pêşiya we?***

Bêgûman xebateke din ku em pir girîng dibînin jî, komîsyona amadekirina pirtûkên salê bûn. Pirtûkên qada Efrînê, hevalên profesyonel yên ku di wê derê de cih digrin, ji pirtûkên Mexmûrê sûd wergirtibûn û li gorî wê hinek amadekarî kiribûn. Lê beriya ku êrîşên DAİŞ’ê çêbibin, komîsyoneke ji 11 kesan di her sê kantonan de hatibû vesazkirin. Ji milê hatin û çûyinê de jî zêde pirsgirek dernediketin. Dê vê komîsyonê li ser esasê konferansa çiyan hatiye darxistin û li gorî rastiya civaka Rojava gelek pirtûk amade bikirana. Ji bo vê van komîsyonan çend mehan karên xwe domandin. Lê kêm man.

Pirtûkeke refa yekemîn hatibû amadekirin li Efrînê. Dervayî vê kar û xebatên pirtûkan dihatin meşandin. Lê ji ber ku ber êrîşan navbera kantonan hate qûtkirin, ew xebat negihişt encamê û nikarîbû rista xwe baş bîlîze. Di heman demê de pêwîstî pê hat dîtin ku komîsyoneke nû bê vesazkirin. Gelek derdoran jî di nava vê komîsyonê de cih girtin.

Me behsa rista mamosteyên dildar kiribû. Di nava komîsyonê me de jî 3 mamosteyên Mexmûrê cihê xwe girtin. Heya refa seyemîn, hemû pirtûk bi Kurdî hatin amadekirin. Piştî wê heya hemû refên amadekariyê jî pirtûkeke ziman hate amadekirin. Ji dîmenên wê bigre heya wêneyên wê, ji rêzkirina wê bigre heya mîzanpaja wê hemû wan hevalan kir. Wan hevalên ji Mexmûrê hatine, 4 mehan di wê komîsyonê de man, lê gelek ked û xebatên wan çêbûn. Em wan hevalan jî careke dîtir pîroz dikin. Piranî jî ji pirtûkên Mexmûrê sûd hat wergirtin. Ne weke ûslûp û axaftin, weke şêwe û rêziman sûd jê hat wergirtin. Lewra axaftina Botanê û ya Rojava hinek cûda ye. Li gorî vê ew pirtûk hatin rêk û pêk kirin, tiştên nû lê hatin zêdekirin.

Li kantona Cizîrê jî, çend mamosteyên fermî yên dewletê hebûn. Wan pîşeyên weke Dîrok, Felsefe, Erdnigarî xwendibûn. Li ser wan beşan komîsyonek gûncav hate amadekirin. Li gel mamosteyên me yên Wargeha Mexmûrê pirtûkên van beşan jî hatin amadekirin. Di heman demê de hevalên ku di van beşan de xwedî ezmûnin jî alîkarî kirin û beriya ku dibistan bên vekirin bi awayekî hevkarî ew pirtûk hatin amadekirin. Da ku ji çapkirinê re amade bin. Di şert û mercên Rojava de, pir zêde derfetên çapkirinê tine ne. Tenê çapxaneyek heye, ew jî pêwîstiyên hemû saziyan pêk tîne.

Xebatên rojname, kowar, pirtûk û materyalên perwerdê, paraznameyên Serokatî hemû di wê çapxaneyê de dihatin amadekirin. Ji ber vê jî ew çapxane ji pêwîstiyên perwerdê re nedibû bersiv. Jixwe ji ber ku kantona Cizîrê navend bû, amedekirina hemû pirtûkan û vesazkirina wê li wir dihat çêkirin. Piştî ku ew pirtûk hatin amadekirin, Komîteyên pispor ew pirtûk hemû yek bi yek ber çavan re derbas kirin, kontrol kirin. Li gorî wê erêkirina derket û li cihên cûda hatin çapkirin. Beşeke van pirtûkan li Bakur hatin çapkirin, beşek jî li Kantona Cizîrê hate çapkirin. Lewra divê bi hejmareke mezin pirtûk derketîbana. Ji ber vê yekê jî karekî pir mezin jî bi riya vê komîsyonê hate meşandin.

Di destpêkê de komîsyon bi awayekî lezgîn hate vesazkirin, da ku hema pirtûk bên amadekirin. Lê piştî kongereyê komîsyon hate berfireh kirin; pêkhateyên Ereb û Sûryan jî tê de cihê xwe girtin. Di heman demê de ji kantonên din jî çend mamoste tevlî vê komîsyonê bûn. Da ku hemû pirtûkên ku Kurdî hatine amedikirin, wergerî zimanê Erebî û Sûryanî jî bibin komîsyon hate berfirehkirin. Her wiha ji bo ku komîsyon rista xwe bîlîze û xebateke zêdetir teqez û bi tendûrîstî bê pêş xistin pêkhateya komîsyonê hate berfirehkirin. Di encamê de rûxmî hemû bê derfetiyan hemû pirtûk di dema xwe de hatin amadekirin.

Beriya ku dibistan vebin, hejmareke pêwîst ya pirtûkan hate amadekirin û li kantonan hate belavkirin. Piştî ku ji milê siyasî û leşkerî ve Rojava hate rizgarkirin, gelek êrîş li ser xebatên bîrdozîk û civakê jî çêdibûn. Ji ber vê jî me xwest beriya ku em bikevin dibistanan, hemû amadekariyên xwe xilas bikin û êrîşan jî vala derbixin. Li gorî wê arastebûn çêbûn û ji bo her xwendekarek pirtûkek hat amadekirin. Hem ji milê mamostayan ve, hem jî ji milê xwendekaran ve tengasiyeke pirtûkan nehat jiyankirin. Lewra bi hezaran pirtûk hatibûn çapkirin.

Ji milê şêwazê ve jî cara yekemîn karekî wisa dihat kirin. Hem xwendekaran pirtûk bê pere digirtin, hem jî mamosteyan pirtûk bê pere digirtin û ew şêwazên berê yên dewletê hatin şikenandin. Naveroka pirtûkan jî pir bala xwendekaran dikşand. Her wiha rêk û pêkiya ku mamosteyan çêkiriye û bandora wê li ser xwendekaran çêdibûn. Vê yekê ji xwe re moral û coşek jî derdixist holê. Ew pergala perwerdê ku bê dewlet û bi awayekî serbixwe civakê perwerde dike, hişt ku gelek nêzikbûnên erenî di nava civakê de çêbibin. Kesên ku li gorî feraseta rêxistinê tevnedigerîn jî hebûn, lê ew coş û moral di nava gel de hate avakirin.

Her wiha dibistanên taybet yên dewletê hebûn. Yên Sûryanî û Ereban bûn, lê girêdayî dewletê bûn. Ji wan re digotin, “*dibistanên xas.”* Mûdûrên wir taybet bûn, mamosteyên wir taybet bûn, ji her zarokek li gor rojan pere dihatin stendin. Ji ber vê jî di nava civakê de pirsgirek derdiketin. Ji bo ku kesek zarokê xwe bide xwendin, divê gelek kar û xebat bikirana û pereyên wê derbixistana. Di destpêkê de her çiqasa danûstendin bi van pêkhateyên din re hebû jî, ji ber vê yekê nerazîbûnên van pêkhateyan çêbû. Bi taybetî di dêr û van dibistanên taybet de nêrazîbûnên wisa hebûn.

Dema ku bihîstibûn em ê dest bi pêngaveke nû ya dibistanan bikin, lezgînî xwestin bi me re hevdîtinan bikin. digotin, “*hûn dikarin di dibistanan de perwerdehiyan bidin, lê dibistanên me taybet in, em bi dewletê ve girêdayî ne, em nikarin pergala xwe ya perwerdehiyê xirab bikin.*” Lê me dixwest perwerdehiya ku dikeve xizmeta bazirganiyê, em kêm bikin û ji holê rakin. Jixwe her malbatek nikare zarokên xwe bişîne van dibistanan, tenê dewlemend dikarin zarokên xwe di wê derê de bidin xwendin. Dibistanên dayikê jî bi pere bûn. Ji ber van sedeman me hem di dibistanên dayikê de, hem jî di van dibistanên taybet de pergala xwe da avakirin. Hin bertekên cûda derdiketin, lê asayî bûn. Li gorî rewşa ku me jiyan dikir, asayî bû. Gelek kes bi perwerdê ve alaqadar nedibûn, ji milê pergala me ya perwerdê ve agahiyên wan tine bûn. Ji ber vê nefêmkirin çêdibû.

Lê beriya ku em bikevin dibistanan, me gelek mûdûrên dibistanan re, mamosteyan re, berpirsyarên dêran re gelek nîqaş pêş xistin. Rûxmî her tiştî me pergala xwe di hemû dibistanan de bi cih kirin. Di destpêkê de tengavî hebûn, wate nedayin hebûn. Lê her ku diçû fêmkirin û wate dayin çêdibû. Di heman demê de ji pêkhateyên din gelek nêzikatiyên erenî pêşdiket. Ji pêkhateyên din bûn, lê li gor hinek Kurd baştir nêzik dibûn. Hinek Kurd hebûn, ne nêzî me bûn, dixwastin me reş bikin. Kurdên wiha jî ji bo wê digotin, *“ew pergala perwerdehiyê, ne pêşeroja zarokan e. Di welatên derva da ev bawername derbas nabe.”* Dixwastin vê yekê bixin mêjiyê civakê jî. Gûmanên weke “*ger ew zarok bawername bistînin, gelo dikarin li derva kar bikin, an na?*” çêdikirin.

***-Dema ku wisa gav bi gav zimanê perwerdehiyê dibû Kurdî, di zimanên din de jî perwerdehiyê berdewam dikir, an na? Li gel vê yekê nêzikbûna derdorên ku zimanê wan yê dayikê ne Kurdî çawa bû?***

Gelek derdorên Ereb hebûn, bertekên erenî nîşan didan. Jixwe me heya refa seyemîn hemû wane kiribûn Kurdî, lê ji bo Sûryan û Ereban bi zimanê wan perwerde dihat dayin. Mesela yên Sûryan, heya refa seyemîn hemû waneyên wan Sûryanî bûn, tenê waneyeke Kurdî, waneyek jî Erebî dîdîtin. Yên Ereb, heya refa seyemîn bi Erebî wane dîdîtin. Yên wan jî waneyek Kurdî, waneyeke Sûryankî dîdîtin. Yên Kurd jî, waneyek Erebî û waneyeke Sûryanî dîdîtin. Bîryara me bi vî awayî bû. Me xwest her zarokek her sê ziman jî fêr bibe, lê zimanê xwe perwerde bibine. Zor û zehmetî jî çêbûn. Lê bi demê re hemû beşên civakê re civîn hatin çêkirin, malbatên xwendekaran re û mûdûrên dibistanan re civîn hatin çêkirin.

Yekîtiya Mamostayan jî di nava hewldanan de bûn. Hemû mamoste û mûdûrên dibistanan re civîn çêdikirin. Da ku bizanibin pergala me çi ye û bi çi awayî tê meşandin. Her wiha da ku bizanibin ku helwesta van mûdûr û mamostayan çi ye. Bîryarek jî hebû ku mamosteyên Kurd yên fermî, waneyeke Kurdî bibîne û di demên pêş de biranşa xwe de waneyên Kurdî bide. Ji bo ku di pêşerojê de pêşengiya perwerdê bike, divê li gorî pêwîstiyan xwe perwerde bikira. Gelek mamosteyan ew bîryar pêk jî anî.

Di pergala peymangehan de jî, hevberdevkî hebû. Hevaleke jin û hevalekî xort hevberdevkên giştî kantonê bûn. Di nava bajaran de jî hevberdevkiyên cûda, rêveberiyên teng û fireh hebûn. Di heman demê de, komîteyên perwerdehî û ziman hatibûn avakirin. Ew komîte di bin navê SZK'ê de hatibûn avakirin. Lewra SZK bi giştî nehatibû feshkirin. Weke komîteyeke jêrîn hatibû vesazkirin. Ango komîteya ku perwerdehiya ziman re alaqadar bibe bû. Komîteya ezmûnan hebû, komîteya aborî hebû. Ezmûnên giştî ku di bajaran de dihatin çêkirin, di dû deman de dihatin çêkirin. Di nava vê demê de 2 ezmûnên nivîskî û ezmûneke devkî çêdibû.

Nûnerên her bajarekî du-sê  kesan pêk dihatin. Bi giştî komîteya ezmûnan jî ji 10 kesan pêk dihat. Komîteya aborî ji 5 kesan pêk dihat. Komîteya Arşîv-sîcîlan hebû, ew jî ji 3 kesan pêk dihat. Jixwe ji destpêka xebatan ve komîteya arşîvê hebû, biçûk an jî mezin çi kar hatibe kirin, hemû kar hatibûn qeyd kirin û arşîva wan hatibû girtin. Kanton kanton, bajar bi bajar, dibistan bi dibistan arşîv hatibûn girtin. Jixwe ji ber ku em ji qada birdozîk ve girêdayî bûn, bîlançoyên vê arşîvê mehane weke rapor dihat şandin. Mijara arşîv û sîcîlê pir girîng e. Mesela kesên ku xizmet dikin hene, kesên ku bi sedemên cûr bi cûr qût dibin hene.

Ji ber ku çêkera me bi piranî jin bûn, pirsgirekên pir cûda çêdibûn. Kesên ku dixwastin derbikevin, serlêdana saziyê dikirin. Kesên ku dixwestin bibin mamoste jî, piştî ku perwerdeya xwe qedandin, bi serlêdana destbikar dikirin. Serlêdan ji rêveberiya wî bajarî re dihatin kirin, ger ew kesên ku serlêdan kirine, ji her alî ve gûncav bihatana dîtin, serlêdan dihat erêkirin û pê re dihat agahdarkirin ku dest bi kar dikir.

Gelek ziraviyên vî karî hene. Ez nixwazim pir kuranî bikevim navê. Jixwe şopandinên rêxistinê jî hene. Bes bi amadekarî ketina dibistanan ya sala 2015'an pir xûrt bû. Li gorî salên berê amadekariyeke xûrt hebû. Her wiha encamên erenî jî derxistin holê. Hem hejmara mamosteyan zêde bûn, hem amûrên perwerdê amadê bûn. Li ser wê esasê kampanya çêbûn û gelek pêwîstî ji Bakur hatin bersivandin. Yek jî gelek şande dihatin û bi me re hevdîtin çêdikirin û alîkariyên xwe dikirin. Li gel pirtûkan, kirtasiye û amûrên weke çente jî dihatin belavkirin.

Yek jî kesên ku ji ENKS'ê ve girêdayî ne, ji bo ku ew pêngava perwerdehiyê bitepisînin, gelek caran tiştên madî derxistin pêş. Dixwestin gelê me bixapînin û bi vî awayî perwerdehiya me vala derbixînin. Lê hemû hewldanên wan vala hatin derxistin. Bi taybetî jî par gotin, *"em ê nizanim çiqasa dolar bidin mamostayan, em ê dibistanên xirab baş çêbikin. Em ê amûrên germkirinê bidin."* Bi vî rengî dibistan bi dibistan digeriyan. Komîsyonek hatibû avakirin û ew dişopandin. Weke rêxistin jî me got, em şansekî bidin wan, ka ew ê çi bikin! Jixwe xûsûsiyet û nêzikbûnên wan dihatin zanîn, lê ceribandinek din hate çêkirin. Lê careke din derket holê ku van kesên bê ked, dixwazin li ser pişta kesên ked didin dixwazin xwe bidin jiyankirin. Tenê karîn nakokiyeke bi vî rengî di nava civakê de belav bikin. Ne ku gavek avitin û piştgiriyek kirin. Jixwe dek û dolabên wan her tim derdiketin holê.

Ji bo xizmeta civakê, heya niha tû gavên berbiçav ji aliyê wan ve nehatine avitin. Lê nêzikî çend mehan geriyan û xwestin rojeveke li gorî xwe ava bikin. Lê ew nêzikatiyên pûç, vala hatin derxistin. Ji

ber ku hemû cihan pergala perwerdê hatibû rûnişkandin, nikarîn tiştekî bikin. Hevalên ku bi karê perwerdehiyê re mijûl dibin û mamosteyan li hemberî wan helwest danîn. Tû nêzikbûnên wan jî nehatin pêjirandin. Mesela 500 heb çenteyên xwendekaran anîbûn, didan hin dibistanan û nedidan hinekan. Bi vî rengî nakokî di nava gel de derdixistin, ji ber vê yekê li hemberî wan helwesteke tûnd li hemberî wan hat danîn û ew nêzikî qada perwerdehiyê nekirin.

Gelek kesên wan digotin, *"me xwendiye, em pir zîrek in û em ê bibin mamoste."* lê hemû vala derketin. Di nava civakê de hin saziyên wan hebûn, di wan deran de li gorî xwe hin perwerde didan. Ew der jî me dişopandin. Şêwaza perwerdehiya wan jî pir ne pêşketî bû jî; tenê tîp dîdîtin û xwendin û nivîsandin fêr dikirin. Pir zêde bala civakê jî nedikşand. Lewra perwerdehiya herî nûjen, *Komîteya Perwerdê ya Civaka Demokratîk* dida. Ji ber vê tiştên wan dikirin jî bal nedikşandin. Hejmareke kêm ku bi wan ve girêdayîne diçûn gel wan.

Di nava xebatên perwerdehiyê de Zanîngeha Mezopotamya jî hebû. Bi ramanên azad ve girêdayî bû. Ew zanîngeh di sala 2014-15'an de hate vesazkirin. Hevalên ku di mijara zanîngehan de xwedî ezmûn in, gaveke wisa avitin. Li ser esasê perwerdehiya birdozîk û ronakbiriyê ya civakê gaveke wisa hate avitin û ceribandinek hate çêkirin. Di vê zanîngehê de li ser esasê du beşan, 3-4 dewre hatin darxistin. Di her dewreyekê de jî 40-45 xwendekaran tê de cih digirt. Ji hemû bajarên Cizîrê û kantonên Kobanê û Efrînê, nûnerên wan di nava zanîngehê de hebûn. Ew jî gaveke nû bû û ji civakê re pir balkeş dihat. Beşeke we civaknasî, yek jî dîrok bû. Xwendekarên ku ew beş xwendine jî tevlî dibûn. Yên ku tê de cih bigrin divê herî kêm refên amadekariyê xwendibin.

Her wiha kîjan beş xwendibin bila bixwînin, dikarîn tê de cih bigrin. Ji her alî ve rewşa xwendekaran dihat berçavkirin û wisa xwendekar dihatin hilbijartin. Komîsyoneke serlêdanê hatibû avakirin, rewşa kesên ku serlêdan kirine digirt dest û li gorî wê erêkirin çêdikir. Di vê xebatê de jî di destpêkê de zehmetî hatin kişandin. Gelek kesan serlêdan kirin, ket rojeva civakê. Di vê zanîngehê de jî gelek ezmûnên girîng hatin dest xistin. Di beşên zanîngehê de waneyên weke Îngîlîzî, kompûtir yên cûda jî hebûn. Lê yên esasî Civaknasî û Dîrok bû.

Di hemû dibistan, peymangah û zanîngehên me de tiştê esasî pergala wê û dîsîplîna wê bû. Rêveberî hem ji pergala perwerdê berpirsyarbûn, hem jî ji jiyanê re mijûl dibûn. Gelek encam jî hatin girtin. Dema her dewreyekê jî ji 6 mehan heya salekê berdewam dikir. Piştî her dewreyekê tez dihatin xwestin. Her xwendekarek teza xwe dinivîsand û teza wan dihat nirxandin. Pişt re derbasî meriyetê dibûn.

Piştî ku Komîteya Perwerdehiyê ya Civaka Demokratîk hate avakirin, ew zanîngeh jî bi xebatên vê komîteyê ve hate girêdan. Kar û xebatên ku di vê de hatibûn kirin, pir girîng bûn. Gelek ezmûn jî hatibûn girtin. Gelek xwendekarên ku di karên cûr bi cûr de cih bigrin jî di nav de hebûn. Piraniya xwendekaran xwe di vê zanîngehê de pêş xistin, hinek di asta navîn de man. Li gorî kesayet û hûnerên kes, dest girtin çêdibû û li ser vê esasê pêşketin jî çêdibûn.

Piraniya xwendekarên ku zanîngeh xwendine, ji bo xebatên peymangehan hatin vesazkirin. Her wiha van xwendekarên ku zanîngeh xwendine, di nava civakê de û saziyan de jî semîner didan. Hinekan jî waneyên xwe pêşkeşî civakê dikirin. Lê piraniya wan derbasî peymangeha bûn û bi demê re karên cûr bi cûr rê ve dibirin.

Di nava civakê de ji xebatên herî girîng yek jî perwerdehî ye. Ji bo ku bi yek rêbazî perwerde were rêvebirin, kongreya perwerdê ya civaka demokratîk hate avakirin. Zanîngeh jî dewrî kongreyê hate kirin. Di vê xebatê de gelek encam hate girtin. Xwendekarên ku ji zanîngehan derdiketin, li hemberî civakê xwe berpirsyar dîdîtin û hem xebatên xwe berfireh dikirin, hem jî gel teşwîqî van xebatan dikirin.

***-Bawerim ji bo koçberên Şengalê jî, xebatên we yên perwerdehiyê pêş ketibûn?***

Rast e. Piştî ku êrîş li ser Şengalê pêş ketin, gelê me yê Şengalê derbasî Derîkê bû.

***-Ew bi çi rengî bûn?***

Li wê derê wan re wargehek hate vesazkirin. Bi riya komîteyên me xebatên wir jî hatin rêxistinkirin. Di destpêkê de xebatên ziman li wir hatin pêş xistin. Gelek zarok li wir hebûn; ji beşa amadehiyê heya zanîngehê xwendekarên cûr bi cûr dibistan xwendine hebûn. Fermana ku hatiye serê wan, ne ji rêzê bû û mirov nikare bîne ziman. Rastî gelek tepisandin û tûndiyan hatibûn. Lê piştî ku wargeh hate avakirin û derûniya gel jî hinekî komî ser hev bû, gelek kar û xebat çêbûn. Ji bo ku pergala wê kampê jî bê avakirin vesaziyên nû çêbûn. Gelek şande û derdorên navnetewî ku alîkarî dikirin jî hebûn, lê dîsa tevgera me pêşengtiya wê dikir. Xebatên civanên şoreşger jî li wê derê hebûn. Gelek xebatên hêja meşandin.

Wêne-25

Di nava wan xebatan de divê em hin hevalan bîrbînin. Mînak, Hevalê Rênas demekê li Dirbêsiyê kar kir, pişt re di nava gelê me yê Şengalê de xebatên ciwanan rêxistin dikirin. Bi riya saziya ciwanan, li gel hin hevalên din ciwanên Şengalî rêxistin dikirin. Bi rastî jî di nava vê şoreşê de keda hevalê Rênas pir e. Hem di rêxistinkirina ciwanan de, hem jî di rêxistinkirina gelê Şengalê de, keda wî pir zêde ye. Bi taybetî piştî ku li Kobanê şer çêbû, derbasî wir bû. Li kuderê zehmetî hebû, hevalê Rênas li wê derê bû. 24 seatan jî di nava xebatan de be, westandin nedizanî. Her tim bi coş û rûken bû. Ew taybetmendiyên xwe didan jiyanê jî.

Di 2014’an de, min di konferanseke de hevalê Rênas nas kir. Piştî ku derbasî xebatên wargeha Newrozê bû, ji ber ku ez jî karê perwerdê re mijûl dibûm; me gelek caran hev û din dîdît. Naskirineke me bi vî rengî çêbû. Bi rastî jî ger mirov bixwaze hevalê Rênas pênase bike, hemû taybetmendiyên xweşik yên ciwanan pê re hebûn. Hevalekî mûtevazî bû, di danûstendinan de giştî bû. Bi taybetî jî li hemberî jinê hûrmet û rêzdariya wî her tim şopeke erenî pêy xwe hiştiye. Ji ber ku rewşa berxwedana Kobanê derket û bangawaziya seferberiyê ya Rêber Apo hebû, li kampa newrozê pir nema. Hevalekê roj û keliyên zehmet bû. Gelek caran ji xwêdanê rengê cilên wî digûherî, rengê rûyê wî digûherî.

Bi taybetî ew pêvajoya Şengalê pir zehmet bû. Bi dehan rojan nikarîn xwe komî ser hev bikin, hevalên li gel wan kar dikirin jî heman êş û zehmetî dikşandin. Ji bo wê jî ez dibêjim, kesayetên weke hevala Viyan, hevalê Gelhat, hevalê Çekdar, hevalê Devrîm, hevalê Seydo, hevalê Lewend û Serhat û bi sedan hevalên wisa pir cûda ne û hêjayî nirxandinê ne. Hevalê Rênas jî wisa bû, wî jî li wargeha newrozê û li Kobanê rista xwe lîst. Her hevalek di qadên cûda de û di demên cûda de rista xwe ya dîrokî lîstin.

Mesela hevalê Lewend û Serhet, li Qamişlo risteke pir mezin lîstin. Hê jî her malekê de wêneyên wan herdû hevalan hene. Hevalê Lewend, di xebatên ciwanan de cihê xwe digirt. Lingê wî de jî seqetî hebû, lê dîsa jî bê navber û bê westandin kar dikir. Tenê berjewendiyên rêxistinê esas digirtin û çi dibe bila bibe ew kar û xebat ji pêş ve dibirin. Hevalê Serhat jî, hem karê giştî dike hem jî xebatên ciwanan dimeşîne. Weke ku tê behs kirin ne hevalekî pir kevn e jî. Lê di nêzikatî û xûsûsiyetên xwe de nîşan dide ku dikare xwe biafrîne, dikare gelek mirovan bikşîne nava rêxistinê. Hevalê Serhat bêyî ku ferq û cûdahiyê bixe nava gel, her kesî re danûstendin çêkiribûn û hewl dabû wan rêxistin bike.

Keda wan li ser bajarê Qamişlo pir zêde bû. Cihê ku van hevalan gava xwe avitiyê û her jin û zarokekî re daye û stendiye, şopên xwe hiştine. Pir zêde keda wan hebû. Bi taybetî di qonaxa destpêkê ya şoreşê de ji bo rêxistinkirana civakê û ciwanan hêzeke pir mezin pêwîst dikir, taybetmendiyên pir xûrt pêwîst dikir. Lewra gelek kesan tû red dikirê, zû bi zû qebûlkirin çênedibû. Hemû gel ji me hez dikir û ji bo xizmetê amade bûn. Lê ya ku dihat xwestin rêxistinkirina wan bû. Erka her mîlîtanê jî ew bû ku mirov tû valatiyan nehêle û rêxistinbûnê ava bike. Ango divê derfet bihatana avakirin û di her şert û mercî de rêxistinkirin pêş biketa.

Hevalê Lewend û Serhad, di her mijara de rista xwe lîstibûn û bi awayekî pir zêde civak bandor kiribûn.

Tû kîjan mala Qamişlo mezî bikê, wêneyên van herdû hevalan hene. Dixwaze bila ew malbat welatparêz be, dixwaze bila ne welatparêz be. Em diçûn kîjan gûnd û bajarokî jî, li her cihî wêneyên van herdû hevala hebûn. Hezkirin, hûrmet û girêdanbûyineke di asta jor de avakiribûn. Hezkirina xwe di dilê gel de gihandibûn lûtkeyê. Tû kesî ku pê re têkilî danenîbûn û tû kesî ku bê bersiv hiştibûn tinebû. Bingeh û nêzikbûnekek bi vî rengî jî di xwe de dabûn avakirin ku her kes bikaribe pir rehet

nêzikî wan bibe. Kesayet û taybetmendiyên van hevalan, em hemû jî ji xwe re mînak digrin. Her dem di dilê me de ne. Ya herî girîng jî daxwaz û hêviyên wan divê em şênbertir pêş bixin.

Bi taybetî ez dikarim bibêjim, kesayeta hevalê Serhad xwe gihandibû pîvanên Serokatî û xwe gihandibû pîvanên azadiyê û xwe gihandibû hevaltiya jinê. Mesela di ew qonaxa destpêkê de hevalê Serhad û hevalê Devrîm li Qamişlo bi hev re kar dikirin. Hevalê Devrîm weke remza kedê tê naskirin. Li Qamişlo di her tax û kolanekê de tû keda hevalê Serhad û hevalê Devrîm dibînê. Di destpêka şoreşê de li wê derê bûn, di destpêka avakirina meclîs û komînan de li wê derê bûn. Wê demê pergal hê nû dihat avakirin. Bi vî rengî her tişt bi ked û xwêdan van hevalan çêbûbû. Van hevalan şopên pir mezin li Qamişlo hiştibûn. Ji ber vê kîjan cihê ku te lingê xwe diavitê, te şopa van hevalan dîdît.

Wêne-80

Dîsa heval Seydo heye. Hevalê Seydo jî bi heman awayî bû. Di qonaxa yekemîn de, rêxistinê erka rêxistinkirina civakê dabû van hevalan. Piştî ku sazî avabûn, kar û xebat berfireh bûn. Xebatên parastinê derketin pêş û di heman demê de êrîşên DAİŞ'ê pêş ketin. Hem heval Devrîm, hem jî hevalê Seydo fermandarên me yên herî pêş yên şer bûn. Hem bingeheke ku di her kêliya wê de ked û bîranînên wan hene di nava civakê de dabû avakirin, hem jî di êniyên şer de bingeheke wisa dabûn avakirin.

Şerê Serekaniyê, şerê Tirbespiyê, şerê Til Hemis hemûyan de hevalê Devrîm û Seydo pêşengtiya wê kiribûn. Jixwe hevalê Devrîm, di şerê Til Hemis de şehîd ket. Plansaziyeke pir berfireh hebû û armanc rizgarkirina Til Hemis bû. Lê bi sedemên cûr be cûr hin lewazî çêbûbûn. Dîsa jî berxwedaniyeke pir mezin di wî şerî de hate kirin û hevalê Devrîm tevlî kerwanê şehîdan bû. Bandoreke pir mezin jî li ser gel çêkiribû. Weneyên wî li her cihî hatibûnû daliqandin, navê hemû zarokan kiribûn Devrîm.

**Jiyana Her Şoreşgerekî/ê Bi Serê Xwe Romanek e...**

Li gel her kesê bîranîneke wî heye. Berhem û encamên keda wan hevalan her roj gav bi gav derdikeve holê jî. Em hemû berpirsiyar in ku xwedî li bîranîna van hevalan derkevin. Lê weke hevalên ku di wan saziyên ku ew hevalên şehîd avakirine de cih digrin, xwedî lê derketineke mezintir hatibû çêkirin. Ji milê hemû gelê me ve jî xwedî lê derketinek çêbûye. Bîranînên wan xwedî derketin, tenê bi navê wan sazî û akademî avakirin nîne. Di her kêliyê de jiyana wan vegotin, taybetmendiyên wan ku pêşketin û serkeftinê çêdikin dayina nasîn û dayina jiyankirin girîng e.

Jixwe jiyan û taybetmendiyên her şoreşgerekê bi serê xwe pirtûkek e, romanek e. Di qonaxa ku hevalê Serhad û Lewend li wir kar dikirin, ez ne li wir bûm. Lê bi vegotinên hevalan û gel, min gelek caran ew heval bi hevalê Çekdar ve dianî beramberî hev, gelek taybetmendiyên wan yek in. Di Şoreşa Rojava de bi sedan şehîdên me çêbûn, her yek hêjayî nirxandinê ye. Gelek hevalên ku xwedî taybetmendiyên cûda ne û di qadên cûda de pêşengtî kirine û mohra xwe şoreşê dane hene. Heval Devrîm û Seydo jî min ji nêz ve nas dikir. Ew heval jî bandoreke cûda li ser mirov çêdikin. Her wiha gelek hevalên ku me nas nedikirin hebûn, lê me bi destê xwe rakirin û bi destê xwe veşartin.

Bi rastî jî êşa wan pir kur bû. Ji bo ku em zêdetir layiqî wan bibin û jiyana wan zêdetir vebibêjin û bîranînên wan xwedî derbikevin; divê em her jiyan û taybetmendiyên wan di jiyanê de zindî bikin. Gelek heval hebûn pir nû bûn, gelek heval rojeke li Rojava neman û şehîd ketin. Lê ew demkin jiyankirina wan jî tijî û dagirtî bû. Bi moral û coş bûn, kêfxweşiyeke cûda bi wan re hebû. Dema ku gav diavitin xaka Rojava, hestên pir cûda jiyan dikirin. Ji bo gelekî bi vî rengî têkoşîn kirin, di êniya pêş de pêşengtiya wan kirin; ji bo wan hevalan bîranînên pir xweşik ava kirin. Ked û berdela ku hatiye dayin jixwe mirov nikare bi awayekî giştî bîne ziman, wê yekê tenê dîrok dizane. Bi sedan hevalên ku me nas dikirin û me nas nedikirin şehîd ketin. Di wê riyê de bi ked û hezkirina xwe têkoşîn dan û jiyana xwe dest dan.

***-Li gorî çavdêriyên me hem ji parçeyên din yên Kurdistanê, hem jî ji çar aliyê cîhanê kesên ku hatine Rojava û di nava têkoşînê de cihê xwe girtine hene. Ew hêza çêker a Rojava, ji kû tê? Hûn di vê mijarê de dikarin çi bibêjin?***

Rast e. Ev jî mijarekê pir girîng e. We jî anî ziman; Hemû gelên çar parçeyên Kurdistanê ku bi fikrên Rêber Apo şiyar bûye, di Şoreşa Rojava de cih girtin û berdal dan. Gelek kesên biyanî di nava şoreşê de cihê xwe girtin. Lewra Şoreşa Rojava, di asta navnetewî de jî mînakek bû. Bi taybetî şerê Kobanê, bandoreke cîhanî da çêkirin. Awirên hemû cîhanê ket ser Şoreşa Rojava, bandoreke pir mezin çêkir. Bi taybetî berxwedana Kobanê, di mejî û pêşdarazîbûnên navnetewî de erdhêjek da çêkirin. Bi vî rengî hem bala hemû Kurdan, hem jî bala hemû cîhanê kişandi. Ji Ewropa bigre heya Emerîka, tevlêbûna şoreşê çêbû, şehadetên wan çêbûn. Gelek kom hene, di bin navê sosyalîzmê de, di bin navê anarşîzmê de hatin û tevlî berxwedan bûn.

Hinek derdoran jî weke şande hatin û alîkariyên ji destê wan hatin, kirin. Êdî rojane şande dihatin û şoreşê pir bala wan dikşand. Bi taybetî jî pergala perwerdê ji wan re pir pir nû dihat û bala wan pir dikşand. Bi taybetî komeke anarşîst hebû, li ser pir lêkolîn kiribûn. Felsefeya Serokatî, jiyana me, pergala me girtibûn dest. Bala wan pir kişandibû, ji bo wê jî dihatin û ji me re hevdîtin dikir. Bê hejmar şande hatin û ji bo hemû xebatan, helwesta xwe diyar dikirin û dixwestin piştgiriya şoreşê bikin. Hinek şande jî dihatin û dixwestin fêrî ziman bibin.

Di akademiyên me de cih digirtin, perwerde dîdîtin. Fêrî axaftin, xwendin û nivîsandina Kurdî dibûn. Zû bi zû fêr nedibûn; lê hin kom hebûn, alaqayeke wan ya mezin hebû, ji ber vê pir zû fêrî danûstendinê bûn. Em zimanê me, hem şêwazên me û nêzikbûnên me fêr dibûn. Di demeke ew qesa kurt de fêrbûyina wan ya ziman, ez pir bandor kirim. Me cihek ji wan re veqetandibû, rojane karê xwe dikirin û dihatin tekmîlên xwe didan. Tevlî xebatên parastinê dibûn, tevlî karên din yên pêwîst dibûn. Hem girêdayî Rojava, hem jî girêdayî ew cihên jê hatine, xebatên pir rengî dimeşandin. Bandora wan jî pir zêde bû. Mesela kêmasî û lewazên xebatê çi ne, divê bi çi rengî ji holê bên rakirin? Di van mijaran de jî gelek nêrîn û pêşniyarên wan ku me jê sûd  werdigirt çêdibûn. Bi rastî jî di derbarê her xebatê de nêrînên pir dewlemend jî derdixistin holê. Lê alaqaya wan ya ji bo ziman jî pir cûda bû.

Nîşan didan ku ger mirov bixwaze xwe bigihînê armancekê, ango armanca mirov zelal be, mirov dikare gelek tiştan bike. Li ser wê esasê jî hewldan, xwestek û coşek bi wan re hebû. Wisa qet xwe weke mêvan nedîdîtin. Di her beşa jiyanê de tevlêbûna xwe çêdikirin. Tevlî meşan dibûn, tevlî çalakiyan dibûn, her kar dikirin. Di qada navnetewî de jî ji bo ku şoreş bê nasîn, gelek kedên wan çêbûn. Ango bandora van şandeyên ku hatine, li ser me jî pir bandor dikirin. Bi awayekî giştî jî, ji bo ku şoreş bi ser bikeve girîngî û wateya perwerdê me dîdît û xwestekeke bilintir û mezintir di me de çêdibû.

Ger em dîsa vegerin ser pirsa Şengalê; rêxistinkirina wargeha Newroz û ya Şengalê girêdayî perwerdeya civaka demokratîk bû. Şandeyên ku ji derva dihatin re jî saziya me mijûl dibû. Rêxistinkirina wargehê, ji kordîneyeke 3 kesan pêk dihat. Ji mamosteyên ku di mijara perwerdê de xwe pêş xistine komîteyeke bi vî awayî hatibû rêxistinkirin. Li wir dibistan hatin vekirin. Di qonaxa destpêkê de ji zarokan re heya refa seyemîn perwerde hat dayin. Piştî wê heya refên amadehiyê perwerde hate dayin.

Li ser vê esasê du dibistanên mezin hatin vekirin. Her ku çû ew kar hate berfireh kirin. Li herêma Şengalê jî bi vî awayî pergalek hate vesazkirin. Di qonaxa destpêkê de ji ber ku gel hê nû bi nû cih dibû û gelek zext û tûndî jiyan kiribûn, rastî qirqirinê hatibûn ji milê rêxistinkirinê ve jî zehmetî dihatin jiyankirin. Piştî demekê kombûyina wan hate çêkirin. Rêxistinê xwest weke hêremeke cûda rêxistin bike. Hemû saziyên wan hatin rêxistinkirin. Di destpêkê de meclîsa wan hate vesazkirin, komînên wan hatin ava kirin. Kar û xebatên ciwanan pêş ketin.

Tiştê herî girîng jî rewşa ewlehiyê bû. Hem parastina wî gelî kirin, hem jî çalakî darxistin û rizgarkirina Şengalê her di rojevê de bû. Piştî wê jî di bin navê TEVDA û xebatên ziman de kar hatin meşandin. Lê ew xebat yekser ji komîteyê ve ne girêdayî bû. Rêxistineke wan ya serbixwe hebû, ne girêdayî Rojava bû. Lê ji bo xebatên perwerdê ji bo ku em piştgiriyê bidin ew hêrema xwe, me di destpêkê de mamosteyek vesaz kir. Mamosteyek derbasî wê hêremê bû. Di qonaxe destpêkê de, komeke xwendekaran hebûn; wan jî berê li ser vî karî lêhûrbûn çêkirin û hinekên wan Îngîlîzî jî xwendibûn.

Piştî ku ew mamoste çû, ji wan xwendekaran komek hate perwerdekirin. Da ku bibin mamoste û bikaribin civaka xwe perwerde bikin. Divê xwe bigihandana zanebûn û hişmendiya xwe û qirqirin û êrîşên ku ji sedsalane li ser wan tên meşandin. Li ser vê esasê jî hebûn û azadiya xwe pêş bixistana. Koma ewil nêzîkî 25 kesan bûn. Piştî qonaxa yekemîn ya ziman, me ew girtin Akademiya Ziman û Perwerdê ya Celadet Bedîrxan. Nêzikî çend mehan di perwerdê de man, ji her alî ve xwe  pêşxistin

çêbû. Piştî wê jî derbasî qada xwe bûn. Mamosteyê ku me erkdar kiriye û wan xwendekaran bi hev re kar meşandin û dibistan vekirin. Di destpêkê de du dibistan hatin vekirin, pişt re heya heşt dibistanan hatin vekirin.

Şert û mercên wê derê jî ne weke yên Rojava bûn. Weke me got, hem rewşa civakê ne li ser hev bû, hem jî şert û zûrifên wê derê zehmet bûn. Di nava wan şert û mercan de, xebateke bi vî rengî pêş xistin; ne hêsan bû. Lê rûxmî wê jî wan mamosteyên me bi hewldan û keda xwe, bi awayekî serkeftî heşt dibistan vekirin. Ew dibistan jî bi navê şehîdan hatin vekirin û rêxistinbûna wan berfireh bû. Heya demeke bi vî awayî meşiya. Dema ku ketin betlaneya havînê, pêwîstî bi perwerdeyeke birdozî hebû. Şopandin û alîkariya hevalên komîteyê jî çêdibû.

Weke me got, xebatên Şengalê ne girêdayî Rojava bûn, lê alîkariya ku ji destê me dihat, me dikir. Bi taybetî me dixwest çêkereke mamoste ku bikaribe wî karî bide meşandin, em ava bikin. Rewşa Şengalê ne weke cihên dîtir bû. Bi taybetî lîstikên PDK pir bûn. Piştî qirqirina mezin jî dixwest destê xwe biavêje wê qadê. Digotin, "*jixwe van xwendekaran di dibistanên me de dixwendine, beşên wan jî hene, dikarin bibin mamoste û em mûçe jî bidin wan.*" Bi vî rengî konevaniyeke pir qirêj ku naye qebûlkirin dimeşandin. Piştî ew qesa binketinê, dîsa dixwestin dest biavêjinê û tiştên heyî jî parçe bikin. Nêzikbûnên bi vî şêwazî hatin pêşxistin.

Beriya ku li Şengalê ferman çêbibe jî, kar û xebatên me li wir hebûn. Gelek hevalên hêja li wir xebitîbûn. Ez dixwazim di vê derê de hevalekî din bi bîr bînim. Hevalê Ferhat Garzan hebû. Hem di xebatên olî, hem jî di xebatên din de demeke dirêj li wir ked da. Gelek heval diçin û dibêjin "*di nava van şert û mercan de, em nikarin demdirêj kar bikin.*" Lê hevalê Ferhat rojekî jî ne got, "*ez nikarim û ez zehmetiyê dikşînim.*" Qonaxên ku hevalê Ferhat li wê derê kar meşand jî pir zehmet bûn, dîsa astengiyên PDK hebûn. Derfetên ku heval xwe tê de pir bi tevger bike tine bûn. Lê kedeke pir mezin hate dayin.

Wê demê konferansek jî hate çêkirin. Di wê qonaxê de em di xebata wergerandinê de bûn. Ji vî milî ve piştgiriya me jî wan re çêbû. Heya ku ew konferans darxistin, gelek zehmetiyan ve rû bi rû man. Lê hevalê Ferhat xwediyê hewldaneke mezin bû, rûxmî wê jî dilnizmiya wî derdiket pêş. Di xebatên Şengalê de armancên wî yên pir mezin hebûn. Ji ber ku bi xwestek û evîneke wisa tevdigeriya, di kar û xebatên xwe de jî pir serkeftî bû. Çandeke, hejabûneke pir mezin di xwe de dabû avakirin ku bikaribe di her şert û mercî de bi awayekî serkeftî kar û xebatên xwe rê ve bibe. Dibe ku gelek hevalên din jî pir ked dane, zor û zehmetiyên xwe pir pir zêde bûn.

Di heman demê de ew hevalên ku diçûn wê qadê divê di gelek waran de bi sebir nêzikî vê xebatê bibin; çand û kevneşopiyeke wî gelî ya pir kevnare hebû, divê watedayina wan tiştên wan hebûya. Ji bo vê jî têkoşîneke pir dijwar tê xwestin. Ji bo wê jî, rista ku hevalê Ferhat li Şengalê lîstiye û bandora ku li ser wan zarokan kiriye, her tê ziman. Her tim behsa kesayeta hevalê Ferhat dikin. Bi rastî jî beriya fermanê bingeheke pir mezin hatibû avitin.

Jixwe bi pêvajoya Rojava re, vesazbûna hevalê Ferhat li Rojava çêbûbû. Dîsa heman kar û xebat dimeşand. Li Rojava kar û xebatên oldaran yên Êzîdiyan dimeşandin. Dema ku nû derbasî qada Rojava bû, li kantona Cizîrê kar dimeşand. Bajar bi bajar digeriya û komîteyên xwe dabûn avakirin. Binesaziya wê ava kir û dest bi xebatên xwe kir. hejmareke pir zêde ku li gel heval Ferhat kar bike jî tine bû, lewra hê nû bi nû binesaziya wê çêdibû. Ji vî milî ve gelek piroje û hewldan nîşan dan. Di van mijaran de gelek hevdîtin û nîqaşên wî çêdibûn. Dixwest her ew rêxistina xwe fireh bike û ew civaka oldar rêxistin bike.

Lê bi awayekî xayînane hat qetilkirin. Ew û hevalê Seydo çûbûn hevdîtinekê, piştî hevdîtinê agahî ji me re hat ku bi awayekî xayînane hatine qetilkirin. Hin kesên komploger ew tişt kiribûn, jixwe pişt re bûyer hate zelalkirin. Ji ber ku di kar û xebatên Şengalê de pir zêde ked û hewldanên hevalê Ferhat jî çêbûbûn, min xwest di vê beşê de hinekî behsa kesayeta wî jî bikim. Şehadeteke bi wî awayî, em pir êşandin. Her çiqasa demeke kin jî li kantona Cizîrê mabû, bandora wî pir zêde bû. Hevalekî xwedî taybetmendiyên vekirî bû, dilnizm bû. Ji her milî ve  zane bû.

Gelek kes hene, ji ber zanebûna xwe, xwe pir mezin dibînin. Lê taybetmendiyeke bi vî rengî di hevalê Ferhat de tine bû. Dikarî bi her mirovekê re bide û bistîne, danûstendinên wî jî bi armanc bûn. Her kesa ku ji hevalê Ferhat re dida û distend, çand û feraseteke rêxistinê digirtin. Di bajarê Qamişlo de, gelek kesan navê zarokên xwe kirin Ferhat. Lewra her cihê ku ew diçû, damgaya xwe lê dida û

bandor dikir. Li Rojava bi sedan hevalên bi vî rengî damgaya xwe şoreşê dane hene, hevalê Ferhat jî kesayeteke wisa bû. Ji ber vê yekê min xwest di nava vê xebatê de jî, careke dîtir bi bîr bînim.

Şoreşa Rojava, bi ked û xwedana van şehîdan çêbûye. Di her kêliyê de em wan hevalan didin jiyankirin, lewra bi taybetmendî û nêzikatiyên xwe di mejiyê me de cih girtine. Gelek hevalan jî xwe gihandibûn astekê ku, risteke mezin ya pêşengtiyê dîlîstin. Bes xayin jî nedisekinîn, her tim di tevgerê de bûn. Da ku ew şoreş pêş nekeve, bi hemû hêza xwe êrîşî me dikirin. Ji ber ku wan hevalên me 24 seatan nedisekinîn û her zindî bûn, her kesî dîdît. Ji ber ku ew qesa zindî û zîrek bûn, bûn hedefa xayinan. Gelek hevalên weke hevalê Ferhat, bi vî rengî me winda kirin. Bi taybetî mirov bi şehadetên wisa pir diêşe.

***-Di encamê de li hemû kantonan di pergala perwerdehiyê de asta ku derketiye holê, hûn dikarin bi kurtasî ji me re rawa bikin?***

Di warê pergala perwerdehiyê de; li kantona Kobanê û Efrînê heya refa şeşemîn bi Kurdî tê rêvebirin, li kantona Cizîrê jî heya refa 3'yemîn bi Kurdî tê rêvebirin. Niha jî ji bo zanîngehê amadekariyek tê kirin. Hemû saziyên ku ji perwerdê re mijûl dibin, hatine gel hev û nîqaşeke hevbeş dane meşandin. Da ku avakirina beşên zanîngehê diyar bikin. Bi taybetî li ser hin beşan hatiye nîqaşkirin. Mesela beşa Jineolojiyê, beşa Ragihandin û Vegûhestinê, beşa Erdnigariyê, beşa Tendûristiyê, beşa Zanyariyê, beşa Civaknasiyê û hwd hene. Li ser van beşan nîqaşên cûr bi cûr hatin meşandin û bingeha wê tê amadekirin.

Ji bo ku zanîngeheke giştî ya Rojava vebe, pêş amadekariyek tê kirin. Zanîngehek li kantona Efrîn hate vekirin, ew jî gaveke mezin bû. Zanîngeheke giştî bû, ne tenê ya perwerdê bû. Li Rojava wezareta perwedê ku bi perwerdehiyê re mijûl dibe heye. Wezareta perwerdê ji yek wezîr û dû cîgiran pêk tê. Di heman demê de binesaziya wê de komîte hene; komîteya aboriyê ye, komîteya arşîvê ye, komîteya têkiliyan e… Ew jî li gorî kar û xebatên hûkimetê, hem di nava xebateke giştî de ne, hem jî bi awayekî xweser karên perwerdê re alaqadar dibin. Ew jî gelek zehmetiyan dikşînin, da ku li gorî rastiya Rojava ji her alî ve pergaleke perwerdehiyê were rûnişkandin. Ked û hewldaneke mezin ya van hevalan jî heye. Di destpêkê de gelek zehmetî jî kişandin. Lê her ku diçe ezmûn digrin, Ezmûnan kom dikin.

Bi taybetî di mijara hişmendiya civakê de pir zor û zehmetî tê kişandin. Li gorî hişmendiya ku dewletê kiriye serê wan, dibêjin "*her tişt pere ye.*" Ji bo ku ew hişmendî û nêzikbûn bê şikenandin; gelek danûstendin, kar û xebatên cûda yên perwerdehiyê jî tên çêkirin. Yên ku ji derva tên Rojava jî dibêjin, "*mînaka perwerdê ya li Rojava cara yekemîn tê jiyankirin, li tû cihan nehatiye jiyankirin.*"

Divê derbasî hemû parçeyên Kurdistanê bibe, bi taybetî li gorî rewşa ku li Bakurê Kurdistanê tê jiyankirin, divê van ezmûnan derbasî Bakurê Kurdistanê jî bibin. Bi vî rengî mirov dikare gavên pir mezin biavêje. Vê gavê lezgînî ji bo Bakurê Kurdistanê heye, lê ew ezmûn dikare li hemû parçeyên Kurdistanê bê karanîn. Lewra gelek ezmûnên dewlemend hene. Dibe ku Rojava ezmûna yekemîn bû, ji bo ku em xwe bigihînin vê astê gelek berdel û xwîn jî hate dayin. Lê divê van ezmûnan jî em bikin bingeha şoreşên parçeyên din yên Kurdistanê û em bawer dikin li ser wê yekê gavên mezin jî bên avitin.

Her wiha ji bo xebatên perwerdehiyê jî piştgiriyeke mezin ya Bakur çêbû. Mesela di şert û mercên giran de me xebat dimeşandin, pirtûkên me tine bûn. Li Bakur ji vî milî ve kampanya hatin destpêkirin û ji pirtûkan bigre heye tiştên kirtasiyeyê, hatin peydakirin. Bi hezaran pirtûk û tiştên kirtasiyê ji xwendekarên Rojava re hate şandin. Ji sedî 90'ê pirtûkên ku me ji bo perwerdehiyê amadekirine, li Bakurê Kurdistanê hatin çapkirin. Ji gelek aliyan ve piştgiriyên bi vî rengî çêbûn.

**4-Di Nava Şoreşê de Xebatên Aboriya Komînal û Ekolojîk**

***-Em bawerin we jî demên dirêj di nava xebatên înşayê de cih girtiye, bi taybetî ji milê aborî ve di nava şoreşê de xebateke çawa pêş ket?***

**CEMÎL AMED:** Di destpêka Şoreşa Rojava de, di hemû qadên jiyanê de xebat hatin meşandin. Hemû qadên jiyanê li gorî felsefeya Netewa Demokratîk girtina dest û pêş xistin bingeha şoreşê ava kir. Şoreşê hin zehmetî û tengasî jî jiyan kirin. Civakbûneke nû dihat ava kirin. Ji ber ku civakê jî li dervayî pergala dewletê, pergaleke din nedîtibû, di destpêkê de ji aliyê fêmkirinê ve hin zehmetî hatin kişandin. Piraniya van zehmetiyan hatin derbaskirin, lê hinek jî bi demê re tên derbaskirin.

Mijareke girîg a jiyanê jî aborî bû. Divê aboriyeke çawa pêş biketa û ji pêwîstiyên civakê re bibe bersiv. Aboriyeke civakî pêş xistin, pratîka wê pêkanîn pêwîst dikir.

***-Gelo berê li Rojavayê Kurdistanê bingeheke aboriyê hebû?***

Heya wê demê Moderniteya Kapîtalîst û netewe dewletê aborî di destê xwe de hiştibû, ji bo ku bikaribe civakê qontrol bike aborî weke çekeke kar anîbû. Bi taybetî ji bo civaka Kurd, ev yek derbasdar bû. Rûxmî ku çavkaniyên aborî yên binerd û sererd ew qesî dewlemend in, li Rojavayê Kurdistanê gel her birçî hatibû hiştin, di sînorê zik têrkirinê de bû. Debara xwe kirina civakê de gelek zehmetî dihatin jiyîn. Ew rewş ji bo hemû civakê derbasdar bû. Derdoreke pir biçûk hemû aboriya civakê di destê xwe de dihêla.

Ev pirsgirek, ji ber konevaniyên dagirkeriyê yên dewletan bûn. Li her çar parçeyên Kurdistanê jî heman konevanî tê meşandin. Bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê dewlet neteweyê hemû dewlemendiyên binerd û sererd xistibûn tekela xwe û ji civakê re tiştek nehiştibû. Ji ber ku civak bêzanebûn jî hatiye hiştin, fêrbûyineke neçarî jî çêbûye û ji rastiya heyî re çav hatiye girtin. Di beşên din yên jiyanê û civakê ve girêdayî, biyanîbûnek di mijara aborî de jî hatiye jiyîn. Ev trajediyeke gelê Kurd e. Heya şoreşê jî vê rewşê wisa berdewam kir.

Li Rojava gavatina şoreşê re, vê rewşê re jî "êdî bes e" hate gotin. Gelê Rojava jî, ji ber ku pir êş û azar kişandibû, hema li şoreşê xwedî derket. Tola sed salî radikir. Ji milê aboriyê ve jî fêrbûyin û elimînên ku weke kirasekî lê hatibû kirin, jêkir û avêt. Di destpêka şoreşê de, ji ber ku pir zêde ezmûn tunebûn û amborgoyeke mezin jî li ser Rojava hate meşandin, hin zehmetî hatin jiyîn. Tevî her tiştî jî gel dizanî ka çawa xwe li ser piyan bigre û jiyana xwe bi rêxistin bike. Bi vî awayî piştî şoreşê weke xebatên dîtir xebatên aboriyê jî ji nû ve hatin rêxistinkirin. Rêxistinkirina beşên jiyanê ya piştî şoreşê, ji dema pêkanîna şoreşê jî zehmetir e. Bi salan hemû aboriya civakê, ji bo berjewendiya xwe kar anîbû. Ji ber vê civak ji karê aboriyê hatibû dûrxistin. Ji ber vê yekê ji mijara aboriyê re hinek biyanîbûn jî hebû. Wê çawa bihata kirin pir nedihat zanîn. Lê dema ku bi keda xwe di nava xebatên aborî de jiyana xwe naskirin, bandoreke pir xurt kir.

Di qada aborî de tiştên ku divê di destpêkê de werin kirin, di nava wê ambargoyê de pêwîstiyên jiyanî yên civakê bûn. Divê hinek bihatana derxistin, hinek jî bihatana kirîn. Ji bo vê xebatê, kombûnek hatibû çêkirin; hinek kes weke erkdar hatibûn diyarkirin. Da ku rojane pirsgirekên ku derdikevin çareser bikin. Komîteyên firin, aş û bazarê û hwd hatibûn çêkirin. Lê giştî xebatên aborî, pişt re weke komîteyeke hatin rêxistinkirin. Her beşeke aboriyê bi awayekî xwe gihand komîtebûyinê. Her wiha kordînasyoneke kar hebû. Beşên çandiniyê, beşên sewaldariyê, beşên tîcaretê, beşên firin û aş pêş ketibûn. Van komîteyan li gorî derfetan karên xwe dimeşandin.

***-Di rêxistinkirina karê aboriyê de, hûn bi kîjan zehmetiyan ve rû bi rû man?***

Di serî de meşandina kar de gelek zehmetî, zorî û nefêmkirin çêdibûn. Ecemîtî hebû, lewma weke civak cara yekem bi karekî esasî yê civakê re rû bi rû mabûn. Lê bi demê re di nava pratîkê de elimandin û derbaskirina hin tiştan çêbû. Her wiha di destpêkê de hemû pêwîstiyên civakê, bi derfetên rêxistinê dihatin meşandin. Derdoreke ji aliyê hejmarê ve kêm ku di dema dewletê de van karan re mijûl bûye jî hebû, bi wan re jî têkilî dihatin danîn û ew jî ji aliyekî ve dihatin karanîn û diketin xizmeta civakê. Dîsa hinek aş û firin hatin rêxistinkirin. Lê her karê ku dihat kirin, li ser esasê bersivandina pêdiviyên civakê dihat kirin. Destûr nedihat dayin ku mantiqa tîcaretê û kar pêş bikeve. Kesên ku di nava pergala civakê de bi karê tîcaret û aboriyê re mijûl dibûn jî, tenê bi ked û maliyeta xwe tevdigerîn.

Herî dawî li ser esasê deskeftiyên şoreşê kirina malê civakê, xwe xwediyê van nirxan dîtina civakê, parastin û mezinkarina van nirxan nîqaş û lêhûrbûn çêbûn. Li gorî vê rêbaz û pêşniyarên derke-

tine holê ketin meriyetê. Bi taybetî zeviyên çandiniyê ku di dema şoreşê de ketibûn destê gel, li ser esasê koperatîfan hatin rêxistinkirin û ji gel hatin belavkirin. Vê yekê coş û kelecaniyek jî ava kir. Ji nû ve vegerîna cewhera xwe, bi vî awayî pêk dihat. Ne ku qada aboriyê de hema her tişt gihêşt encamê, lê eleqe, bal kişandin û şiyarbûnek ava kir. Disa di xebatên bazirganiyê de hevgirtin û komîn hatin rêxistinkirin. Pêşiya tûcarên mezin hate girtin, mantiqa kar û pereyên mezin bidest xistinê hate sînordarkirin. Dîsa ji bo sewalkariyê teşfîq û rêxistinbûna komînan çêbû.

Wêne-28

***-Hûn dikarin mînaka çend projeyên şênber bidin?***

Di qada aboriyê de ji bo pêjerojê jî plansaziyên demkurt, demnavîn û demdirêj hatin çêkirin. Bi taybetî li gelek herêman pirsgireka avê tê jiyîn, ji bo vê plansaziyên lezgîn hatin kirin. Mesela ji bo ku beşeke ava firatê ji bo çandiniyê were karanîn, projeya kanalê pêş ket. Ger ev proje bi ser bikeve, jixwe ew herêm dibe bihuşt. Her wiha xebatên komîn û koaperatîfan mezintir dibin. Ezmûnên ku derdikevin holê, ji bo plansazî û projeyên nû jî bingeheke ava dikin. Li ser aboriyê perwerdehî jî tên darxistin. Ji bo dema pêş zêdetir plansaziyên perwerdehî û zanekirinê hene. Her endam, xebatkar û rêvebirekî/ê ku ji qada aborî re mijûl dibe tevlî perwerdehiyan kirin û zane kirin, hem pêwîstiyek e, hem jî armancek e. Her wiha xebatên tekstîlê (cil û berg) bi awayekî xurt tên meşandin. Li ser vê qadê jî nîqaş û plansazî hene.

***-Birêz Amed, ji bo xebatên aboriyê yên şoreşê hin mînakên şênber dan, hûn jî dikarin felsefe û zîhniyeta ku van xebatên aboriyê xwe dispartinê ji me re rawa bikin?***

**EGÎD ROJ:** Şoreşa Rojava, ne tenê şoreşeke leşkerî ye, xwe dispêre zîhniyeteke. Li ser esasê paradîgmaya Netewa Demokratîk, dîtinên ekolojîk, demokratîk û azadiya jinan esas digre. Ev zîhniyet dikare xwe ji her alî ve di nava civakê de belav bike. Lewma ne texlîteke dewletên dagirker e, ne jî çavlêkirineke hêzên êmperyalîst e. Ev şoreşa ku li ser esasê felsefeya Rêber Apo xwe pêş xist, ne li ser esasê tûndî û qetlîaman pêş ket, li ser esasê parastina rewa pêş ket.

Ji aliyê din ve ev zîhniyet dikare ji pirsgirekên herêmê re bibe bersiv. Van gelan hezaran salan li gel hev jiyan kirine, lê pergala êmperyalîst wisa kir ku her di nava nakokî û şer de bin. Ev zîhniyeta demokratîk pêşiya vê dibe asteng û çareseriya gelan diafrîne. Dikare di nava gelan de ji nû ve biratiyê pêş bixe. Şoreşa zîhniyetî ne hêsan e ku di rojek û du rojan de pêk were. Ji ber vê hê jî di vê şorêşê de kêmasî hene. Bi taybetî ji bo xebatên aboriyê ev tişt derbasdar e. Di Şoreşa Rojava de her çiqasî şoreşa zîhniyetê negihêştibe armanca xwe jî, hewildanên wê pir zêde ne. Îro pêwîstiyên wê bi sazîbûn, bingehên ku saziyê civakê xwe li ser wî esasî pêş bixin û perwerde bikin heye. Ji ber vê yekê li Rojavayê Kurdistanê akademiyên cuda cuda hatine avakirin. Van akademiyan di nava realîteya şer de bi awayekî paralel dimeşin.

Wêne-23

Li ser esasê demokrasiyê avabûna pergala Rojava, bersiveke dide pergala BEAS jî. Pergala BEAS her tim netewa Ereb esas girt, cih neda netewên din û ji heralî ve ew asîmîle kirin. Ji aliyê aborî ve jî gelên dîtir, di bin deshilat û hûkmekî Ereban de bûn. Ne tevî Ereb bûn jî, tenê aqileyeteke BEAS'î bû. Lewma dewlet netewe li ser esasê berjewendiyên derdoreke teng hatiye avakirin. Pergala êmperyalîst jî li ser esasê bazar û karê tîcarêtê hatiye avakirin. Modelê seyem ku pirsgirekên aborî yên civakê çareser dike, modela aboriya komûnal û demokratîk e.

Aboriya Komûnal îro di asteke berfireh de kariyê ji pêwîstiyên civakê re bibe bersiv. Lewma aborî berê di destê rejîma BEAS'de weke siyaseteke birçîbûn û deshilatdariyê dihate meşandin. Aboriya Komînal darbeya herî mezin li vê siyasetê da. Aboriya deshilatdar, hem gelê me ji ax û çavkaniyên wê mexrûm kiribû, hem jî bi vê siyasetê gel bêdeng kiribû. Bes modela xweseriya demokratîk ku li Rojavayê Kurdistanê rê ve diçe, li ser esasê komînkirina ax, enerjî û avê, pergala xwe bi awayekî de-

mokratîk ji bo gelan pêş dixe. Ev alternatîf, ji bo bîoîktîdara ku li ser gelan tê meşandin darbeya herî mezin e.

Wêne-24

***-Em dixwazin heman pirsê ji we jî bikin, ji aliyê aborî ve hûn bi kîjan astengiyan ve rû bi rû diman, bi taybetî dewleta Sûriye, li ser gel bi çi rengî konevaniyeke aboriyê meşandibû?***

Divê ev jî were zanîn, li Rojavayê Kurdistanê li ser gelan gelek zext jî hatine pêş xistin. Bi taybetî di dema Cemal Evdil Nasir de, dema ku di navbera Sûriye û Misirê de yekîtî ava bû, gelê Kurd herî zêde di vê demê de ji çavkaniyên xwe mexrûm ma. Li ser esasê siyasetên faşîzane, ev kemara Erebî ne tenê ji aliyê erdnigarî û siyasî ve hatiye meşand. Her wiha bûye sedem ku aboriya civakê bi tevahî were talankirin û gel ji çavkaniyên xwe mexrûm were hiştin. Gelê Kurd, li Sûriye xwediyê çavkaniyên herî dewlemend e. Lê ji bo ku dest daynin ser van çavkaniyan ji Dêrîkê heya Hesekê, ev gelên li herêmê bê nasname hatine hiştin. Ji bo ku weke hemwelatî nayen dîtin û nikarin xwedî li mal û milkê xwe xwedî derkevin. Ji aliyê din ve jî Erebên Penaber anîne û li wir bi cih kirine. Axa giştî ku di destê Kurdan de maye jî, li gorî siyaseta giştî ya dewletê hate rêvebirin. Ango ev konevaniya aboriyê ji aliyê Şam'ê ve dihat diyarkirin û li ser esasê talankirinê bû. Ji aliyê din ve jî, modelên aboriyê yên kapîtalîzmê li ser esasê kar û sudwergirtinê pêk dihatin. Ev hê jî li ser esasê bazara lîberal pêk tê.

***-Aboriya ku we pêş dixist li ser kîjan esasan bû?***

Dijberî vê aboriya ku li ser esasê xweseriya demokratîk pêş dikeve, ango aboriya xeta seyemîn li ser esasê pêwîstî û masrafên civakê pêk tê. Li gorî berhem û pêwîstyên gelan pêk tê. Ev model di asta ku tê xwestin de pêk nehatiye, lewma tiştên weke alozî û şer jî li ser tesîr dikin. Lê di asta komîn û koperatîfan de kariye xwe bi awayekî berfireh rêxistin bike.

Ev yek gav bi gav pêş dikeve û dibe pêwîstiya gelan. Karker û esnafan jî li ser vî esasî xwe rêxistin kiriye. Ev aborî di her astê de teyisîna xwe ya li ser jiyanê û zîhniyetê jî dike. Ev zîhniyeta modela demokratîk, dihêle ku karker û kedkarên ku kar dimeşînin û berheman diafrînin xwe di nava ev pergala aborî de bibînin. Lewma karê ku dikin û keda ku didin pir zehmet e û ne tiştekî ku bi pereyan were kirîn û firotinê ye. Îro ev zîhniyet pêş dikeve. Di berhemên xwe de xwe dibîne. Dibe sedem ku hemû mirov hem ji aliyê zîhniyet û aboriyê ve, hem jî ji aliyê civakî ve xwe tê de bibînin. Ev mirov vedigerîne cewhera mirovahiyê.

Têkoşînên aboriyê, bi vî awayî rengê jiyana xwe jî diyar dikin û rêxistinbûna xwe ya jiyanê jî bi vî awayî rengekî esasî digre. Ji aliyê din ve jî zîhniyeta Modernîteya Demokratîk ku di civakê de tê avakirin, bi xwezayê re jî dibe yek. Bi xwezayê re jî di nava aştiyê de ye û ekolojiyê esas digre. Lewma pergalên berê ku li ser esasê kar hatibûn meşandin ekolojî jî têk biribûn. Têkbirina ekolojiyê tê wateya ku mirovahî têk çûye.

Zîhniyeta aboriya demokratîk û ekolojîk, îro li Rojavayê Kurdistanê her roj weke baxçeyekî şîn berhemên xwe dan û her roja ku diçe şîntir dibe. Bêguman pêwîstî bi têkoşîneke zîhnî ya berfirehtir heye. Lewma bermayiyên pergala deshilatdariyê û dewletê ku heya şaneyên her mirovekî/ê tesîr kirine, hê jî hene. Ev pergala deshilatdariyê bi awayekî giştî civak felç kiribû.

Mesela jinên ku weke nîvê civakê tên dîtin, hem ji aboriyê qut bûbûn, hem jî di karên dîtir yên civakî de derva hatibûn hiştin. Lê îro mirov dikare bibêje ku li Rojavayê Kurdistanê, şoreşa jinan pêk hatiye. Ji aliyê parastina rewa ve û ji aliyê rêxistinkirina civakî û aborî ve tevlêbûna jinê pir xurt e û rista herî sereke dîlîzin. Bêguman di vê mijarê de jî pêwîstî bi xurtkirina têkoşîn û zîhniyetê heye. Her çiqasî jin îro ji hemû şoreşê re pêşengtiyê bikin jî, her ku asta jinê ya tevlêbûnê çêbibe, dê azadiya hemû civakê teqez bibe. Wê li ser vê esasê tesîra xwe li hemû Rojhilata Navîn jî bike.

Li ser vê bingehê di her mijarekê de akademiyên demokratîk jî hatine avakirin, lê îro jî pêwîstî bi xebateke zêdetir û berfirehtir heye. Pergala qirkirinê, Rojavayê Kurdistanê vegerandiye çoleke, ji ber vê li ser esasê ekolojiyê pergalek avakirin pêwîst dike. Mesela weke remz mirov li hemberî wê çolbûnê, dikare daristanan biçîne. Dê pergaleke demokratîk jî di zemîneke wisa kesk de xweşiktir û

bedewtir bibe. Ger li ser hîmê pergaleke ekolojîk pêş nekeve, zîhniyet û mirovekî teqûz jî pêk naye. Têkoşîna ku di van mijaran de tê dayin, îro di zemîneke berfireh de gav bi gav dimeşe. Her çiqasî kêmasî hebin û ev zîhniyet ji her alî ve nehatibe girtin jî, ji bo vê yekê israr û hewildaneke xurt jî tê nîşandan. Bi vê yekê hemû mirovên ku di nava civakê de kedê didin, ji keda xwe xwedî derdikevin û ber bi serkeftinê ve diçin.

**5-Li Rojava Çapemeniya Azad**

***-Dema ku me jî hewil da em rastiya Şoreşa Rojava di çapemeniyê de biteyisînin, em gelek zehmetiyan ve rû bi rû man, lê ji aliyê din ve di nava şert û mercên şoreşê de xebatên çapemeniyê meşandin, hîseke pir xweşik dide mirov. Hûn jî ji destpêka şoreşê ve di xebatên çapemeniyê de cih digrin, em bawerin beriya wê jî ezmûnên we yên rojnamegeriyê hene. Di nava şoreşê de xebatên çapemeniyê çawa pêş ketin û îro di kîjan astê de ne?***

**ARARAT SÛVEYDA:** Rast e, zehmetiyên wê hebin jî, me bi kêfxweşî di nava xebatên çapemeniyê yên şoreşê de cih girt. Berê jî me hin xebat dimeşandin, lê taybetî di dema şoreşê de xebatên me gihêştin lûtkeyê.

Min di sala 2011'an de li Helebê xebatên çapemeniyê meşandin. Bi taybetî min xebatên Ronahî tv meşandin. Beriya Şoreşê, ji milê çapemeniyê ve tiştek li holê tunebû. Bingeheke civakî hebû, lê ji aliyê ragihandinê ve pir lewaz bû. Bi taybetî li Heleb, Efrîn û Kobanê qet tiştek tune bû. Li Cizîrê hin hevalên xwedî danehev hebûn û hin kar kiribûn, lê cihên dîtir tiştek nehatibû kirin.

Ji milekî ve bêderfetî hebûn, lê ji milê din ve pêvajoya Şoreşê ji bo xebatên çapemeniyê jî bingeheke pir mezin ava dikir. Hêza rejîmê nemabû û gel rabûbû ser piyan. Di zemîneke wisa de her hevalekî/ê ku di xebatên çapemeniyê de bû bi evîn û xwestekeke mezin tevdigerî. Zanebûna gaveke nû û girîng tê avitin xebat meşiyan.

Wêne-29

***-Hûn dikarin hin xebatên şênber ku di destpêkê de hatin meşandin mînak bidin?***

Wê demê weke xebatên stûdyoyê cara ewil rêzebernameyeke bi navê "*Kulîlkên Rojava*" ku li ser zarokan bû hate çêkirin. Bingehek ava kir. Tenê ji bo vê bernameyê bile me her tiştekî xwe ji cihekî digirt. Mesela kameramanên me yên ewil, ji welatparêzên ku dîmenên dewetan dikşînin pêk dihatin. Dîsa pêşkeşvanê me mamosteyek bû. Piştî wê bernameyên ziman û platformên gel hatin çêkirin.

Weke xebatkarên ragihandinê beriya ku şer û alozî li Sûriye û Rojavayê Kurdistanê zêde bibe, me dikarî em biçin hemû kantonan û xebatên xwe bimeşînin, lê piştî ku şer mezin bû, bi neçarî her hevalek jî bi kantona ku lê dima ve sînordar ma. Ez jî di wê demê de li Kobanê mam.

***-Bawerim demên ku daneyên şoreşê nû bi nû derdiketin holê bû, wê demê li Kobanê xebatên çapemeniyê di çi astê de bûn?***

Me li Kobanê stûdyoyek ava kiribû. Li wê derê jî hin bernameyên zarok û jinan û bernameyên siyasî hatin çêkirin. Ew dîroka ku we qalê kir de hin bernameyên pêwîst dihatin çêkirin. Lê piştî ku şer destpê kir, li gorî herîkîna şer, me hewil dida ku rewşa heyî ragihînin. Bi vî rengî bernameyên bi tevger çêdibûn. Lê dema ku şer mezin bû, xebatên me yên asayî jî sekinîn û me bi awayekî din xwe rêxistin kir. Zêdetir jî li ser esasê ragihandina şer, nûçegihanî hate kirin. Li gel vê yekê pêwîstî bi bernameyên mayinde ku berxwedaniya Kobanê biteyîsînin hebû. Li ser wê esasê ji nîvê şer û şûn ve xebatên belgefîlman hatin pêş xistin. Me fêm kir ku ew lehengî, moral, hezkirin û hestên ku di wê derê de tên jiyîn, em nikarin bi nûçeyên çend deqîqeyan pêk tê biteyîsînin.

***-Di wan deman de cihên dîtir rewşa ragihandinê çawa bû, sazîbûnên esasî yên ragihandinê kîjan bûn, gelo astengî hebûn?***

Di xebatên giştî yên tv de, li cihekî Rojavayê Kurdistanê stûdyoyeke me tune bû. Lê niha hersê kantonan jî stûdyoyên tv'yê hene. Jixwe stûdyoya Qomişlo di 2013'an de hat avakirin. Xebatên ajansê jî hebûn. Di destpêkê de pirsgireka pêşkeşvanan hebû. Jixwe qamera bi serê xwe pirsgirekek bû. Ji ber ku em kesên dîmenên dawetê dikşînin ve girêdayî bûn, karê me jî pir caran rêk û pêk nedihat meşandin. Êdî bi demê re perwerdekirina hin peşkeşvan û qameremanan çêbû. Dema ku li ser wê esasê rêxistinbûnek çêbû, kar jî rehet-tir bû. Di destpêkê de hemû kar me bi xwe dikir, lê pêwîstî bi sazîbûneke hebû. Ew hemû di nava pêvajoyeke demdirêj de çêbûn.

Li Rojavayê Kurdistanê, weke tv tenê Ronahî Tv heye. Rêxistinkirin û rêk û pêk kirina wê jî bi kedên mezin çêbû. Rexne li ser vê tv'yê jî hene. Weke xebatkarên çapemeniyê kêmasiyên me jî hebûn, me nedikarî pêvajoyê şoreşê bi awayekî germ bişopînin. Em her li pêş qada parastinê, siyasetê û civakî dihatin. Rûxmî ku risteke me ya pêşengtiyê û beralîkirinê heye, em her paş de dimînin. Çapemenî her bi xwe ve sînordar dimîne, nikare vekirineke çêbike. Ji bo vê yekê jî berhemên wê nayen pêjirandin û nikare alaqayê bikşîne ser xwe. Nikare li her cihekî şoreşa xwe rêxistin bike. Bi piranî jî em kêmasiyên xwe bi teknîkê îzah dikin, lê ne wisa ye. Qadeke şoreşê ye, her cih azad e. Em bi xwe pêşiya xebatên xwe jî asteng in. Pirsgireka sereke ev e. Em nikarin xwe rêxistin bikin.

Her wiha ji aliyê civakî ve jî ragihandina me teng bû. Ew qesa gelên ku tevlî şoreşê dibin û li Rojava û Sûriye jiyan dikin hene. Me nikarî em wan jî bixin navenda xebatên xwe. Rêveberiya xweser û Netewa Demokratîk neteyîsî xebatên me yên ragihandinê. Nikarî pirsgirek û jiyankirinên hemû derdorên civakî biteyîsîne.

Şêwazek rûniştiye, em vê yekê ji xwe re weke pirsgirek nabînin. Ew kelacanî û coşa şoreşê ku di destpêkê de li ser ragihandinê çêbû jî lewaz bû. Pirsgirekên me yên profesyonelbûyinê jî hene. Di mijara xwe perwerdekirin û afirînerkirinê de kêmasî tên jiyîn. Bêguman li ser van mijaran di civîn û konferansên me de jî gelek nîqaşên me çêbûn û hewildanên çareseriyê jî derdikevin holê. Di şexsê tv'yê de mirov dikare van bibêje.

Xebatên ajansê jî di bin navê ANHA'yê (Ajansa Nûçeyan a Hawarê) de hatin rêxistinkirin. Risteke girînga a ajansê heye. Ji Heleb'ê bigre heya Dêrîkê hemû kiryar û pêşketinên çêdibin, radigihîne. Ji aliyê leşkerî ve bigre heya xebatên civakî bi awayekî piralî diteyîsîne. Risteke çavkaniya ragihandinê jî dîlîze. Tv'yên din jî xwedî dike. Li Rojhilata Navîn jî di asteke de xwe da nasîn û bi nav û deng bû.

Rojnameya Ronahî heye. Di sala 2011'an de hate vekirin. Risteke girîng a rojnameyê jî hebû. Lê di destpêkê de feraseteke wisa hebû; hevalên me digotin, ti kes rojnameyê naxwîne. Vê yekê rist û tesîra rojnameyê jî teng dikir. Ji ber vê angaştên me yên xebatan jî lewaz diman. Ji bo giştî ragihandinê jî wisa girtîbûnek hebû. Ya heyî têr dîtin hebû. Dibe ku çanda xwendinê lewaz be jî, lê me dikarî em bi xwe vê yekê pêş bixin. Jixwe dervayî pirtûkên dibistanê, pir zêde pirtûkên Kurdî jî tunebûn. Vê dawiyê hinek pêş ketine.

Dervayî van, radyo hebûn. Bi piranî di 2011-12'an de hatin vekirin. Di her qantoneke de radyoyek heye, li Cizîrê 6-7 heb hene. Radyo jî pir dihat şopandin. Pirsgirkên wê jî mirov nikare ji beşên din yên ragihandinê qut bigre dest.

***-Asta ku çapameniya azad li Rojavayê Kurdistanê gihêştiye hûn çawa dinirxînin?***

Em dikarin bibêjin, di qada ragihandinê de li Rojava astek hatiye girtin, lê kêmasiyên me jî hê pir in. Dibe ku di destpêkê de hinek bêderfetî û tengasî jî hatibin jiyîn, lê niha tiştekî wisa tune. Ger astengiyek hebe, em bi xwe ne. Li gorî rihê şoreşê tevnegerîna me ye. Bi awayekî giştî, me nikarî em tiştên ku li Rojava di nava şoreşê de pêk tên biteyîsînin. Me nikarî em heqê wê bidinê. Di vî mîlî de seranseriyek heye. Rast e, ji gelek aliyan ve ked hatiye dayin û pêşketin jî çêbûne, lê divê em zêdetir li ser kêmasiyên xwe bisekinin. Mirov bi kurtasî dikare wisa rawa bike.

**6-Şoreşa Rojava Bingeha Xwe ji Çand û Hûnera Şoreşgerî Digre**

***-Em baş dizanin ku di şoreşan de risteke girîng a çand û hunerê heye. Li Rojavayê Kurdistanê çahdeke çawa hebû ku ji şoreşê re bû bingeh? Li ser çanda Kurdinî, konevaniya dewleta Sûriye çibû?***

**ÎSMAÎL XABÛR:** Ji bo ku mirov bikaribe xebatên xwe yên çandî îro binirxîne, divê mirov di destpêkê de hinekî tûndî û zextên li ser çandê binirxîne. Mesela şewitandina Sînemaya Amûdê heye. Ev bûyer diyar dike ku di çanda Kurdan de alîkariya bindestan kirinê heye. Li Cezayîrê nêzî milyoneke şehîd çêbûn, fîlmê ku tê pêşkeşkirin jî ji bo alîkariya têkoşîna Cezayîrê bû. Ji bo wê hemû Kurdan zarokên xwe şandin sînamayê.

Gelek projeyên qirkirina çandî li Rojavayê Kurdistanê li ser Kurdan hatine meşandin. Mesela li ser Kurdan lêkolînek hatiye kirin û pirtûkek hatibû nivîsandin. Di vê pirtûkê de girêdanbûna Rojava bi hersê parçeyên din re jî hatibû kirin û ji gelek aliyan ve hebûnên Kurdan diyar kiribûn. Armanca esasî ya vê pirtûkê jî îspatkirina *“Kurd, ne gelên Sûriye ne, ji derva hatine Sûriyeyê”* bû. Di encama konevaniyeke wisa de jî nasnameya hemwelatiyê nadin gelek Kurdan. Zêdetirî 300 hezar kes bê nasname hatin hiştin.

Ya din jî li ser orf û edetên Kurdan, li ser cil û bergên wan û zimanê wan konevanî hatin meşandin. Navê gund û bajarên Kurdan hatin guhertin. Kurd ji bo xwe weke xeterî dîdîtin, ji ber vê yekê weke tevdîr van konevanî dimeşandin. Ev proje di 74’an de bi navê “*şoreşa dijî feodalîzmê*” gihêşt asteke din. Erebên Reqa derbasî Cizîrê kirin, da ku di demografya Kurdistanê de guhertinê çêbikin. Ji vê yekê re dibêjin, “*kembera reş.*” Ango milk û erdên Kurdan jê girtin û dan Ereban. Jixwe van Kurdên ku bênasname ne, nikarin bibin xwedî milk û madîyatê. Ew kes kengê werin girtin û kûştin jî ne diyar e.

***-Ji bo parastin û pêşxistina çand, gelo ti pêşketin tunebûn? An jî tevgerên ku vê yekê dixin navenda têkoşîna xwe tunebûn?***

Hinek hebûn, lê çawa! Di 73’an de jî ji ber şerê Îsraîlê Rewşa Awarte îlan kirin û vê jî li ser Kurdan tesîr kir. Rejîma BEAS jî di van deman de hate ser deshilatdariyê û ev konevanî tûndtir bûn. Her çiqasî hin Kurd û komînîstên hevkar xistibin nava vê pergalê jî, di bişavtina çandî û tûndiyê de guhertinek çênedibû. Axaftina Kurdî jî qedexe kirin. Nedihiştin ku Kurdek huner û çanda xwe jiyan bike. Dema ku hin partî derketin jî, hemû endamên wan girtin. Pişt re ev partî jî nerm bûn û di astekê de li ser esasê çarçoveyeke reformîst destûr dan xebatên van partiyan. Wan jî digotin, *“em çanda Kurdî dixwazin.”* Lê li ser vê esasê di nava civakê de xebatek nemeşandin, ji bin ve girêdanbûna van partiyan jî bi dewletê re hebû. Çanda dewletî bi ser van partiyan re konevaniyên xwe careke din dan meşandin.

Dema ku Tevgera Azadiyê derbasî Rojava bû, van partiyan xwestin weke xwe lê bikin, lê nikarîn ser bixin. Bi hatina Tevgera Azadiyê re, di nava gelê Rojavayê Kurdistanê de çandeke nû afirand. Sekin, uslûp û nêzikatiya wan pir balkeş bû. Vê yekê jî ji milê çandî ve jî di gel de şiyarî û guhertinek çêkir. Vê hişt ku di 85’an de li Rojava, Newroz were pîrozkirin. Berê kesî nediwêrî ku Newrozê pîroz bike. Dev ji wê berde, ger te bixwesta straneke Kurdî jî guhdarî bikê, qebûl nedikirin.

Ji ber van sedeman tesîra çanda Erebî li ser Rojavayê Kurdistanê hebû. Jixwe her bajarekî Rojava ji hev û din qut kiribûn û dixwestin helandineke çandî çêbibe. Lê bi hatina Tevgera Azadiyê her tişt binguhê hev ket û vê yekê hişt ku çandeke şoreşgerî li vê derê pêş bikeve. Ji bo ku ev çanda şoreşgerî pêş nekeve jî gelek astengî hatin darxistin, mesela di Newrozan de bi sedan kes dihatin girtin, dehan kes hatin kuştin.

Piştî vê jî di nava gel de komên çandî hatin avakirin; komên şanoyê, yên sikeçan, yên folklorê, yên helbestan, yên stranan çêbûn. Van xebatên şoreşgerî û Kurdî bal dikşand ser xwe. Mesela bi serê xwe Koma Berxwedan bi serê xwe tesîrek dikir. Di wê demê de tenê 12 heb komên mûzîkê li Rojava hatibûn avakirin. Navên wan jî bi vê çandê ve girêdayî bûn. Mesela Koma Botan, Koma Agirî, Koma Raperîn, Koma Tolhildan, Koma Cudî, Koma Engîzek, Koma Serhildan hebû. Navê xwe jî bi piranî ji berxwedanî û têkoşîna li Bakur digirtin. Van koman di maleke veşartî de amadekarî û xebatên xwe dimeşandin. Amûrên xwe yên teknîkî hemû dizîka ji cihekî dibirin cihekî dîtir.

Wêne-31

***-Di dema şoreşê de ji milê çand û hûnerê ve çi pêşketin çêbûn?***

Di dema şoreşê de jî yekem saziyên ku hatin avakirin yên çand û hunerê bûn. Mesela Navenda Mihemed Şêxo li Qamişlo, Navenda Çanda Kurdî jî li Helebê hate avakirin. Jixwe di nava pêvajoya şoreşê de ev sazî û çalakiyên çandî jî zêdetir bûn. Ev komên çandî, vegeriyan navendên çandî ku mirov bikaribe hemû xebatên çandî tê de bimeşîne. Di nav de perwerdehiyên bîrdozî û çandî hatin darxistin. Hemû beşên hunerê jî, bi awayekî pergal hatin rûnişkandin.

Pêvajoya şoreşê ji bo çand û hunerê jî mirov dikare weke serdemek nû bigre dest. Bi taybetî di nava çend salên dawî de li ser esasê çanda Netewa Demokratîk, xebatên çandî gihêştin lûtkeyê û hê jî berdewam dikin. Li ser vê esasê gelek çalakî û xebatên giranbiha jî hatin pêş xistin. Çawa ku mirov ji malên xwe derdiketin û dihatin tevlî raperînan dibûn, ev komên çandê jî bi stran û rengê xwe tevlî çalakiyên girseyî dibûn. Vê yekê hem ji aliyê Netewa Demokratîk ve, hem jî ji aliyê yekîtiya netewî ve çandek pêş xist. Ew xebat li ser esasê nijadperestiyê û tenê ji bo Kurdan jî pêş neketin. Ji bo pêkhateyên din jî xebatên çandî hatin meşandin û teşvîq çêbûn.

Ji bo ku niha em vê astê bilindtir bikin; em dizanin ku beşeke girîng a Netewa Demokratîk jî akademî, meclîs û komîn in. Ev jî hatin avakirin. Li ser esasê perwerdehiya çandî jî, Akademiya Ş. Yekta hate avakirin. Di wê akademiyê de perwerdehiyên profesyonelî di her beşeke çandê de tê dayin. Kadroyên xwe diafrîne. Hem ji aliyê rêxistinî ve, hem jî ji aliyê hunerî ve rista xwe dîlîze.

Van xebatan bala civakê jî kişandin û gel jî tevlêbûna xwe ya van xebatan zêde kiriye. Niha nêzikî 20 navendên me hene. Hem xebatên giştî, hem jî xebatên xweser yên jinê di van navendan de tê pêşxistin. Çanda Kurdî û şoreşgerî her ku diçe berz dibe.

## BEŞA SEYEMÎN
## DI ŞOREŞA ROJAVA DE PÊŞKETINA HÊZÊN PARASTINÊ

### 1-Li Rojava Avabûna Hêzên Parastinê; YPG

***-Weke ku em ji pêşketinên ku hatine jiyîn jî derdixin, di şoreşê de risteke girîng a parastinê heye. Xebatên parastinê yên şoreşê li ser kîjan esasî û çawa pêş ketin?***

**MERYEM KOBANÊ:** Ji bo sîstema ku em dixwazin bidin avakirin, pêwîstî karekî berfireh hebû. Milekî pergalê perwerdehî ye, milek rêxistinkirin e, milek leşkerî ye, milek siyasî ye, milek aborî ye. Ya herî girîng û lezgîn mile wê yê parastinê ye. Ji bo wê jî hewceyî hêzek leşkerî hebû.

Destpêkê bi hucreyên biçûk, me destpêkir. 2004'an de jî hinek hêzên biçûk hatibûn avakirin. Wekî din jî hêzên me yên veşartî jî ava bibûn. Hemû cihên Rojava yên wekî Heseke, Serêkaniye, Amûde, Qamişlo, Til Temir û hwd cihên Sûrî yên Kurd lê heyî amadekariyên leşkerî hatin çêkirin. Heta demekê xebatên leşkerî jî di nava yên civakî de dihatin meşandin, ji ber ku veşartî dihatin kirin.

Di pêvajoya destpêkirina şoreşê de hem ji aliyê xebatên leşkerî, hem jî aliyê xebatên civakî ve, taybetî di pêşengtiya hevalên jin de xebat hatin meşandin. Jinê di pêvajoya şoreşê de pêşengtiyek xurt kir. Ji bo wê jî Şoreşa Rojava wek şoreşa jinê tê binavkirin. Di destpêka şoreşê de her malekê ji bo ku em fîşekan bikirin me pere kom dikirin. Weke xebatkaran mehê du caran yan jî carekê me viya dikir. Ji bo ku em xwe bi xwe bidin meşandin viya girîng bû. Bi rastî jî derfetên me yên kirîna çekan zêde nebûn. Me her malekê çend kes rêxistinkiribûn. Me ji wan re got, "*ger kesên ku bê bawer jî bin wana jî rêxistin bikin.*"

Hucreyên ku perverde dibînin pêwîst e ji penç kesan neborin. Perwerde jî herî zêde sê rojan bidome. Ew jî ya bi şevê bi awayekî dizî, yan jî li gundekî me dida. Piranî jî me teoriya wê dida, kêm caran me pratika wê dikir. Pergala me ya leşkerî piraniya xwe li ser vê esasê hat çêkirin. Me ev grûp ser esasa; çawa xwe biparêze û li ser esasê dîroka Kurdistan'ê perverde dikirin. Dîroka xwe zanîn

girîng bû bêgûman. Ji ber ku di dîrokê de her tim Kurd hatibûn xepandin. Vê carê jî rejîma BAAS xwest me bixapîne. Digot; *"werin em bi hevre şer bikin, pişt re jî emê mafê we bidin."* Hêzên muxalefetê jî digotin; *"werin bi mere bin, lê bi navê hêzek muxalîf tevbigerin."* Em wekî xwe nedigirtin dest. Dixwestin wek Kurdên berê, Kurdên kole, xizmeta dijminê xwe dike me kar bînin. Lê dîtin ku Kurd êdî ne Kurdê berê ye. Çavê xwe vekirî ye, xizmeta tû kesê jî nake.

Wekî din me piranî perwerdeyên xwe, ser esasa *"ka em ê çawa ji dewletê feyde bigirin, di bajaran de em ê çawa tevbigerin?"* dida. Ji ber ku ew ne malê dewletê ye malê vî gelî ye. Mafê gel heye ku bikarbîne.

Ji aliyê heza me ya leşkerî ve pêwîstî xurtkirinekê hebû. Dema Şehîd Xebat ser qûwetên leşkerî bû, me bîryar girt ku em hêza leşkerî wek yekîneyên tîm hwd ava bikin. Em êdî îlana qûweta xwe bikin, ger dewletê xwest bikeve cihê me de em nehêlin. Eger yêk ji milet were girtin em jî biçin yê dewletê bigrin. Ji bo ku baweriya gel xurt bibe me xwest bi hêza xwe ya leşkerî xwepêşandanekê çêbikin. Wê deme bi şev viya hat çêkirin.

Hê şoreş nehatibû îlankirin şahadeta Şehîd Xebat çêbû. Hê hevalê Xebat birîndar, di nexweşxaneyê de bû, me bîryar girt ku em tolhildana hevalê Xebat bigirin. Ji ber ku dê çavê gel tirsiyaba, ser wê esasê hê Ş. Xebat di nexweşxaneyê de bû, me tola wî girt. Hevalên me bi çekdarî ketin nava wan kesan û pêş çavê herkesî tola hevalê Xebat girtin. Wekî din cara yekemîn bi rengekê bi bandor merasîma cenaze çêbû. Viya jî hişt ku ser gel bandoreke mezin çêbike. Di nava civakê de giraniyek hêza me çêbû. Ji xwe hêza me ya leşkerî bi navê YXK hatibû avakirin. Cihê ku nehatibû avakirin jî hat avakirin.

Wêne-33

Pêvajoya xwe komkirinê, xwe avakirinê rûxmî her cûreyê êrîşan me ser xist. Civînên me yên ji vir şûn ve, her meh me bîryara hemleyên nû digirtin. Bi rastî jî şev, roj, seet çawa derbasdibin me nedizanî. Her gavêk pêşketinek dihat çêkirin. Li hemberî me her roj êrîşên cûr bi cûr dihatin çêkirin. Hema hema ji milê siyasî ve em dihatin recmkirin.

Dewlet jî êdî ketibû ferqa hêza me. Mînak rojekê endamên me hatin girtin roja din me endamên rejîmê digirtin. Me di civînên xwe de bîryar girtibû ku em li hemberî rejîmê derkevin, nehêlin bikevin taxên me, em barîkatan deynin ji bo ku hêza me bizanibe. Piştî şahadeta Şehîd Xebat hem hêla leşkerî, hem jî ji milê siyasî ve em ketin pêvajoyeke nû.

***-Ev serdema ku hûn weke pêvajoya nû pênase dikin, hûn dikarin hinekî din şênber bikin?***

Piştî şahadeta Şehîd Xebat em dikarin bêjin me di qûweta xwe de nûbûyîn ava kir. Me bi viya ve peyamek da dijmin ku şahadeta Şehîd Xebat bû vesîleya nûbûyîna qûweta me yê leşkerî. Êdî hêzên me di akademiyan de perwerde didîtin. Heta akademiya me ya yekemîn li Efrîn'ê hatibû avakirin. Me hêzên xwe bi veşartî, bi hejmareke biçûk dişandin Efrîn'ê. Wê deme perwerdeyên me 15-20 roj bûn. Ji hemû bajaran heval diçûn perverde didîtin. Pişt re hêdî hêdî îlankirina artêşê di nava gel de dihat çêkirin. Destpêkê bi şev îlan dihate kirin. Milê Dêrik, Qamişlo, Tirbespiyê, Serêkaniyê, Amûdê hat îlankirin. Ji ber ku şev dihate kirin hinekê jî sir, hinek veşartîbûn dixistê. Viya jî di nava gel de baweriyek çêdikir. Di nava yên ku em nasnedikirin de jî meraqek dida çêkirin, ka em kîne, em ê çi bikin. Yanî her du milan ve bandorek erênî çêdibû.

Li ser dewletê jî psîkolojiyek cuda dihat avakirin. Ew rêbaza me ya propaganda pir di cihê xwe de bû, bandora xwe hebû. Rejîmê li hembere me antîpropagandayek cidî dimeşand. Şerê psikolojik di asta jor de dikir. Wexta ev tişt dihatin kirin milê Dera, Helep û Şamê şerekî mezin dimeşiya. Em li gorî her kesi zêdetir rêxistinkirîbûn. Wê deme avakirina meclîsan, xebatên leşkerî hemû bi hev re dihatin meşandin.

Piştî wê me bîryar girt ku her hevalek li bajarekî, bi taybetî li ser xebatên leşkerî bisekine. Piştî şahadeta Şehîd Xebat me bîryar girt ku em kordînasyoneke ji pênç kesan ava bibe derxin. Ji van, du hevalên jin sê hevalên xort bûn. Piranî dê bi xebatên şer re mijûl bibin, ji derveyî viya van hevalan tû karên din nekin tenê rêxistinkirina xebatên leşkerî bikin. Wê deme cara yekemîn di 2012'an meha

Sibatê de li Helebê civîna me hat çêkirin. Di wê civînê de me cara yekemîn sembola ala xwe û navê hêza xwe ya leşkerî diyar kir.

Ji vir şûn ve bi hemû awayan me xwest em pergala xwe cih bikin. Mînak me navê hemû gundan veguhert Kurdî. Ji bo parastina taxan di hemû deran de me dewriye derxistin. Êdî me nehêla ku dewriyeyên rejîmê derkevin. Me ji wan re got: "*Ger tiştekê dij viya bikin, hûnê li rastî berteka me werin.*" Piştî wê wan jî êdî nedikarîn dewriyeyên xwe derxin. Di hinek xetên sînor de me xwest em xwe hakîm bikin.

Wêne-34

Her roj gavên nû dihatin avêtin, pêşketinên nû çêdibûn. Hem ji aliyê siyasî ve, hem ji milê leşkerî ve roj bi roj guhertin dihatin çêkirin. Her kes bi baldarî em teqîp dikirin. Her ku diçû hijmara me zêde dibû. Em jî, ji bo ku felsefeya Rêbertî ya civakeke exlaqî û polîtîk bidin rûnişkandin di hewldanan de bûn. Heta 2012'an meha heştan beriya şerê Serêkaniyê meşen înê, civînên gel, perverdehiyên me didomiyan. Piştî viya her ku çû me otorîteya xwe zêde kir.

***-Dema ku we bi awayekî çalak rêxistinbûna leşkerî pêş dixist, li hemberî vê helwesta rejîma Sûriyê û Tirkiyê çawa bû?***

Bêgûman planên dijmin yên ku nedihêlişt pêşketin bidomin hebûn. Lîstokên derve pir zêdebûn. PDK dijmintiya Şoreşa Rojava di asteke bilind de dikir. Ji bo ku li ser Cizîrê hakîm bibin, PDK dixwest sînoran bigire. Ji bo wê jî ew sînorên di navbera me û PDK'de me girtin. Hemû planên di nava Şoreşa Rojava de, deste Tirkiyê hebû. Dewleta Tirk di nêz de çete xwedî dikirin, perverde dikirin, rê nîşanî wan didan. Gorî agahiyên ku me digirtin ew cihên ku petrol lê zêde, van dixwestin bikevin tê de.

Di wê pêvajoyê de, pêwist e me ew planên hene vala derxistibana. Me li ser vê esasê tedbîrên ewlekariyê zêde kirin. Piştî demekê me Dêrik girt. Di wir de şahadeta Heval Bawer çêbû. Ez dixwazim di vir de tişteke girîng bêjim; ji bo ku şaştî çênebe. Piştî Şehîd Xebat, şehîdê me ye yêkemîn Heval Kemal bû. Ji aliyê rejîmê ve hevalê me yê yêkemîn şehîd bû, Şehîd Kemal bû. Şehîd Kemal li bajarê Dirbêsiyê şehîd ket.

***-Ev bûyer çawa qewimî?***

Ev bixwe ciwanekî ji Dirbêsiyê bû. Tevlî YXK bibû. Dema ku bi rejîmê re dikevin pevçûnê şehîd dikeve. Yanî ew pêşiya Şehîd Bawer şehîd dikeve.

Ji vir şûn ve nakokiyên me û dewletê zêde bûn, ji ber ku du hêzên leşkerî beramberî hevdû şer dikin. Êdî parastina heremê, parastina taxan, bajêran zêde dibû. Viya jî qonaxek nûbû ji bo me. Ji bo ku weke hêzeke leşkerî em xwe rêxistin bikin û gavên nû biavêjin, ew yek ji bo me girîng bû.

Pergala me wek du herêman xwe saz kiribû. Yêk ji wan hêremên Helep, Kobanê, Efrînê pêk dihat; ya duyemîn jî bajarên Cizîrê bûn. Ji derveyî van me li Şam'ê jî xwe bi rêxistin kiribû. Sala 2012'an her rojekê wê gavên nû têde dihatin çêkirin. Sala 2012'an ji bo şoreşê, hem di mile leşkerî, him siyasî, him civakî ve saleke pir girîng bû. Taybet ji bo xebatên leşkerî, rojane pêşketin çêdibûn. Carna di kêliyê de valatî derdiketin, pêwîstbû em wan valatiyan dagirin. Rastî jî zor û zehmetiyên wê jî zêdebûn. Lewma tecrubeyên me yên di şerê bajaran de zêde nebûn. Projeya Serokatî cara yêkê me dê li bajaran de pêkanîba.

Xeşîmîyên me pir zêde bûn. Em fêrbûbûn, bi yêk rengî xebat bikin, lê di pêvajoya şoreşê de em bi her rengî xebat kirine fêrbûn. Him di alî gel de pêwîst bû em xebateke rast bikin, him di alî leşkerî de hewce bû ku em xwe xurt bikin. Ya rastî pêvajoyekî hesas bû. Pêwîst bû em gavên xwe pir baş biavêjin. Her tişteke ku me dikir ji me re tecrûbeyek nû bû.

***-Di nava wan pêşketinan de di vesazbûn û perwerdehiyên we yên leşkerî de guhertineke çawa çêdibû?***

Sala 2012'an meha 4'an şûn ve hinek rewşa şoreşê hat guhertin. Li ser vê esasê me xwest em hinek guhertinan çêbikin. Mînak me di akademiyan de hejmara perwerdê zêde kir. Berê perverde 3 rojbûn, me kir hefteyek. Me bernameyên xwe ji bo her bajarekî derxistin. Divê hêza parastinê me li her deverê bi taybetî jî gundan pêş bixin. Gund ji ber ku ji dewletê dûr in parastina xwe dikarin bi hêsanî û zêdetir bi xwe bikin.

Niha di dîrokê de li Rojavayê Kurdistanê pir zêde li hemberî dewletê isyan çênebibû. Ji ber ku politikaya asîmîlasyonê pir zirav dihat meşandin. Belkî di perçeyên din de şer û serhildan çêbibûn; lê di Rojava de ew tecrûbe jî nebûn. Rûxmî ku gelek keç û xortên li wir tevlî PKKê bibûn û bi salan li çiyayên Kurdistan'ê şer kiribûn, lê gelê vê derê bixwe zêde şer nedîtibû. Lê rûxmî viya jî şoreşeke serkeftî pêk hat.

Me got, sala 2012'an şûn ve em ketin rewşeke nû. Me li Efrîn, Kobanê, Helebê rêxistinbûyîna xwe zûtir kir. Ji ber ku li wan deran hêzên cûda cûda ketibûn dewrê. Hêza me ya leşkerî li wan deran vekirî tevdigeriyan. Me di sala 2012'an de tabûran îlan kirin. Piştî sînorên Dêrik'ê me girt, me ev bîryar da. Pêşiya ku em tabûran avabikin li Efrîn'ê şahadeta Şehîd Çekdar çêbû. Şehîd Çekdar endamê Ciwanên Şoreşger bû. Roleke xwe yê girîng hebû. Piştre ji bo ku em di her bajarekî de hêza xwe ya leşkerî mezin bikin û bandor bikin me bîryar da ku em alayan avabikin.

Me wê deme sîstema Cizîrê kiribû sê beş. Beşek Dêrik, Girkê Legê, Çilaxa bû, viya weke eyaletekê bû. Eyaleta din jî Qamişlo, Tirbespiyê bû; eyaleta din jî Dirbêsiyê, Serêkaniyê, Hesekê, Amûdê, Til Temir bû. Ev guhertin hinek jî girêdayî rewşa siyasî hatin çêkirin. Ji ber ku lîstokên pir dewletan di Şoreşa Rojava de hebû. Artêşa Azad, xwe derdoran cih kiribû. Ji ber viya pêwîst bû em di mile leşkerî de xwe hîn zêdetir rêxistin bikin.

Bajarê Kobanê, bajarê yekemîn ku me ji deste rejîmê rizgarkirî bû. 19'ê Tîrmeh'ê de bajarê Kobanê hat rizgarkirin. Planên me beriya wê jî hebûn ku em rejîmê ji hinek bajaran derbixin. Me digot, em ê destpêkê ji Efrîn'ê derbixin. Ji ber rewşê wisa rê da, me şoreş bi Kobanê destpêkir. Wê deme di rêveberiya Kobanê de Hevala Jînda, Hevalê Kendal hebû. Hevalê Kendal Efrîn piştre di şerê Kobanê de şehîd ket. Heval Jînda jî li Efrîn'ê şehîd ket. Wê deme artêşa azad ji bo ku hinek cihan bigre, li milê Minbic û Cerablûsê ketibû nava tevgerê. Ji bo wiya, me tedbîrê wê jî digirt.

Wêne-35

***-Îlankirina hêzên leşkerî we kengê kirin, bingehek siyasî û leşkeri ya çawa hebû?***

Roja 19'ê Tîrmeh'ê me dest bi rizgarkirina Kobanê kir. Bi viya ve me îlankirina YPG jî kir. Ji ber ku êdî meşrûiyeta me derkete holê. Ji bo ku em ji dewletê re bejin: "*Em li vir in, hûn nikarin wek berê tevbigerin!*"

Alaya yekemîn li Kobanê bi navê Şehîd Sadiq hat avakirin. Ev alay ji bo biranîna hevalê Sadik avabû. Ya rast bi avakirina alayan ve, me xwest em propaganda xwe ya leşkerî jî bikin. Bi viya ve çavê dijmin jî tirsiya. Piştî alaya Şehîd Sadiq, me ya duyemîn li Qamişlo ava kir. Taybetmendiyê Qamişlo jî ji ber ku di herêma Cizîrê de bajarê herî mezin bû. Li wê dere di navbera me û dewletê de pevçûnên biçûk derketibûn. Me ji rejîmê re dida nişandan ku eger tevbigere, pêwîst e hesabê me jî bike. Li gorî wiya gavên xwe biavêje.

Roja 10'ê meha 4'an ya 2012'an li Qamişlo Alaya Şehîd Sarya hat avakirin. Wê deme di bin fermandariya Şehîd Devrîm de qûweteke leşkerî ya nêzî 2 hezaran kesan pêk dihat, kûçeyên Qamişlo xwe pêşandan kirin. Viya baweriyek xurt di civakêde pêş xist. Di rejîmê de jî tirsek avakir. Ji bo ku hêza me were dîtin viya girîng bû.

Li Efrîn'ê jî, 14'ê meha 12'an alaya Şehîd Çekdar hat avakirin. Şehîd Çekdar jî di şoreşê de roleke girîng dileyîst. Sedemê avakirina alayan; him mile leşkerî, him mile siyasî hebûn. Milê Helep, derdorê Efrîn'ê gelek cihê ku dewlet lê heyî ji deste dewletê hatibûn girtin. Ya rastî dixwestin êrîşê li cihê Kurdan jî bikin. Dixwestin me bikişînin nava şerekî de.

Tabûra Şehîd Hogir li Dirbêsiyê hat avakirin. Şehîd Hogir ji aliyê dewleta Tirkiyê ve ser sînorê Dirbêsiyê hat şehîdkirin. Li Serêkaniyê tabûra Şehîd Erdal hat avakirin. Xeteriya Serêkaniyê, ji ber ku nêzî dewleta Tirk bû, deriye Tirka ve dixwestin qûwet bişînin, hinek cihên weke Til Ebyed hatibûn

girtin. Ji bo wiya li ser Serêkaniyê xeterî hebûn. Me destpêkê bîryara xwe li ser esasa ku em alaya yekemîn li Serêkaniyê avabikin dabû. Lê ji ber ku şert û merc ne guncav bûn, viya pêk nehat. Tabûra Şehîd Erdal bi 150 zêdetir endamên xwe 24'ê meha 10'an de hat avakirin.

Di vê deme de li Helebê şerê me û rejîmê derket. Em ketin pêvajoya xwe parastinê. Li ser vê esasê divê li kûdere Kurd hebin xwe biparêzin. Me bîryar girtibû ku di her bajêrî de *Konseya Leşkerî* ya me hebe. Mînak li Helebê hevalê Zekeriya endamê Konseya Leşkerî bû. Ev heval zewicîbû, zarokê xwe jî hebûn.

Piştre me li Hesekê tabûrek avakir. Hejmara wê jî nêzî 180 kesan bû. Ya rastî qûweteke wisa ve tabûr îlankirin xeteriya xwe jî hebû. Ji ber ku li Hesekê dewlet li hemû cihan heye. Dewleta Sûrî pir girîngî dida Hesekê. Weke navenda wî bû. Ji bo wiya jî wexta me tabûr li wir îlankir, herkes hinekî şaş ma. Li Girkê Legê jî tabûra Şehîd Bawer hat avakirin.

Bêgûman kêfxweşiya hêza leşkerî di nava bajaran de avakirin pir cuda bû. Di dîrokê Rojavaye Kurdistan de cara yekemîn hêzeke leşkerî ya Kurdan temsil dike hatibû avakirin. Viya jî him di aliyê bandorkirina civakî, him ji xwe bawerbûyînê de cudatiyek derdixist holê. Her tim ji Kurdan re digotin: Tu nikarî bikî! Cara yekemîn derketibû holê ku Kurd dikarin pir tiştî bikin. Girîngiya hêza leşkerî jî mezin e. Ji bo ku mirov bikaribe xwe biparêze pêwîstî vê hêzê heye.

Piştî demekê berpirsiyara Helebê Hevala Nûjîn, ji aliyê Cebhet El Nûsra ve hat girtin û radestî Tirkî kirin. Viya jî karkirina Tirkiyê bi çeteyan re dida berçav. Wê deme hevalan 13 kesên wan kûştibûn, 16 kesên wan jî esîr girtibûn. Wan jî hinek kesên ji gel esîr girtibûn. Wexta heval Nûjîn ji bo hevdîtinê diçe cem wan tê girtin. Li ser hevalên me komplo çêdikin.

Wê deme şûn ve em ketin pêvajoyeke ku cihê em bigirin em biparêzin. Cihên weke Efrîn, Kobanê, hinek cihên Cizîrê me girtibûn. Li Cizîrê jî cihên weke Dêrikê hê rejim hebû. Me dixwest em bi temamî rejîmê ji Dêrîkê derxin. Jixwe li Dêrikê şahadeta Heval Bawer çêbû. Ew jî ciwanekî ji Rojhilatê Kurdistanê bû. Heta wê deme em ser rêxistinkirinê, parastina taxan disekinîn.

Ji vir şûnde pêwîstî hebû ku emê xwe berfirehbikin, netewên din jî tevlî rêxistinê bikin. Ji ber ku projeya Serokatî projeya netewa demokratik bû. Lêgerînên me yê ku em bi netewên din re bikevin diyalogê çêdibû. Him di leşkerî, him di siyasî de lêgerînên me yên ku em wan jî tevlî şoreşê bikin hebûn. Jixwe wek felsefeya Serokatî pêwîst bû wisa bibe. Ji bo ku em serbikevin yekitiya gelan pêwîst bû. Destpêkê baweriya wan pir zêde nebû. Ditirsiyan. Digotin: "*gelo van dê bikaribin ew qasî bajaran biparêzin.*"

***-Weke fermandarekî we di nava xebatên YPG'ê de cih girtiye. Li gel pêşketinên siyasî ku çêbûne û şerên ku derketine, YPG xwe çawa pêş xist û di nava şoreşê de risteke çawa lîst? Ango pêşketina YPG'ê ji ber kîjan pêwîstiyan bû?***

**HARUN QAMIŞLO:** Weke kesekî ji Rojavayê Kurdistanê, dema ku şoreş destpê kir; di Sibata 2012'an de min dest bi xebata şoreşê kir. Destpêka şoreşê bû. Şoreşa li Sûriyeyê jî ne li Kurdistanê; li Dera, ango bajarê Ereban pêş ket. Vê bandora xwe li Kurdistanê jî kir. Gelê Kurd jî ketibû nav coşekê.

Bêguman di çûyîna me ya Rojava de armanceke me hebû. Diviyabû me hêza xweparastinê ava kiriba. Me destpêkê zehmetî kişand. Perwerdekirina gelekî, biçekkirina gel wer ne hêsan bû. Bêguman beriya wê şehîd Xebat gavên wê avêtibûn. Yekîneyên Xweparastina Kurdistanê (YXK)'ê hebûn. Ne Yekîneyên Parastina Gel bûn. Piştî konferansê ew pêk hat. Ji ber em wê dema destpêkê lewaz bûn. Me hê pergala xwe ava dikir. Me bi vî rengî kar kir.

Di milekî de jî meclîsên gel, xweserî dihatin avakirin. Li aliyê din jî xebatên avakirina parastina gel dihat kirin. Li aliyê din jî xebatên ji bo dewlet dest ji şîdetê, komkujiyên li hember gel berde dihatin meşandin. Bi vî awayî gel hêdî hêdî radibû serhildanan. Xebatên destpêkê zehmet bûn. Derfet kêm bûn. Bi her ciwanekî Kurd re axaftin, ew îqna kirin, amadekirin, perwerdekirin pêk dihat.

Di destpêkê de ne bi rengê tabûr û bolûkan bû. Du kes, sê kes weke yekeyeke biçûk, me di odeyan de ew perwerde dikirin. Heta me ji wan re digot ku "*pêwîst e hûn xwe ji malbat, dayik û bavên xwe veşêrin.*" Me nedihişt xwe aşkera bikin. Ji ber hê dewlet di Kurdistanê de hebû. Li ser piyan bû. Me bi vî awayî xebatên xwe dimeşandin. Di nav van xebatan de ne tenê hevalên xort bûn. Hevalên jin jî di nav vê xebatê de cih digirtin. Hêdî hêdî hêzek derdiket holê. Li her taxekê komên cuda cuda diha-

tin çêkirin. Di heman demê de, kom bi şev, bi awayekî rûyê wan girtî û bi çek di nav kolanan de digeriyan. Vê bi serê xwe bandorek li ser gelê Kurd çêkir. Ango êdî hêzek heye wê wan biparêze. Di dirûşman de êdî gotina, *"ne Artêşa Azad, Artêşa Gelê Kurd"* derdiket pêş. Dema gel êdî daxwaza xweseriyê dikir, bawer dikir. Ji ber êdî hêzeke leşkerî bi çek dîtibûn. Ev kom di civînan de, di bin konê şînê de derketin holê û propagandaya xwe kirin. Vê bandoreke mezin li ser ciwan û gelê Kurd çêkir. Bi vî awayî tevlîbûn çêbûn.

Di wê pêvajoyê de ku dewletê dît, em xwe rêxistin dikin êrîş li hemberî me pêk hatin. Bi awayekî nemerd li hemberî me êrîş pêk hatin. Ev pêşketin li Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê, Serêkaniyê bi giştî li kantona Cizîrê pêş ketin. Dewletê dest bi girtina ciwanên Kurd kir. Bêguman beriya wê hêzên xweparastinê hatibûn avakirin. Em li hemberî wê bêdeng neman. Ji ber em êdî ketin pêvajoyeke ku pêwîste tu xwe ji gel re îspat bikî. Em neçar bûn êdî gavên ji bo parastina gel pêş bixin.

**Gel Bi Keviran Li Hêzên Dewletê Xist**

Dema ciwanên Kurd girtin birin leşkeriyê me jî endamên leşkerî yên dewletê girtin. Ev pêngaveke yekemîn bû. Me nizanîbû wê piştî wê çi biqewime. Lê me xwest em nîşan bidin ku em ê nehêlin ji îro û pê ve ciwanên Kurd biçin leşkeriya Sûriyeyê bikin. Ji ber civînên me ji ciwanan re çêdikirin li ser vî esasî bûn. Her wiha endamên meclîsê me girtin. Ciwanên ji leşkeriyê reviyan girtin. Helwesta me li hember wan dijwar bû. Me jî yên wan girtin. Dewlet matmayî bû. Wer digotin ku Kurdên piştî 12'ê Adara 2004'an pûç kiribûn, 33 ciwanên Kurd qetil kirine û li gor wan êdî Kurd nînbûn. Digotin, *"bê nasname ne, jixwe ne hemwelatiyên me ne, ji derve hatine, em wan xwedî dikin."* Me ji wan re got ku *"yan hûn ê ciwanên me berdin, an jî em leşkerên we bernadin."* Bi vî awayî aloziyekê rû da. Her wiha cara yekem dewlet di vir de li mile Cizîrê şikest. Dewletê wê demê tawîz da. Wan ciwanên me berdan, me jî leşkerên wan berdan.

Vê bi serê xwe di nav gelê Kurd de bandorek çêkir. Tevlîbûn hê zêdetir bû. Di wê pêvajoyê de li Serêkaniyê du ciwanên me yên kadro girtin. Li hember vê nerazîbûnên gel derketin holê. Gel derdora hêzên dewletê girt û gotin, *"em hevalan dixwazin."* Bi keviran li hêzê dewletê xistin. Dewlet di vir de pir tengav bû. Saet 12'ê şev, ew her du heval berdan. Her du ciwan jî endamên hêza xweparastinê bûn. Li Kantona Cizîrê du gavên wiha derketin pêş. Bandora xwe pir zêde li gel kir. Coşek ket nav gel. Meclîs hê xurtir bûn.

Piştî avakirina komun û meclîsan gavên berbiçav dihatin pêşxistin. Hêza me ya xweparastinê jî derdiket pêş. Piştî destkeftiyan em êdî daketin bajaran. Yanî êdî kolan û bajarên xwe me bi xwe tenzîm kiriba. Me ji wan re got ku "*êdî mafê we nîne hûn pergalekê li ser vî gelî ferz bikin*." Wê demê bertekên wan jî derketin holê. Digotin, "*hûn kî ne, da ku hûn tiştekî wer bikin, hûn Kurd ji kû derê derketin?*"

Wê demê êdî pergal dihat bicihkirin. Bajar êdî gel bi rê ve dibirin. Vê bandoreke zêde çêkir. Wê demê jî hinek ciwan girtin. Lê êdî helwestên hêzên çekdarî derketin holê. Bi vî rengî çalakiyên leşkerî dest pê kirin. Leşker hatin girtin. Alavên wan ên leşkerî hatin desteserkirin. Me di vê de israr kir. Partiyên din jî li hember me têdikoşiyan. Digotin, "*hûn gelê Kurd dibin komkujiyan."* Di pêvajoyeke wiha de ku tu ji gel re dibêjî, "*êdî tê xwe bi rê ve bibî*." Tu saziyan ji destê dewletê derdixê û dikê malê gel. Vê bandor û coşek mezin di nav gel de çêkir. Her ku çû tevlîbûna gel zêdetir bû. Hêzeke wer mezin a leşkerî jî derdiket pêş. Di Newrozê de ku ji bo gelê Kurd xwedî wateyeke girîng e, parastina gel bandoreke pir mezin çêkir.

***-Di serdema ku hûn qala wê dikin de, ne tenê li Rojava hemû Sûriyê rêveberî dest diguherînin. Di xwedî lê derketina gel û Şoreşa Rojava de cudahiyên bingehîn çibûn?***

Li milekî jî Artêşa Azad bajarên Sûriyeyê dixe destê xwe lê bi awayekî ku talan dike weke pêlekê dihat. Şoreşa 19'ê Tîrmehê ne bi vî rengî bû. Dema saziyên dewletê hatin desteserkirin, qirşek ji cihê wê neleqand. Bêguman vê bi serê xwe bandorek kir. Talan nedikir; berevajî ava dikir. Di vî milî de şahî û coşa gelê Kurd bi çend gotinan nayê îfadekirin.

***-Gelo we roja 19'ê Tirmehê bi plan pêk anî, an bi awayekî xwezayî pêş ket?***

Bêguman 19’ê Tirmehê rojeke plankirî bû. Beriya wê amadekarî û plansazî hatibûn kirin. Ne gaveke wer ji rêzê bû. Êdî şert û merc gihiştibûn ku gavek hê mezintir bê avêtin. Beriya 19’ê Tirmehê, ez texmîn dikim 17 an jî 18’ê Tîrmehê bû. Li Şamê civînek hat lidarxistin. Ev li Sûriyeyê bû krîzek. Dema ew kriz û valatî derket holê, meclîsê dest danî ser hemû saziyên dewletê. Bêguman beriya 19’ê Tîrmehê ji bo gel û meclîsê civîn hatin lidarxistin. Wê kî biçe ku derê bigire, hatibûn nîqaşkirin. Bi vî awayî hemû saziyên dewletê hatin desteserkirin.

Di vê demê de YPG hat îlankirin. Hevala Jînda hebû, bi eslê xwe ji bajarê Til Temir e. Em bi vê wesîleyê vê hevalê bi bîr tînin. Di berxwedana Efrînê de şehîd ket. Dijmin êrîşî girê hevalan kir. Heval Jînda bi berxwedaneke mezin heta guleya xwe ya dawî şer kir û şehîd ket. Hevala Jînda wê rojê ji raya giştî ya cîhanê re diyar kir ku ji îro û pê ve em ê vî bajarî bi rê ve bibin. Li Bajarê Kobanê ev îlan kir û got ku wek Yekîneyên Parastina Gel (YPG) wê êdî bajarê Kurd bi xwe biparêzin.

Vê bangê di nav raya giştî ya cîhanê de deng veda. Hat gotin ku, *“bajarekî Kurdan li Rojavayê Kurdistanê ketiye destê hêzên Kurd ên bi navê Yekîneyên Parastina Gel.*” Berê hêzên me, Yekîneyên Xweparastinê (YXK) bûn. Hêdî hêdî pêngav hatin pêşxistin. Yekîneyên Parastina Gel (YPG) hat avakirin.

***-We çima navê rêxistina xwe ya parastinê weke ‘YPG’ bi nav kir?***

Ev nav ne tenê ji bo gelê Kurd, tê wateya parastina tevayî gelên li Rojavayê Kurdistanê dijîn. Navê YPG’ê wer ji rêzê nehat hilbijartin. Ji ber em Sûriyeyeke demokratîk û Kurdistaneke Xweser dixwazin. Em dibêjin mafê her neteweyî heye ku di nav axa Sûriyeyê de bijî. Li ser vî esasî di destûra bingehîn a Sûriyeyê de divê guhertin pêk bên. Ne li ser esasê şîdetê li ser esasen demokratîk divê bê avakirin. YPG li ser vî esasî derket holê. Hêdî hêdî dest bi parastina van bajaran kir.

Di vê pêvajoyê de êrîşên Meclîsa Wetanî pêk hatin. Li hemberî me têkoşiyan, xebat meşandin. Digotin, “*em careke din bang li Artêşa Azad dikin, em nikarin bajaran biparêzin divê Artêşa Azad biparêze û hwd.”* Digotin, “*ew yekîneyên parastinê ji ku derê derketin.”*

Bi pêngava 19’ê Tîrmehê re li bajarên din jî tevgerîn çêbû. Di nav gel de coşek mezin çêbû. Piştî pêngava 19’ê Tîrmehê ya li Kobanê pêngava Efrînê dest pê kir. Li Efrînê jî bi awayekî bi plan meclîs hemû ketin nav tevgerê.

Bêguman hinek cudatiyên Kantona Cizîrê hebûn. Pêngava 19’ê Tîrmehê li herêma Cizîrê li Amûdê, Qamişlo, Dirbêsiyê û Dêrikê dest pê kir. Li Amûdê hinek saziyên dewletê hatin desteserkirin. Bi pêngavên li Kobanê û Efrînê re hinek guman çêbûn. Ji ber dewleteke faşîst heye. Gengaz bû balafiran bişîne û gelê li wir qetil bike.

Di vê pêngavê de gel û YPG’ê bi hev re tevdigeriyan. Eger gel ne amade bûya gaveke wiha mirov nikarîbû bavêje. Piştî mehek - meh û nîvekê li bajarên Cizîrê yên wek Dêrikê jî gel ket nav tevgerê. Amûdê û Dêrikê bi temamî ji hêzên dewletê hatin valakirin. Êdî di vê pêvajoyê de xebatên leşkerî jî bi awayekî zêde dihatin pêşxistin.

Bi pratîka YPG’ê ya di şerê Serêkaniyê de hat nîşandan, pêşniyar hat kirin ku lidarxistina konferanseke leşkerî pêk bê. Ji ber ku hê rêvebernameya wê ya fermî, bername û armanca wê nehatibû diyarkirin. Li gor wê amadekarî hatin kirin ku konferansa YPG’ê bê lidarxistin. Bîryar hat girtin ku ji Kobanê û Efrînê jî delege tevlî konferansê bibin. Bi giştî 350 heval tevlî konferansê bûn.

Di wê demê de di navbera kantonan de çûn û hatinek hebû, bes çawa hebû. Li gor peymana rawestandina şer, çûn û hatinek hebû. Lê dema şer rê hatibûn girtin. Jixwe di êrîşa li hemberî Serêkaniyê de armanca wan diyar dibû. Dixwestin bajarên Kurdan ji hevdu qut bikin.

-***Em li ser YPG û YPJ’ê hinekî din dixwazin biaxifin. Di avabûn û şêwegirtina van hêzan de tiştê ku esas dihate girtin çi bû?***

Ya rast şêwegirtina YPG’ê bi konferansa ku me berê behsa wê kiribû çêbû. Vê konferansê heft rojan berdewam kir. Bîryarên pir girîng hatin girtin. Di konferansê de ‘*ji nû ve xwe avakirin, amadekirina rêziknameyê, em ê çawa tevbigerin û tevlî bibin’* hatin destgirtin. Hin ji van bîryaran ev bûn ku bajar bajar konseyên leşkerî, meclîsên leşkerî bên avakirin. Ev gav bi gav hatin avakirin û di heman demê de bîryar hat girtin ku Konseya Leşkerî ya YPG’ê bê avakirin. Li gor vê bîryarê jî Konsey hat avakirin. Bi vî awayî li Kobanê, Efrîn û Cizîrê hêzeke leşkerî bê avakirin. Bîryar hat girtin ku ala YPG’ê bê guhertin.

Ala berê sor bû û stêrkeke kesk di nav de bû. Paşê ew jî hat guhertin. Al, di zemîneke zer de derdora wê kesk û stêrka sor li ser hat çêkirin.

Di vê pêvajoyê de hewldanên *Meclîsa Wetanî* jî hebûn. Destkeftiyên ku hêdî hêdî dibin malên Kurd hebûn û derketina hêza leşkerî pêş diket. Hevdîtin bi wan re hatin kirin. Xwestin ew jî tevlî vê hêza leşkerî bibin. Di bin banê YPG'ê de kar bikin.

Beriya wê bi hewldanên PDK'ê ve yên ku digotin, *"em ê di bin navê pêşmergeyan de biçin, xwe rêxistin bikin"* hebûn. Lê piştre gotin, *"em ê di bin vê sîwaneyê de xwe rêxistin bikin*." Hevdîtin bi wan re çêbûn. Bîryarên girîng hatin wergirtin. Hinek ji wan partiyan tevlî bûn. Lê ev neçû serî ji ber ku dîtin ev ne li gor berjewendiyên wan e û li hemberî wê kar kirin. Ji ber yekîtiyeke wan a siyasî derneketibû holê wê çawa di nav YPG'ê de cihê xwe girtibana. Hêzeke leşkeri ava bibû. Mirov bi awayekî fedayî canê xwe didin. Ev jî yek ji bîryarên konferansê bû. Ji bo vê hewldan çêbûn. Lê bi vî rengî nehat kirin.

Di beşa girtinê ya konferansê de tiştên girîng derketin holê. Protokol jî hatin û tevlî merasîma konferansê bûn û şahî û mîhrîcana konferansê hat lidarxistin. Şêxên Ereban tevlî bûn. Rûspiyên eşîrên Şemeran tevlî bûn. Di heman demê de kesên Xirîstiyan, neteweyên cuda li Sûriyeyê dijîn beşdar bûn. Her wiha Asûrî û Suryanî jî tevlî protokolê bibûn. Wan jî kêfxweşiya xwe anî ziman.

Bêguman di wê konferansê de, ew bawerî derket holê. Bîryarên weke avakirina sîstema tabûran, destpêkirina perwerdeya şervanên nû, ji bo hêz hê zêdetir bi awayekî aktîf tevlî bibe bîryara perwerdekirina hêzan û tevlîbûna nav refan hatibûn girtin. Ev hêdî hêdî pêş ketin. Bîryara avakirina dibistana fermandariyê hat girtin. Ev perwerde bi giştî hat destpêkirin.

Wê kantona Kobanê, Cizîrê û Efrînê di bin banê xwe de xebatên xwe bimeşandina. Rêxistinbûna jinê jî hatibû kirin û piştî konferansa YPG'ê konferansa YPJ'ê jî hat avakirin. Sala 2012'an bi vî awayî konferans hat lidarxistin.

Di wê pêvajoyê de cih bi cih şer hebû. Hewldanên El Nûsra ji bo were Rimêlan, cihên ku petrola Kurdan têde bi dest bixe hebûn. Bêguman nerazîbûna li hemberî vê hewldanê hat nîşandan.

Piştî konferansê di sala 2013'an de Artêşa Azad ji bo Til Hemisê êrîş kir. Til Hemis bi dest xist. Til Koçer girt. Êdî rejîma Sûriyeyê çû, Artêşa Azad bû weke cîranê me. Til Koçer, Til Elo, Til Hemis, Til Beraq weke xeta di sînorê Iraqê de ket destê wan. Li aliyê din heta Başûrê Kurdistanê YPG hebû. Bêguman wê bandora xwe li herêmê kir. Di nav gel de baweriyek derdiket holê. Tirs û xof diçû.

Yek ji bîryarên girîng ê konferansê jî ew bû ku tabûrên profesyonel bên avakirin. Li her bajarekî tabûren profesyonel ên YPG'ê hatin avakirin. Tabûren di nav tevgerê de, yên ji bo her kêlî li hundir û derve pêşiya êrîşan bigire û mudaxele bike wek bîryara konferansê hatin avakirin. Li ser vî esasî xebat hat kirin. Heta YPG gihişt asta avakirina tûgayan. Li her bajarekî herî kêm 10 tabûr hatin avakirin.

Li gel tabûrên YPG'ê, tabura milîsan jî hatin avakirin, ji bo her gundek karibe xwe biparêze. Di vir de ya herî girîng ev bû ku her kes û gel dikare tevlî nav hêza YPG'ê bibe û em ewlehiya jiyana azad a gel û kesên li ser vê axê dijîn e. Di vir de ya esas Sûriyeyeke Demokratîk û Kurdistaneke Xweser bû.

Wê demê Desteya Bilind hat avakirin. YPG'ê Desteya Bilind wek îradeya xwe ya siyasî dît û di bin banê wê de kar kir. Ev xisûs di konferansê de derketin holê.

Ji bo YPJ'ê em dikarin çend xisûsan diyar bikin. Pratîkeke YPJ'ê derketibû holê. Di şerê Serêkaniyê û parastina bajaran de ev pratîk derketibû holê. Jinên ciwan û xortên Kurd di nav refên YPG'ê de, ji bo parastina xwe û axa xwe cih digirtin. Bêguman di nav YPG'ê de cihgirtina jinên ciwan wer ne hêsan bû. Jin di nav civaka Kurd de wek namûsê dihat dîtin. Lê gelê Rojava ku Rêber Apo û tevger nasdikirin, ji bo her tiştî amade bûn ku zarokên xwe ji bo vê axê bikin qurban. Jinên ku di nav YPG'ê de cih digirtin bi vî awayî tevlî nav YPJ'ê bûn. Di jina Kurd de baweriyek derket holê. Di heman demê de gelê Kurd jî ew baweriya xwe dianî ziman. Baweriya wan bi çiyayên azad, Rêber Apo û tevgerê re hebû lewma tevlî dibûn.

Di heman demê de bîryar hat girtin ku Ragihandina Çapemeniya YPG'ê jî bê avakirin. Bîryar hat girtin ku fermandariyên tabûran jî bên avakirin. YPJ'ê bi vî awayî di konferansê de xwesertiya xwe îlan kir. Tabûrên yekemîn li Kobanê hatin avakirin û ji raya giştî re hatin eşkerekirin. Taburen xweser li Kobanê, Efrîn û Cizîrê hatin avakirin.

Bi van pêşketinan re coşeke mezin ket nav gel. Avakirina tabûren YPG'ê û YPJ'ê coşek mezin çêkir. Di roja salvegera şehadeta heval Xebat de 2500 heval di merasîma leşkerî de amade bûn. Êdî di nav gel de coşa wê zarokên xwe neşînin nav artêşa Sûriyeyê, wê di nav hêzên YPG'ê de ji bo axa xwe

şer bikin derket holê. Hestekî pir cuda di nav gel de derket holê. Bi vê coşê re di carekê de hejmara YPG'ê gihişt dehhezaran. Bi dehhezaran kes amade bûn ku ji bo axa xwe û gelê xwe, xwe feda bikin. Di şehadetan de dayikan bi vî awayî hestên xwe dianîn ziman.

Wêne-40

Bajarê Rimêlan ku cihê petrolê bû. Di destê rejîmê de bû. Helwesta YPG'ê li hember vê derket holê. Ew pêvajoyê şerê Girzîro û Rimêlan destpê kir. Cara yekemîn şerekî ji sê milan ve pêş ket. Yek li milê Serêkaniyê, yek li milê Til Koçer, milê Til Hemis êrîşên çeteyan li hemberî Rojavayê Kurdistanê pêk dihatin. Tabûrên bi navê El Nusra, Ehrar El Şam, Rebîa Şam êrîş pêk dianîn. Til Hemis, Til Koçer û Til Beraq di destê Artêşa Azad û El Nusra de bûn. Dema êrîşên YPG'ê ji bo Girzîro û Rimêlan pêk hatin, wan jî şerekî berfireh dan destpêkirin.

Hewldanên hinek eşîrên Ereban ên girêdayî rejîma BAAS derketin holê. Dixwestin şerekî Kurd û Ereban derxin. Lê piştî konferansên YPG û YPJ'ê, bi pratîka derket holê ev hewldan bi ser neketin. Eşîrên weke Şamara hatin tevlî YPG'ê bûn. Tifaqeke bi vî rengî jî hebû. Bêguman ev êrîşên wan vala derketin. Girzîro û Rimêlan hatin rizgarkirin.

Helwesta herî kirêt ji bo Tirbespiyê bû. Gelek êrîşên wan çêbûn bombe teqandin. Weke çawa êrîşî Serêkaniyê kirin ku Cizîrê û Kobanê ji hev qut bikin, dixwestin bi êrîşên li hember Tirbespiyê-Dêrikê û Qamişlo ji hevdu qut bikin. Di van erîşan de hevala Faraşîn ku rêvebera YPJ'ê bû û çar hevalên pê re şehîd bûn. Li girekî li ber xwe dan, gir bernedan. Heta dawiyê bi guleyên xwe şer kirin û şehîd ketin. Berxwedana YPG'ê ya di şexsê hevalan de derket holê hişt ku bigihêje serketinê. Bi vê, hêzên di nav xaka Kurdan de nehatin qebûlkirin.

Li ser bangan pêngavên YPG'ê di vî milî de pêş ketin. Til Koçer, Til Elo mînaka vê bû. Mile Til Hemis û Til Temir ku gelê Asûrî, Suryanî û Ereb li wan deveran dijîn, dîsa li Serêkaniyê bangawaziyên bi vî rengî çêbûn. Di nav YPG'ê de jî baweriyeke wiha derket holê ku em tenê ne herêmên Kurdî dikarin deverên netewên ku lê dijîn jî biparêzin. Lewma di YPG'ê de ev tişt derket holê.

Êdî ji aliyê artêşbûnê ve ji aliyê şervanên YPG'ê ve profesyoneltî derdikeve holê. Êdî branşên wan çêbûn. Tabûrên topavêjan hatin avakirin. Artêşeke ku nîv bi nizamî û nîv jî gerîla derket holê. Bi vî rengî xwe avakirin çêbû. Branşên sabotajê, sûîqestê, tabûren di nav tevgerê de, di çalakiyan de encamgirtin, afirandin hatin pêşxistin. Bi vî awayî akademî hatin avakirin. YPG'ê bi vî awayî xwe pêş dixist. Di vir de hem avakirina YPG'ê hem jî avakirina neteweya demokratîk û xweseriya demokratîk avakirin û bi vî awayî înşaya civakê pêş diket.

***-YPG têrî parastina nava bajêr jî dikir, an rêxistinbûneke cuda hebû?***

Ji bo wê asayîşan pêwîst dikir. Ji ber wê demê wek civaka Kurd me nizanîbû em ê çawa asayîşê avabikin, pergala trafîkê wê çawa çêbibûya hwd. Di van mijaran de nezaniya me hebû. Lê diviyabû ev gel hatiba parastin. Lewra her çi qas hatibe ji bîr kirin jî parastin, taybetmendiyek xwezayi a civakê ye.

Wêne-36

Dema ku asayişên me ava bûn jî gel qebûl kir û hembêz kir. Ji ber ku têkoşîna gelê Kurd û tevgera azadiyê bawerî dida. Vê tevgera azadiyê çi awa dikir, gel pê bawer bû. Bêguman avakirina asayîşê ne li ser esasê xisûsa zîhniyeta dewletê bû. Ne ew bû ku em kesan bigirin û wan bixin girtîgehan. Ne ev bû ku şîdet, derew û zor bê meşandin. Ne înkarkirina neteweyan bû. Bang hatibû kirin ku her kes dikare di nav asayîşê de cih bigire. Mafê kesên Asûrî, Mesîhî heye ku di nav vê asayîşê û xebatên parastina sînoran de cih bigirin.

Ji ber tu neçarî pergalekê ava bike. Nîzamek pêwîst bû da ku gel karibe xwe bi rê ve bibe. Jiyaneke wekhev di nav aştiyê de avakirin pêwîst bû. Lewma tu neçar bû, nuqteyên kontrole ava bikî, ji ber yê li hemberî te êrîşan dike û bombeyandibarine. Tê û xwe di te de diteqîne. Pêwîst e tu tedbîrên wê bigirî. Tevî hemû êrîşan jî gel zarokên xwe tevlî hêzên asayîşê kirin. Tirs û teredût bi gel re çênebû. Bombe jî bi wan de teqiya, lê dest ji vê dozê bernedan. Ev mijareke pir girîng bû. Eger bawerî ti-

nebûya van mirovan zarokên xwe nedişandin. Mirovên me yên li zanîngehan dixwendin, kesên xwedî pîşe hemû derdiketin ser rêyan di nuqteyên asayîşê de cih digirtin. Ji ber nîzamek dihat xwestin.

**YPG, Rêveberî Radestî Meclîsa Gel Kir**

YPG'ê heta wê demê di nav bajêr de bû. Ji nav bajêr derket. Dewrî Asayîşê, dewrî îradeya civakê kir. Wekî din YPG'ê sînorên heyî li hember êrîşan cephe girt ji bo şer bide meşandin. Bi vê ve girêdayî civak dihat rêxistinkirin. Di pergala dewletê de ji bo tu bibî memûrek pêwîste tu di pergala dewletê bixwîne. Lê di nav civaka exlaqî polîtîk û xweseriya demokatîk de gel xwe bi rê ve dibe. Tu xwendekar bî ne xwendekar bî ne girîng e. Tenê zîhniyeta te civaka exlaqî polîtîk û civaka xwezayî be mafê te heye tu tê de cih bigirî.

Wêne-38

Bi van pêşketinên ku derketin holê re, YPG li derveyî bajaran û asayîşê di nav bajaran de parastin dikir. Dîsa hilbijartinên şaredariyan bi awayekî azad hatin kirin. Xwe bi wê re birin û xwe ji dewletê qutkirin mijarên pir girîng bûn. Bandora xwe çêkirin.

Vê bi sere xwe baweriyek da vî gelî jî. Ji ber vê jî me wê demê li herêma Serêkaniyê, tabûra yekemîn a Ereban di Hezîrana 2013'an de ava kir. Bi vî rengî li milê Qamişlo, Til Hemis li vê erdnîgariyê me tabûren Ereban ava kirin. Asûrî tevlî nav refên YPG'ê bûn. Bi vê coş û îradeyek derket holê. Nerazîbûna aliyên siyasî li hember vê derket. Tê bîra min kesek Ereb ji wê tabûrê girtin û yekser sere wî jêkirin. Danîn ber nuqteya kontrolê da ku ji Ereban re bibe îbret. Digotin, "*ev kesên tevlî YPG'ê bûne xayîn in.*" Lê kesên bi YPG'ê re di nav danûstandinan de bûn bawer dikirin ku tenê YPG dikare wan biparêze. Di vir de pêngavên YPG'ê pêş ketin. Gel bi YPG'ê îqna dibûn. Wê demê bangên Ereban bi taybet ji bo YPG'ê hebûn. Digotin, "*werin van bajarên me rizgar bikin. Ji van kesên çete, talanker, xwînxwar me rizgar bikin.*"

Lewra dema YPG diçû bajarekî, herêmekê, gundeki Ereban îradeya wê derdixist pêş. Îradeya mirovên azad derdixist pêş. Dihişt gel xwe bi rê ve bibe. Bibe xwedî îrade. Bi xwe hêza xwe ya leşkerî çêbike û xwe biparêze. Piştî vî şerî li ser esasê bangên Ereban, Ebû Rasên hat rizgarkirin. Herêma Hesekê ji çeteyan hat rizgarkirin. Pêngavên YPG'ê pêş ketin. Bi vî awayî ew erdnîgarî hatin rizgarkirin.

Wêne-101

Di wê pêvajoyê de êrîşên çeteyan bi taybet li hember Efrîn û Kobanê jî hebûn. Mînak şerê Qesrik Cindo. Êrîşên pir dijwar kirin. Di hevdîtinan de bi awayekî nemerd heval girtin. Hevaleke bi navê Nûjîn girtin. Piştî wê teslîmî îstîxbarata Tirkiye MÎT kirin. MÎT'ê ew lêpirsîn kirin. Ji ber nerehetiya dewleta Tirkiye li hember Kurdan heye. Qebûl nakin. Lewma mirov û hevalên me digirtin, bi awayekî nemerd ew esîr digirtin. Ew dibirin û didan dewleta Tirk.

Tevayî çek û cebilxaneya wan MÎT dida. Pasaport û nasnameyên wan hemû ên Tirkiye bûn. Di şerê Serêkaniyê, Til Temir û Til Koçer de jî pasaportên dewleta Tirk li ser van kesan derketin. Ji ber wer amade kiribûn ku kesên Ereb ên Reqa, Helebê û Der El Zorê reviyan çûn dewleta Tirk. Li vir MÎT û istixbaratê dest avêtin wan. Ew rêxistin kirin û dîsa ew şandin van herêman. Bi taybet şandin herêmên Kurdan. Digotin, "*Kurd in her kesî qebûl dikin. Pergaleke wan a xwesertî heye. Neteweyan înkar nakin qebûl dikin.*" Wan jî jê feyde girtin, hatin. Lê di encam de ev hewldana wan jî bi bin ket.

Di wê pêvajoyê de baweriya gel, a YPG'ê ya bi xwe derket holê. Baweriya bi xweseriya demokratîk derket holê. Gel xwe bi rê ve dibe û xwe pêş dixe. Hikûmetên xwe ava dike. Parastina xwe dike. Di nav bajaran de pêwîstiyên civakê bi cih tîne. Di vê astê de berxwedanek derket holê. Diviyabû ew destketî û sînor hatibana parastin. Ji ber di aliyekî de dewleta Tirk, di aliyekî de dewleta Iraqê û di aliyekî de jî pêşmerge hebûn.

Lê yekemîn artêşa ku hat avakirin û di şertên herî dijwar de parastina gel kir YPG bû. YPG'ê berdel da. Di herêmekê de du-sê artêş nabin. Tenê divê artêşek be. Lê di pergala xweseriya demokratîk de mafê her gelî heye ku xwe biparêze.

***-Aşûrî, Sûryanî, Tirkmen, Kurd û Ereb... Ew qesa gel û baweriyan çawa karîn di nava heman hêza parastinê de cih bigrin?***

Li her cihî mînakên vê, li gorî pêwîstiyan bi awayekî xwezayî çêdibûn. Ji ber vê dema me tabûrên gelê Ereb li Til Temir ava kirin, Asûriyan jî bang li me kirin. Di vê cihana em lê dijîn de nifûsa Asûriyan pir kêm maye. Bi vî rengî bangawaziya wan û avakirina tabûr û asayîşa wan pêk hat. Wê taxên xwe ew bi xwe biparêzin. Qamişlo bajareke û mafê her kesî heye di vî bajarî de mafê xwe biparêze. Nabe tu weke dewletê nîzameke desthilatdar pêk bîne. Tê xwe bi rê ve bibe. Lewma hêza *Sotoro* hat avakirin. Asayîşa wê ji bo vê ye. Tê xwe û taxa xwe biparêze. Tu di ber vê axê de berpirsyarê. Eger pêwîstî hebe tê bê eniya pêş. Tabûrên Asûriyan jî bi vî awayî hatin avakirin. Tê de meclîsên leşkerî hatin avakirin. Dê tu di van meclîsan de xwedî îrade be û tê xwe biparêze. Tê nekeve bin desthilatdariyan û wê tu kes serweriyê li ser te neke.

Ji ber wek gelê Kurd me ev êş gelekî dît. Ev nayê wê wateyê ku em ê biçin li ser gelekî din desthilatdariyê bikin. Lewma asayîşa Asûriyan jî hat avakirin. Me hêza Ereban a leşkerî ava kir. Ev ji YPG'ê ne qut e. Cihên xwe di rêveberiya YPG'ê de jî digirin. Em hêza Ereban hem jî ya Asûriyan cihê xwe têde girtin. Asayîşa Rojavayê Kurdistanê  jî bi vî rengî ye. Ew alî jî cihê xwe têde digirin. Armanc yek e, lê sê îrade hene. Eger li gor zîhniyeta desthilatdariyan be nifûsa Kurdan zêdetir e û divê yên din nejîn. Lê ne bi vî rengî ye. Em hilbijartinan di vê de nakin. Mafên wan heye û divê bên di rêveberiyê de cih bigirin.

Mînaka artêşa Sotoro li ber çavan e. Çû li Hesekê şer kir. Di eniyê de li hember DAIŞ'ê şer kir. Di heman demê de hêza Sotoro li bajêr û meclîsa leşkerî bi YPG'ê re bi heman awayî ye. Ya Sotoro li aliyekî li ser milê wan ala wan li aliyê din ala YPG'ê heye. Yanî dibêjin alake neteweyî heye û em ê di bin banê wê alê de şer bikin. Lê mafê min heye ez bi cilên xwe yên leşkerî û ala xwe jî şer bikim. Li hemberî vê tu helwest nîne. Ji ber ev sembolên gel in ên xwe pê îfade dike. Tu berteka YPG'ê û gelên li Rojavayê Kurdistan şer dikin li hember vê nîne. Rejîma BAASê gelek êrîşên dijwar pêş xistin. Got, *"hûn ê ala BAAS jî rakin."* Ev nehat qebûlkirin û hat redkirin. Ji ber di destûra bingehîn de ev alî nayên qebûlkirin. Dijwariya rejîma BAAS a şoven tenê li hember gelê Kurd nînbû. Ev zext li ser xirîstiyanan, Asûrî û Ereban jî hebû. Şîdet, zext û zilm di destê aliyê Elewî de bû. Ev rastiyek e. Ji ber vê jî vê bi serê xwe bandorên pir cuda çêkirin.

Bi hev re jiyana gelê Ereb, Kurd û Asûrî eger em tenê bi Şoreşa Rojava re bigirin dest wê şaşiyên pir mezin derkevin holê. Ji ber rastiyek heye û divê em vê zanibin. Ev rastiya Rêber Apo ye. Yê ev tişt ava kir Rêber Apo bû. Rêber Apo têkiliyên bi gelê Ereb û Asûrî re ava kir. Rêber Apo ew têkilî li Libnan û Şamê ava kir. Hêza Tevgera Azadiyê ya leşkerî ya di sala 1982'yan de li hemberî Îsraîlê şer kir. Bi vî rengî 12 şehîd dan. Di wê demê de bingeha bihevre jiyana gelê Kurd û Ereb hat pêşxistin. Bêguman zîhniyeta dewletan bingehek dabû avakirin ku wê qetil bikin, talan bikin. Ev zîhniyet hebû ne ku tinebû. Lê bingeha jiyana pêkve hatibû danîn. Ji ber hevdîtinên me yên bi gelê Ereb re jî rastiya Rêbertî nişan dide. Pirtûkên Rêber Apo, parêznameyên Rêber Apo hemû dixwendin. Heta wêneyên Rêbertî yên bi rahîbên Xirîstiyan re yên li Sûriyeyê dijin re hene.

Lewma bingeha wê ne di îro de ye. Ji dîrokê tê lê aliyên serdest ên desthilatdariya dewletdar ev zîhniyet dan avakirin û parçe kiribûn. Lê belê bi rastiya Rêber Apo re bingeha wê hat avêtin. Piştî wê bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re ev tişt derket holê. Lewma ew tirs zû şikest. Ji ber berê bingehek hatibû avakirin. Vê moral û coşek da gelan. Ji ber vê li ser nerazîbûnên wek dewleta Tirk û dewletên Ereban êrîş pêk hatin. Li hemberî Kobanê êrîş pêk hatin. Êrîşa li hember Kobanê ne êrîşeke wer ji rêzê bû. Ji ber ku tu gavên pir berbiçav li Rojhilata Navîn pêş dixe. Her wiha evqas kêmneteweyên li Sûrî dijîn hene û tu maf dide wan. Tu mirovan hişyar dikî û zîhniyetê ava dikî. Yek ji sedema ku êrîşî Kobanê kirin ev bû. Yan na li Kobanê çi heye? Çolek e. Ne li ser avê ye, ne petrola wê heye. Dixwestin îradeya Kurd û ya YPG'ê bişkînin.

Berxwedana li Kobanê jî ne berxwedaneke wer ji rêzê bû. Berxwedana gelan û ya neteweyan bû. Lewma ji nav raya giştî ya cîhanê bi hezaran kes hatin tevlî bûn. Ji her çar parçeyên Kurdistanî û ji kêmneteweyên din mirov hatin beşdar bûn. Ji neteweyên din ên cîhanê mirov hatin û li vir şehîd bûn. Ji Amerîka, Awûstralya, Elmanya, Îngilîstan kesên Fars, Ereb, Xirîstiyan kes hatin li wir şer kirin û şehîd bûn. Di berxwedana Kobanê de cihê xwe girtin. Rastiya gelê bindest li Kobanê xwe nîşan da. Rihê

gelan ê enternasyonalîst li vir derket holê. Wer bi awayekî ji rêzê nehatin tevlî nav berxwedanê nebûn.

***-Di destpêka şoreşê de pêwîstiya leşkerî çawa derket holê û di rêxistinkirinê de, we çi zehmetî jiyan kirin?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Di dema aloziya Sûriye de ji aliyê me ve pêwîstiya bi hêzeke leşkerî li Rojava hêdî hêdî derdiket pêş. Yanî divê her tişt bi hêza leşkerî çareser bibe. Hêza leşkerî wê di têkoşîna li Sûriyê bibe bingeh. Ji bo vê ji ez di serî de ji bo Rojava û Sûriyê vê bêjim; Ji bo avakirina hêzeke leşkerî perspektîf girtin, ev ji dil hîs kirin, bi rastî jî bi xwestek meşandin, bi eşqa 'êdî asta ku em hatinê, hewceyî şoreşekê ye û ev jî di xeta leşkerî re derbas dibe û serkeftina vê xetê jî wê bi artêşeke xurt bibe' re pêşkeve. Kesê ku destpêkê ev ji dil hîs kiriye Hevalê Şehîd Xebat Dêrik bû.

Her kesî piştî 5-6 mehan pêwîstî bi tehlîleke leşkerî dît, lê ji aliyê tevgera me ve, esas ji 2004'an ve êdî hate fêm kirin ku hêzeke leşkerî ji bo parastina Rojava pêwîst e. Li ser vê bingehê, yê ku li ser xebitî û kar kirî, ji 2004'an û vir ve Hevalê Sadiq bû. Lê di dema şoreşê de li ser vê bingehê, rêxistineke hîn fireh û mezin ku bersiva şoreşê bide, xwediyê vê feraset û şexsiyetê Hevalê Xebat bû. Bi rastî jî Hevalê Xebat, xebateke leşkerî ya girîng, bingeheke mezin ya xebatên leşkerî di Rojava de danîbû.

Di bajaran de em ê çawa têkoşîn bimeşînin, em ê çawa hêz çêkin, em ê çi bikin, jê re kar pêwîst bû. Çewisandina rejîma BAAS hema bêje nedihişt kes di cihê xwe de tevbigere. Civakeke ku di bin vê zilmê de dijî, ji aliyê leşkerî ve rêxistin kirin, pir zehmet bû. Beriya her tiştî, baweriya kesî tinebû. Lê bingehê ku Hevalê Xebat danîbû, li ser wê esasê meşiya; Bi rengê şaneyên biçûk ava kirin, tîm ava kirin, tîmên veşartî ava kirin. Ji Dêrîkê bigire heta Efrînê wisa tîmên biçûk ên tolhildanê ava kirin. Li van herêman di avakirina van rêxistinan de ji koman bigre heta şexs bi şexs, keda Hevalê Xebat heye. Yanî di avakirina rêxistinên gel û di avakirina hêzên leşkerî de ku wê bibana bingeha YPG'ê û di destpêkirina xebata leşkerî de rasterast rol û xebata Hevalê Xebat heye. Xebata ku Heval Xebat bi vê armancê meşandibû, bingeheke xurt ku mirov karibe li ser bimeşe, hêviyeke mezin çêkiribû.

Wisa di nav milet de hewaya şoreşê çêkirin, bingehê şoreşê ava kirin, di serî de Hevalê Xebat pêk anî bû. Bi qasî ku giranî dabû xebatên din ewqas di xebatên YPG'ê de jî kûr bûbû. Bi perspektîfên Rêbertî bingehek danîbû.

Jixwe destwerdana destpêkê ya dijmin bi şehîd kirina Hevalê Xebat re çêbû. Ev, destwerdaneke cidî bû. Yê ku wisa di nava gel û xebata YPG'ê de serî dikişand, di sala 2012'an, di meha destpêkê de yek jê jî Hevalê Xebat bû. Hevalê Xebat bi destê malbateke ji Qamişlo ku wek *mala Bedro* dihat naskirin, hate şehîd xistin. Malbateke ku berê dostaniya me jî kirine lê piştî Rêbertî ji Rojava derket bi temamî xwe firotiye rejîma BAAS, bi temamî bûye ajanê Tirkiyê û PDK'ê. Bi destê vê malbatê bi şêwazekî xedar û xayînane Hevalê Xebat hate şehîd kirin. Şehadeta Heval ji bo me şoqeke mezin bû. Heta niha ez bi xwe hezim nakim ku Hevalê Xebat şehîd bûye. Ji bo hemû Hevalan jî şehadeta Heval weke şoqeke mezin bû. Ew, ji bo me wendahiyeke mezin bû. Lê şehadeta Hevalê Xebat ji bo şoreşê bû destpêkeke nû.

Ji aliyê leşkerî ve jî bandoreke hê mezintir pêk hat. Komên leşkerî yên heta wê demê hemû Hevalê Xebat çêkiribûn. Taximên Dêrîkê, Qamişlo û Kobanê jî heta taximên Efrînê jî bi xwe Hevalê Xebat li ser sekinîbû. Êdî dewamkirina doza Hevalê Xebat weke erkekê bû. YPG'ya ku çêbûyî ev ji xwe re weke erkekê dît. Çalakiya xwe ya destpêkê jî esas întiqama Hevalê Xebat bû. Wate, ne tenê wê întiqamê rake, wê artêşekê çêbike, artêşeke ku qet nakeve, artêşeke ku li Rojava şoreşê çêbike, ava bike. Di milet de jî kîneke wisa çêbû û berê ciwanan, ciwanên Rojava zivirand ber bi YPG'ê ve yanî şoreşê. Destpêkê Hevalê Xebat navê wan wek YXK'ê lê kiribû, yanî ne YPG'ê bû. Întiqama Hevalê Xebat rakirin. Ew şexsên ku di şehadeta Hevalê Xebat de rol girtine ser xwe bi çalakiyeke serkeftî tasfiye kirin. Heta, tevî ku ew malbat jî di hembêza dewletê de bû. Vê yekê hêvî, bawerî û moral afirand û li ser wê êdî zemîneke şoreşê çêbû.

Wêne-37

Ev pêşketin di sala 2012'an de encam dan. YPG'ê jî êdî ev hîs kir ku tenê bi sloganan û bi meşan nabe. Hêdî hêdî ew ciwanên ku nêzîkî me bûne bi awayekî veşartî, di malan de û di taximan de perwerde kirin. Yanî xebateke perwerde jî dest pê kir. Li ser vê esasê asta rêxistinê jî ji her aliyê ve bilind bû, pêş ket. Gelê ku me hîn xwe negihandiyê, me xwe gihandiyê; li her derê komîn çêkirin, meclis çêkirin. Ev heta nîvê sala 2012'yan jî wisa bû. Di Sûriyê de jî pêşketinên girîng ji aliyê leşkerî ve çêbûn.

Wê demê endamên YPG`ê bi piranî ne profesyonel bûn. Yanî piştî karê leşkerî vedigeriyan malên xwe. Vê yekê ji bo rewşên acîl giranî çêdikir. Mînak, dema şerê Serêkaniyê dest pê kir diviyabû em xwe bi lezgînî bigihînin bajêr lê bi derengî diket. Yanî me fêm kir ku êdî YPG bi wî rengî nabe. Êdî pêwîst e di YPG'ê de gavên nû werin avêtin û pêwîst e derbasî asteke profesyonel bibe. Di şerê duyemîn yê Serêkaniyê de hin hevalên ku bi rola xwe rabûn û bandor li ser YPG, li ser ciwanên Qamişlo kirin wek Hevalê Serhed, Hevalê Murad hebûn. Êdî rewş ji bo me zelal bû. Êdî pêwîst e YPG'ê ji wê rewşa xwe ya berê derketiba. Ji hêla din ve cara yekê bû ku wek YPG em diketin şerekî demdirêj. Ji bo vê mînak binesaziya me, cebilxaneya me, bi giştî amadekariyên me li gorî wî şerî nebûn. Mînak cîhazên bêtêl yên pêwendiyê tinebûn. Şerê Serêkaniyê bû sedem ku em van kêmasiyan hemûyan bibînin.

Me li ser vê esasê bîryar girt ku em akademiyan vekin û li wan deran dest bi perwerdeyê bikin. Êdî ji bo ku em akademiyên leşkerî ava bikin derfet ketibûn dest. Me herêm azad kiribûn ku em tê de YPG'ê bi şêwazekî profesyonel perwerde bikin. Me destpêkê li Dêrîkê ji Akademiyên Şehîd Xebat yên Leşkerî yek vekir. Pey re me li her qadê Akademiyek vekir. Ji ber ku derfet tinebûn me destpêkê hefteyekê perwerde dida, paşî bû deh roj. Ji ber ku encax şert û mercên YPG ewqas derfet dida. Wekî din me tabûrên profesyonel çêkirin; endamên van tabûran wê bîst û çar seat di nav karê leşkerî de bûne. Ev tiştekî nû bû.

Me li ser vê esasê bîryar girt ku em ji Dêrîkê heta Efrînê ji van tabûran ava bikin. Ev hêzên her tim amade bûn. Êdî em bûbûn artêşek, em di qadeke berfireh de hêzeke leşkerî, artêşek bûn. Lê ev ê li ser kîjan zagonan bimeşe, çi esas bigre, disîplîna wê çi be, li ser çi bingehan ceza hebe yan jî li ser çi ceza nebe. Heta vê demê ev tiştan tinebûn. Mînak ala wê yê çi be? Ji bo vê jî pêwîst bû ku em rêziknameya wê çêkin. Mesela em derdiketin me digot, YPG'ê ne ya tu partiyan e, em hêza parastina gel in. Pêwîst bû ku ev hemû daketane fermiyetê.

Ji bo wê, dema şerê Serêkaniyê me li Qamişlo di civînekê de bîryar girt ku em aleke YPG'ê çêbikin. Al jî di civînê de bû bîryar ku zemîn sor be, stêrka wê zer be, nivîsa `YPG` jî kesk be. Destpêkê *Yêkîneyên Parastinê* bû. Lê paşî navê *Yekîneyên Parastina Gel* guncawtir hate dîtin. Jixwe di şerê Serêkaniyê êdî me ew ala rakir.

Van pêwîstiyan em dehf didan ku êdî em bîryarên nû bigrin. Pêwîstî bi hin bîryaran hebû. Di serê sala 2013`an de me yekemîn konferansa YPG'ê çêkir. Şerê Serêkaniyê hîn dewam dikir. Hin caran disekînî lê dîsa dest pê dikir. Delegeyên konferansê ji gelek cihan hatibûn. Ji Efrînê, Helebê û Kobanê jî delege hatin. Hîn derfetên çûnûhatinê hebû, riyên di navbera kantonên me de nehatibû girtin. Li Serêkaniyê şer bû lê çûna Kobanê û Efrînê qut nebûbû. Hejmara delegeyên konferansê bi xort û jin, di navbera 150-170`ê de bû. Cara yekemîn meclîseke leşkerî ya YPG'ê çêbû. Yanî YPG'ê bû organekî leşkerî. Ji fermandariya wê bigre, ji jor heya jêr wê çawa xwe tanzîm bike, wê rêbaz û taktîkên wê çibe, fermandarên wê çawa bin, çawa bê rêxistinkirin, yanî wisa cara destpêkê bi şêwazekî fermî em bûn xwedî rêzikname. Armancên YPG'ê hatin diyar kirin. Ala YPG'ê hate guhertin û ya niha heyî hate qebûlkirin.

Ji bo hêza jinê jî weke rêxistineke leşkerî bîryar hate girtin. Heta wê çaxê hevalên jin li her derê tevlê xebata leşkerî, hemu karan di asta herî pêşeng de dikirin lê ne rêxistin bûn. Piştî wê Hevalên jin jî konferansa xwe çêkirin û weke rêxistina leşkerî ya jinê YPJ hate avakirin. Di encam de wisa ji aliyê leşkerî ve zelalbûnek çêbû.

Bîryareke herî girîng jî ew bû ku li Rojava ji dervayê YPG`ê em çi hêzên leşkerî nasnakin. Yên ku dixwazin di Rojava de şer bikin, pêwîst e tevlê YPG'ê bibin. Berê jî helwesta me wisa bû lê di konferansê de bû bîryar ku YPG yekane hêza leşkeriya fermî ya Rojava Kurdistanê ye. Jixwe di şerê Serêkaniyê de ev îspat kir. Li ser vê bingehê konferansê roleke xwe ya dîrokî û diyarîker pêk anî. Piştî wê jixwe li Dêrîkê, Qamişlo û Kobanê êdî tabûr çêbûn. Êdî li navendan bi şêwazekî profesyonel û amade

tabûrên me çêbûn. Êdî giraniya têkoşînê ketibû aliyê leşkerî û bi înisiyatîfa wê dimeşiya. Bi taybetî jî şerê Serêkaniyê serdemeke nû vekir. Heta wê demê YPG bi propagandayeke devkî dimeşiya. Lê ev şer bû sedemê propaganda ya çekdarî û Serêkaniyê YPG`ê bi her kesî da nasandin.

**2-Rêxistinbûn û Zayina YPJ'ê**

***-Di xebatên leşkerî yên parastina şoreşê de, rist û rêxistinbûna jinê çawa bû?***

**MERYEM KOBANÊ:** Di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de, ji milê xebatên leşkerî ve heya şerê Serêkaniyê di bin navê hêzên xwe parastinê de rêxistinbûneke giştî hebû. Piştî şerê Serêkaniyê em gihaştin hin bîryaran. Heta dema şerê Serêkaniyê jî hevalên jin di bin banê YPG'ê de têdikoşiyan. Êdî pêwîstî xwe binavkirinê hebû. Lê al an jî navekî me yê cuda nebû. Di encamê de me bîryar da ku em xwe bi rêxistin bikin. Beriya vê jî me aqademiyên xweser ên li ser navê Şehîd Şîlan ava kiribûn.

Ev akademî cara yekemîn li Kobanê hat avakirin. Ev yek sedema xwe ji cudabûna civaka Kobanê digirt ku tevlîkirina hevalên jin gelekî zehmet bû. Ji ber di civaka Kobanê de meseleya eşîrtî li pêş bû. Her wiha jin tenê namûs dîtin hebû. Tevî ku gelekî pir welatpêz e jî gelek guherîn têde hebin jî, bandora pergala baviksalarî pir li ser hebû. Dema ku keçek ji malê derket û şûn ve nikare vegerê malê. Lewma me qada xweser yekem car Kobanê hilbijart.

Wene-104

Piştî şerê li Serêkaniyê û li cihên din me bîryar da em tabûrên xweser ava bikin. Armanca me ew bû em li hemû bajaran jinan rêxistin bikin û ev rêxistin jî bikaribe xweser bi rê ve biçe. Di wî alî de hêvî û baweriya me bi me hebû ku rêxistinbûna xweser bê pergalkirin. Tecrûbeya me têra xwe hebûn, divê me bingehê xweser baş biavita. Dîsa di şer de em bi hevalên xort ra di çeperande bûn. Lê wekî din di jiyan û avakirina mekanên xweser de moralekî mezin bi xwere anî. Me pergala xweser di demekî kin de ava kir û xiste çalakiyê.

Li Efrînê hêjmarek zêde jin tevlî bûn. Şert û mercên civaka Efrînê cuda bûn. Me li vê qadê zêde zehmetî, ji bo tevlîbûna jinan nekişand. Dema ku tevlîbûn zêde bûn, me li Efrînê jî akademiyên xweser û yekîneyên xweser avakirin. Hevalên ku perwerde li hemû akademiyan didan piraniya xwe hevalên jin bûn. Yanê em dikarin bêjin ji % 90 hevalên jin bûn. Tevlîbûna hevalên jin a nav gîştî de bi bandor bû. Ev jî bû bingehekî xurt ji bo em pergala xwe ya xweser bi lez avakin.

Jixwe pergala tabûrên gîştî li her cihî hatibûn avakirin. Di nav tabûran de hevalên jin jî cihê xwe digirtin. Lê me êdî bîryar da em tabûrên xweser îlan bikin. Asta ku êdî şoreş xwe gîhandebûyê ji bo rêxistina jin jî bi avakirina tabûrên xweser re demekî nû destpêdikir. Ev tevgera xweser ne tenê di aliyê leşkerî de, di hemû qadên xebatê de pêwîstî bi pergala rêxistina xweser hebû. Mînak ji perwerdên xweser bigire heya çapemeniyê pêşxistina rêxistinên xweser şert bû. Xebatên civakî ji xwe dimeşiyan, lê weke hêzên leşkerî jî êdî me xwe di her alî de rêxistin kir.

Her wiha me konseya xwe ya leşkerî li hemû qadan derxistin. Me wê demê li her cihî civînên rêveberiyan çêkirin û di wan civînan de bîryar girt ku em tabûrên xweser îlan bikin. Me bîryar da ku civîna yekemîn li Efrînê pêşbixin. Ji ber hem aliyê civakî ve derfet zêdebûn, hem jî li wir hêjmara tevlîbûna jinan zêde bû. Yekemîn tabûra me îlan kir, di 23'ê Sibata 2013' an bû.

***-Îlankirina tabûrên xweser her çiqasî li Kurdisatên berê mînakên wê hebin jî, di qada navnetewî de tesîreke çawa kir?***

Tabûra me yekemîn a bi navê Şehîd Ruken bû. Avakirina vê tabûrê di ragihandinê de dengekî cûda veda. Ev pêşveçûn di Şoreşa Rojava de demekî nû bi xwe re anî. Wê demê di hemû sernavên rojnameyên derve de hatibû gotin ku li Rojava artêşa jinan tê avakirin. Vê hişt di raya gîştî de baldariyeke xurt li ser Şoreşa Rojava derbikeve. Her wiha van gavavêtin hişt di qada siyasî û civakî de jî gelek guhertin çêbibin.

Me di 25'ê Sibata 2013'an de jî tabûra bi navê Şehîd Berçem li eyaleta Dirbêsiyê avakir. Tabûra li vir avabûyî jî li hemû bajaran beşdarbûna jinan çêbû. Bajarên weke Til Temir, Amûdê, Hesekê, Dirbêsiyê û Serêkaniyê. Hêjmareke bi qasî 200 jinan beşdarî vê tabûrê bûn. Bandora Şerê Serêkaniyê li ser avakirina vê tabûrê hebû. Avakirina vê tabûrê bi gîştî li ser civaka wir tesîrek da çêkirin.

Me piştî van herdû tabûran di 5'ê meha Adara 2013'an de li bajarê Dêrîkê tabûra Şehîd Sozdar ava kir. Bandora vê tabûrê weke yên din li ser civaka wê derê pir zêde çêbû. Tabûra Şehîd Adalet jî di 8'ê Adara 2013'an de li Qamişlo hate îlankirin. Tabûra çaremîn jî di 23'ê Adara 2013'an li Kobanê ser navê Şehîd Dijle hate îlankirin. Di roja 8'ê Adarê de îlankirina van tabûran girîngiyek xwe a dîrokî hebû. Serok Apo dixwest her 8 Adareke bike roja azadiya jinan. Li Kurdistanê di pêşengiya Serok Apo da têkoşinek mezin hat meşandin û ev têkoşîn hişt ku jin ji xwe rêxistin bike. Pêşketine arteşa jinê û partiya jinê li Kurdistanê, dîsa cih girtina pir jinên Rojavayê Kurdistanê di tekoşîna li çiyayên Kurdistanê ji bo me bû bingeh. Me jî xwest em di vê milê de gavek di herema xwe de biavêjin.

Şehîdên ku me navê wan li van tabûran kiribûn hemû di destpêka têkoşîna şoreşê de cihê xwe girtibûn. Me di roja 8'ê Adarê de bi îlankirina tabûra li Qamişlo peyamekî wiha da giştî cîhanê; ev hêza jin a ku xwe ava kiriye hêza parastina hemû jinan e. Hêza parastina hemû kevneşopî û nirxên jinan e. Me weke diyarî ji hemû jinên tekoşînvan, şoreşger û berxwedanvan re ragihand. Êdî piştî ku hêza hatî ragihandin xwe hêdî hêdî bi pergal kir û pêwîst bû di pratîkê de bê bi navkirin. Êdî pêwîst bû ev hêz xwe bike navnîşana çareseriyê û rengê xwe bide der. Ev dana der ji bo hemû qadên tekoşînê derbasdar bû. Di jiyan, şer û têkoşîna civakê de û hwd.

Bêgûman di nav ev hêza leşkerî de bi kêmanî be jî jinên ji netewên din cihê xwe girtin. Hinek keçên Ereb beşdar bûn, cardin Êzîdî beşdar bûbûn. Lê bi giştî baldariyek di hemû netewên din de da çêkirin. Bi taybet di qada ragihandinê de hişt ku bandorekî xwe ya erênî bide çêkirin. Me dema ku ev tabûr dan ragihandin, me di peyama xwe de dabû destnîşankirin ku ev hêz di serî de ji bo parastina herêmê ye. Her wiha bi hestên jinan dê têkoşîn ber bi avakirina Sûryekî Demoqratîk ve biçe.

Me êdî bîryar da li hemû deveran hem ji aliyê perwerdê ve û hem jî pisporbûnê ve gavên hîn berbiçav bêne avêtin. Me got pêwîst e ev tabûrên me avakirine di hemû aliyan de xwe perwerde bikin û di serî de şer, teqtîk û her aliyê şer ve pispor bibin. Li gorî wê komîteya şer bi rê ve bibe. Tabî tecrûbeya ku hatibû girtin em gîhandibûn wê qenetê.

Di sala 2013'an de rola ku jinê di nava şoreşê de lîst, xwe bi avakirina artêşbûnê bi ast bûbû. Êdî ne weke hêzeke kêlekê, weke hêzeke pêşeng û sereke xwe destgirtin çêdibû. Hêza me çiqas di nava YPG'ê de hebê jî, weke xweser xwe kirina hêz zarûriyetek bû.

Di avakirina pergala xweser de keda gelek hevalên şehîd hebû. Rola fermandarên weke heval Jînda, Bêrîvan, jiyan, Warşîn û Roksen di avakirina van tabûran de gelek zêde ye. Ji bo ku ev tabûr li ser bingehekî bi kok xwe ava bikin, kedeke van hevalan a taybet hate dayîn. Cardin heval Ronahî Reşo xwedî heman kedê bû. Ji ber ku van hevalan li ser xebatên xweser disekinîn. Ev ji bo me weke gaveke nû bû.

Wêne-39

Piştî wê di heman salê de bîryara konferansa YPJ'ê hate girtin. Ji bo ku em hîn zêdetir bikaribin pergala xwe ya xweser ava bikin. Me konferans di 4'ê Nîsana 2013'an de lidarxist. Konferans di roja dayîkbûna Serokatî de lidarxistin jî ji bo me pir cûda bû. Me ew konferans diyarî keda Rêber APO kir. Ji ber ku keda Rêber APO li ser Rojava û bi taybet jinan pir çêbûye. Me ji bo xwe jî weke ji nû ve dayîkbûnê digirt dest. Me weke jin roja ji dayîkbûna Rêber APO roja dayîkbûna xwe didît. Bêgûman weke avakirina hêzekî leşkerî girîngiya xwe hîn zêde hebû. Armanca me bûyîna hêza xwebûnê, serkeftinê ya di bin felsefeya Rêber APO de bû.

Konferansa me bi beşdarbûna 336 beşdarvanan pêk hat. Beşdarvan ji hemû deveran hatin. Ji Efrîn, Kobanê û Helebê hatin. Konferans li herêma Cizîrê bajarê Dêrîkê çêbû. Di konferansê de gelek bîryar hatin girtin. Lê me got êdî asta em hatinê têrî nake, pêwîst e em xwe bigihînin hemû civakên din û bikaribin hemû kesîmên civakê û bi taybet kêmnetewan beşdarî vê pergala xwe bikin. Bi taybetî jî jinên Ereb, Asûrî û Ermen kişandina nav xwe hate nîqaşkirin. Me got pêwîste em weke hêzên leşkerî

xwe bighînin hemû netewên di Sûriyê de dijîn û felsefeya xwe parastinê bi wan bidin fêmkirin. Feraseta *"jin jî dikare hem xwe û hem jî xaka xwe biparêze"* belavkirin girîng bû.

Konferansa me çar rojan berdewam kir. Bîryarên ku me di konferansê de girtin wiha bûn; a yekemîn, me navê xwe kir YPJ'ê. A din me ala xwe çêkir. Ala me li ser zemînê kesk, di nav de stêrka sor hebû. Yek jî bîryara me girtibû ku, divê em xwe bighînin hemû netewên di nava Sûriyê de jiyan dikin. Îlankirina konferansê jî di 7'ê Nîsanê de hate kirin.

Ev konferans li ser *esasê em xwe bikin vîneke serbixwe*, bû. Armanca me ji vê konferansê ew bû ku em ew feraseta zayendparêz bişkînin. Bi kinahî em bikaribin têgihîştina di civakê de li hemberî jinê hatiye avakirin bişkînin. Ji ber ku di Şoreşa Rojava de jina ku ne bi rêxistinkirî mehkûmî binketinê bû. Jina ne rêxistinkirî ji her cure û ferasetên zayandparêziyê re mahkûm bû. Ji bo wê erka me a yekemîn em bikaribin hemû jinan bi rêxistin bikin. Em gund bi gund, mal bi mal, kes bi kes serî lêbidin. Projeya me, felsefeya xwe parastinê ji bo hemû jinên Rojhilata Navîn parastin bû. Bangawaziya me jî li ser wê esasê bû.

Piştî konferansê cihên me li akademiyên xweser venekirine jî, vekirina akademiyên xweser hate plankirin. Li ser wê bingehê me Akademiya Şehîd Şîlan li Cizîrê vekir. Berê dest bi xebatên perwerdehiyê kiribû. Lê bi rengekî resmî me vekir. Ev akademî li ser esasê pêşxistina fermandariyê bû. Me nîqaş kir ku ji hemû qadan jin werin beşdarî perwerdê bibin. Ew akademî weke akademiya leşkerî hate vesazkirin.

Ev akademî yek ji akademiya navendî bû. Li Kobanê jî akademî hatibû avakirin. Li her bajarî tabûr hebûn, lê me biyar girt ku em li her bajarî tabûrên pispor û bitevger ava bikin. Ango weke hêzeke amade li kuderê ango li kijan bajarî şer derbikeve bikarebe xwe bigihîne û bibe bersîv. Dîsa pêwîst bû hevalên jin di çekên giran de jî bibin pispor. Her wiha şofêrî kirin jî weke fêrbûnekî pêwîst bû, divê di vê mijarê de jî hevalên jin xwe pêş bixin.

Dibe ku ev ne tiştên girîng û destpêkê bûn. Lê ji ber di civaka me ya Rojhilata Navîn de hinek tişt aîdê jinê nayên dîtin, di van aliyan de xwe rêxistinkirin girîng bû. Lê ya esasî armanca van akademiyên jin, di aliyê teqtîka şer de kûr bibe û lêhurbûneke di xwe de pêş bixe. Hem di nav şoreşê de û hem jî pratîkî pêş ketinên bi vî rengî girîng bûn.

Piştî wê li hemû bajaran navendên jinê hatin avakirin. Di konferansê de me bîryara kincên hêzên jin ên leşkerî jî cûda bin hate girt. Van pêşveçûnên ku di nava demekî kin de hatin avakirin, hem li ser derve û hem jî li ser civaka em di navê de bûn bandorên erênî dan çêkirin. Coş û kelecaniya konferansê pir zêde bû. Ji bo ku rihê konferansê li her cihî bê ragihandin bi hevalên beşdarvan re nîqaş hatin kirin. Mînak hevala Silav hebû. Ji Efrînê beşdarî konferansê bûbû. Ew heval bi cesaretekî pir mezin, ji xwe bawer û bi xwestek beşdarî konferansê bibû.

Bi wê yekê re di destpêka sala 2013'an de, bi ava kirina YPJ'ê re li hêrema Efrînê û Helebê şerek derket, di vî şerî de hevalên ku şehîd ketin hebûn. Bê guman wan hevalan di şerê Efrînê de rola xwe lîstin. Sekna wan ya şer me di konferansa xwe da jî nirxand. Ji ber ku weke dem jî rastî konferansê hatibû, sekna wan hevalan li ser konferanse jî tesîreke mezin kir. Di nava wan de hevalên ku di rêveberiyê û konseya leşkerî de cihê xwe digirtin jî hebûn.

***-We jî di nava xebatên parastinê de cih girtiye, bi taybetî xebatên parastinê yên jinê çawa pêş ketin? An jî çima pêwîstiyeke wisa hate dîtin?***

**JIYAN HELEB:** Em bixwe di xebatên parastinê de man, yanî li ser bingeha parastina cewherî xebatên me çûbûn. Hê bêhtir gel ji bo rewşeke awarte amadekirin, saziyên wan ên siyasî û civakî jî hebana lê li keleka wê êrîşên bên, ji bo ku karibin xwe li hemberî wan li ser piyan bigirin, wan saziyan biparêzin. Li ser vê bingehê parastina cewherî jî esas hate girtin.

Xebatên esasî yên parastinê di 2012'an de destpê kirin. Di 2011'an de jî hebûn, lê ne wisa bi awayê tabûr û hwd bûn. Hê bêhtir kîjan gund be an jî hin mezra hebûn, hin ciwan hatibûn rêxistin kirin. Lê li ser esasê rêxistinkirina jinê nehatibû kirin, yanî wisa jinên ciwan hene, keçên ciwan hene; li ser esasê di rewşên awartê de dema tiştek çêbû kanibe xwe bi xwe biparêze, bikanibe gundê xwe, navçeya xwe, bajarê xwe biparêze nehatibû avakirin. Hê bêhtir di çarçoveya xortan de di çarçoveya mêr de hatibû esas girtin.

Civaka Kurdan hemû dişibîn hev, lê hinek cih tu bixwazî nexwazî ji sedema eşîra, ji sedemên çandî hinek tiştên bandor dikin hene. Ji bo wê nas kirin pêwîst dike. Li ser wê esasê wisa plan û programeke parastinê dane avakirin pêwîst dikir, yê giştî hinekê hebû. Ango ji bo her cihekî, her qadekê rêxistinbûneke xweser pêwîst dikir. Di şexsê herêma Amûdê de, hin xebatên min yên xweser ku jinê digre navenda xwe çêbûn.

Beriya min hevalê Selahaddîn li wê derê bû. Vî hevalî rêxistinbûna xortan kêmekê çêkiribû. Di gundan de destpê kiribû. Çend gundên li ser sînorê Bakûr, Tirkiyê çêkiribûn. Bi xwe ji me re bû alîkar jî, me mehekê gund û bajarên wê nas kirin. Kêm zêde civaka li wê dere çawa xwe bi rê ve dibe. Rojane bigirê, bi giştî hinekê hate naskirin.

Me li ser wî esasî xwest xebatên xweser bimeşînin. Tiştê ku me weke perstpektîf ji xwe re esas digirt çi bû? Em bikaribin keç û jinên van gund û vê navçeyê û mintiqayê, li ser esasê rewşeke awarte amade bikin. Tabî ne tiştekî hêsan e, tiştekî cara yekê bû, di nava gel de. Mînak ji beriya wê tecrubeyên civaka Kurdistanê hebûn; jinê xwe li serê çiyê bi sazî kiribû, xwe birêxistin kiribû. Heya sih, çil salî şer jî kiribû. Lê ev di çiyê de bû, ne di nava gel de bû. Ji bo wê yekê jî qebûl kirinek hêbû, lê li ser esasê ku li çiyê be. Di nava gel de tu wisa werî û bêjî, ez ê van keçên ciwan bêxim nav xebateke leşkerî û perwerdeyeke leşkerî bidimê; di nav malê, gund û bajaran de rêxistin bikim; gel ji aliyekî, xwe hin hevalên me yên qadro jî bawer nedikirin. Yanî wek em tiştekî pir tersî civakê dikin, tiştekî tersî mantiqê bi hezar salan hatiye rûnîştin dikin. Ji bo vê, wan jî ji xwe re dikeniyan, dema me digot, "*em ê tabûrên jinê ava bikin.*"

Tabî wê demê navê YPJ tinebû, bername û rêzikname tinebûn. Tenê perspektîf heye digot, "*jixwe Suriyê dê bikeve nav rewşeke şer û di nava vî şerî de yên herî zêde zor û tedê zehmetî dibîne jin û keç in.*" Yanî yên tên tacîzkirin, tên tecawizkirin, dîl tên girtin û tên firotin hem weke rih û fikir, hem jî weke laş jî jin in. Ji bo wê jî ev tişt, di dîrokê de hemû şoreşên cîhanê de me dîtibû. Bi taybetî şerê bi hezaran sal li ser coxrafyaya Kurdistanê ew isbat kiribû.

Weke din min got li ser çiyayên Kurdistanê 40 salî şerê ku dihate kirin, civak pir jê ne qut bû. Em qet jê ne qut bûn. Tenê ev bawerî hebû, ev bîryar hebû, ev rih hebû; ji bo vê jî ev bi civakê dane fêmkirin ne hêsan bû. Bi taybetî dayik, bav, bira; ji ber ku di nava civakê de yên ku di derheqê keçan de bîryar didin ev in. Yanî destpêkê bav e, bira ye. Ger eşîr be hemû zilamên eşîrê ne, piştre soz tê jinê. Heta pir kes jê napirse jî. Ji bo vê yekê, me destpêkê ne got, em ji bo xebatên leşkerî ne. Me newêrîbû bigotana jî, ji ber ku ne civak jê re amade bû û ne jî weke sazî hevalên kêleka me jê re amade bûn. Yanî me bi giştî weke xebatên gel, xebatên tevger, saziyên civakî nîşan dida. Li ser vê bingehê di nav wan saziyan de me xebat dikir.

Weke xebatê jinê; hê bêhtir xebata birêxistinkirin û perwerdekirina wan, di milê civakî de, di milê siyasî de, me xwe li ser vê esasê bi nav kiribû. Heta hin gundên wisa hebûn ku pir hişk nêzi jinê dibûn. Hê bandora eşîr li ser xwe ye. Di wê derê de jî me bi rengên cuda, weke mamosteyên dersên zimanê Kurdî dixebitîn, heftê sê caran em diçûn wan gundan. Nêzîkî 150-170 gundî bûn. Heftê sê rojan em derdiketin wan xetan. Nîvê gundên wisa pir hişk me digot, *"em hatine dersê zimanê Kurdî bidin, keçan bialimînin ziman"*. Ji ber ku piraniya gundan xwendin û nivîsandina wan tune bû.

Dema em destpêkê derketibûn xebatên civak naskirinê me ev rastiya ferq kir, piranî keç bê xwendin tên hiştin. Ji bo vê jî derfet çênebû, digotin dê di nava Ereban de bibê dîtin. Ji ber fikarên eşîrî, ji ber fikarên bav û bira zêdetir me got, *"em di malê de xebatên xwe bimeşînin, em dernaxin derve li pêş çavên we bin. Tenê odayekê bidin me, em di wê derê de ders bidin. Bila keç bikaribin bixwînin û binivîsin, dinya-alem ji aliyê ilm ve gihîştiye ser hêyvê, em nikarin hê du herfan bînin gel hevdu."*

Ango me li ser vê esasê bi saetan li gel malbatan nîqaş dikir, da ku destûr bidin ku em dersê Kurdî bidin keçan, dest berde ji xebateke leşkerî. Xebateke wisa pir xeyal dihat. Ji bo wê jî me newêriya rasterast bigota. Yanî civaka wê derê çi pê qebûl bû me li gorî wê, planek wisa ji xwe re derdixist û li gorî wê em tevdigerîyan. Mînak, xetên gundan li ser esasa dersên zimanê Kurdî me destpê kir, em wisa ketin malan. Li ser vê esasê me keçên gund dianîn cem hevdu. Êdî çiqes bin, hin hebûn 5-6 bûn, hinek hebûn 10 bûn, hinek 15 bûn. Li gorî vê me grub çêkiribûn. Tabî me ders saetekê dida.

Hefteyên destpêkê me heftê saetekê dersên zimanê Kurdî didan. Paşê me bi dizî li gel xwe çek jî biribû. Me piştî ku hinekê keç nas kirin û hinekê bawerî ji wan girt, da ku ji dayik û bav û birayên xwe

re nebêjin em bi wan re diaxifiyan. A din jî ew bi xwe jî ditirsîn; dema çek didîtin, hinekan qîr dikir, hinekan dixwestin ji gel me birevin. Tabî hêdî hêdî me ew dialimandin vekirin û girtinê, ji çekan hezkirinê.

Dema me feraseta parastinê vedigot, ew bi xwe digihîştin çekê. Ji ber ku me mînakên dîrokî didan mînakên jiyanî didan, mînakên her çar parçeyên Kurdistanê li ser jinê hatî jiyîn didan. Li ser çiyayên Kurdistanê jinên qehreman bi şerê xwe, bi jiyana xwe hatine naskirin, dema me mînakên wan didan eşqeke wan zû çêdibû. Ji ber ku ew jî bi salan hatibûn çewisandin. Dest berde ji mafê parastinê ji milê mafê herî biçûk ê jiyanî ve jî heqekî wê yê axaftinê tinebû. Keseke ku ji aliyê jiyanê ve xwe neparêze, ji aliyê siyasetê ve ji aliyê leşkerî ve jî parastin xewn û xeyal bû.

Lê piştî qeneatê, me ew dialimandin. Piştî wê bi eşq nêz dibûn. Lê me soza ji wan digirt diviyabû pir veşartî be, ji bo ku ev ne tenê ji bo gundê wan e, ne tenê ji bo mala wan e, projeyeke pir berfireh e. Ji bo keçên din gundên din jî pê bandor nebin divê veşarî be. Yanî sirê wê yê serkeftinê dibê veşartî be. Ji ber ku civak jî jê re ne amadeye, ji bo vê yekê bi vî awayî bû.

Di bajaran de jî; wisa tax bi tax dema em diçûn, li ser navê dersên huner û çandî dayina keçên ciwan em tevdigeriyan. Mînak, çenteyekî me hebû, çenteyê kemanê bû. Lê me di nav wê de çekeke biçûk bi cih kiribû. Yanî dema em diçûn malan her kesî dizanî ku em dersên muzîkê didin keçikan. Bi vî rengî kêfa wan jî dihat weke keçên me dialimin hunerê. Tabî nedizanîn ku huner, hunera şer e, ne hunera ku ew bi salan elimîne. Ez dikarim bêjim me şeş meha li ser vî navî kar kir. Heya me xwe gihand asta tabûran. Yanî me gund û bajar wisa ava kirin. Di her taxê de tîmeke hevalên jin hebû. Di gundan de dê bigihiştina asta taximê, di bajaran de bigihiştibana asta tabûran; ji bo bikaribe bi rastî jî hem xwe û hem axa xwe biparêze. Tabî bi vî awayî şer dest pê kir, hê me yekser perwerdeyê wan xelas nekiribû.

Di hemû milan de parastin, ne tenê wisa çek girtin, vekirin û çûn û fîşek avêtin, zêdetir weke parastina rewa hê me di her milê wê de perwerde nedayîbû, çeteyan êrîşî Serêkaniyê kir. Piştî 6-7 mehan a rêxistinkirinê. Ji ber ku xort jî di nav de hebûn. Tabî me ji xortan re nedigot, "*em keçan jî perwerde dikin*." Me wisa xort tenê serê xwe, cuda perwerde dikirin. Lê nedizanîn ku keç di nav de hene.

Beriya ku şer dest pê bike, me navenda kontrolê girtin. Ji ber ku li hemberî rêjîmê wisa meşeke siyasî çêbû. Gotin *"ji bajar û gundê me derkevin, em ê xwe bi xwe bimeşînin."* Dema ku wisa serhildanên sivîl ên gel çêbûn û wisa hinek saziyên dewletê girtin destê xwe; hem ê siyasî û hem ê civakî, hem ê perwerdeyê, hem ê leşkerî, valatiyeke pir mezin çêbibû. Hema di wê kêliyê de ew ciwanên hatine rêxistinkirin, ew keçên hatine amadekirin li ser ferasetê parastinê, me dîrek ew bi cih kirin.

Mînak li ser cihên kontrolê sekinîn, hinekan sazî parastin. Baregehên ser sînorê Tirkiyê hebûn, yên bajarê Amûdê; heft baregeh hebûn, ji neçarî ew ciwanên me bi dizî perwerde kirine, me li ser wan belav kirin. Ji bo hem ji aliyê siyasî ve û hem jî ji aliyê leşkerî ve valatî çênebe. Herî kêm bikaribin parastina wan bikin. Da ku neyên şewitandin, neyên talankirin. Wisa bikeve xizmeta gel. Nekeve bin kontrolê hin kesên berjewendîperest. Bila bibe malê gel. Ev pir baş bû jî.

**'Şerê Herî Mezin Me destpêkê Bi Dayik û Bavên Xwe Re Kir...'**

Dema ku cara yekemîn keç derketin ser cihên kontrolê tû kesî nas nedikirin. Ji ber ku me rûyên wan girtibûn. Wêke destpêk bû, me got bila wisa bandora xwe zêdetir bike. Veşartî bû jî, me got bila zû neyên naskirin. Me rûyên wan girtibû, kincên wan cuda lê kiribûn. Yanî bav û dayik diçûn gel keçê xwe lê nedizanîn zarokên wan in, silav didan derbas dibûn. Digotin, *"xwedê we bihêle*" û dua dikirin.

Piştî mehekê fêm kirin ku keçên wan in, jixwe îsyan çêbû. Şerekî herî mezin me destpêkê bi dayik û bav re kir, bi civakê re kir. Piştre em gihîştin asta rêxistinbûna leşkerî û me li hemberî dijmin kir. Ger ew jê re ne amade bûna şer jî bi ser nediket. Piştre hêdî hêdî kesên nêzî me weke neçar man qebûl bikin. Mînak, dîtin keça wan perwerde dîtiye 6-7 mehan çek bi kar aniye, hindek ji wan tirsyan jî. Gotin, '*vaye keç elimîne çekê em nikarin weke berê zor û zordariya xwe jî bimeşînin.'* Fikarên wan jî çêbûn.

Ji bo vê jî êdî nedikarî xwe li ser serê jinê venana. Jin li kêleka wan li hecizan, di nava baregehên li ser sînor bûn; bi rastî jî dema ku meşek çêdibê parastina wê mêşê û dema ku pêwîstiyek çêdibe,

zahmetiyek çêdibê ev keç diçin wan tînin. Piştre asayîş çêbû, lê vê ji aliyê leşkerî ve bandoreke pir mezin di nava civaka Amûdê de kir.

**YPJ, Di Nava Şoreşê De Şoreş e!**

***-Li Rojhilata Navîn ji derveyî Kurdan di nava ti arteşan de jin tine ne. Dibe ku zehmetiyên wê hebin, lê dema ku jina Kurd hêza xwe ya parastinê ava dikir, tesîreke çawa dikir?***

Niha ji bo avabûna YPJ'ê weke her kes dizane, her kes dibêje qey di nava mehekê de û rojekê de hatiye avakirin. Ne wisa ye. Mîraseke wê ya pir dîrokî heye, çandî heye. Bi taybetî di Rojhilata Navîn de mîrasa civaka xwezayî, civaka Neolotîk heye. Piştî ku dîroka serdest hatiye avakirin ev mîras, ev çand hatiye wendakirin. Ji milê fermiyetê ve hatiye wendakirin lê ji milê cewherî ve her xwe parastiye. Di herêma xwe de, di gund û bajarê xwe de xwe parastiye. Wisa di nava malê de be jî xwe parastiye, îro weke rêxistin hatiye nav lê kirin, lê ji vê mîrasê tê.

Mînak, di şerê ku di Rojhilata Navîn de hatiye kirin de, bi taybetî şerê ku ji aliyê jinên Kurd ve di herêmen Kurdistanê de, di dema eşîran de, di dema qebîleyan de an jî di demê tarîqatan de hatiye kirin heye; jin bi rola xwe rabûne. Hem jî di milê siyasî de, ji milê rêxistinbûnê ve û kêm be jî ji milê leşkerî ve erka xwe pêk anîne. Lê bi taybetî piştî tevgera rizgariya jinê hate avakirin; mîrasek çêbûn, YPJ'ê bi vê mîrasê xwe amade kir, bi vê mîrasê derket holê. Ji ber ku ev mîras tineba YPJ'ê nedikarîbû li hemberî vê êrîşa hovane xwe bigirta. Ji ber ku dîrokeke wê ya xurt li hemberî hemû êrîşa serdest hebû û li ber xwe dabû derket holê. Îro li Rojava, li hemberî hovitiya ku bi navê dijmin ê DAIŞ, xwe li ser piyan digire û moral û kelecaneke pir mezin bi hemû hevalên xwe, civaka xwe û dinyayê re parve dike. Ew kenê li ser rûyê wan vê mîrasê îfade dike.

Jina Kurd, erê di fermiyetê de li ser kaxizê tineye, lê di nava civaka xwe de her li ser piyan maye. Ji bo vê tiştê ku YPJ'ê kiriye, tenê ev komkirin e. Komkirina siyasî, komkirina polîtîk û leşkerî ye. Bi taybet ji aliyê leşkertiyê ve bûye zirveya herî dawî. Ji bo wê jî, tu îro dibînî jinên Rojavayê Kurdistanê li dinê bûne mînak. Jinên Ereb, jinên Aşûrî, jinên Suryanî, jinên Tirk di nava YPG'ê de xwe îfade dikin. Li kêleka wê ne tenê moral û kelecan, weke rêxistinbûn jî pêşengî dike û di roja me ya îro de bûye mînak.

Li cihekî weke Suriyê, jin dikane li wê derê siyasetê bike. Kêm be jî, ew nasname jê re hatibû dayin. Lê ne bi zêhniyeta xwe, ne bi çanda xwe û ne bi rihê xwe, ne bi nasnameya xwe ya weke jin. Yanî sîstema ku heyî dikane di nava wê de cih bigire. Lê di vê derê de ew xapandin-şaşitî hate şikênandin. Mînak, dîtin ku ew jî jin in, ew jî ji Rojava ne, dibe ku weke wan sîstemê ji milê fermiyetê ve ew destek nekirine. Di nava siyasetê de wisa cihekî li pêş negirtine, ji milê çandî ve, ji milê perwerdeyê ve dibe ku wisa cihekî diyar negirtine; lê ji aliyê jiyanî ve ew cewher ji ber ku hebû, îro ji wan jinan re jî bûne mînak. Ew jin jî tên û xwe bi şexsê YPJ'ê îfade dikin.

Bi taybetî dema li cihanê şer çêdibe ev tê zanîn, di hemû şoreşên ji derveyê YPJ ku tê de jin hebûne ev mînak e, destpêkê êrîşî ser jin û keçan dikin. Ji ber ku jin û keç di nava şoreşên hemû dinyayê de di hemû şerê ku li dinya û Rojhilata Navîn tê kirin, berdêlê herî mezin dide. Çanda xenîmetê ku 5 hezar sal ji xwe re her tişt heq dîtiye, bêhtir ev di şexsê jinê de, ev ji xwe re fermî kiriye. Yanî tu çi bigirê, tu dikarê bikirê û bifiroşî. Jixwe di serî de jî jin hatibû kolekirin. Çanda xanedaniyê ev rewa kiribû, bi riya Îslamiyet û şerîata heyî.

Lê îro, YPJ'ê ji vê çandê re got: *"Bes! Ev ne çarenûs e."* Jin di mala xwe de di nava çar dîwaran de agahiya wê ji siyasetê, ji parastinê tinebe, eger êrîş jî hat jin dibe berdêla wê; ji vê çandê re jî got, bes e. Yanî ew zincîr di wê derê de şikest, ew zincîra 5 hezar sal.

**'Çawa Bê Av û Nan Nabe, Ji Bo Jinê Bê Parastin Jî Nabe...'**

Bi rastî jî zêde pêwîstî pê tineye ku mirov YPJ'ê bi gotinên felsefîk, dîrokî bi nav bike. Bi kurtasî mirov dikare bibêje, YPJ di nava şoreşê de şoreş e. YPJ'ê jiyan bi xwe ye. Jiyan di civakbûna yekemîn de li derdorê çi tê avakirin? Jiyan li derdora jinê tê avakirin. Li derdora nasnameya jinê tê avakirin.

Yanî rêgeza xwe parastinê jiyana mirovan da rêgeza hebûnê ye. Çawa ku bê av nabe, bê nan nabe, ji xwe beriya vana bêyî parastin jî nabe. Bi taybetî ji bo jinê jî, YPJ'ê ev da naskirin. Ku parastin nebe tiştekî te jî tineye. Mînak, me dît; jinên ku di nava pergala serdest de xwe bi mertalên zanistê xurt kiribûn û digotin, "*va em wisa zane ne.*" Dema ku êrîş hat herî destpêkê ew li holê man, ew bê kes û bê xwedî man û kesî wan tinebû wan biparêze. Heta niha jî termê pirek ji wana di kolanan da, di ser-goyan de tê dîtin.

Herî diyar di mînaka Şengalê de. Jinê ji aliyê leşkerî ve xwe birêxistin nekiribû, derket holê ku dema ew bi xwe parastina xwe nekin, ti kes nikare parastina wan bike. Weke xenîmet, îro 3-4 hezar jinên Kurdên Êzîdî ku ketine destê DAIŞ'ê hene. Yanî li wê derê komkujiyek çêbû. Cihêkî lê parastin tinebe, li wê derê komkujiya jinan e.

Mînak, di tevkujiya Şengalê de, du taybetmendiyên jinê derketin holê. Ya yekemîn parlementera bi navê Viyan ku bi eslê xwe Êzîdî bû û di meclisa Iraqê de li ser tevkujiya Şengalê digiriya; ya din jî sekna jinên Şengalê û sekna YPJ'ê ku hate hewara bi giştî Şengalê.

Tabî di van her du taybetmendiyên jinê de, mirov dikare du sîsteman bigire dest: Yek, dîroka 5 hezar sal jin tine kiriye, jin wisa kedî kiriye. Jin dikane tenê li hemberê sîstema zilam qîr bike, hawar bike, giliya xwe bike û parastinê bixwaze. Yanî ji derveyê xwe, hêvî ji zilam û ji sîstemê dike. Yek ev taybetmendî e. Jina ku 5 hezar sal e ji cewhera xwe, ji nasnameya xwe, ji kesayetiya xwe dûr ketiye, ji rastiya xwe ya civakî, siyasî dûr ketiye û parastina leşkerî dûr ketiye. Jina ku di nava çar dîwaran de, tenê wisa weke xemla tiştekî be ye.

Lê li kêleka wê jina ku xwe afirandiye, vegeriye ser koka xwe û ser mîrasa xwe heye; hem di milê siyasî de, hem di milê perwerdeyê de, hem di milê heta dawî bîr û baweriya xwe ve wisa ye. Ji bo vê jî, ev dihêle ku îro jin ji aliyê parastinê ve, ne tenê xwe û civaka xwe li kêleka xwe bi cîranên xwe jî, vê bide nîşandan. Mînak, ev jinên ciwan bûn; lê ji aliyê dîroka xwe ve pir têr û tijî bûn, di kesayetiya wan de tenê bûye şikl, bûye laş. Yanî mîras di şexsa wan de xwe şênber kiriye û pêşengî dike. Ji bo vê yekê, karektera ku bêçare ye û di pêvajoya herî zehmet a nava şer de, çare ava dike.

***-Bi vî rengî ketina nava şer û parastina xwe avakirina jinê, li ser jinên di nava civakê de tesîreke çawa kir?***

Şer di dinyayê de tiştekî herî zehmet e. Herî zêde jin tê de hatiye kuştin, hatiye tecîzkirin, hatiye tecawizkirin, hatiye firotin. Bes îro jinê ev şikênand û berovajiya vê, civakê ava dike. Mînak, jineke YPJ'yî li kû derê be li wê derê civak tê avakirin. Jinên li wir, pir rehet dikarin civaka xwe ava bikin. Di cepheya pêş de erê YPJ'ê şer dike, parastin dike, lê li pişta wê civakek hatiye avakirin, saziyek hatiye avakirin. Yanî civaka xweseriya demokratîk di pêşengiya jinê de tê avakirin. Îro li Rojava jin civakeke nû ya wekhev ava dikin.

Jinê berê di nava çar dîwaran de bû. Ne îradeyeke wê ya siyasî hebû, ne îradeyeke wê ya leşkerî hebû, ya hunerî, ya xwe perwerdekirinê, ne îradeyeke wê ya xwe bi nasnamekirinê hebû. Berê wisa tenê heykelek bû. Navê wê 'jin' bû. Bes îro jinê ev dîwar şikandin, çar dîwar şikandin û herikî nava civakê. Mînak, di hemû saziyan de jin li kêleka mêr bi deng û reng û nasnameya xwe heye. Niha di saziyên hatine avakirin de,  di civak ji nû ve avakirinê de, jin nêrîn dide, jin di wir de sîstem didê, ava dike. Jin di wir de birastî jî îradeyeke pir mezin nîşan dide. Hem ji bo civaka xwe, hem ji bo cinsê xwe... Tewîz nade sîstema serdest ku di şexsê mêr de wisa bûye weke qalib. Ji bo vê ev nûbûn e, îro li kola-nan binêre tu yê fêm bikî ku çi ye yanî. Ne hewce ye pir wisa mirov li ser şîrove jî bike. Li şexsa Şoreşa Rojava binêre tu yê jinê bibînî.

Dîsa, hêza bîryargirtinê di nava leşkeriyê de wisa ne hêsan e; berdêla vê bi canê xwe da. Keseke ku bikanibe xwe feda bike, tiştekî ku nikanibe bi ser bixe tineye. Yanî ew civaka ku rûtin, klasîk fêr bibû şikênand. Ew zincîrê kevneşopbûnê, paşverûtiyê di şexsa xwe de şikênand. Ew zivirand teqîneke bîryarê, zivirand teqînekê mezin di aliyê bîryarê de. Ji ber ku civak bi vî awayî nabe, jiyan bi vî awayî rûtîn nabê. Eger bibe dê wekhev be. Di her milî de wekhev be. Bi taybetî jî ev ji îradeya xwezayî tê; ji naskirina dîrok, felsefeya jiyana wekhev, jiyana komîn tê. Ku di kesayetiya jinê de hatibû tinekirin, hatibû kuştin û hatibû piştperdekirin.

Bes di kesayetiya keçên ciwan de, ji nû ve derketina ser rûyê erdê, civaka hemû mirovahiyê şiyar bû. Ev di heman demê de bîryarek bû. Ev bîryar jî, bi vî awayî bû: Civaka ku ez ê li wê derê hebim, ez ê wisa jiyan bikim, an jî ez ê nebim. Ez ê ne esîr bim, ne kole bim; ez ê ne piştperde bim. Ez ê wekhev, li her derê bim.

Xwe fedakirin jî di serî de tê. Dema ku bîryara fedayitiyê hebe, li wê derê her tim nûbûn û dewlemendbûn heye. YPJ'ê ev bi xwe ye yanî. Her tim xwe ji xwe nû dike, dizivire zanisteke pir mezin ku li Rojava bûye mînak, ji bo Rojhilata Navîn û bi taybetî jî ji kesên Rojavayî re. Bi xeyalên xwe yên şaş pir kesên nivîskar hatin, ji wan bû ku YPJ'ê hema weke çiqilê darekê, dareke bê kok û gulek li ser wê şîn daye. Lê piştî ku ew jiyan kirin û hinek tişt bi wan ve parve kirin, ev dîtin ku ne wisa ye.

Têkoşina jinê tenê ne şerekî çekdarî ye. Eger tenê ev baya, ev di nava artêşên din de jî heye. Mînak di artêşên sîstemên serdest de jin hene; di şoreşên din de jî jin hene, ne ku cara destpêkê leşkertî em dikin, me çek rakiriye. Lê cara yekê ye ku jin li gel me jiyanê ava dike. Ji bo vê deng daye û bûye mînak. Van jinan jî dema hatin diyalog kirin û hinekê jiyan kirin, ev nêzîkbûna xwe ya şaş dîtin. Tu dibêjî qey YPJ'ê tenê leşkertiyeke zûha ye, weke ku di nava sîstemên serdest de fêr bûne, leşkertiyeke zûha û rûtîn, YPG'ê bi vî awayî ye. Pêkhateyek ku amade ye ber bi çetebûnê ve biçe. Lê dema hatin dîtin, fêm kirin ku ya herî dawî ew e.

Şerê wan ê herî dawî bi dijmin re ye. Çek û şerê li dijî dijmin, milekî têkoşînê ye û ya herî dawî ye. Hê bêhtir jina ku di her milî de xwe bi çek kiriye, bûye xwediyê parastin. Piştre ziviriye hêzeke leşkerî, li ser rûyê dinyayê û li hemberî çeteyên DAIŞ'ê sekiniye. Di vê derê de ev nêzîkbûna xwe ya şaş dîtin. Yanî wan digot qey haya me ji dîroka mirovahiyê tineye, haya me ji siyasetê û rêxistibûnê tineye, haya me ji azadiya civakî û kes tineye; tenê wisa civakeke di nava bajar û gundê xwe de ji her tiştî qut, wisa van bi awayekî seretayî jiyan dikin, di nava xwezayê de jiyana sereyî dijîn. Dema ku êrîşek jî hatiye, me destê xwe rakiriye û me wisa xwe parastiye. Tabî ku rastî ne wisa ye.

Ev nêzîkbûnên wan ên şaş, jixwe di Rojava de li pêş çavên wan hilweşiya. Ji ber ku bi çavê oryantalîst li Rojhilata Navîn dinêriyan, bi taybetî jî li jinên Kurd; lewra weke min got, di dîn de rola jinê tinebû. Di zanista heyî de, wisa rola jinê ne ber bi çav bû. Bi taybetî jî di nava leşkeriyetê de, leşkeriya sîstema serdest fêm dikirin. Lê dema hatin tîmên YPJ'ê dîtin û di cebheyê de bi wan re jiyan kirin, bi rastî jî dîtin ev civakê ne qut in; ji zanista rast, ji heqîqetê ne qut in. Heqîqeta herî rast ew dijîn.

Li ser vê esasî YPJ'e ev e; di kesayetiya sîstema serdest de jina ku hatibû avakirin, hemû hilweşandin e. Em dikarin bi rehetî vê bibêjin; YPJ'ê hilweşandina sîstema ku pênc hezar sal e zilam li ser jinê ava kiribû. Bi gotineke herî kurt mirov dikare wisa îfade bike. Bi parastina cewherî, avakirina jiyana cewherî ye; gotin û parastina heqîqetê ye. YPJ'ê vê îfade dike. Yanî ji dîrokê ne qut e, ji civakê ne qut e. Bi taybetî ji jinbûnê, ji cewhera xwe ne qut e.

Dema ku ew rojnamevanên oryantalîst, nû hatibûn; YPJ'ê tenê bi milê wê yê leşkerî nas kiribûn. Yanî weke bejin, *"va hin jin in hatine gel hev, hinekê ji çekan fêm kirine, wisa bi awayekî qebe têkoşîn dikin û xwe diparêzin."* Li hemberî DAIŞ'ê hemû dewlet, hemû sîstemên serdêst li hemberî wê direve çawa keçeke 15-16 salî li hemberê van disekine? Ev nêzîkbûneke pir qebe û pir şiklî bû. Ji ber ku cewhera YPJ'ê ne ev bû.

Di jiyana xwe ya 24 saetan de xwe bi program kirine. ji rojbaşekê heya êvarê hemû tiştê wan di zeman û mekanê xwe de pir bi rêkûpêkiyeke xwezayî pêk tê, bê emr û talîmat, bêyî ku yek li ser ferz bike, weke pêwîstiyên jiyanî ku însanek dixwaze bijî, çawa ku jê re hinek tiştên esasî pêwist e, YPJ jî ev bi xwe ye. Jiyan di detayên wê de avakirin e. Bi eşq diçe ser kar, bi eşq diçe ser xwarinê. Di wê derê de her tişt bi ken û eşq tê kirin. Yanî wisa ne weke talîmatek e, jiyan ne tenê bi wî şerî xwe parastin e. Her tiştî bi eşq dike, her tiştî bi evîndarî dike. Weke pêwîstiyeke azadiyê dikir.

Mîrasê Tevgera Jina Azad, îro xwe di nava civakê de pêk tîne. Ji bo wê jî civakeke nû û jiyaneke wê heye. Di gundê xwe de, di bajarê xwe de, di mala xwe de, di mintiqa û coxrafyaya ku tê de jiyan dike, pir rehet dikane bi jinên din re bibêje, *'jiyaneke bi vî awayî heye, ne hewce ye tu serê xwe daynî, bibî kole û esîr, weke xenîmet.'* Lê li şûna wê jiyaneke ku cewhera wê azadbûna hemû jinan û neteweyan e dipêjirîne. Bêyî ku tu vê bibînî dîrokeke nû tê avakirin, jiyaneke nû tê afirandin. Berdêla wê çi dibe jî, wê dizanin, dizanin ku berdêla wê giran e lê ji ber ku heqîqet û azadiyê di vê rê de dibîne, ji bo vê jî ti carî ne poşman e û ew kenê wan wê îfade dike.

Ji bo jinên cîhanê; va hin tên Rojava dibînin, jin di kesayetiya YPJ'ê de bûye alternatîfa hemû sîstemên heyî. Her kes bêyî ku em bang bikin, bi xwe jî tên. Ez jî dixwazim hê zêdetir werin, ew bi xwe bibînin...

**3-Di Şerê Deşt û Bajaran De Taktîk**

***-Cihên weke Serêkaniyê, Helep û Kobanê hûn di nava şer de bûn. Jixwe di beşên pêwîst de, ew şer bi awayekî kîte hatine vekirin. Lê ji ber ku bi beşên leşkerî ve girêdayî ye em dipirsin; li van deran ji milê teqtîk ve şerekî çawa hate meşandin, ji milê leşkerî ve encamên çawa derketin holê?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Şerê bajaran, ne weke şerê deşt û çiyan e. Bi taybetî di şexsê şerê Kobanê dê dixwazim hin tiştan diyar bikim. Lewma şerê bajaran, li Kobanê gihişt asta herî jor. Mirov dikare bibêje tû hêz nikarin weke YPG û YPJ şerê bajaran bimeşînin. Li Kobanê hêza me sîng bi sîng şer kirin û teqtîkên şerê bajaran pêş xistin. Bi vî awayî gav bi gav pêş ve çûn û Kobanê wisa rizgar bû. Hemû teqtîkan em dikarin bînin ziman.

Xaniyên Kobanê pir ne bilind in, lê gelek kolanên wê hene. Cûdahî di navbera şerê Serekaniyê, Helep û Kobanê dê jî hebûn. Di şerê Serekaniyê de me hinek ecemîtî jiyan dikirin. Heya ku em elimîn, pir dem ser re derbas bû. Lê em dikarin bibêjin, li Serekaniyê ji sedî bîst, li Helebê ji sedî şeşt û Kobanê jî ji sedî sed qûral û qeîdeyên şerê bajaran pêk hatin. Wan teqtîkan hişt ku dijmin ji Kobanê bê derxistin. Ji bo ku dijminên ber xwe didin bên kûştin û yên din jî birevin, ew yek pêwîst dikir.

Qûral û qeîdeyên şer hene, tenê fîşek teqandin nîne. Ya mûhîm, tuyê ew çeka di destê xwe de çawa bide şûxilandin e. Divê tu di ziraviyan de qûralan pêk bînê. Di destpêkê de divê tu amadekariyên xwe baş bikê.

Disa di şerê bajaran de perde pir stratejîk in. Di şerê Serekaniyê de me perde wisa pir seranser kar anîn. Pir baweriya me pê tine bû. Lê li Helebê me hinekî din giringî dayê, me dû metro datanîn û me digot, "bes e." Me digot, "*em ji ber re herin û werin bes e.*" Lê Kobanê divê zêdetir bilind bana. Me hemû kolan kirin perde. Lewra ji bo ku tû ji kolaneke biçê yek din, îmkanê bi arabayan çûnê tine. Lewra dijmin li ser hemû bînayên bilind sekvan danîne û tu nikarê bi awayekî ewle ji aliyekî kolanê biçê aliyê din.

Gelek hevalan ji ber ku perde nedaliqandibûn, şehadet çêbûn. Ez dikarim bibêjim ku şehadetên me ji sedî heftî di kolanan de çêbûn. Ger tu kolanên xwe negrê, teknîka dijmin xurt e, heya hezar û pensid metrî jî diavitin.

Hinek çek me li ser wan rakirin, çekên balkeş bûn. Fîşekên doçqayê dixistinê û dûrbîn jî li ser bû. Bi awayên cuda, bi rêkên ne paqij ew çekên xurt bi dest xwe dixistin. Gelek dewletên ku alîkariya wan dikin hene, her cûre çek di destê wan de hebûn. Divê em wisa biçûk negrin dest. Ji sedî heftî hevalên me di kolanan de şehîd ketin. Ger wisa be, em ê tevdîrên xwe bigrin û kêmtir şehîd bidin.

Mînakên vê di şerê Kobanê de derketin holê. Ger te perde danî, divê bigêhêje heta serê dîwaran, wisa dû metro bes nake. Divê bi kabloyekî, an jî tayekî ve baş bê girêdan û derkeve asta dîwar. Ger dû metro be, sekvan jî sed û pencî metro dûr be, dikare li te bide. Lê dema ku perdeya te bilind be û an jî panzdeh metro be û her qûncikekî jî kevirekî pê ve girê bide, ase bike qet tiştek nabe. Wisa psîkolojiya dijmin xirab dibe. Di serî de çend fîşekan diavêje, lê pişt re dev jê berdide. Divê teqez ew rêbaz esas bê girtin.

Mesela hevalê Cûdî çawa şehîd ket? Deh kolanan dûrî dijmin bû û di nava qûvetan de digeriya. Dijmin ji dûr ve ew fîşekên çeka weke Zagrosê avitinê. Ew fîşek ji dîwar ket û parçeyekî fîşekê li ser dilê wî ket. Heya ku gihişt nexweşxaneyê şehîd ket. Rûxmî ku hevalekî xwedî ezmûn bû, ew qesa şer kiribû, lê ji ber ku perde dînenabû û ji ber dîwar re nemeşiya bû şehîd ket.

Wisa di şerê Serekaniyê û Helebê de me pir birîndar dan lê Kobanê bi vî awayî me pir şehîd dan. Ger ew cihên ku hatine diyarkirin, perde bihata danîn wisa nedibû. Lê divê me pêk jî bianibaya. Çiqasa heval eciz dibin bila bibin, divê me ew perde danîbana. Jixwe di nava wî şerî de ne gengaz e ku tu treks bînê û li serê her kolanê çeperan çêkê. Lê perde rêbaza herî pratîk e. Dema perde hebin, dijmin

te nabîne. Ji ber vê divê em meseleya perdeyan stratejîk bigrin dest û her hevalekî ku çûye şerê bajaran vê esas bigre. Li cihekî tu şer dikê, bila peywira komeke tenê perde danîn be.

Ger derî û şibake vekirîbin, divê li wir jî perde bê danîn. An na ji dûr ve sekvanê dijmin te bibîne, wê li te bixe. Divê em nebêjin ku em di hûndirê xanî de ne û tiştek nabe. Dibe ku çend fîşekan jî biavêje, lê dema ku dîmen nedît dê dev jê berde. Mesela hevalê Xemgîn, perde denanî bû. Dema ku şer dike, bi awayekî lezgîn diçe aliyekî xanî. Lê dema ku dijmin wî dibîne, di zivirînê de lê dixe. Ger ew xanî perdekirîbaya, şehîd nediket. Ji ber vê divê em stratejîk bigrin.

Mesela li aliyê hecizê xaniyekî di nava araziye de û li hemberî doçqayên dijmin hebû. Me hinek bermîl danîn û hinek dar xistinê û ew mesafeya sed metrî hemû me kir perde. Em bi awayekî rehet diçin û dihatin. Lê dema ku tinebûya, me nedikarî em xwe bigihînin wê malê. Lewra li hemberî çeperên doçqayan, di navbera me û wî xanî de qadeke sed metro hebû.

Dîsa dema ku hevala Ozgûr şehîd ket, ba perdeyên wan xistibûn. Ger ew perde neketana, ne hevala Ozgur, ne jî hevala Têkoşîn şehîd diket. Dê bi awayekî rehet ji ber perdeyên xwe re biçana û bihatana. Ji ber ku ji kolanê re dibezin, sekvan lê dide û şehîd dikevin. Carna ba tê, baran tê û perde dikevin. An jî tazyîqa teqînan perdeyan dixe, divê teqez wê şevê ew perdeya ku ketiye bê sererastkirin. An na tûyê xwînê birijînê. Me ew hemû jiyan kirine.

Hinek hevalan digot, “*cihê me deşifre dibe.*” Jixwe tu bi dijmin re sîng bi sîng şer dikê, çawa cihê te deşifre dibe. Hûn li hemberî hev fîşekan diavêjin hev. Tiştekî deşifre bibe tine. Ger pir deşîfrebûn tê fikirîn jî, divê çep û rast wan xaniyên derdorê xwe jî hinek perdeyan bidaliqînin. Mesela cihekî hevalan gotin, “dema ku em perde datînin cihê me deşîfre dibe û tang diavêje me,” me jî got, wê kolanê hemûyê bikin perde, her panzdeh metroyan careke perdeyekê bi dîwar ve berdin. Wisa be dê biavêje kû navêje kû. Pişt re nikarî biavêje cihê hevalan.

Mijara xereqe vekirinê heye. Em kûnên di nava dîwaran da tê vekirin, jê re dibêjin xereqe. Ger di şerê bajaran de xereqeyan venekê û ji kolanan re herê û werê, tuyê bibê sedema windahiyan. Ji ber vê dema ku tu ketê şer divê balyozê te, bi te re be. Di demên dorpêçê de, di demên nêzikî dijmin de û di demên ku tu dixwazê pêş ve biçe de, tiştê herî girîng balyoz e. Divê her tîmekî re balyoz hebe. Di şerê gund û deştan de jî divê balyoz her bi te re be. Ji bo xereqeyan, teqez balyoz pêwîst dike.

Mesela em bibêjin kolan ji dirêjiyê sed metro ye, ji firehî pencî metro ye. Divê tu nebêjê sed metroye û ez ê bibezim. Divê tû nebêjê ez ê pişt perdeyan re jî biçim. Divê her pişta te vekirî be, da ku her tû bikaribê paş ve û pêş ve biçe. Bikarê manewra bikê. Dema tu tengav bûyê, dê ji wê xereqeyê re teqwiye û cebilxane ji te re were. Birîndarekî te çêbe, bê xereqe tu nikarê wî rizgar bikê. Ger cihekî bîst heval hebin, divê deh heval nobeta xwe bigrin û şer bikin, deh heval xereqeyan vekin.

Xereqe kûnên mezin in. Divê qesî ku mirov bikaribe tê re derbas bibe kûnan vekin. Bila mirov biweste jî. Lê cihê ku mirov di şer de xwînê birijîne, divê berî şer mirov xwedanê birijîne. Hinek hevalan digotin, “*ew malên gel in û em nikarin kûn bikin.*” Lê tu şehîdan didê. Ger tu wir neparêzê, ew bi giştî diçe. Pişt re tu dikarê çend pîrîketan bide ser û hinek çîmento lêxê. Me li Helebê gelek caran wisa dikir. Dema ku şer nebe, me xanî weka bere tamîr dikirin. Heval carna di vê mijarê de hestiyar nêz dibûn. Lê tu wir êniyan vedikê û Kurdistanê diparêzê.

Di şerê gund û deştan de mirov dikare komên biçûk bike tevgerê û teqtîkên gerîla bi kar bîne. Wisa mirov dikare derbe li dijmin bixe û hin teqtîkên weke sabotaj û çalakiyên gerîla bi kar bîne. Lê di nava bajêr de, tu sîng bi sîng şer dikê û qada di destê xwe de diparêzê. Divê her hevalek ew êniya ku diparêze weke Kurdistaneke biçûk bibîne.

Hinek heval dihatin, digotin “*ma em şerê kozikan dikin, şer*ê *Hîlvanê û Sîwerekê dikin ku em sîng bi sîng şer bikin.*” Ew dem cûda ye, derfetên niha cûda ne. ji bo ku hevalan newestin, an jî di çeperan de nesekinin nerazîbûn nîşan didan. Jixwe ew nêzikbûneke me ye, Serokatî jî berê pir rexne kiriye; em cihekî digrin û li wir nasekinin, wir naparêzin. Gelek caran heval wisa nêz dibûn. Lê te wir xwîn rijandiye, berdel dane. Divê tu wê derê biparêzê. Hemûyan digotin, *“em amadene ku êrîş bikin.*” Bi rastî jî rihê êrîşê xurt bû. Lê di parastin û pergal avakirinê de em lewaz bûn. Ger em çeperan negrin, bila em bi salan jî şer bikin.

Ya din, ji bo ku tu şerê xwe baş bikê; dema ku tu ketê xaniyan, dê tuyê wan derî û şibakayan hemûyan bigrê. Mesela tu di kolaneke ji firehî pencî, bi dirêjiyê sed metro de yê. Dibe ku dijmin bixwaze bê û ji deriyekî re veşartî were û êrîş bike. Di wê kolanê de pencî mal heye, tu nikarê

hemûyan hevalan têkê. Bi firehî divê tu derî û pencereyan hemûyan bigrê û bi xereqeyan wan xaniyan hemûyan veke û xetekê çêkê. Dema ku dijmin bixwaze bi balyozan derî bişkîne û bikeve hûndir jî dê tuyê bi xwe bihesê. Tuyê werê wir û bombayekê biavêjê.

Di şerê bajaran de divê her bombe li gel te be. Mesela carna tu û dijmin pir nêzikî hev dibin, tu guleyan li ser direşînê, lê ji ber ku xwe dide ber dîwar bê feyde ye. Lê dema ku tu bombayekê diavêjê, ti kes li wir namîne.

Mesela li Helebê, ji ber ku qûweta me pir kêm bû, em neçar bûn ku pir çeperan çêkin. Dive navbera her hevalek de 70 metro hebûya. Dema ku hevalan hemû derî û şibake digirtin û xereqeyek jî vedikirin, dijmin dihat ber derî gule dibarandin. Lê dema ku hevalan fîşekek yan bombeyek diavitin ser, direviya û diçû. Lê ger derî û şibake negirtîbana, dê tuyê parastina kû bikê. Jixwe dijmin nedizanî ku xereqe ji ku dere vebûne.

Ji bo parastinê tiştekî din jî, li hemberî maşîneyan tevdîr girtin e. Mesela DAİŞ pir erebe diteqandin. Divê berî ku maşîne bigêhêje te, di mesafeya pencî metroyî de tu wê îmha bikê. Jixwe dema ku bigêhêje gel te û biteqe dê ew bîna ji ser te de were xwarê. Treks hebe, divê tu bikolê. Tinebe jî divê teqez di êniya pêş de tu riyan qût bikê. Heya 80 metro jî divê maşîne ji dûrî te bê îmha kirin. Yên çalakiyên întîharî dikin hinek heban dixûn, hinek jî li ser navê Îslamiyetê û nizanim çi xwe diteqînin. Carna zarokan jî dişînin. Ger di destê te de qet derfet tinebin jî, divê di hûndirê malan de wan kûrsî û tiştên weke sindoqan biavêjê ser rê û rê qût bikê. Dibe ku ew tişt yeksek maşîneyê jî nedin sekinandin, lê wê demekê pê ve ase bimînin. Heya ku xwe rizgar bike, tuyê bi B7’an lêbixê.

Hevalan gelek maşîne wisa îmha kirin. Çend maşîneyên dijmin jî wisa ketin destê me. Hûndirê wan tijî teqemenî bû. Ji ber vê çi dibe bila bibe, dema ku te derfet dîtin divê 80 metro dûrî xwe tu rê qût bikê. Ger te nikarî wê jî bikê, dema ku maşîne hat, ji xereqê re xwe bide paş. Pencî metro paş ve were, dema ku maşîne teqiya dîsa bizivire. Jixwe dema ku maşîne diteqe ew êrîş dikin. An jî maşîneyê gulebaran bike. Carna hevalan wisa dikir, lastîkên wê diteqîn û nedikarî pêş ve were. Jixwe maşîne tijî ye û pir giran e, ji ber vê nikare bi lastîkên teqiyayî pêş ve bê. Ew kesê di hûndir de, an direviya û diçû, an jî hevalan dikûşt. Ji ber vê divê mirov van tiştan cîdî bigre. Dema ku te ji xereqeyê re pencî metro xwe da paş, dibe ku xaniyê destpêkê bê xarê, lê xaniyên din nayen xarê.

Ji aliyê çekên tên karanîn ve, qarnas çekeke girîng e. Sûîqast di bajaran de rista xwe pir dîlîze. Dema ku te cihê sûîqastvanan çêkir; divê tu di xaniyê pêşî de cih bibê. Lê divê tu dîwarê pêşî de nesekinê, divê hem dîwarê pêşî kûnekê vekê, hem jî ji rêza wê kûnê re di dîwarê paşî de jî kûnekê vekê û dîwarê dûdûyan de bisekinê. Dema wisa bibe, B7’an jî biavêjin te, tiştek bi te naye. Divê kûn jî ne yek bin, divê gelek kûn vebin ku dijmin bixape. An jî derfet hebin, divê ji aliyê derve ve bi teniyê wêneyê kûnan çêkê. Wisa her cih weke kûnan bê xûyakirin, dijmin nizane ku biavêje kû. Tenê kûnek be, dijmin jî dikare li te bixe.

Mesela hevalê Canfeda Efrîn hebû, diçe di cihekî stratejîk de bi cih dibe. Lê tenê kûnekê vedike, dijmin jî ji dûr ve diavêje kûnê û ji seriyê xwe fîşekê dûxe. Rûxmê ku dijmin wî nabîne û torbe jî dane ber kûnê, şehîd dikeve. Lê sê-çar kûn bana, dijmin nedizanî ku biavêje kû. Her wiha divê kûnên ku tên vekirin biçûk bin. Hinek hevalan qesî seriyê xwe kûn vedikirin, lê encam nedigirtin. Ji mile hûndir ve jî divê tu torbayan dagrê û bidê ber.

Di şerê bajaran de qarnas pir girîng in, lê ji ber ku pir bihabûn me nedikarî bistînin. Cihê wê mirov dikare dûrbînê bide ser qilêş û G3’ê jî. Mirov dikare dûrbînê bide ser bûrnoyê jî. Bûrno pir bi bandor e; hem menzîla wê pir e, hem jî dikarê yek bi yek biavêjê. Carna hevalên me bi qilêşan yek bi yek fîşek diavêtin, psîkolojiya dijmin binguhê hev diket. Digotin, qey qarnas li ser me ye. Ji ber vê jî divê em giraniyê bidin ser qarnasê û di avitinê de jî em xwe xurt bikin.

Ji aliyê sabotajê ve dijmin pir xurt bû. Her cûre mayin çêdikirin. Sabotaj ji bo me jî teqtîkek girîng e. Mesela hejmara te kêm be û qada ku tu diparêzê pir be. Mirov dikare li cihên ku dijmin were mayineke yê ku xefka vê bikişandinê ve ye dayne. Dema ku dijmin hat, biteqe û tuyê pê bihesê. Wisa tu dikarê xetekê parastinê jî çêbikê. Lê divê bi awayekî hasas û pîspor bê danîn. Tu dikarê mayinan dînê cihê çûn û hatinê yê dijmin. Vê tektîkê em jî li hemberî dijmin dişûxilînin û ew jî li hemberî me dişûxûlîne.

Divê li hemberî ew teqtîka dijmin jî em baldar bin. Mesela dema ku em pêy wan diketin, dijmin mayin datanîn û direviyan. Ji ber vê dema ku em pêşve çûn, divê tu kes bi mayinan nelîze. Divê em

rastgele neçin ser. Divê em deste xwe hema neavejin her tişte. Ger tu biçê û hema berê xwe bidê derî û bikevê hûndir, nabe. Pêwîst nake ku mirov bi derî re têkeve, mirov dikare ser dîwar jî xwe biavêje hûndir. Cihê ku em têkevin, divê em kontrol bikin.

Mesela hevalê Şiyar hebû; fermandar bû û di şer de jî risteke mezin lîst. Diçû kû bi ser diket. Ji milê rojavayê Kobanê, diçe û dikeve xaniyekî. Radihêje bataniyê û dikşîne, mayin diteqe. Dijmin mayin bi bataniyê ve girêdaye. Ew û sê hevalên gel wî, bi vî rengî şehîd ketin. Xeynî wê dema ku gundiyan çûn û deriyên xwe vekirin, mayin di wan de teqiyan. Mirov dikare xereqeyan jî veke û bikeve xaniyan. Yek jî divê mirov bi komî nekeve cihekî. Ew tiştên wisa bûn sedem ku em gelek şehadetan jiyan bikin. Ji ber vê divê em pir baldar bin.

Ji aliyê vedizînê ve, divê mirov bi mesafe bimeşe. Yek yê din biparêze. Mesela hevalên me careke bi awayekî veşartî dixwestin bikevin cihekî. Nikaribûn ji kolanê re biçin, xereqe vekiribûn. Dijmin pê hesiya bû û bombe avitibû nava wan. Çar-penc heval jî bi hev re meşiyabûn, bi vî rengî sê heval şehîd ketin. Dema ku heval xereqê vedikin, divê hevalên din çep û rast parastinê bikin.

Yek jî dibe ku dijmin ji aliyê hûndir ve li ber kûnê sekinîbe û gulebaran bike. Li hemberî vê jî divê dema ku te balyoz lêda û xereqe vekir, tu xwe bidê aliyekî. Jixwe tu pêşve diçê û psîkolojiya dijmin xirabe bûye, ji gulebarana ewil zêdetir nikare tiştekî bike, bes li hemberî gulebarana ewil xwe bide aliyekî. Dema ku te xereqe veke jî, her dîwar av bide, şil bike da ku toz ranebe û dijmin bi te nehese. Dîsa kûna ku tu cihê çekan diteqînê jî av bike. Da ku toz jê ranebe û dijmin cihê te nizanibe. Lewra kûnên din jî hene, dijmin nizane tu ji kîjan kûnê diavêjê. Lê dema ku tu av nekê, kûna ku tu wê fîşek diavêjê toz radibe. Dibe ku ew tiştên biçûk bin, lê dibe sedem ku jiyana hevalan biparêze.

Dijminê me, ne dijminekî wisa bi îstîkrar e. Navê wan yek bû, lê hêzên wan her dihatin guhertin. Qîrqîra wan bû û êrîş dikirin. Dixwestin li ser me şerê psikolojik bimeşînin. Lê dema ku me hinek şer dikir, direviyan û diçûn. Mesela qûwata wan ya Minbicê dihat darbe dixwar û diçû, lê dema ku piştî wan qûwetên Raqqa hatin, nedizanîn ku me çawa li wan daye. Lê yên me, heman heval bûn û di çeperên xwe de bûn. Ew jî ji bo me awantaj bû.

Bi kûrtasî di şerê bajaran de divê mirov van xalan baldar be. Mirov çiqasa bibêje jî, mirov tam nikare îzah bike. Mirov dikare bi dîtînê ve baştir fêm bike. Lê mirov mantiqê wê bigre, di astekê de têrî dike. Lê dîtin û gotin ne weke hev e. Jixwe mirov çiqasa bibêje jî, heya ku mirov nebine hinek tişt baş nayen fêmkirin. Lê ez jî bi pratîkê û bi dîtinê fêrî van tiştan bûm. Bi vî awayî jî baweriya min van teqtîk û rêbazan hat. Bi vî awayî di bajaran de mirov dikare şerê xwe pêş bixe û bibe serkeftinê.

***-Gelo heman rêgezên şer, ji bo gundan jî derbasdar in?***

Şerê bajaran û şerê gundan ne weke hev e. Divê di şerê gundan de mirov dijmin bixê nav xelekê. Divê tu çep û rast qûwetên xwe dînê û di mesafeyeke maqul da doçka bide xebitandin. Doçka di bajaran de, bê rist e. Lê di gundan de pir bi bandor e. BKC jî hema wisa. Bi qûwetên xwe yên din jî, dê tuyê riya dijmin qût bikê. Şerê gundan, ne weke şerê bajaran sîng bi sîng e. Divê tu dijmin bixê dorpêçê. Ji bo vê jî qûwetek zêde pêwîst dike.

Di vir de xetereya ku dijmin yekîneyek te bixe navbera xwe jî heye. Lê divê weke xelekekê bi hev re biçe û ji hev û din qût nebê. Di gundan de rista çekên giran; weke doçka, BKC, Qarnas, Zagros pir zêde ye. Dema ku tu ketê gundekî divê hêza te weke xelekekê rêz bibe. An na, tu ne baldar bê, xeterî heye.

Mesela li Kobanê, yekîneyek me pêş ve diçe. Dijmin dernakeve hemberî wan û pişt wan re dizivire. Ew heval wisa dikevin dorpêçê û şehîd dikevin. Divê hem çep û rast bi hev re biçin, hem jî cihê ku tu derbas bûyê tu parastina xwe bihêlê. Carna her cihekî hevalek dûdû hebin bes dike, lewra deşt e û nikare were ser te. Tu ji dûr ve lêdixê.

Tangan mirov dikare bi mayin û B7'ê îmha bike. Cihê we yê lewaz zîncîra wê ye. Ger tu zîncîrê darbe bikê, tang disekine. Ceribandina wê çêbûye. Panzer jî bi B7'ê tê îmha kirin. Careke tangek hat û ket nava hevalan. Hevalan bi B7'ê lêxist û agir pê ket. Cihên wê yên lewaz jî hene. Li gorî şerê bajaran, tehlukeya şerê gundan jî heye. Tu dikarê zû pêş ve biçê, lê rîska wî jî heye.

***-We jî di gelek pêngavên şer de cih girtiye, ji milê taktîk ve mirov dikare kîjan encaman jê derbixîne?***

**ÇIYA KOBANÊ:** Li ser esasê danevehên me ku çêbûne û waneyên ku me ji van berxwedanan derxistine; li hemberî êrîşên dijmin ên wekî DAİŞ, Cebhet El Nusra mirov çawa dikare xwe biparêze? Ji bo çar parçeyên Kurdistanê jî waneyên ku mirov jê derxîne hene. Mirov di bajarekî de êrîşên dijmin çawa dikare vala derxe û bişkîne? Di heman demê de mirov çawa pêngav dike, ger mirov êrîşî bajarekî yan jî gundekî bike, divê li ser çi esasî bibe? Ez dikarim Rojava mînak bigrim dest û hin teqtîkên şer bînim ser ziman. Ezmûnên Rojava mirov dikane gelek dersan jê derxe. Şerê bajaran ê çawa bibe, şerê kolanan ê çawa bibe? Van hemûyan pêwîstî heye ku li ser lêhûrbûn çêbibe.

Lê beriya vê ya Kurdistanê giştî mirov dest bigire wê rastir bibe. Weke gelê Kurd tecrubeyên me şerê çiya hene. Di çiyayên Kurdistanê de bi salan şerekî gerilla tê meşandin. Hemu parçeyên din a Kurdistanê tecrubeya şerê çiya çêbûn. Lê li Rojavayê Kurdistan ev yek tune bû. Li Rojavayê Kurdistan jî tecrubeya çil salî kirin bingeha ev şerê bajaran û şerê kolanan hat meşandin. Hêzeke çete ji derva hatibû û dixwest bajarên me, gundên me, kolanan me dagir bike. Bêguman li hemberî vî şerekî be hempa hate meşandin.

Niha ferqa çiyê û bajar çawa ye? Çiya cihekî bilind e. Gir hene, girên bilind hen, til hene. Lê di bajêr de xanî hene. Xaniyên bilind hene, mekteb hene, bînayet hene. Çiya ne wisa ye. Mirov dikane di çiya de di tepeyan de hem dikare xwe biparêze û hem jî ji bo ku tu bixwazî cihekî kişif bikî, tu xwe didî cihekî bilind, bi dûrbînê tu bi şiklekî baş dikanî bibînî. Li ser wê hedefê tu plansazî çêdikî.

Lê di deştê de ne wisa ye. Di deştê de dema ku tu kişif dikî, tu herî zêde gundê li pêş xwe dibînî. Ji bo ku tu bizanî li pişt wî gundî çi heye, çend gund hene, çend tax, çend gir hene, pêwîsti bin tiştên din heye. Lewma tu nînazê, mirov tam nikare bibîne. Pêwîstî bi çi heye? Ji bo ku tu yekser li ser lêhûrbûn çêbikê divê tu li ser nexşeyê bixebitî. Di bajaran de divê li ser nexşeyê xebateke te hebe. Mînak, li Rojavayê Kurdistan li ser nexşeyê hinek xebat hebûn. Dîsa dibe ku li ser tabletê jî bibe. Ji ber ku di peykan de hatiye çavdêrî kirin. Nexşe heye. Tu dikanî gundên ku tu dixwazî êrîş bikî bibînî, gundê li pişt wî bibînî, gundên din jî bibînî hetanî gelek gundan bibînî. Gelek bajaran jî bibînî. Di hundirê bajaran de çend tax, çand cade û çend kolan hene, mektep li kî derê ye, cihê bilind li kî derê ye? Bi şêwazekî tu dikanî van tiştan fêm bikî, tesbît bikî. Ev awantaja wê ye. Mirov dikane teknîke bixe xizmeta teqtîkê. Mirov dikane teknîkê bi vê şêwazê bi kar bîne.

Niha Rojava bi vî rengî tê çêkirin. Destpêkê ji bo tu xwe biparêzî, cihek te girtiye. Te gund an jî bajarek girtiye tu dixwazî vê derê biparêzi? Ji êrîşên çeteyan, an jî  ji êrîşên Tirkan ji bo bajarên xwe biparêzî çi pêwîst e? Yek, ew tecrube dibê hebe, dive ew taxên di nava bajêr de, kişfekî te hebe. Di nava bajaran de tax, di nava taxan de cade, di nava cadeyan de çend kolan hene, divê tu bizanibê. Di serê kolanan de, goşeyan de xaniyên çawa heye, stratejîk in an na, dikanin li pêşiya xwe hakimiyete çêbikin an na? Dîsa di rêza herî pêş a xaniyan de cihê herî stratejîk kî derê ne? Divê fermandarê di nava bajêr de, hakimiyet û naskirineke wî hebe. Heta hevalên herêmî yên ku wî bajarî, taxan baş nas dikin, cadeyan baş nas dikin, li gel şervanan hebin hê bêhtir awantaja wê heye. Ji ber ku eger di bajêr de nikanibe hakimiyet çêbike, mirov nikanî şer bike; ev îhtimal e tu tê de derbe bixwê, tu îmha bibî û tu tê de zehmetiyeke cidî bijî. Ji bo vê pêwîst e, tu hemû cadeyên bajêr nas bikî û li ser nexşeyê xebata te hebe.

Xetên bajêr diyar in. Tax bi tax diyar in ku cadeyên mezin kîjan in. Divê ev hemû ji nav hev werin derxistin û li ser vî esasî tu cihgirtinekê xurt çêbikî. Kordîneya bajêr ku li bajêr şer dide meşandin, divê grûbên xwe re baş biaxife û bi cihkirina wan grûban divê were zanîn. Divê serweriya wî li ser grûban hebe ku kîjan grûb daniye kî derê. Mînak, di sînga bajêr de, li hemberi dijmin goşeya milê rastê û goşeya milê çepê, xanî hene. Divê li van xaniyan bi şiklekî di cih de mewzîgirtineke baş were çêkirin. Rêzêxanî hene, divê wan rêzêxanî bên kûn kirin. Da ku ji wî xaniyî derbasî xaniyê din bibî, ji wî jî derbasî yê din bibî. Bi vê rêzkirinê divê tu kanibî tevbigerî, bi vê şêwazê tu dikanê têkiliya hemû xaniyan bi hev re çêbikî. Ji bo vê, pêwîst e tu wan xaniyan kûn bikî û di hundirê van xaniyan de qorîdoran çêbikî ku tu kanibî xwe biparêzî.

Mewziyên li ber çav, vekirî hene; mewziyên veşartî hene. Mewziyên vekirî, li ser xaniyan, ne cihê ku li hemberî diyar dibe, li wan mewziyên veşartî hebin û li wan deran bila hin mewziyên vekirî jî he-

bin. Tu dikanî wan çêbikî. Mesele, mewziyek te li ser xanî çêkiriye, tu divê derdeora xanî li cebheya pêş perde daynê. Ji bo tevgerên te, çûn û hatina te zêde nekeve qada dîtine dijmin. Divê li herêmê, dijmin bê dîtin. Ku tevgera te nekeve bin kontrola dijmin. Divê ji bo wê yekê tedbîrên xurt bên girtin. Eger tu tedbîrên xwe negirî, dijmin dê bi dûrbînan tevgera te bişopîne û cihê ku lê disekinî tesbît bike. Teknîkên dijmin hene, bi teknîka xwe ya heyî wê xaniyê tu lê disekinî îmha bike. Dîsa te qorîdorên di navbera xaniyan de çêkirin, tu wê demê dikanî taxa piştê re jî têkilî daynê. Bi wê korîdorê, bêyî ku dijmin te bîne, dikare di nava xaniyan de bigerê. Li gorî pêwîstiyan cihê xwe biguherînê.

Ya din di navbera taxan de cadeyên mezin hene, kolan hene divê tu li van deran barîkat daynî. Barîkat çawa ye? Mesela teble hebin, blok hebin tu dikanî bi wan kolanan bigirê. Dîsa eger di nava bajêr de hesin hebin, bermîlên gelaş hebin, tu dikanî wan bi karbînî. Eger trêks hebe, tu dikanî bi axê wan bigirî. Ji bo ku erebe nekeve navberê. Mesele li hemberê DAİŞ'ê, ew kolan bi trêksan dihatin girtin ji bo ku DAİŞ erebeyên bombebarkirî nekeve navbera xaniyên ku te mewzîgirtin çêkiriye, xwe nêz neke û xwe neteqîne. Li pêşiya wê jî divê weke hewz were çêkirin; da ku erebe dijmin negîhe te û neteqe.

Ya din divê agahiya van grubên ku di nava bajêr de çeper girtine ji hev hebe. Yê yekê, yê duyemîn û yê seyemîn divê agahiyan wan ji hev hebe û bi sîstemên cur bi cur ên têkilî çêkirinê, bi cihazan êdî bi şêwazekê bi çi rengî be, divê têkiliya wan bi hev re hebe. Çima? Dema mewziyek şikest yan jî ket, pêwîst e agahiya milê çepê yan jî rastê pê hebe. Ji ber ku bi xwe re xeterî diafirîne. Dibe sedem ku heval derbe bixwin. Divê heval van şêwazan pêk bînin û têkîliyan wan bi hev re hebe. Pêwîst nake hemû grûb li cihêkî stratejîk ê bajêr kom bibin. Ew bi awayekî xwezayî dibe hedefa dijmin. Çekên giran û çekên sûîqastê tu wekî parastin datînî cihên bilind û xaniyên nizm weke mewzîlendirmeyê çêdikê. Ji bo ku tu bajêr biparezî, divê tu di xaniyên biçûk de jî mewzîgirtineke baş çêbikî.

Ger ew qeîde pêk werin, mirov dikane bajêr biparêze. Dîsa têkiliya xaniyan bi hev re divê her hebe. Ji bo têkilîya wan qût nebe, tu di navbera wan de perde datînî. Dema tu perde datînî, qada dîtinê ya dijmin tê girtin û nikane tevgera te bibîne. Ev dive hebe. Ya din divê di goşeyan de, yanî li cihên veşartî divê grûbên te yên suîqastê hebin. Divê cihê wan veşartî bin. Di xaniyan de pencere hene. Divê li pencerayan de tevger nebe. Divê pencere ben perde kirin. Dema tu wisa bikî, tu qada dîtinê ya dijmin digirî. Ew qorîdorên di navbera taxan de ji bo ku tu bigîrî divê misoger tu perde daynî.

Tiştekî din; eger di bajêr de hêjmara te kêm be, tu dikanî bi maketan xapandinê çêbikî. Mînak li ser xaniyan, li goşeyên xaniyan maketan daynî. Tu dikanî kincan li wan bikî û wekî çek di dest de ye tu wisa bipêçî. Ji bo ku nizanibin ev maketin jî, tu dikanî cihê wan dem bi dem biguherî.

Ji bo parastina bajêr tu dikanî di barîkatan de mayîn biçînî. Dîsa li ser cadeyan mayînên cur bi cur biçînî. Hinek xaniyên ku tu nikanî zêde li ser hakimîyetê çêbikî tu dikanî tê de zêde zêde mayin biçînî. Dema dijmin tê, tu dikanî wan mayinan pê de biteqînî û wan dijminan bê fonksiyon bihêlî. Li hemberî DAİŞ'ê hevalan şêwayên bi vî rengî bi kar anîn û bi serkeftî jî dijmin derbe kirin.

Dîsa ji nava şêwazên parastinê, parastina herî xurt çi ye? Grûbên parastinê, dema te bi vî şiklî danî cihên stratejîk, ne ku hemû quwet biçe bibe hedefa teknîkê, mesela li xaniyên bilind parastin dayne, li xaniyên nizm jî wekî grub bici bike, di heman demê de kemînan dayni. Çepergirtina te wekî tîpa C be, dema dijmin dikeve nav de, tu dikanî C bike O. Yanî xeleke bigirî û wî dijminî bifetisînî. Şêwazên bi vî rengî tu dikanî pêk bînî. Dîsa dûrbînên bin deryayê hene. Serê dûrbînê li ser dîwêr derdikeve, lê tu li pişta dîwer kişfa xwe dikî û dibînî.

Dîsa çekên te yên giran hebin, tu dikanî di goşeyan de daynî. Dijmin, weke tîrekê êrîş dike. Lê di nava xwe de wek tîpa 'V' fireh dibe û çemberê digire. Ji bo vê çi hewce dike? Pêwîst e tu li baskan bidî, baskên wî bişkînî. Te di goşeyan de lê da, te baskên wê şikênand, tu dijmin îmha dikê. Mînak; li Cezaa êrîşeke bi vî awayî çêbû; hevalan ev teqtîk bi kar anîn, li baskan dan û baskên wê şikênandin, grûbên êrîş kirin îmha kirin.

Wêne-103

Ger ji ber xaniyan re, di goşeyên xaniyan re tu derkevî sûîqastê bikî; di mile dijmin de xuya bike, tu yê derbe bixwî. Divê li hemberê vê parastin bê çêkirin. Hê bêhtir tu di xaniyan de dikarê şibake çêbikî, ne tenê yek, sê-çar şibake… Ji wan şibakeyan re tu dikanî şer bikî. Eger tu yek şibakeyê de şer

bikî, dijmin li ser wê zêde zêde êrîş dike, lê eger tu di çend şibakeyan de şer bikî, barê te siviktir dibe û tu dikanî xwe biparêzî.

Ya din jî li bajêr, pêwîst e tenê baskên pêşî nebin. Divê xeta wê ya piştê ya parastinê jî hebe. Tu yê wê jî esas bigirî. Ji bo xeta piştê; baskê dijmin li cebheyê pêş ê mewzîgirtinê nezivire, pêwîst e tu xeteke parastinê, li pişt wê cebheyekê, xeteke parastinê daynî.

Ya din jî divê qorîdora te hebe. Di şerê DAİŞ'ê de qorîdor girîng e. Qorîdor wekî nefesê ye. Ji bo ku tu nefesê bistinî, ji bo ku tu kanibî quwetê teqwiye bikî, ji bo ku tu kanîbî cebilxane rêbikî, ji bo ku tu kanibî lojistike rêbikî, ji bo ku tu kanibi birîndaran derxî. Ji ber vê yekê qorîdor girîng e. Divê ew qorîdor parastî bibe. Ji bo ku tu kanibî qorîdorê û bajêr biparêzî.

***-We jî di nava şerê bajaran de cih girtiye, bi taybetî di rastiya şerê Kobanê de, hûn dikarin hin kîteyan vebikin?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Di şerê bajar de pêşveçûn ne weke şerê çiyayan, yan jî deştan e. Ji bo ku tu di bajêr de pêşde biçê gerek tu mal bi mal kontrol bikê, mal bi mal êrîş bikê û pêş ve biçê. Di vê pêşdeçûnê de pir wext diçû. Tu mala pêşiya xwe bigrî, dive bi terzê êrîşê biçî ser, veşartî biçe, bomba bavêjê hundir, di hundir de kes heye tuneye kontrol bikê û şonve bikevê malê. Ji bo wê roj hebû ji êvarê heya sibê bîst metre, sih metre, pêncî metre; yanî malek, dumal, sê mal di heman rêzê de te digirt. Car hebû heftiyekî tu pêncî metran di pêşve diçûyî.

Bi vî awayî zehmetiyên xwe pir bûn. Pêşiya mirov xwiya nake, hemû bi diwaran girtiye. Di pişt wan dîwaran de çi heye çi tune, çiqas quwet heye mirov nizane. Yanî mirov êrîşî gireke bike mirov dibini li pêş çi heye û dizane çiqas jimar tê de heye. Çend mewzî di tepe de ne mirov dizane. Lê di malan de mirov nizane du mewzî ne, an deh mewzî ne. Mal bi giştî bi hev ve ne, di rêzekê de ne. Sed dused mal di rêzekê de ne. Wan rêzan mirovê çawa bigire, hostatiyek mezin dixwaze. Pir hesasiyet, tîtîzbûneke mezin dixwaze. Yanî dive mirov sed carî bifikire, carekê bîryar bide, carekê gav pêş ve bavêje. Şerê bajêr bi vî awayî ye.

Ji bo wê jî pêşveçûn pir hêdî dimeşiya. Ji bo wê mirov mal digire, mala din pêve ye, gerek mirov dîwar bişkêne. Mirov carnan dîwar dişkêne, meyze dike DAIŞ derket. Ev çawa ji bo me wihabû, heman demê ji bo DAIŞ'ê jî wisa bû. DAIŞ jî carnan pêşve dihat, dîwarê malê kûn dikirin diketin nav hevalan. Hevalan dîwar kûn dikirin diketin nav çeteyan. Di şerê bajaran de lez tevgerîn pir girîng e. Sekvanî roleke pir mezin dilehîze. Di şaran de çûnûhatin pir hesasiyet dixwaze. Dive mirov pir lez tevbigerî, pir teqtîk bimeşîne, yanî ji bona ku mirov karibe şaraya pêşiya xwe kontrol bike, serê xwe ber diwar re derdixe, yê sûîqast dikin. Ji bona mirov serê xwe dernexe wê çawa kolana pêşiya xwe bibîne, me pir caran neynik didanî, kontrol dikir heyanî ku ji kolanê re derbas dibûn. Bi vî awayî pir kîteyan dixwaze, teqtîkên nû ku mirov serê xwe pê ve biêşîne dixwaze. Terzekî wisa nîne hema tu biçê pêş.

Di şerê bajar de bi vî awayî tecrûbeyek pir mezin çêbû. Çawa wê sûîkast bê kirin, wê çawa xwe veşêrin, kûderê de hakimiyeta xwe li ser kolanê çêkin, kûderê de wê derbas nebin, di kûderê de derbas bibin, di kîjan malan de wê herin, di kîjan malan de wê vegerin... Di tevahî teqtîkên şerê bajêr de, şerê Kobanê adeta ji bo her hevalek bû tecrûbeyek mezin. Ji bo herkesê bû tecrûbe û minakek.

Hem jî di tecrûbe, teqtîk û terzê pêşdeçûna bajaran de bû tecrûbeyek mezin. Ev tecrûbe qezenckirin wisa rihet nîne, bi şehadetên pir mezin, pir zêde ev teqtîk bi dest ketine, ev tecrûbe hatin qezenckirin. Di encamên şehadetên pir giranbuha û zêde de, tedbîr, teqtîk û terzê şerê bajaran hinekî em fêr bûn. Sedemên evqas zêde şehadet çêbûn, li bajêr xala sereke bêtecrûbeyî û bêpilanîyê bû. Mirov dikare bêje di despêka şer de heya dema navendê şer ya di bajêr de, di şer de teqtîk tine bû. Şerekî bê teqtîk, şerekî bê kontrol bû. Tecrûbe, însîtaytîf û tecrûbeya kê çi be, ji milê xwe ve ew yek dida meşandin. Jixwe herkes wisa nêzî şer dibû. Heya çil rojî zêdetir şerê hundirê bajêr bi vî awayî bû. Yanî her komek bi însiyatîfa xwe, bi zanabûna xwe bû.